

**ABDULLAH OÇALAN**

**ÇAWA BİJÎN**

Abdullah OÇALAN

**Çawa Bijîn**

Çapa yekem: Weşanên Serxwebûn-70  
Çapa Yekem: Adar 1995

## Naverok

PÊŞGOTÎN.....

LÎ KURDÎSTANÊ ERKA HUNER

Û GELALA ROMANEKE ŞOREŞGER.....

Huner û wêje pediviya giyanê ye

Mêtîngerî dijminê huner e jî

Ji pîrsa “Çawa Bijîn” re bersîva bê dayîn romanek e

Romana Kurdistanê divê xweser be

Ku qonax baş neyê vekolandin

kesayet baş nayê dahûrandin

Cîhana kevin di bin kontrolê de ye

Di nava me de têkiliyên jin-zilam

têkiliyên şer in

Li Kurdistanê hezkin hatiye qetilkirin

Em demxeya mulkiyetê ya li ser zayendîtiyê radikin

ÇAWA BIJÎN

Ez di bingehê bervêdan û bertek raberkirina

her tiştî de gihîştîm teorî û çalakiya şoreşger

Li hember faşîzma 12 Rezberê me doza azadiyê

vegerand rastîna jiyana gelekê

Jina herî bedew, herî bi qîmet û ya herî zêde divê bê hezkinin,

wê çawa derdikeve rastê

A ku em dikin, şerê heyînê ye

li hember her tiştê ku li ser jiyane gefê dikin

Hezkirina ku bi welat û çînayetiye ve negirêdayî ye

ne tu tişt e

Li devereke ku her dest têkil dibin

hêlin nayê çêkinin

Di bingehê rastînan de karibî hez bikî, hez bike, karibî bijî, bje

CÎHANEKE BÊ QEZENCKÎRÎN HEYE

Nêzîkatiya çewt ji zayendîtiyê re û mezintirîn bêçaretiya civakê

Kesayetiya dij-civakî nikare saxlem nêzîkê gerîla bibe

Nêzîkatiya min a jinê vegeiriya şerê man û nemanê bi KTyê re

Tu dikarî di rêjeya pêşxistina hezkirinê de şer,  
di rêjeya pêşxistina şer de jî hezkirinê pêş bixî  
Mirov di hêza atomê de behreyek e  
Şûna stû tewandinê  
di rîya têkoşînê de her roj mirin bêtir di cî de ye  
Koleyan jî mafê hevrêtiyê bi têkoşînê qezenc kirin  
Apocîti,  
ji hilkeftina karên herî zor xwe nepelikandin e  
Ji pirsgirêkê re nêzîkatiya netewî,  
wê ji warê navnetewî re jî tevkariyekê berpêş bike  
Wek aliyekî  
çarenûsa xwe bi azad diyar bikin  
Em di şexsê kesan de asta netew û civakî didahurînin.  
Yên ku nayên xeta rêkxistinîyê  
nayên têkiliya azad jî  
Mirov rîskê nede ber çav  
serkeftin nayê qezenckirin  
Hesteke sihêl jî  
dikare hêviya gelekî bi erdê ve bike yek  
Bi armancan ve girêdana şidandî  
mitlaq dide qezenckirin

ŞOREŞA KURDÎSTANÊ  
ŞOREŞA AZADÎYA JINÊ Û CIVAKÎ YE  
Zayendîtiya bêteşe qedan e  
Tîpê jin û zîlamê Kurd ê klasîk  
li hemberê hev binketî ne  
Ji bo têkiliya azad şernekirin  
li azadiyê xîyanetkîrin e  
Li ba me evîn  
yekîtiyeke mezin a siyasî ye  
Azadî bi şer tê afirandin  
Zîlam, divê bibe rêhevalê azadiya jinê  
Evîna PKKê bijîn  
Pirsgirêka jinê çareserkirin  
qezenckirina serkeftinê ye  
Hunê xwe bigihînin  
têkilî û şerê jiyana rast

DÎVÊ EM JÎ BO JÎYANDINÊ ŞER BIKÎN  
Û DÎ ŞER DE JÎYANÊ DERXÎN RASTÊ  
Armanc jîbîrkirin  
û amrazan hişkbawer hebandin karesat e  
Tevgera me çemka şoreşa civakî ye  
Damezraka malbatê û têkiliyên civakî divê çawa bin  
Divê em çîroka xwe rast bizanibin  
Ne jiyîn, ne jî najiyîn  
jiyanê dide sekinandin  
Li derveyê têkilî û şewaza şoreşgerî

yê ku dihizire wê bi ser xîne debeng e  
Mafê jiyane  
Mafê şer e  
Ger tu jiyana civakî ya azad dixwazî  
Wê tu zagona Kurdistanê bisepînî  
Her tiştên ku xwemalê kevin in  
eyb, kirêt, xirab û çewt in  
Zarokê Kurd yê li Awistralyayê jî dizane  
ku bi hêsanî nayê jiyandin  
Ku tu li hember hest û kevneşopiyan bin ketî  
wê tu her tiştî wenda bikî  
Rast zagona zayendîfî û têtîliya zayendiyê heye  
Afirandîna jin û zilamekî  
bi qezenckirina şer gengaz e  
Keç û xortên me jî bo azadiya mezin in  
Ger azadî hêsan ba  
Ronahî û Bêrîvan xwe nedişewitandin  
Pakrewanî  
bergîdana jiyane ku divê bê dayîn e

## PÊŞGOTÎN

---

“Çawa Bijîn”, di roja îroyîn de weke pirseke herî girîng ya dîroka Kurdistanê tê pirsîn. Pirseke wisa ye ku tenê bi şoreşeke mirov û jiyana dikare bersîvê peyda bike.

Taybetmendiya herî darîçav ya wan şoreşên ku di dîrokê de şopên mezin hiştine, şaristaniyê re tevkarîya mezin berpêş kirine û bandora wan heya îro berdewam kirine, ew teşeyê jiyana nû ye ku li ser hilweşîna jiyana kevin derxistine rastê û mayînde kirine. Şoreşên ku bi pirsra “Çawa Bijîn” re nakevin têkoşîna lêpirsîna mezin, bersîva vê nadin û nafûrin derveyê armancan, dîrok dinivîsîna ku di hundirê heyamê de wenda dibin û diçin. Şoreşên dema nêzîk jî, ka ev pirs çiqas pêdiviyêke sotîner e, pir baş nîşan didin.

Bi taybetî gava ku sehaya tevgerînê dibe Kurdistan, divê neyê jibîrkirin ku avên diherikin disekinin. Ev rasteqîn, çend qet mezinbûnên dî tevî mezinahiya vê pirsê dike. Bêyî vê “pirs”ê belkî her tişt bê kirin, lê tiştên nikare bê çêkirin jî, şoreşa ku di oxira wê de hewqas bedêl tî dayîn e. Bêguman ev ne îdfayek e; bi rastî her kesê ku vê lêkolîn dike, dikare bersîv bibîne ku her roj, her demjimêr û heta her qas bi rasteqîna vê pratîkê ve tijî derbas dibe. Serok APOyê ku mirov dikare bibêje dahûrînên dîrokê yê herî curbecur û berfireh çêdike, di her peyva tîne ziman de ev rastî veşartîye. Em dubare dikin, divê qet neyê jibîrkirin ku ev der Kurdistan e. Yê li ser vê axê jiyana qezenc nekin, nikarin tu tiştê qezenc bikin. Yê ku xwe azad nekin, nikarin tu tiştê azad bikin. Yê ku kesayetîya serbixwe çenekin, nikarin xwe ji koletiyê rizgar bikin.

Lewma “Çawa Bijîn” pir girîng e; pirseke ku qasî nan, av û hewayê pêdivî pê tê dîtin. Yekcar jiyana xwemalê mêtîngeriye, ne jiyana e. Di Kurdistanê de bi hezarûyek cure rêbazan jiyana mirovan hatiye sekinandin. Ya tê gotin zindî, mirî ye; ya tê gotin jiyana, zindan e; ya tê gotin rûmetdar e, bêsermiya ketî ye. “Civata miriyên li ser piyan...” welatekî ku bi her tiştên xwe ve hatiye wendakirin û rasteqîna gelekê... Bi rastî jî, zoriyeke şoreşa Kurdistanê rû bi rû maye ku bi “miriyên li ser piyan” ka jiyana çî ye û ne çî ye bide têgihîştin.

Serok APO di nixandineke vê pirtûkê de dibêje, “Bersîva ku ji pirsra “Çawa Bijîn” re bê dayîn, romaneke mezin e. Bersîvbûyîneke wisa hêsan nîn e. Karekî wisa giran e ku her kes nikare ji bin derkeve. Bêşibaniya şewaza serokatîya Serok APO, bi gotina wî, ji ber ku kûraniya bikaranîna “Diyalekta Kurd” pêk aniye, bi gor pêwîstekên wê têkoşînekî bingeher girtiye û ji pirsra “Çawa Bijîn” re gihîştina hêza bersîvdanê pêk aniye, derketiye rastê.

Di Kurdistanê de ji ber ku her tişt hatiye tewiştandin, tu tiştêk ne li ciyê pêwîst dike dimîne, ji ber ku kesayet di lîtava mezin a ketîbûnê de tîn xeniqandin û rastînên berevajî cî bi wan tê guherandin, bersîva pîrsa “Çawa Bijîn”, şerê mezin e. Ev şer, ne ew şerê zipûziwa yê çek bikaranînê yê ku cara yekem de tê hiş e; heya pêşiya pêvajoya ronahîbûna PKKê tevahitiya sepandinê ya ku nedihate hişan e. Çalakiya mezin xirakirina her tiştê kevin û li şûna wê mezin çêkirin e. Bêyî vê tu takekes, nikare hêza rakirina lekeya şermê ji eniya xwe nîşan bide. Serok APO bi xwe jî, li rexmî têkoşîna xwe ya xedar a bêhn diçikîne, ger ku dibêje hê jî vê lekeya şermê tam ranekiriye, her hal tu kes nikare bikeve nav xefleta hizirandina ku wê karibe vê lekeya mezin a şermê bi desmalê paqij bike.

Gihandina pîrsa “Çawa Bijîn” û ka wê bersîv çawa karibe bê dayîn nîşandan, datîne rastê ku ew mirovatiya li cîhanê diçilmise, li navenda xwe ya kevin a li Kurdistanê ji nû de tê şînkirin. Serok APOyê ku mezin dirame, tenezûlê hêsaniyê nake û têkoşîna rîskdar bingeh digire, bi bersîva ku ji pîrsa “Çawa Bijîn” re dide, bi dahûrandinên wergir ên jiyana civakî, di vê warê de jî derbasî hilperîneke mezin bûye. Her kesî li pêşberî vê hilperîna mezin piçûktiya xwe bi erjengî ferq kiriye. Bi têşeyekê balkêş hatiye nîşandan ku, her guleya hatî avêtin, her dilop xwîna hatî rijandin, her zoriya hatî kişandin vala neçûye, naçe û her tiştêk xerxa jiyana nû ye. Ev di heman demê de diderbirîne ku şoreşa Kurdistanê perînê pêvajoya însayê bûye.

“Çawa Bijîn” di bin serokatiya Serok APO de gaveke nû ya PKKê ye. Li perçeyê Kurdistan a cîhanê ku qeyrana civakî, siyasî û çandî bi tevahî giraniya xwe ve tê jiyandin, dîroka jiyaneke nû tê nivîsandin. Pêşketina herî zêde dijminên PKKê ditirsîne ev e. Ji ber ku şerê leşkerî yê bi serkeftin, tujbûna viyana hêwilnak, xeta serxwebûna ku ji pêveberdan û radestbûnê re bi temamî biyanî bûye û hwd. her tiştê PKKê, ji bo jiyaneke nû ye. Helbet di ciyekî de jin, binyada jiyane ye. Jixwe di Kurdî de wateya “jin”ê, “jîn” e. Lê belê jina ku herî zêde ji jiyane hatiye xistin, bi dahûrandinên azadiyê yên Serok APO, bi guncîna navê xwe pêgirê pêvajoya avakirînê tê kirin. Êdî di xala pêkhatî de, di derbarê ka pîrsgirêka jinê çi ye û ne çi ye de aliyên dîrokî û rojaneyî hatine dahûrandin û niha li gavên vê yên pratîk zorî tê kirin.

Bi taybetî ev du sal in dahûrînên jiyana civakî yên Serok APO, henaseyeke nû bi têkoşîna rizgariya azadiyê daye qezenckirin. Tîpê zilam û jinê yê ku pêwîst e bê pejirandin, bi hemû aliyan ve rave kiriye. Pirtûka “Çawa Bijîn” ji van dahûrînan hatiye berhevkirin. Taybetmendiya pirtûkê ew e ku, şerê ji deh salan bêtir hatî birêvebirin û di bingehê rûxandina jiyana kevin de, mesafeya ku afirandina jiyana nû wergirtiye bi hemû aliyên xwe ve dide teyisandin. Her wiha ev nirxandinên ku ne tenê mirovên Kurd, mirovên ji gelên din jî karibin xwe tê de bibînin, di çonatiyeke hejîner de ne. Bi vê watiyê ev pirtûka ku her yê dixwîne têxe nava lêpîrsînê û pê dide pîrsîn ka çawa dije, di warê xwe de ya pêşîn e. Ji ber

ku pirsgirêkên jiyane datîne rastê û çareseriyên jê re tîne, jêderkeke nirxdar e ku ew kesên dixwazin xwe û civakê ji nû ve biafirînin, dikarin li serê bîroniyê, lêkolîn bikin û encamên pir berfireh jê derxînin.

**Weşanên Serxwebûn  
Çile 1995**

**“Gihîştina şewazên derbirîn, uslûb û hîtabên pergalên nû, têkiliyên nû,**

her roj kevin xirakirin û şewitandin  
û ji nû ve çêkirinê re rê vekirin  
jiyaneke romanî ye’’

## LÎ KURDÎSTANÊ ERKA HUNER Û GELALA ROMANEKE ŞOREŞGER

Pêşketina civakî, di bingehê bi xedarî rexnekirina rasteqîna civakî a ku bi her awayî kesayetiya pêwîst e bê terkirin dide axaftin de derdikeve rastê. Bi vî awayî di biçimê jiyanê ku yekuna têkiliyên civakî yên ku kesayetiya tê pejirandin dide axaftin rastîneke guhêrker û dahûrîner diderbirîne.

Di şêkiltirînê netewî de qasên veguherîna çonayetî, dibine qasên şoreşî. Ji bo pêkanîna her pêkhateya civakî, şoreşa ku tê wateya serûbinbûyîna bingehîn, di destpêkê de li warê zanistiyê pêş dikeve. Pêşketina zanistî bi xwe re weke bêtir şênber li ba rêxistinî û çalاکmendiyê; felişandina têkiliyên jorsaziyê ku êdî li pêşiya jiyanê teng û weke astengekî tîn, mîna peywirekî girîng datîne pêş xwe. Bêguman tevgera şoreşger hewldanên xwe yên ramyarî, li dijî raman û bîrdoziyên kevin di rêjeya têkoşînedana rehdar de naverok û xeta xwe ya bîrdozî derdixwe rastê. Dîsa vê têkoşînedana xwe li hember dezgehên jorsaziyê gava ku didaxîne hewldaneke pratîk, êdî di nava qalikên zagonan da cîbicî nabe. Nikare bi azînen zagonî û aştiyane qîm bike. Bi azînen dijwarî dixwaze rasteriya siyasî vebike û pêşketina siyasî pêwîst dibîne. Her wiha pêşketina şoreşgeran destpêkê di warê bîrdozî û ber bi çûyîne ve jî di warê siyasî de derdikeve rastê. Şideta şoreşê, di rêjeya sepandina rêxistinî û ponijîn de têkoşîn ber bi warê leşkerî ve dişemite. Her wiha pêşketina şoreşê ya bîrdozî û polîtîk berdewam dike û diçe. Ger xwe bigihîne serkeftinê wê gavê jêrsaziya xwe li rasta veguherîne tîne û teşeyê hilberîna kevin dirûxîne. Ew têkiliyên ku astengî çêdikin belav dike. Têkiliyên mulkiyeta nû di destpêkê de ji bo pêşketina hêzên hilberîne çarçova dest didin ava dike û hewl dide ku pêşketina xwe temam bike.

## Huner û wêje pediviya giyanê ye

---

Şoreşa ku di jorsaziyê de dest pê dike, her wiha jêrsaziya xwe li veguherînê rast tîne, pêş dikeve û tekûz dibe. Di vê derê de pirsra herf girîng ku bê bersivandin ev e: Erka wêjeyê çi ye? Ango pêwîst e bi giştî huner, bi taybetî jî wêje û dîsa ew romana ku beşek girîng a vê yekê ye bi pirsra ka erka şoreşî çi ye, ku em bibersivînin. Ger huner nebe em nikarin qala civakan bikin. Lewma huner, amrazekî jêveneger e, ji bo civakbûyîn û pêşketina civakî. Bi taybetî, ji ber ku mirov nêzîkatiya xwe ya li hember xwezayê bi zanistî û bi polîtîkayê tam nikare dahûrîne û nikare giyana xwe bi têrbûyîneke daringî têr bike, wî ber bi teşeyê têrbûyîbûneke cewaz, yanî ber bi hunerê ve dibe. Di vê wateyê de huner, derbaskirina pêdiviya giyanê esas digire. Bêguman pêwendiya vê bi raman ve heye. Bi hêsanî mirov dikare diyar bike ku huner, warekî pir xweser diderbirîne.

Gelek teşeyên curbicur ku xwestekên giyanî di nava xwe de peyda dikin, weke berhemên hunerî derdikevin pêş me û her wiha têrbûyîna arîştî pêk tînin. Berhemên pergale jî dem bi dem hunerê bandor dikin. Dîsa pêşketina polîtîkî jî pir nêzîk ve pêwendiya xwe bi huner re dide avakirin. Lê ji van tevan re em nikarin bibêjin huner. Di aliyê din de, di polîtîka û aboriyê de mirov dikare qala hunerê bike. Gelek bîrdoziyên curbicur nêzîkê huner dibin. Di virê de ya bê têgiştin ev e ku; huner ji faktorên civakî yê din zêde bandor digire, lê bi wana re nabe jêbûnî ango dibe siyeke wan a pasîf. Lê belê weke pêdiviyeyeke çîst û jêveneger jiyandin û hîskirina wê mijara gotinê ye.

Dikare bê gotin ku jiyan, bi gor pêdiviyên mirovatîyê tê şekilkirin, di virê de tevahî amraz û azînen ku tên dîtin, dikevin berfirehiya hunerê. Bûyera ku em dibêjin dengêkî xweşik, dimenê bi çav xweş tê, helbest ango destana baş a ku hîtabê giyanê dike weke cureyekî hunerê tê nixandin. Dibe ku ev tunebin jî jiyan bidome, lê ev yek razberkirinek e. Di her nihêrtinê de hemin veqetandina xweşikbûn û kirêtiyê heye. Dîsa di her nêzîkatiya giyana mirov de tiştên ku li xweşê diçin û naçin hene. Libat û tevgerîna baş heye, libat û tevgerîna şaş heye. Lewma Civakek yan jî takekes her çende ku bilind dibe (bi taybetî dema ku çalaktiyên hunerê dibe mijara gotinê) ku pêşketin hatibe pêkînanandin yek jî di vî aliyê de dibe derbirîna pêşveçûyîne. Yekî ku di nav teşeyê hunera pir paş de maye ango di nav teşeyê libata pir paşdemayî de seyr dike û diçe ji hovebertiya wî tê qalkirin. Kesayeta ku kûrbûna giyanê û dewlemendiyê bi xwe re peyda nake, ji mûzîk, dîmen û bi her awayî teşeyên libata huneriyên cûrbecûr ve bandor nabe û nakeve ferqa ve yekê, rehên jiyanê wî ziwa bûne. Lewma huner, erka xwe ya civakî bêgotûbêj e. Bêyî wê jiyan tenê dikare nêzîkê jiyaneke ajalî seyr bike.

Sînorê ku ajal, bi mirovatîyê re dibe yek, dikare biderbirîne. Ev, ne jiyaneke ku were pejirandin.

Bi vê wateyê di her qonaxa pêşketina civakî û pêngavên çonayetî de rasteriya pêşketinê ya hatiye pêkînanandin, di heman demê de rasteriya pêşketina hunerê jî dide diyarkirin. Jixwe qonaxên civakî yên serûbinbûnên girîng, di heman demê de bi hewldanên hunerê ve darîçav dibin. Her serûbinbûyîn di destpêkê de li warê hunerê pêş dikeve; hem hunerê bandor dike, hem jî jê bandor digire. Bi taybetî qonaxên şoreşî, weke ku bi hunerê tîn amadekirin, di gihandina teşeyên çonayetî û xurt de bandorekî girîng çêdikin. Huner bi vê wateyê li hember zoriyên jiyane henase wergirtineke fireh e. Yanî ew giyana mirov a ku teng bûye, bi hemû behremendiya seheka xwe ve qewastin çêkîrin e. Bi tiştên heyî û kevin qîm nekirin e. Qîmpênanîna wê jî, hêz qezenckirin e. Dikare pênasê şoreşa hunerî wisa bê çêkîrin.

Civak û welatê Kurdistan dema ku dibe mijara gotinê, bi pênasêya giştî ya guncîn a hunerê tiştê ku dikare bê gotin, tevahîtiya civakê di mercên feodal û mêtîngîriyê de hatiye rewşeke ku nikare henase wergire û xwe bide pêşxistin û ev yek jî, li ser hunerê bandorekî pir neyênî çekiriye. Lê belê di virê de ya herî girîng ev e: Gel, di gelek dezgehên jorsaziyê, têkilî û hêzan de tevî ku pir zorayî kişandîye ango hatiye qedandin, lê sînardar be jî, xwe tenê bi huner dikare bide jiyandin, dîsa derbirîna nasnameya xwe dikare tenê bi hunerê bidomîne. Em vê yekê dibînin. Ev yek jî hêza huner nîşan dide. Huner dibe taybetmendiyekê civakî yê belkî jî herî dawî bin bikeve û bê wendakirin.

## **Mêtîngerî dijminê huner e jî**

---

Mêtîngerî, di heman demê de ji bo pekanîna qirkirina hunerê hendazetiyekî mezin nîşan dide. Qirkirinê di her astêde ku li Kurdistanê hatiye pêkînanandin, di rêjeyêke girîng de qirkirina hunerê jî pêk aniye. Lê huner, ji ber ku hindêk bi giyanê ve girêdayî ye pir û bêtir zindî ye, di nava kategoriya yên dijîn de cî digire û aliyê xwe yê arîştî de giraniyê dide çêkîrin, ew qirkirinê ku di şertên darîngî de pêk tîn, qasî wana qirkinê napejirîne ango vala derdixe. Huner, taybetmendiyekê xwe yê wisa jî heye.

lewma civaka Kurd, di rasteqîna gel de nasname, hindik zêde berdeyamkirina bi huner tê fêmkirin. Bi taybetî folklor û mûzîk bûne sebeb ku nasname netewî di rewşeke diyarî de xwe li ser piya bihêle. Lê gelek alî û çalaktiya hunerê hatiye tewiştandin û li piştaftinê rast hatiye. Her wiha ji bo hunera netewa serdest bûye amrazekî bikaranînê.

Serdestiya mêtîngerî, di heman demê de serdestiya hunerî ye jî. Ev yek jî derbirîna xwe, destpêkê di nejiyandina rastîna hunera gel, tewîşandin, ji xwe re malkirin û anîna halê nenasînê û piştîre jî hunera xwe wek hunera ku a gelê bindest e, di vê nêzîkatiya nîşandanê de peyda dike. Dîsa mêtîngerî di hemû dezgehên fermî de, bi taybetî, li ser piştevaniya hêza dewletê, ji bo vê yekê şîringa cîhana giyan û hestên gelê bindest da ku baweriya “di bîngêh de tu ji netewa serdest î, wek wî yî, nasnameyekê te yê cuda nîn e” bide çêkirin, serdestiyeke mezintirîn pêş dixê. Her wiha netewa serdest di rêjeya ku xwe dide pejirandin de, tunekirina netewekê temam dibe. Bi vî rengî nasnama netew wenda dibe û nasnama netewa serdest desthilat dibe. Bi rastî jî ev, di rasteqîna Kurd de rewşeke herî pêş ketiye. Ji ber vê sedemê, li hember rasteqîna netewa serdest berxwedaneke pir hindik heye. Tebî ev yek nîşan dide ku mêtîngerî ka çiqas pêş ketiye.

Nexwe, têkoşîna li hember mêtîngeriyê di warê hunerî de piçûk nayê dîtin. Dîsa di warê huner de pir bi sînor be jî, hebûna nasnama netewî di hinek aliyan de domandin dikare bîngêhek çêbike, ji bo derketineke girîng di têkoşîna rizgariya netew de. Di qonaxên destpêkê de bi taybetî, xebata çand û hunerî piştgiriyeke ji netewbûn û têkoşîna netew re dide çêkirin. Heya qonaxêke diyar roleke girîng dileyize. Lê heke ku şideta siyasî û leşkerî nebe, têkoşîna çandî û hunerî zêde wateyekê naderbirîne û zelal tê dîtin ku erka xwe nikare bide temamkirin.

Mîrov dikare qala nêzîkatiya rewşenbîr û mîliyetperestîya hoveber ku di vê wateyê de huner rast nanirxînin bike. Em baş dizanin ku huner, çand û xebata wêjeyê ya ketûber bi rizgariya netewî, bi taybetî jî bi peywîrên siyasî û leşkerî têkil hev dikin ango bi vî rengî naxwazin peywîrên xwe bibînin, mafê hunerê jî nadin û rê vedikin ji bona têkilhevkerinekê.

Bi pêşketina têkoşîna me ya şoreşger huner hem erkdariya di nava şoreşê de hatiye zelalkirin, hem jî ew çemkên çewt ên di nava şoreşê de neyênîya wan hatiye marezkirin. Çawa ku rola hunerê re giraniya pêwîst dike hatibe dayîn, li hember karanîna helperestî jî, rexneyên pêwîst hatiye pêş xistin. Ka çiqas ev yek rast e di nava têkoşîna şoreşê ya bilindbûyê de pêşketina hunerî wek aşutekî mezin bûye, li ba vê yekê qasî bandora warê hunerî li warê siyasî û leşkerî, van waran jî li ser warê hunerî bandorekê derxistiye rastê. Di vê wateyê de çalaktiya hunerê hatiye gihandin bîngêhên rast ên erkdariya şoreşgerî. Ji destpêka sedsalê vir ve heta pêşîya wê jî, nasnama netew a ku di hate xwestin xwe bigihîne asta hunerê wek dêwekî hilperîne pêk anîye û ev tenê bi têkoşîna siyasî û leşkerî derketiye rastê. Lê, li ba vê yekê erkdariya huner kême nebûye, tam berevajî zêde bûye. Her wisa ku şoreşa Kurdistanê serûbinbûneke girîng dike, şer ji hemû girseyan re bûye mal, xwe kûr dike, her çîn û tebeqeyî digire nava berfirehiya xwe, vê yekê didomîne, li ba vê yekê kêmbûyîna erkdariya hunerê bila li vir bimîne, em dibînin ku bêtir zêde bûye û hatiye halê pêdiviyeke şênber. Girseyên gel, bi mûzîk,

folklor û wêneyên şoreşgerî bêtir hatiye rewşeke zindî û ji bo teşeyê jiyaneke baş hewl dide ku zêdetir xwe lêhatî bike. Yanî di vê wateyê de bi kiryarî şoreşeke hunerî tê jiyîn. Lê li rexmî vê diyar e ku, ev yek nayê terkiserkirina jixweberiyê, tam berevajî pir êşkere ye ku pêdiviya xetêke huner a pir rehdar û xebata wê ya pratîk heye. Her wiha ji bo derbaskirina kêmasiyên heyî mîna afirandina eniya hunerê û berê xwe dayîna xebateke wisa hem pêdivî ye, hem jî sehayek e ku ji pêşketina şoreşî re tevkarîyekê çêdike.

## **Ji pirsra “Çawa Bijîn” re bersîva bê dayîn romanek e**

---

A ku em dixwazin di vê sehayê de bidin pêşxistin, di bingeh de gelala romaneke şoreşgerî ye. Em dikarin bibêjin ji pêvajoya hilveçîrîna korgirêka ku di civaka Kurd de hatiye çêkirin û pêvajoya ber bi rizgariya nû ve bi romanê hunandin ango bi romanê anîna ziman. Bersîva em ji “Çawa Bijîn” re bidin di wateyekê de dibe roman. Em raveya şoreşê a bîrdozî, polîtîk û leşkerî û dîsa stratejî û taktîkê pêş dixin. Her wiha peşketin çêdibin û diçin. Lê di heman demê de ger ku em pirsra “Jiyana şoreşger wê çawa be” nebersivînin, wê emê şoreşa xwe ji pêşketineke giyanî ya girîng û ji teşeyê libatê pîmen bikin û êşkere ye ku ev nabe saxlemiyek. Lewma ji bo milîtanek şoreşger pirsra “Çawa Bijîn” sofîner e. Jixwe têkoşîna rizgariya netew a ku di bin serokatiya partî ya me de pêş dikeve, hemû civakê alandiye, tenê ne ji bo milîtan, ji bona hemû takekesan şewazeke jiyana şoreşger ka çawa pêwîste bê peşxistin, bi qasî nan û avê bi misogerî aniyê halê pêdiviyekê. Di nava civaka me de paşdemayînen mezintirîn û xirabûnen libatî hene. Dema tîkiliya vê bi mêtîngerî, Kemalîzm û dîsa bermayên çerxa navîn ve bê kolandin û dahûrandin, wê bê dîtin ku ka çiqas tîkilî û jiyane bî hilweşandin û li hemberê bertekê bê raberkirin û dîsa di şûna wan de ji tîkilî û teşeyên jiyana nû ku bê afirandin, hewqas pêdivî pê heye.

Va ye roman, hindê jî di navbera vê belênayê de hewldanê diderbirîne. Tîkilî û teşeyê jiyana ku pêwîst e bê derbaskirin, tîkilî û teşeyê jiyana pêwîst e bê parastin lîkolîn û lêpîrsîn dike, dahûrîn dike û ji nû ve ava dike. Ev yek ger ku teknîka hunerê baş bê karîndin, di wê rêjeyê de, wê ji şoreşê re tevkarîya herî baş bide berpêşkirin. Tebî dema ku têkoşîna me ya şoreşger dibe mijara gotinê, rasteqînen dîrokî yê şoreşê, teşegirtina civaka ku xwe li ser radigire, bi taybetî li ba pêvajoya dîrokî ya nêzîk rasteqîna ku îroyîn dije û aliyên pêşketinê dibêtî ku pêgirê nîrxandina asteke nêzîkê zanistiyê bê kirin û ji romanê re zemînekî wisa bê berpêşkirin, em dikarin destnîşan bikin ku ev pêdiviya romanê pala xwe dide ango divê pala xwe bide ser binyada rasteqîna sosyalîst.

Ev yek di heman demê de, di bingehê daneyên zanîstî de derdikeve rastê, ew aliyên ku kevneperestî bi her awayî pê re çêdikin, şunda dikişînin û vesazî dikin û helwesta ku dixwaze nûjenî bike, ji her cure temsîla vê re bi rexneyê bersîv dide. Li ba vê yekê, xwedî li rasteriya pêşketî derdikeve, ji bona pêşengtiya vê bêrî, azwerî û bilindbûnê esas werdigire. Ev roman, rasteqîna tê jiyandin tam jî bi vê teşeyê digire dest, di bingeh de jiyana takekes a ku bi hilweşandinê ve rû bi rû maye û piştgiriyê ji jêr û jorsaziya civakê werdigire ji hilweşandina wê re çavdêrî dike û di teşeyê herî radîkal de rexne dike. Lê di heman demê de ye şunê de bê cîbicîkirin ka wê çawa be, hewl dide ku derxîne rastê û girêdana bi kevirên bingehîn yên jêr û jorsaziya tevahî jiyana nû ya ku divê bê pejirandin, bide avakirin. Ev, di kesayeta tîpek an çend tîpan de dikare ji avakirina nû ya hemû civakê re rê bide vekirin. Li virê sê-çar tîpên ku were destgirtin, di heman demê de ji dahûrandina rasteqîna dîrakî û civakî re, wê rê bide vekirin. Çend tîpên ka kîjan dîroka paşdemayî têkiliyên civakî yên vê dîrokê temsîl dikin baş didahûrine, baş çavdêrî dike, baş rexne dike û ji nû ve ava dike. Ger ku vê yekê çiqas bi kûranî, çiqas bi xweşikî û çiqas bi hunerî bigire dest, hewqas jî dikare berhemên hunerî yên saxlem derxîne rastê. Êdî ev der, bi hêza hunermend ve girêdayî ye. Hindek xeyalên xwe dide axaftin. Yanî di virê de ji zanistiyê zêdetir xeyalan dana axaftin, xwestek, bêrî û azweriyan anîna ziman mijara gotinê ye. Li hember çî me, çî dixwazim, divê çî hilweşînim, çî ava bikim; çî kirêt e, çî xweşik e; çî nayê jiyandin, çî tê jiyandin; çî tê pejirandin, çî tê redkirin; çî tercîha min e, çî ne tercîha min e, van pirsan eşkere dipirse û bersîvên tûj dide. Bersîvên ku bide, wê giştiya hemû civakê girê bide.

Va ye, ew gelala romana ku em dixwazin pêş bixin, li derdora van pirsan hindik zêde pêwîst e bê derxistin. Rasteqîna tê jiyandin jî di wateyekê de ev e. Li ba pêwendîya vê rasteqînê bi mezintirîn kevneperest û muhafazakar, yanî bi mêtîngeriye û bi bermayên feodal ve, di heman demê de, ew civaka ka çawa bi nûjenîyeke sexte ve tê cîlakirin, hewl hatiye dayîn ku derxîne rastê. Heta welatparêziya sexte, di bin navê çepê sexte de kesayet û kesayetiyên heyî ka çî ne, hatiye ravekirin û li ba vana, pêwendîya rizgariya civakî ya nû bi nasnameya netew re ango di asta kesanî de temsîl kirin ka wê çawa çêbibe; kesayetên wisa çawa derdikevin rastê û çawa ditêkoşin; ev yek jî hatiye daxistin.

Yek jî, ji tîpên berwenda hatiye qalkirin. Ew tîpên ku lingekî xwe li bermaya serdema navîn e û lingekî xwe şekilbûyîna civaka nû de ye, her tim sîketina her du aliyan temsîl dikin û xwe li dijî her qonaxên girîng dana çespendina wan hatiye rexnekirin. Bi taybetî dahûrînên Serokatî (em dikarin bibêjin dahûrînên bingehîn in) yên di vê mijarê de pêşketinên ku derxistiye rastê, ku bê lêkolînkirin û pê ve girêdayî da ku wek kelûmelê romaneke şoreşger pêgirê nîrxandinê bê kirin wê tevkariyekê berpêş bike. Ev xet hindik zêde di dahûrînan de hatiye derxistin. Dahûrînên kesayeta bingehîn; di jiyanê de, di nav şerê germ de hatine

ezmûnekirin û derketine rastê. Yanî ev ne xeyalî ne, rastînên ku şoreşê derxistine rastê ne.

Lewma dane û kelûmelên ku romaneke rasteqînî pala xwe bidê mijara gotinê ye. Yanî hewqas kelûmelên ku di wêjeya çî welatî de nehatiye peydakirin hatiye bidestgirtin. Têkoşîna rizgariya netew ku di bin serokatîya PKKê de hatiye birêvebirin qehremantî, xiyamet û berwendayên derxistiye rastê kelûmelên mezintirîn in û heta li ser her qonax yan jî li ser her her tîpekê, dikare pirtûk bê nivîsandin. Em tenê derbirîna vê ya herî giştî, girêdayê pêvajoyên rizgariya netew û partiyê hewl didin ku bidin. Gelala romanê di aliyekê de rasteqîna mêtîngerî û kemalîzma Tirk a faşîst, di aliyekê de jî rasteqîna Kurdistanê ya eşîrî û feodaliya serdema navîn, di aliyekê din de jî, rewşa kedkar, karker û gundiyên xizan, ew kes û têkiliyên ku ji pêwendiyên eşîrî û feodalî hatine qutkîrin û hatine şekilkîrin hewl dide ku bîne ziman. Û PKK di wateyekê de dibe ev. Roman, pêşketina di vê wateyê de hewl dide ku di asta hunerî de pêş bixe. Hem berhemekê pêşketina şoreşî ye, hem jî ji bo pêşketina şoreşgerî teşeyekê dide. Her çende ku bi helbest, mûzîk û wêneyan şoreş nayên pêkanîn jî, ji bo pêşxistina herî puxteyî ku wê roman tevkarîyekê jê re berpêş bike bêguman e. Gelale hindik zêde dayîna naveroka vê ji xwe re kiriye armanc.

Di bingeş de tîpên hîmî mijara gotinê ye, lê heke ku em gelek tîpan bidin axaftin wê kelûmel bêtir dewlemend bibe. Lewma bi neqandin, yekirina gelek qismên baş, yanî bi gişandina sentezekê roman dikare pêk were. Di vê gelala romana ku em dixwazin bidin de, bi komên curbicur lêgerîn tîp çêkîrin. Em li hember kîjan jiyanê bertek raber dikin û ka em bêriya kîjan jiyanê dikin tê lêpirsîn. Dîsa çî baş e, çî xweşik e; çî rast e, çî çewt e; çî kirêt e, çî xirab e pirsên wiha di virê de zêde tîp pêşxistin. Ji ber ku roman hindek di nava van tîgînên hîmî de pêş dikeve. Hun, ji ku derê tîp, jiyana kevin çî ye, jê qutbûna we çawa ye; dîsa pêwendiyên we bi jiyana nû re çî ye, hun çawa pê ve hatin girêdan, hun dixwazin çawa pêş bixin, van pirsan zêde pêş dixê. Di aliyê din de bi lez pêşneketin û nehatina halê milîtanek şoreşger ka çî diderbirîne; xuyangên vê yêr curbicur çî ne; di kesayetê de ji çî re rê vedike? Li van tê lêpirsîn û bi azîneke rast ji bo pêşxistina şoreşê bi her awayî gihîştina tevkarîyekê tê xwestin.

## **Romana Kurdistanê divê xweser be**

---

Bêguman gava ku li Kurdistanê gelala romana şoreşger tê pêşxistin, ji ezmûneyên netewên din jî sûdwergirtin girîngî hildigire. Bi taybetî rasteqîna romana Fransa ku şoreşên hîmî çêkiriye, dîsa rasteqîna romana Rus û heta li ba hindek taybetmendiyên qonaxa zayîna şoreşa Îslamê, Viktor Hugo, Balzac û hwd.

romaniwîsên mezin hene. Pêwendiyên van bi şoreşa Fransa ve tê avakirin. Dîsa şoreşa Rus têkiliyên xwe bi Tolstoy, Dostoyevskî, Çernîşevskî, Gorkî û hwd. çî ne; vana di kîjan qonaxa şoreşê de û bi çî cure berhemana di tevkariya şoreşê de peyda bûne? Hindek taybetmendiyên bingehîn yên şoreşa Îslamiyetê çî ne; bi taybetî çima piştîre bûye paşverû, veqeriyaye kevnepeştîyê û hindek taybetmendiyên bingehîn ên kesayetiye çawa derxistiye rastê? Malbateke çawa, tîpekê jin-zilamê çawa derxistiye rastê.

Di rasteqîna civaka Rojhilata Navîn de ev dikarin bîna pêşçavkirin. Tebî romana Kurdistan rasteqîna şênber a xwe ku hindek bêşîban e divê bîna pêş çavên xwe. Taybetmendiyên civakiya Kurd, ji ber dîroka jiyaye pir hindik dişibe civakên din. Lewma pêwîst e reseniya xwe pir baş bîna pêş çavên xwe. Yanî romana Kurdistan, pêwîst e bêtir bibe romaneke xweser, nikare zêde lasayî pêş bixe. Lasayîkirina romaniwîsiya Tirk jî zêde pêşxistînkare nabe.

Vê yekê têkoşîna şoreşa me bi rengekê balkêş daxistiye rastê. Xebateke hunerê ya bi baldar dikare bibîna ku şoreşa me ya pêşketî henaseyeke mezin bi huner daye wergirtin û bi hunerê jî şoreş pir tê pêşxistin. Dikare hêz rabe xebateke wisa bike û berhemên xurt derxîne rastê. Ji vê qonaxa ku têkoşîna me bi ponijîn tê de peyda dibe re, ji pîrsa “Çawa Bijîn” re bi romaneke wisa ve bersiv gihandin jî, tevkariyeke piçûk nayê dîtin e. Ger derfetên me dest dabana li ba peywîrên bîrdozî, siyasî, leşkerî wê me kariba tevkariyeke wisa ji peywîrên wêjeyî re berpêş bikira. Jixwe her ku em fersend dibînin, em hewl didin ku vê çêbikin. Bi rastî jî ev hewldanên me tevkariyê dîderbirînin.

Milîtanên ku di vê mijarê de bixwebawer in, ka huner bi taybetî jî wêje û roman di nava me de bi pêşwazîkirina çî berpirsiyar e dikarin bîna pêş çavên xwe û divê ji bîr nekin ku, di vê navberê de ji pîrsa “Çawa Bijîn” re bi dayîna bersîva herî rast wê tevkariyê karibin berpêş bikin.

Çawa ku ez pir caran diyar dikim, mirov dikare gelek mînakên bîna pêş çavên xwe. Di Dîroka her gelê de mîna vê pêngav hene. Di qonaxa began a wurşedar de, hindek pêşketin di wêjeya kurd de çêbûye. Dîroka kurd jêderka çiyê ya tê zanin, di wan qonaxên nayê zanîn ê hatina me ya vê çavkaniyê ka çawa hatiye derbirandin, di hin destanan de dîtin gengaz e.

Hin tîpên weke Kawayê Şoreşger ku serî rakirine û vegotinên wêjeyî weke Memê Alan hene. Vana ji sertara girîng a pêşketina civakî hêz girtine û hatine pêş xistin. Bi vegotîneke lehçeya Rojhilat yan jî bi azînan heta roja me ya îro bandordar bûne. Mem û Zîn a Ehmedê Xanê jî di vê wateyê de, bi taybetî di qonaxa ku otorîteya keyayan ji bo gelan çarçova netew û civakan xet dikir de, derbirîna wê pêdiviyê ye. Ji şewaza mîran a par û perçe dikir û tim bi hev re di pevçûnê de bûn û yekîtiya netew pêk nedanîn heya xwiyanga nav sûlaleya feodal hewl dide ku vebibêje. Vegotina di virê de pêk tê, di bingeh de rasteqîna feodal mîr a req ku nayê yekîtiya gel û wê yekîtiyê venaguhêze asta netew e. Pir û pir

fitne fesad heye, xulamtî heye; hewl dide ku vê bîne ziman. Lê, ji ber ku pêvajoyeke şoreşî ya bingehîn nejiyaye, nikare bi vegotîneke xurtir xwe temam bike û pêş bixîne.

Ji ber ku Kurdistan şoreşeke rişt nejiyaye, em di dîrokê de ne di sedsala 18an, ne di sedsala 19an, ne jî di sedsala 20an de rastê mînakên romanên xurt nabin. Yên hatine nivîsandin, di bingehê tunekirina kemalîzmê de romanên Tirk in. Di vê mijarê de Yaşar Kemal bi xwe jî, navê wê rasteqînê ye ku ji rasteqîna Kurd a ku bûye Tirkane best girtiye û derketiye rê. Xwedî romanivîsiyeye wisa ye. Mîna vê gelek romanivîs hene. Ev ew romanivîs in ku di dirêjahiya tevahî dîroka komarê de ew rastiya ku serhildanan perçiqandiye û bi piştê jî, bi Tirkiyê re kiriye yek di teşeyekê pêşverû de pênase kirine. Di ciyekî de kemalîst sinc, wêrankarî û tunekirin hatiye xwestin ku bi riya wêjeyê re rewşa bê nîşandan. Di vê bingehê de pergala ku hatiye avakirin; mîna xweşikîtiya ku pêşverû ye û pêwîst e bê jiyîn daye çespendin. Tebî bi wêjeyê hatine aşîkirin û divê bîr redkirin. Perspektîfa van romanên, dil bi rasteqîna Kurdistanê neşewitandin û ka ev çi ye pê tenegehîştin e. Her tiştî înkarkirin e, hem jî bi lezgîni! Cardin wan neyênîyên kevîr nevekirin e. Kurdan wek paşverû û weş nîşandayîn e.

Va, dixwaze bila Kurd be, dixwaze bila Tirk be, heya niha di derbarê Kurdistanê de romanivîsi, hunermendî û wêjeyanî ya baş di vê bingehê de xwediyê erkekê ye. Tebî ev romanivîsî di radeyê dawî de wêrankariyê afirandiye. Bi taybetî şêkilgirtina kesayetê çelaxwarî pêş xistiye. Ramandina azad û rasteqînî asteng kiriye. Tirkbûyîn, koçkirina metropolan, welat û gelê xwe piçûk dîtin û bi rengekê hêsanî dest jê berdanê bi xwe re aniye. Ev ji pêvajoya ber bi metropol û Ewropayê ve herikandîneke mezintirîn û pêvajoya ji xwe revê ye. Di heman demê de pêvajoya revê ya ji giyan û mejiyê xwe ye. Heta ev pêvajo, qasî qedalbûyîne pêş ketiye. Pir hindik kes karîbûye li rasteqîna xwe xwedî derkeve. Her tişt bi erzanî ji dest hatiye derxistin. Yên ku nav girtine ser zimanê xwe jî, ya hatine sîxurkirin yan jî, hevkarîmendên bi misyona ku di bingehê hin berjewendîyan de bi dest girtine de derketine rastê. Welatparêzî, hatiye veguherandin têgîneke ku di ber re jî nayê borandin.

Tebî em vê yekê heya derketina tevgera şoreşgerî, bi rengekê bêtir trajedî û kûrbûyî dibînin. Bi taybetî binketina her serhildananê, di çûyîna encamek wiha de rol leyistiye. Piştî serhildanan, yanî qonaxa terora spî, di bingeh de rasteqîna gelê Kurd, ji qonaxa serhildanan bêtir xistiye xeternakiyê û em dikarin bibêjin ku aniye heya wê xala ber qedanê.

Va, ev tîpên heyî, di çarçoveya vê vegotina giştî de derketin rastê. Em, hinek wisa derketin rastê. Hun weke derbirîna vê gelemperiyê, dikarin pênaseyekê deynin ka hun çi ne û dixwazin çi bikin. Di wateyekê de ev, êdî dibe gihîştina kesên bi pêvajoya nîrxandina rasteqînî.

Yên ku bi rasteqîna xwe rast têngihîjin, qet nikarin bibin xwedî çalakiyeke rişt. Bi aliyên xwe yên zêde hestiyar derdikevine rastê û ev derketina rastê jî, ji her cure bandorê re vekirîye. Çima ? Ji ber ku ne derketinek bi gor pênaseya rasteqînê ye. Ji xwe bêhay e. Em jî di vê wateyê de jê re dibêjin şûngeha “Xafil”. Mirov dikare ji vê re bibêje teşeyekê cehaletê jî. Ger hun bala xwe bidinê, ev, rasteqîna we tevan a ku bi ponijîn dijîn. Hun tev xwedî jêderkeke wiha ne. Zanebûn û hesta vê jêderkê di we de çiqas pêş ketiye, diyar nîn e. Kemalîzm qasî karibe ketiye nav, malbatî û eşîrî, qasî karibin ketine nav. Ji têngîna welat û ji têngîna gel heta dawiyê pêmênî hatiye jiyandin. Taybetmendiya rewşenbîrên Tirk di radeyeke dawî de bi teşeyê demagojîk teyisiye. Dîsa demagojiya feodal teyisiye. Bîrdoziya dê, bav û kal teyisiye. Vana tev kesayetê ji rasteqîna bingehîn, ji rasteqîna dîrokî, ji rasteqîna hemdemê dûr xistiye û jê qut kiriye. Lewma hun lewaz dimînin. Hûn, di bîrdoziyê de, di polîtîkayê de, di çalakiyê de û di jiyandê de lewaz dimînin. Di her sehayê de koma tîpên ku dinalin, diqarin, ditengisin, net nabin, tûj nabin, nayên dahûrandin û xwe nagihînin çareseriyê mijara gotinê ye. Taybetmendiya vê kesayetê, hatiye veguhestin nava pêşengiya şoreşî. Me, hewl da ku, em vê yekê bi şurê şoreşê yê herî tuj derbas bikin. Piraniya we di vê bingehê de herikîn nav şoreşê. We got, “Ev rêka herî kurt a pêşketinê ye.” Li hember pergale bertek bi we re çêbû, hun hatin nav şoreşê. Helbet tiştên we di nava partiyê de jiyaye, ew hezar teşeyên kevin bi şewazeke cuda berdewamkirin e. Li hember vê bertek, di ciyekê de şerê nav rêkxistinê yê şoreş û dijî-şoreşê ye. Her wiha di vê pêvajoyê de derketina yên binkeftî û serkeftî, ev hewqas pêşketin in, ku di kesayeta we de tîpên jiyandin.

Ger dîqat bê kirin, em dixwazin gelala romanê bi tevlibûna takekesan ya nav pêvajoya şoreşê, nav pêvajoya partîbûyînê, nav şiyarbûna netew û pêvajoya azadbûyîna civakê bidin destpêkirin. Romana şoreşger bi wateyekê, peywirdar e ku derketinê wisa çêbike. Lê belê, ew lewazî, qelsî û xumamiyên nayê bawer kirin ên di destpêkê de ku me pê dest bi kar kir, nayê paşçavkirin. Ji ber ku rasteqîn dadixe rastê ku wisa ye. Mirov bi demagojî û bi gotineke, “Ez pir xurt im, pir bi biryar im” nikare derbas bike. Bi rastî jî niha em baştir têngihîjin ku, hestên sexte û pêşandanên wêrekiyê zêde wate naderbirînin. Em dibînin ku ketina nav asta her cure têkilî û nakokî ne rişt in û encam nagirin. Em destnîşan dikin ku qasî kesayetiyên pir nepixandî, kesayetiyên pir mirî jî, ne denkên dema derketina şoreşê ne. Lê, li rexmî hemû hewldanan, ji ber ku derketina şoreşgerî pêwendîya xwe bi ponijîn û tempo ya şênberiya PKKê ve neda avakirin, çalexwariya pêşketinan bi rêbazên zehmet hate zelalkirin.

Tîpê me, ji hemû taybetmendiya nêvengê wiha re hindêk vekefî ye. Her wiha vê, ne bi eybîrinê ji bin derketin, ne jî bi sergirtin ji nav derketin nêzîkatiyek rast nîn e. Ya pêwîst e bê kirin, qasî selimandineke rast a rasteqînê, ne çarenûsbûna vê daxistina rastê ye. Lewma dema ku ê kevin tê rûxandin û tê

derbaskirin, divê bê dîtin ku di wergirtina yê nû û înşakirinê de pir tişt pêwîst dikin, ev yek ji bo me jiyânî ye û biryarkirin, hêza azîm û viyanê re vegerandin û dîsa di her sehayê de karkerî û hewldanê bi rengê encam wergirtî kirin e.

Gava ku me hewl da tîpek wisa em bêxin nav gelala romanê, qasî daxistina aliyê zanîstiyê, aliyê wî yê hunerî jî pêşxistin me pêşçav kir û bi vî awayî me xwest nêzîkatiyek wiha pêş bixin. Niha em vê gotûbêjê dikin. Bi wateyekê roman tê pêş xistin. Bi gotineke rastir, êdî pêşketinên di nava jiyânê de ber bi nivîsandinê ve diçin. Ew pirsên timî me dipirsiya, pirsên romanî ne. Çawa çêbikin? Çawa bijîn? Ev pirs, pirsên herî zêde tê pirsîn in; tesadûf nîn e. Hema her roj têkilayî bi libatan kirin heye. Ev, vesazîkirina ji nû ve diderbirîne û ziraviya kar dadixîne rastê. Bi taybetî di aliyên hin têkilî û libatan de bertek raberkirin, arezû û xwestekên şewaza kevin redkirin, şunê de xwestek û viyana şewaza nû derxistin û bi kevneşopiya civakê re, di asta damezraka malbatê de ketina nav têkoşînê peyda ye. Tevahî aliyên ve çonayetiya rasteqîna malbat, eşîr û babistîna derêxistin, bandora wan li ser jiyânê dîtin û bi wan re şerkirin; dîsa gihîştina pergala nû, şewaza derbirîna têkilîyên nû, hîtap û uslûba wân, her roj kevin şewitandin-rûxandin û ber bi avakirina nû ve rê wergirtin, jiyanêke romanî ye û ev bi ponijîn e. Em dibînin ku di kevneşopiya romanê de babetên herî zêde tînin karanîn, asta hestan e. Asta zanebûnê bêtir bi derbirînên zanistiyê tê nixandin. Bêguman roman asta zanebûnê tevli naveroka xwe dike. Lê bi giranî asta hestan û şewaza derbirîna giyanê dixwaze bigire dest.

## **Ku qonax baş neyê vekolandin kesayet baş nayê dahûrandin**

---

Ev têkoşîn di heman demê de şerê hestan e. Hezkerin dikeve hundirê vê, weke derbirîna ponijîn evîn dikevê; wekî din nîşanên kurbê û heta xiyanetê vegotin. Dîsa tîginên kirêtî û xweşikî dikevin dewrê. Tîpên berwenda û qehremanê tê pêşxistin. Ev tev hinek jî bi razberkirinê ve tê çêkirin. Yanî di bingehe çavderiyê de şûna yek bi yek kesayetê vegotin, hindik zêde hemû kesên ku tevli pêvajoyê bûne taybetmendiyên wan yê hevbeş di romanê de tê vekirin. Ev razberkirinek e. Ji şênberiyê razberkirin, ji asta razberkirinê jî tim û tim daxistina takekesan û pêşketina dema bê bi çavderiyê sepanandin, dibê teknîka romanê. Her wiha hinek hêman di hinek qonaxan de bi ponijînê tê vekolandin. Ku qonax baş neyê vekolandin, hêman jî baş nayê vekolandin. Heta hinek aliyên hêmanan, di hinek qonaxan de zêde tê vekolandin. Di hinek qonaxan de ji wana berhem namîne. Yek jî têkilhevê tê vekolandin. Yanî vekolandinek tenê bi serê xwe ne pêşketina hestan e. Bandor û bertek di nava hev de ye. Rik, hezkerin; xafil, şiyar; şoresger, dij-

şoreşger di nava hev de ne. Dîsa tîpê bintûte û tîpê balkêş ku li hember wî derdikeve di halê pevçûnê de ne. Carna ev pevçûn gur dibe, carna jî gihaneke pêk tîne û ber bi çareseriyê ve diçe. Carna jî dixitime û dikeve nava qeyranê. Yek jî tê veguhertin. Hemin veguherîne dije. Dema ku vediguhere, carna tê qezenckirin, carna jî tê wendakirin. Carna tê derbaskirin, carna jî tê pîrozkirin. Weke ku têkilî û nakokî ji têkilheviyeke wisa difilitin, ber bi pergal û asteke pêşketîr ve diçin, carna jî dikevin nava xeniqandinekê û dimirin jî. Pêwîst e Roman, di bingehê vê teqalê de bê gihandin derbirînekê.

Bi taybetî, di gelaleyê de mînakdayîne, min ji xwe da destpêkirin. Li ba vê yekê em kesên din jî didin axaftin. Wisa tê fêmkirin ku emê gelek kesan bidin axaftin. Her kesê ku diaxive, di kesayeta xwe de gelek rasteqînan tîne ziman; qasî aliyên bingehîn, aliyên talî jî datîne rastê. Qasî aliyên ku giştî bi xwe ve girê didin, aliyên eksantrîk jî hene. Lê bi sentezkirineke ku piştî van tevan bê çêkirin, em dikarin romanê şênber bikin.

Jixwe di romanê de bi giştî kes, viyan, hest û azwerî diaxivin. Ger ku em jî, bi vê wateyê takekesan bidin axaftin (bi taybetî ku ev hindik zêde giştîbûyînekî tînin ziman) ev azîneke rast e. Di virê de ya girîng ew e ku veqetandina tiştên bingehîn û talî bê çêkirin, yê bingehîn ê civakî-netewî û heta mirovanî bê dîtin, di nava kitekitan de neyê xeniqandin û yê zêde ne balkêş in, asta xwe ya temsîliyê nîn in, di nav re neyê heşandin.

Tebî hêza ziman û uslûp jî pir girîng e. Jixwe rola hunerê di virê de ye. Ev war, wareke ku pir afirandinerî dixwaze. Jiyana wê jî, hindêk hunermendane ye. Vegotina wê jî, bêguman ê wê temam bike. Gelala tê pêşxistin jî, wê di vê çarçoveyê de be. Dema ku em, hinek tîpan di nava vê çarçoveyê de didin rûniştandin, em carna yê ji zindanê derketine jî didin axaftin. Ji ber ku yê ji zindanê derketine, hinek rasteqînen ku jiyane hene. Ger ku rasteqîna dijwar a zindanê neyê dahûrandin, hemû hest û asta jiyana wan bi tevahî aliyên xwe ve neyê ser ziman, roman nayê temamkirin, wê kêmbimîne. Her wiha dana axaftina yê ji zindanê derketine, pêwîst e bê domandin. Qasî gelek aliyên wan ên erênî, aliyên xeternak û rizî jî hene. Ji vana hinek tîp bi cinewirî, hinek tîp jî bi qehremanî derketin; vana daxistina rastê û dîtin pêwîst e. Yen ku li ser nava hest û azweriyan pergalê bi regekê herî pûç dijîn û pergalê dihebînin hene. Hem jî ew kesên ku vê bi rûpoşa şoreşgerî dikin, me dît ku ne hindik in. Wêjeyê sexte ya zindanê, bêriya pergalê, hate xwestin ku li ser navê bêriya şoreşî daxînin rastê. Heta nepixandin û demagojî pir zêde ye. Ji ber ku jiyana pratîk û şênber nîn e. Bi vî awayî zemîne sextetiyê zêdetir xurt dibe. Pêwîst e rexneya vê bê çêkirin û hê jî em li ser vê disekinin.

Ji vê zêdetir girîng pratîka çiya heye. Me hewl da ku, ev pratîka çiya qasî taybetmendiyên xwe yê paşdemayîkirin û weşîkirinê, taybetmendiyên ku civakê ji hev vediçirîne û azad dike derxin rastê. Jixwe milîtanê çekdarî tê

nirxandin. Milîtanê çekdarî kî ye, çawa ye? Heya niha jî dahûrîna wê weke peywireke girîng disekine.

Di nava partiyê de qasî ku derbirîna zanistî hatiye gihandin bo derbirîna taktîk, tê xwestin ku derbirîna wê ya wêjeyî jî pêk were. Dema ku em van hemûyan pêk tînin, di nava pêwendiyên sazgeha kevin de bi taybetî jî, damezraka malbatê û eşîriyê hate destgirtin. Çima? Ji ber ku ev der wek zindana giştî ya rasteqîna civaka me ye; warê kevneşopiya giştî û zincirbûna giştî ye. Di vê navberê de ji ber ku her çîn, tebeqe û hemû girseyên civakê dikevin dewrê, serûbin dibin, tê xwestin ku ew taybetmendiyên rewşenbîriya bajarî û taybetmendiyên gundîtî bê vegotin. Rewşenbîrê bajarî kî ye ango bajar çî ye? Em, ji vê dest pê dikin. Ev rewşenbîrên pêk hatine çî û kê temsîl dikin? Bi kevneşopiya me ve çiqas pêwendiya wan heye? Rasteqîna azad û welatparêziyê çiqas esas digire? Ji mêtîngerî, kemalîzm û dij-şoreşê çiqas bandor digire û wan çiqas esas digire?

Niha ev, di pêkhatiyên bajarî de baştir zelal dibin. Gundî, zêdetir serdema navîn, heta gelek pêkhatiyên jêderka serdema pêşîn temsîl dike. Alîyên xwe yên welatparêziya erênî hene. Bi axê ve girêdayî ye, hedarmend e. Lê zêde bi hundir ve hatiye girtin, di nava mercên paşdemayî de hatiye hiştin; weke ku nikare biaxive, nikare xwe bi ziman bike, hatiye rewşeke wisa; vê guzarîşt dike. Vegotina vê teyisandinê ya di nava refan de tim tê çêkirin. Tîpên hîmî hene. Ew taybetmendiyê van ên ji afirandinêriyê dûr bûn, pir çewsandîner, sexbêr û belaşxur tînin ser ziman. Dîsa dirêjahiya van ê piçûk û curbicur hene. Weke sermejiyê eşîrî, sermejiyê kevneperest û dîsa bi temen ve girêdayî welatparêzên kal û welatparêzên ciwan, hinek tîpên wisa jî anîna ziman mijara gotinê ye.

Dîsa wek bireke civakî tevlihbûna jinê û bandorên ku wê daye çêkirin hene. Di teşeyê azadiya jinê de ew tiştê ku em, di Kurdistanê de krîter û kategoriya herî girîng a azadiya giştî guzarîşt dikin, derdikeve rastê; nirxandina wê tê çêkirin. Tê xwestin ku ji pîrsa “azadiya jinê çî ye?” re bersîv bê dayîn. Tebî dema ku jin dibe mijara gotinê, de îcar dema tevli şoreşê dibe bi hemû lewaziya giyanê, ka çî hatine teyisandin, ew dibe hêmaneke ku temsîla wê tîne ziman. Di ciyekî de ya herî xafil, di ciyekî de ya herî xwerû, di ciyekî de jî weke tîpa herî sîketî viyana wê felç bûye. Ev dibe şewaza ew tevlihbûn û kesayeta pir rajêr. Hemin bi hinek ciyan ve paldayî dibe xwedî meşekê. Weke tîpeke ku bi qeysikan dimeşe tê. Ango weke tîpeke pir hestiyar, pir bêpalpişt û pir bê amade ye. Ya herî girîng jî, weke zayendeke ku daraziyên nirxên civakê bi stemkarî li ser tê birêvebirin, tevlihbûneke wisa mijara gotinê ye. Ji nêzîkatiyên feodal, xwe ji meta-malbûyînekê wêdetir nikare bibe. Em azadbûyînekê deynin aliyekê, xwe xistina mal aliyekê, ya xirabtirîn dibe tevlihbûneke ku teşeye herî zirav a malbûyînekê ji xwe re peywir dihesibîne û diparêze.

Milîtan, di vê mijarê de rewşa herî sêr dije. Mebesta jinê ku jiyana xwe ya kevin di nava şoreşê de bi şewazeke pir zirav wek malekê bêtir pêşketiye ajotin e.

Jixwe romanek bi giranî dikare cî bide têkîliyên jin û zilam. Bi taybetî dixwaze têkilî û nakokiya wan bîne ziman. Bi rastî ji, di romana qonaxa şoreşê de, dixwaze têkiliyên damezraka malbatê, dixwaze têkiliyên di navbera du tîpên ku ji malbat û kevneşopiyê qut bûne bigire dest, em ji van re dikarin bibêjin teqala pêwendiyên di navbera wan tîpên ku şoreş ango dij-şoreşê diparêzin. Dema ku em hatina wan li hember hev û teşeyê têkiliyên wan digirine dest, di bingeh de em dibînin ku qasî şêwazeke zirav meşandina pergale, bi zêdebûyîna têkiliyên mulkiyetdarî ku ne li ser bingehê keda azad, tevlibûyîna azad e û xeternak e rû bi rû dimînin. Şêwaza têkiliyên fêodal di teşeyekê cuda de ku xwe dispêre kapîtalîzmê ango wek meta tê veguhêstin nav şoreşê, ji daxwaza xwe di gelek teşeyên curbicur de berdewamkirinê nêzîkatiya serdestî ya zilam, helwesta jinê bi şêwazeke zirav ku dixwaze xwe biha pêşwazî bike divê bê têgihîştin. Yanî yên mîna red, bertek û lewaziyên xwe bi rengekê xirab dayîn û her wekî din... Bi rastî jî dema ku şênberiya Kurdistanê dibe mijara gotinê, mezin axayên malbatê hene. Malbat, bi palpiştiya pergala mêtîrgerî û hevkarmandiyê tê avakirin. Têmsîla vê di jinê ango di bûyera zewacê de, bi taybetî rewşa zilam ya di nava malbatê de ku pir bêhevseng û bêberpirsiyarî ye, bi bandorên xirab tevlibûna wî nava şoreşê, dîsa koledariya jinê û şêwaza ku pir girêdayî ye, di bingeh de ev şêwaza nêzîkatiyê ku baş nehatiyê dahûrandin û ronahîkirin jiyane pir gef dike.

Nêzîkatiyên ku pir dûrê azadiyê ne, di nava partiyê de ew kesayetên ku pir zêde di bin bandora kevneşopiyê de ne, dikarin şoreşa me vala derbixin. Dixwaze di teşeyê redkirinê de, dixwaze di teşeyê malbûyîna de ango di teşeyê pejirandinê de be, ew têkiliyên ku xeternak ne pir zêde derketine rastê. Îcar derketina jinê li çiyayan, wergirtina jinê ji her sehayê re, di vê mijarê de bandor-bertek bêtir derxistiye asteke pêşdetir. Rast nekanalîzekirin û nekişandina jinê ber bi tevgera şoreşê ve û di xalekê de girtin, sekinandin, lê di rewşa hatina wê de jî, bi têkiliyên bêpîvan û bêast hatin, her wiha xirakirina arteşê, di bingeh de ji ber ku pêwendiyên şoreşgerî tam ne serdest in ji tevliheviyekê re rê dana vekirin û jiyane hereşekirin dibe mijara gotinê.

Bi kurtasî, tengasiyên negihîştina jiyana nû û teşeyên têkiliyan tîn jiyandin. Roman di wateyê de bêtir dikare ber bi şênberiyê ve biçê û hewl dide di ciyê civakî de derkeve pêş. Roman hindêk jî ev e.

Erê, dema ku tîp bi aliyên curbicur wisa tîn nixandin, di bingehê têkiliyên jin-zilam-malbatê de dikare pêgirê dahûrandineke baş bê kirin. Kurtasîkirin yek jî di vî aliyê de tê çêkirin. Rewşên ku her milîtanê me hevbeş dijîn mijara gotinê ye. Her wiha roman, warekê baş guzarîşt dike. Me xwest ku em hindêk vê bidin. Ka çima pêwîstî heye ku bi jinê re destpêkirin bê çêkirin, bi encaman ve hate daxistin. Hate xwestin ku ji xalên serik hindêk mînak bê dayîn. Jina hatî bijartin ango xwestek heye bê destgirtin û pêwendiya têkiliyan bi pergale re (pêdiviya van bi derbirîneka wêjeyî heye) hevkarmand e yan na, sîxur e yan na, şoreşger e yan

na; pênaseyeke misoger nîn e. Yanî raveyeke zanistî nin e, guncaw jî nîn e. Ger bibe jî wê bi hindek texmîn û şiroveyan pêş bikeve. Vê herî baş wêje dikare çêbike, lê encamên wê pir girîng in. Di virê de ya tê dahûrandin, pêşî mêtîngerî dibe, kemalîzm dibe, mîrzadeyî ango bijarteyî dibe. Dema ku partî dibe mijara gotinê, serdestiya hevkarmandî, çespanandin li ser PKKê, li ser tevgera şoreşger, nêzîkatiyên dekbazî yên pir zirav û dîsa ew şaş nêzîkatiyên li hember hemû taybetmendiyên tîpê milîtanê şoreşger...

## Cîhana kevin di bin kontrolê de ye

---

Hatiye xwestin ka tîpê şoreşger wê çawa pêş bikeve, ka çima nêzîkatiyên kujoker, valaker û sarker derketine rastê bê vegotin. Pergal ji vê kesayetiye re gelek derfet dide. Dema ku li Kurdistanê ne jiyane wan a berfireh heye. Pir mîrzade ye. Dîsa jiyana wan a li Enqerê herî hindik guncawê asta fermî ya komara Tirkiyê ye. Yanî piştî wê spartiyê hezekê wiha ye. Aliyê dijber tebî di rewşeke nakokî de ye. Ji gunditiya xizan direve û li hember mêtîngeriye bi berteka gewre mezin dibe. Kesayetiya ku di nava malbata mîrzade de mezin dibe, qutbûna ji pergale û tê de cûdabûn çêkirin esas digire. Ev şer cûrbecûr e; bîrdozî ye, siyasî ye, çalakî ye, rêkxistinî ye, hestiyarî ye, bertekî ye, hezkirinî ye, welatparêz e, bi azwerî ye, bi kerb e, rûxandiner û avakar e. Yanî di nava xwe de gelek taybetmendiyên dihewîne. Di xwiyangê de têkiliyeke civakî, têkiliya jin-zilam e, lê di cewher de jî mezintirîn pergala mêtîngerî, hevkarmandî û li hember vê jî, ew hilkeftinê şoreşgerî re dibe xala pevçûnê. Di heman demê de dibe vegotina rûxandin û avakarî. Di vî aliyê de hema hindik dimîne ku xwe bigihîne wateyeke dîroka partiyê. Di wateyeke din de çalakiya şoreşgerî tê romankirin ango di wateyeke tê jiyandin de, cewhereke wiha diderbirîne. Yanî jiyana bi xwe dibe roman. Û tê fêmkirin ku ev tenê ne bûyereke yekejimar e, taybetmendiyeka giştî tine ziman. Çima? Ji ber ku di şênberiya Kurdistanê de sîxurtî di çonayetiyeke sazgeha objektîf de ye. Weke ku civak li hember xwe mîna sazgeheke sîxurtiyê xebat dike. Malbatî di bingeh de ji mêtîngerî û pergale re dixebite. Di vê mijarê de tê dîtîn ku hevkarmandî di bingehê taybetmendiyên mînanî ve û belavî de, di qonaxa komarê de hatiye şekilkirin û zarokên wan jî temsîlkariya vê yekê dikin.

Tê dîtîn ku pêşketina şoreşgerî ya nû ava dibe, bi vê re di nava dijberîtiyê de ye. Her wiha, her çiqas kes tevî nava tevgerê bibin bila bibin, bi heman taybetmendiyên tîpê û hilkeftinan çêdikin; baş tê fêmkirin ku hatinê hevkarmandî jî bi heman taybetmendiyên e û em bêtir ber bi giştîbûyînekê ve diçin. Dema ku hinek tîp tîp çêkirin, di vê wateyê de çiqas tê derbirandin? Mînak di gelala

romanê de ew tîpên ku xatine xêzkirin, gelo cewaz in an na? Em lê dinêrin zêde cewaz nîn e. Piştê di gelek mînan de hate dîtin ku ev bû cureyek, dûbareya vê ye. Tîpên ku xwe li ser partiyê diçespînin û dibin sedemê halanê, bûne mînanê wana. Heman hilkeftin û heman peyvan bi kar tînin. Minak, milîtantiyê asê dikin, viyanê dîşikînin û dibin sarker, xeniqandiner û xitimandiner. Ev di cîyekî de li ser taybetmendiyên milîtantiya nû, weke bandoreke kujoker ê hestiyarî ye. Yanî ev şêwaza pêwendîdarî û nêzîkatiya statukoya kevin nîşan dide. Nexwe wisa jixwe ve bi hestên wisa ve ji derketina milîtan re bersîvek nayê dayîn. Sedemê xwe hene.

Di aliyê din de tîpê milîtan bi rastî jî dibe xwediyê hewldanên puxteyî û dixwazê yê nû ava bike. Sedemên vê jî hene. Ger cîhana nû nebe, çî şensê wê jî nîn e. Cîhana kevn di bin kontrolê de ye; mêtîngerî û hevkarmandî serdestên wê yên mitlaq in. Milîtan, di radeya ku hilweşîna vê cîhana kevin pêk bîne, wê bije. Ji ber vê yekê jî, di helweşandinê de xurt e. Xwedî hewldan e, bi azwerî ye û ji her cure pêşketinê re vekirîye. Cîhana wê cîhaneke ku wê di pêşerojê de bê qezenckirin e. Tebî tîpê li dijberê vê bi şêwaza tevgera xwe ya kevin, bi tiraliya xwe ve, bi bêuslûbiya xwe ve, bi bertekiya xwe ve, bi taloxkirina xwe ve, bi xirabkariya xwe ve, bi rizandina xwe ve dixwaze vê bîne ziman: “Ez ji nêvenga xwe ya kevin qayîl im!” Di bingeş de wê diparêze ango dixwaze berevaniya wê bike. Wateye vê ya felsefî û sincî ev e. Her çende ku dibêje: “Ez bîrdozî û xeta partî û şoreşê diparêzim!” jî, derbirîna hebûna şênber a vê wisa peyda dike.

Çima wisa bû? Ji ber ku neçar bû wisa bibe. Gelo milîtanê me ango tîpê me yê pêşeng, ger wisa nekiribana ma wê baştir biba? Ku di teşeyê bênakokî de dest pê kiriba, di vê pêvajoyê de, wê di bin venêrana pergale de, di radeyeke mezin de bixeniqiya. Pir bi lez bi taybetmendiyên pergale ve rû bi rû mayîn, bi taybetmendiyên pergale re bi nakokî pêş ketin, li hember dijmin, li hember taybetmendiyên fêodal, eşîrî û malbatvaniyê dihêle ku were haleke hişyar.

Me, şêwaza di hundirê PKKê de wisa da destpêkirin. Ku tenê bi gundiyan xizan ve dest bi kar bê kirin, piranî evdal û xwerû ne. Nikarin pêşiya xwe bibînin, dikarin bi hêsanî têkevin bi venêranê; bi rastî jî wisa dibe. Lê ji destpêkê vir ve wisa şêwaza dij-şoreşî û temsîlîkirinê bêbandor hiştin, KTYê bêbandor hiştin, hevkarmandan bêbandor hiştin, tê wateya wan aliyên wan ê tê dîtin û nayê dîtin, aliyê tê veşartin û yên ku bi rûpoş ango vekirî ne. Tê wê wateyê yên li paş bi vana re têkilhevîkirin û xistina nav pevçûn û nakokiyê ye.

Gelek aliyên vê dikare bê ravekirin. A girîng dîsa encam e, pêvajoya destpêka qonaxa şoreşê ye. Lê di virê de tîpên rikoker derketin rastê. Mijara ku romanê têkildar dike ev der e, yanî pêşketina tîpên wisa. Aliyê dijber kete nav helwesteke wisa ku, di nava vê de gelek tiştên hene ku nayên hiş û xeyalan. Yanî wek hevkarmandekê heye, wek dekbazekê heye, wek kemalistekê heye, wek jinekê heye, wek dijminê gundî heye, wek afirandineke zayendî heye, wek hakim ango

serdest heye, wek yeka navtêder û halantêder heye û wek yeka hostayê taktik heye. Dîsa di aliyê berjewendiyên xwe de nêzîkatî û şêwazeke xwe yê jiyânê heye. Dîsa kesayetîyeke ku ji wan azînen bi sedsalan vir ve hatiye ezmûnekirin hêz digire, heye. Ev, dibe şêwaza ku bûye serok û xwe rêkxistin kiriye yê pergala fermî ku hatiye derbirandin e.

Li aliyê hember jî, derketina serokatîyê ku bi gora xwe xwedî îdfayek mezin e, heye. Ew jî xwe, weke kevin bi hêsanî radest nake. Çawa ku di pergala kevin û malbatê de xwe radest dikir, xwe radest nake. Xwe radestê Kemalîzmê, Tirkiyê, hevkarmandî, axatîyê û dîsa malbatê nake. Bi şêwaza kevin nêzîkê jinê nabe. Ne nêzîk dibe, ne jî nêzîkê xwe dike. Di pîvanên diyar de azadbûnê esas digire. Yên kevin red dike û lêgerînên nû di radeyeke dawî de bi xurtî çêdike û ji vê pêveberdan nade. Di vê mijarê de xwe azad digire. Helwesta azad, dibe derbirîna zanebûn, viyan û azîm. Erê niha jiyandina van hemûyan bi ponijîn, bi lezgînî tempoyê meşandin heye. Û ev, li ser çîroka partîbûnê, di mijara pêşxistina xeta şer de bandorekê peyda dike. Vê yekê pêl bi pêl li nava civakê radigihîne.

Bi kurtasî, malbat û jina dîl perçe dike; û dîsa hevkarmandîyê belav dike. Têkiliyên jin-zilam ên di nava malbatê de belav dike û rûpoşa wan dixîne. Kê çi ye, çawa ye; derdixe rastê. Ji pirsên “Çawa bibe” ango “Çawa bijîn” re bersîvan digihîne. Bi vî awayî ev jiyân, bi rastî jî tam dibe kelûmelê romanekê.

Jiyân hindik zêde vê yekê anî ziman û teyisandina xwe da gelala romanê. Tebî hinek babet hene divê zêdetir bêne pêşxistin. Tenê yên jiyandî anîna ziman, wê bibe bîranîn, ji ber ku roman vê kategorîyê derbas dike. Roman, hindek a ku dest bi ajdayîne kiriye bi avakirina hindek xeyal û hêza gelaleyê vedike û ber bi çawa bibe ve dibe. Dikare bi geş pêş bikeve û dikare bibe dara azadiyê ya baş. Lê dibe ku aliyê çalexwarî jî bikeve. Di virê de erkdariya romanê heye; dikare asteke tam azad a pêşketî bigire; dikare bi rengê dara azadiyê, şêwaza jiyana azad bibe bandordar. Dar, bi awayekê din jî şîn dibe, zîl dide û mezin dibe, lê ku neyê xwedîkirin wê roman çalexwarî pêş bikeve, nikare zêde bilind bibe. Dîsa ji her cure xeternakiyan re wê vekirî be; wê bibe pêşketîneke ku bêmazmazk e û xwe negihandiye hestî û goşt. Zêde estetîka vê pekhateyê nîn e, lewma dikare birûxe. Roman, dikare vê hindek asteng bike.

Roman, di derbarê diviyaye çawa bibe de xeyal û gelala xwe dixê dewrê. Îdealîzm, xîret û azweriyên tîne ziman. Baş e, bi tevahî ev e, yan na? Naxêr! Zîldayîna rastînekê heye; heya ku ev zîldayîn neyê dîtîn, nivîsandina romaneke rasteqînî gengaz nîn e. Di hundirê civakê de zêde şensê nûbûyîne nabîne, nikare derbirîna yê kû hatiye qedandin bike. Roman tam pevbestînek û gelaleyek nîn e. Rewşa zîldayîna rasteqînê bi hewldaneke mezin, bi heza gelale û bi heza xeyalê anîna ziman e. Di bingeh de bi cureyek çalakhmendîya cuda, tê wateya temamkirina jiyandina li çiyekî. Ji ber ku yê tê jiyandin bi kiryarî jî, hindek ev e. Yanî bi gor zanistîyê, bi gor çîrokê hin tişt hatine jiyandin, lê gelale û xeyal jî

hene. Yê nehatine pêkînanandin, yê hatine çexwarîkirin û dîsa yê ku saxlem pêş ketine hene. Va, roman wê vana bîne ziman.

Tebî em ji vê re dibêjin hunereke estetîk e. Tevahî erkdariya hunerê ev e. Jiyanê estetîzekirin, bêtirîn xweşikirin peywira hunerê ye. Tê wê wateyê ku wê roman jî bibe xwedî erkdariyeke wisa. Tebî di virê de yê tîn pejirandin, yê nayên pejirandin û yê tîn redkirin, yê nayên redkirin hene. Yanî wergira wê pir berfireh e; em pêwendiyê bi welatparêziyê re avakirinê bigirin, heya destgirtina taybetmendiyên baş ê şervanên rêxistinê, wergir fireh e.

Erê, dubare diyar dikim: Raveya vê ya zanistî guncaw e û tê çêkirin jî. Çîrok û bîranîn gelek tîn nivîsandin, wêne tîn kişandin, tîn weşandin. Lê belê, pergala tîkiliyên mezintir, bêriyên tîkiliyan, gelale, xeyal ka li ku derê man? Şoreş, di heman demê de xeyaleke mezin jî diderbirîne. Şoreş, her çende ku xeyal û asoya xwe fireh be, hewqas pêş dikeve. Lê ev ma tam xeyalek e? Naxêr; rasteqîneke wê ya civakî heye. Ma jixwe ew gelaleya ku me amade kiriye, tê de hem xeyal, hem jî xalên zîldayîne ava bûne. Her wiha wê nirxandinên rasteqînî jî hindêk çêbin. Çawa ku min da diyarkirin, ji gelek waran statûkoperest, milîtan û qehremanan dana axaftin girîng e. Di mijara tîkiliyên jin-zilam de aliyan dana axaftin, weke birekî jinê dana axaftin û dîsa çînen civakî dana axaftin girîng e. Ji çawa diaxivin wêdetir, pêwîst e çawa biaxivin re divê girîngî bê dayîn û ev ji bo romanê watedar e. Gelek bilêvkirin û jiyan hene. Û dîsa yê çawa ava bûne û pêwîst e çawa ava bibe hene.

Di vê mijarê de gelek kelûmel mijara gotinê ye. Niha em van kelûmelan kom dikin. Emê bineqînin, piştî jî bi teknîka vegotina baş vegeîrînin romanê. Ev xebata ku em dixwazin çêbikin, me got ku wê di rasteriya giştî de ye. Di gelek çarçovan de em gotûbêj dikin. Tenê ne gotûbêjkirin heta em dijîn. Di heman demê de jiyanên pîrmend jî hene. Bandorbûyî jî derketin rastê. Li ba girêdana peywirên şoreşgerî, peywirên rêxistinî, heta peywirên çalakmendiya milîtan nikare bîn paşçavkirin. Ev di nav hev û dî de ne. Ger ku ev bi hev re ne pêwendîdar bin, nikare xwe bigihîne romaneke şoreşger. Ev tev di nav hev û dî de ne.

Romaneke şoreşger, kesekî statûkoperest qet nikare binivîsîne, nikare di nava bîra xwe de bihewîne. Dîsa yê ku hemû asta partiyê nedîtibe, nejiyabe nikare zêde xwedî îdîa be. Ji derve çavdêrek bêguman dikare romaneke binivîsîne, lê em dikarin bibêjin ku romana herî baş wê ji milîtanên ku rasteqînê bi germî dijin were. Romana rasteqînî, ji nava hewldanên milîtanê şoreşger derxistin guncaw e. Romana rasteqînî, hin kes dikarin di vê kategoriyê de binivîsînin. Di vê mijarê de hin tîpên ku em dibêjin hunermend, bêguman ji derve ve jî, bi çavdêriyekê dikarin binivîsînin.

## Di nava me de t êkiliyên jin-zilam t êkiliyên şer in

---

Min vê vegotinê, bi teşeyekê ku ji romanekê re bibe kelûmel xwest bidim. Ma hun jî weke komekê babetên ku dixwazin pêş bixin hene? Ma di aliyê tevkariya vê gotûbêjê de pirsên we hene?

D: Serokê min, di vê axaftina we de, ew her du takekesên ku di navbeyna wan de hewqas nakokî hene, dikarin werin ba hev ango dikarin bijîn. Têkiliya bi vê jinê re, ew taybetmendiyên cara yekem tîne ba hev çi ne?

S.P: Di xwiyangê de pêwendiya xwe bi şoreşê heye. Tevî ku ji malbateke hevkarîmendê kemalîzmê jî tê, pêwendiya xwe bi Kurdayetiyê heye û biryara tevlibûna komê dide. Weke jineka ku azad e (tebî di xwiyangê de) xwe dide hîskirin. Bi her zilamî re di pileyeke dawî de dikare azadane gotûbêj bike. Dema ku bi van taybetmendiyên tê bêrçavkirin, ji bo komê wek endameke îdeal tê hesibandin, tê hizirkirin. Tebî pirsnişan jî ne kêmin. Ev şewaza tevgerîna azad ku bi temamî di xwiyangê de bû, piştî hate fêmkirin. Dîsa derket rastê ku malbatperesteke bawerhişk e, qaşo tevî ku rexneyên xwe li kemalîzmê heye jî, jîrekatiyeke kemalîzmê ya herî bawerhişk hildigire, weke çepgirekê xwe dide nasîn, lê bi çepgiriye ve çi eleqa xwe nîn e û tipeke kirêçbûyî ya mîrzade ye. Di vê mijarê de, ji ber ku wê demê netbûyîn tunebû, hinekan digot “tîpeka şikdar e”, hinekan jî digot “tîpeka baş e.”

Seranserîya wê qonaxê hatiye vegotin. Tenê ne seranserî bi anîna her cure dibêtiyan pêş çav, ezmûneya t êkiliyekê hem di wateya taybet de, hem di wateya giştî de dikarin nişan bidim ku wê fikariya xwe tune be. T êkiliyên bi malbatê re, t êkiliyên bi partiyê re di bingehê çemka kemalîst de pêş dikevin. Xwe pêşketî û nûjen dihesibîne. Di aliyê din de em jî, dixwazin Kurdistaneke nûjen biafirînin. Em dihizirin ka “wê ji vê re çi bibêje?” Gelo ji bo Kurdistaneke wiha çiqas vekirîye? Ew bi xwe dibêje “ez vekirî me!” Ji bo ezmûnekirinê t êkiliyeke yek bi yek e û îdîa dike ku sosyalîst e, hem jî nişan dide ku wê sosyalîzma milîtan bipejirîne; em wê jî ezmûne dikin. Dîsa îdîa xwe heye ku jina azad temsîl dike. Di aliyê ezmûnekirina t êkiliyên jina azad de ka çiqas xwedî nêzîkatiyeke azad e? Em wisa nêzîk bûn.

Di bingeh de ezmûneyeke bi guman e. Mebest dihêle ku em şiyar bin. Ger pir şiyarî nebe wê karibe gelek tiştan bibe û jixwe xeniqandinera gelek xweşiktiyan e. Weke jinekê di xwiyangê de xurt e. Bikaranîna jinantiya xwe ve dikare bixeniqîne. Ji serokatiyeke hevkarîmend tê. Taybetmendiyên wê yên pir dekbazî û komplogerî hene. Çepgiriye bi kar tîne. Bi demagojiyeke çep a baş guncaw e, dibe ku mebestên sosyalîzmê bi kar bîne. Kurdayetiyê dike, ji ber ku bi Kurdayetiyê re baş şer kiriye, dikare welatparêziya Kurd bixeniqîne.

Ev xeternak hene, lê aliyê dijber ger ku bi rêkûpêk û pîlanî tevgerê xwe hebe, têkiliyên ku daye avakirin, li ciyekî dibine têkilî û hevgerînin girîng. Ji bo ku xwe ji nêvenga qels derxîne, dikare vê hevgerîninê bi kar bîne. Ya herî hindik xapandina MÎTê di vê bingehe de pêk hatiye. Dîsa ji bo jinê nêzîkatiya azadiyê wê çawa be, ji bo bersîvdayîna vê pirsê pêgirê ezmûneyê kirin, dikare bibe. Yanî ji bo azadiya jinê, berevajî be jî, weke xaleka derketinê dikare pêk were. Ger pêk were û ew bi xwe bibe jineka azad, baş e. Lê ku nebe, nexê xefika, bêtirîn wê were rewşa zemîna derketineke pir pêşketî. Heman tişt ji bo sosyalîzm û welatparêziyê jî derbas dibin. Ger pir bisteyî bixwaze, pir şiyarî jî bixwaze, ev têkilî wisa hate bidestgirtin û wisa destpêkirin hate çêkirin.

Tebî aliyên hestên wê demê jî hene. Di aliyekê de pir pê bawer kirin, wek baweriya ku dikare bibe milîtan û jineka hêja heye. Lê guman jî ne ku tune ne. Ka wê kîjan giraniya xwe çêbike, wê pêvajoyê diyar bike. Emê çalakiya şoreşgerî bidomînin, emê rastiyan deynin rastê, bû bû, nebû em pêşgirî ji dest bernadin.

Tebî, piştê derket ku aliyê dijber jî sabit e. Ne wek teşeyê ku dixweyî ye. Hê jî negihîştîye netbûyînekê. Lewma ka sîxurekê bi şêwaza libata xwe, xwe vedîşere yan na, çawa ku tê gotin ji heşt saliya xwe vir ve kesayetek pêşeng ku bi taybetî hatiye xwedîkirin e yan na? Îdîya serokatiya feodal û hevkarîmend û nêzîkatiya wê ev in. Dibe ku sîxureke baş be û hê jî eşkere nebûye. Vana tev wê pratîk biselîmîne. Milîtaneka şoreşger nîn e, berevajî milîtaneka kujoker e. Jineka azad nîn e, berovajî jinantiya ku di şêwaza feodal de bi kar tîne, tenê di dekbaziyên sarayê de tê dîtin. Derket rastê ku rewşê pir bi hostayî dibîne, lê di heman demê de tîpeka pir rajêr û kole ye. Ji libatên rû bigirin, heya zayendîtîyê her tiştî bi teşeyê mal, mulkiyet li hember kedkaran wek kozekê bi kar tîne. Derket rastê ku dixwaze bixê û temsîlkariya jin a pir rajêr û mulkiyetdar dike.

Qismek ji vana di gelala romanê de hatiye xwestin ku bê vegotin. Ev tîp, bikaranîna her roja xwe wek amrazêkê êrîşê mijara gotinê ye. Kesayetiya jinê, kesayetiya pergale, kesayetiya mîrzade her demjimêr, her çîrk wek hêza êrîşkeriyê bi kar tîne. Her rojê ku derbas dibe, vê nêzîkatiya xwe zêdetir dike. Hinek milîtanên me dema ku rojekê jî wê çavdêrî dikin, li hemberê bertekek mezin pêşan didin û wek yeka ku pêwîst e yekser bê tunekirin dinirxînin.

Qonax hatine vegotin, naxwazim dubare bikim. A girîng, asta gelale, xeyal û kirûyên vê pêvajoyê, ne di aliyê takekesan de, di aliyê qonaxan de girtin e. Ji ber ku li wirê di kesayeta takekesan de yê tenê jiyandin şiyarbûna netewekê ye, xwe zanebûnkirina xwediyê kedê ye. Dema ku ber bi jiyane ve çav rast hate vekirin û wêrekî li hember jiyane hate raberkirin, aliyê dijmin jî tam berevajî dixwaze ku berxwedana kurd bixeniqîne û mitlaqa di bin venêranê de bihêle. Ka wê bi kû ve bibe diyar nîn e û jinantiya xwe pir bi xeterî bi kar tîne. Bi taybetî li hember jina ku dixwaze azad bibe bertekek xwe yê mezin heye û ber bi tunebûnê ve jî dibe. Da ku yek jineka azad dernekeve curbêcur pêşgiriyan digire. Di bingehe de bi wan

pêşgiryên wê yek jineka azad a gihîştî serkeftinê dernekeve rastê. Daxwaza wê misoger e ku tîpê jina kole mitlaq di nava refan de serdest bibe. Ew zayendîtiya jinê ya pir çalexwarî, bi şêwazeke pir xirab bi kar tîne. Ne tenê xwe, hemû tîpên jin ê rêkxistinê pir çalexwarî bi çemka zayendîtiyeke berevajî dixwaze ji bo berdewamkirina saziya civaka kevin bidomîne. Ji ber ku ew temsîlkara pir xurt a pergala kemalîzmê û hewl dide ku li Kurdistanê vê pergale zêdetir belavî bike. Bêyî ku hewl bide, bêyî ku bixebite, taybetmendiyên hevkarmandî bi kar tîne û zilamê kurd dixê bin kontrola xwe. Mînak dema ku ez weke tîpekî pêş dikevim, li ser min çavdêriyan pêk tîne. Ji bo hinek hevalê me yên di nava refan de ne gotinên wê hene. Ez naxwazim zêde navê wan hevalên me bi kar bînim. Dibêje, “filankes gundî ye, bi hêsanî dikarim bigirim nav destê xwe.” Taybetmendiyên serokatî heye, wana bi kar tîne; taybetmendiyên jinantiyê heye, wana bi kar tîne û dibêje, “ez bi hêsanî dikarim kontrol bikim.” Jixwe azadiyê jî wisa fêm dike. Weke jineka azad, dema ku daxwaz dike bandor li ser zilamekî çêbike, bi têkiliyên jina sihêl, bi libatên ku wî bîne rayê dixeniqîne, girê dide, digire û tune dike.

Ku taybetmendiyên serokê fêodal-hevkarmandî mijara gotinê be, axaya herî mezin e, serek eşîra herî mezin e. Ku bi taybetmendiyên çepgir, bixwaze hinekan bixe bin kontrolê, ji ber ku xwedî devekî herî populer e, devokê sosyalîzma bêkêmasî bi kar tîne. Ji çepgirekê herî mezin, baştir qisebêj e, baştir axaftinvan e û bandorker e. Ji bin van bandoran kîjan zilam dikare bifilite? Bi taybetî ji wê saziya Kurdistanê ku pir paş de maye û ji wê birê xizan kîjan li hember vê nêzîkatîyê dikare li ber xwe bide? Îcar ku zilamê Kurd ku aliyê hestan de bê pêşwazîkirin, pir tê girêdan. Heke pir xweşik be, dibe ximbilê wê. Jixwe dema ku kete bin bandora yeka wisa, henase wergirtin jî gunçaw nîn e. Dema bikeve bin bandorê bertek pêwîst e; bertek jî di rojekê de vedigere şer; ji ber ku di şer de ew pir berxwedêr e, dibe ku bi mirinê ve encam bigire. Têkiliyeke wisa dema ku dibe mijara gotinê gelo mirin, tê çi wateyê? Wê cuda belav bibe, derbeyeke mezin wergire û çi wateya têkiliyên taybet namîne. Ev jî nêzîkatîyeke hedefan a berevajî ye. Di vê wateyê de lêxistin ji stûtewandinê xirabtir e. Ger ku te şêwaza têkiliyên ku ew naxwaze te pejirand, ji mirinê xirabtir li hember raber bûyî, hingê jî wê gelaleyên te bikevin avê. Wê demê tê çi bikî? Di rastê de riyeke pir cuda ji xwe re bibijêrî. Lê ew ji bona riyeke cuda fersend nade. Jixwe di vê mijarê de aliyê dijber pir baş fêm dike. Van gotinan dibêje: “Ji bo sosyalîzmê, ji bo partiyê çi tiştê nehe dirînim nîn e. Dema ku berjewendiyên partiyê dibe mijara gotinê wê tu her tiştî re hedar bikî. Ez çi qas heqaretê li te bikim, libateke ku çi zilam napejirîne rojê çil çaran li te biçespînim, wê tu bipejirînî!” Belê, van axaftinan gotiye. Yanî zilamekî gundî yê ketûber be, yek libatekê re, bi hêsanî wê bi awayê çawa ku tê zanîn bersîv bide. Lê min neda. Tebî, encamên vê yên mezin derketine rastê.

Ev taybetmendiyên hîmî ku min jîmart, bêtir bi kûrkirinekê dikarin bîn vekirin. Lê hinek jî ev li virê pir dibe girîng: Li ser navê hestê tebatkirin, li ser navê pêşketina siyasî-rêxistinî tebatkirin heye. Qonax hatine dîqatkirin. Mînak di derketina derveyê welat de intiba pê hatiye dayîn, ez di hundirê welat de me. Ger şik pê re çênebe, îhtîmaleke mezin, rapordayîna jor mijara gotinê be, wê bibêje, “di bin kontrola min de ye!”. Yanî ev girêdan li ciyekî ji bo xapandina dijmin xwedî nixê bikaranînê ye. Belkî ji bo vê yekê sebir û hedan hatiye nîşandan. Lê hêviya dibe ku “bibe şoreşger” jî heye. Dibe ku ji bo vê yekê jî sebir hatibe rakerkirin. Yek jî bi rêgezî, di mijara guhertina mirovekê de wêreyeke me yê pir mezin heye. Da ku hemin emê vê biguherînin, wisa em hedar dikin. Tevî ku hatiye sînore êdî nayê tebatkirinê jî, ev pêvajo tê dirêjkirin. Êdî hatina qonaxeke wisa pêk tê ku, kar ber bi kompoyê ve digihîje. Ya dê tu wê, ya jî ew dê te bibe. Êdî divê tu bikşîni bin kontrolê. Bi hewldanê wisa giranî çêdike ku, di 3. kongreyê de dibêje, “ezê bombeya xwe biteqînim!”. Qesda wê ji teqandinê ew têkiliyên ku bi çend jin ango zilaman re avakiriye, li ser serê aliyê dijber teqandin e. Yanî bi ya wê pêwîst e zilam ne wisa be; zilamekî wisa ango aliyê dijber, ew aliye ku pêwîst e bê redkirin; redkirinê jî, ya bi kompoyê ya jî, di kongreyê de bi afirandina gef û hetikandinê wê pêk bîne. Valaderxistina 3. kongreyê tê wateya valaderxistina hilkeftina 15ê Tebaxê.

Ev hemû tenê ji bandor-bertekên di asta têkiliyên dumend de peyda nîn in, dikarin valadixistina tevgera neteweke qirase armanc bigire. Tebî li hember vê jî pêşgirî tî wergirtin. Yanî em bi hemû dilxwaziya xwe tevî dixwazin wê bikşînin rastiyê, lê ew bi xwe ji bo nepêkanîna vê pêşgirî werdigire. Jixwe aliyê dijber wek qeşayê ye, tîpeka di sarîtiya mar de ye. Carna ev axaftin bi ken be jî tê gotin: “Ma tu hizir dikî ku jahrî xistine vê xwarinê ango vê tiştê? Pêwîst nîn e ku tu bitirsî” ango “ma tu dihizirî ku ez sîxur im?” Yanî dikare axaftin û gotinên wisa bibêje. Jixwe rewş bi xwe jî ev e. Bi pirsên ponijîn pîj dike. Ev taktîkek e. Belê va hedan û şewazek li vir heye. Rast e belkî hun, di xulekekê de derxînin zelaliyê û berteka xwe bînin ziman. Lê ev, dibe herî xala dawî ya hatinê.

Em bi dahûrandina vê kesayetiye, kemalîzmê, KTYê û hindek jî MÎTê dahûrand. Dîsa malbata aliyê dijber ji bo me digot, “me xwest vî kesî bi vê têkiliyê bi dewletê ve bidine girêdan.” Wê demê ev tîp jî, bi malbatê ve pir girêdayî ye. Û dîsa xwesteka me ya vê malbatê di xizmeta Kurdistanê de bikaranîn girîng e. Me hindek jî bi kar anî. Lê bi durustî û di bingehe welatparêziya Kurdistanê û xizmeta şoreşê de pêk anî.

Ger bê dîqatkirin, wê bê dîtin ku têkiliya min jiyaye, ne mîna piraniya we ye. Li ba me heya dawiyê ji têkiliyan re watedayîn, birîdayîn, berdewamkirin û taybetmendiya pêşxistinê heye. Di bingehe de, li rastê têkiliya taybet filan nîn e, têkiliya zewacê jî di axaftinê de dimîne. Li vê derê têkiliyeke şer heye, lê xwiya wê bi awayekê din e. Niha di virê de nêzikatiya min a gundiyeke

ketûber be, ya wê min di cî de stû tewandiba, ya jî pevçûbama. Yanî ev, wê vegeriya têkiliyeke diyar û biçûya. Ji têkiliyeke tune re min dikaribû xwe bida bawerkirin; dikaribûm aliyê siyasî jî nehiziriyama. Ji ber ku têkiliyên piraniya we asta xwe ya siyasî nîn e. Nêzîkatiyên bi teşeyên ka wê çî bîne, wê çî bibe nîn e. Zêdetir aliyê hatiye nepixandin û ji rasteqînê hatiye qutkirin giraniya xwe didê. Tebî ev, zêde we pêş naxe. Bi hêsanî tê avakirin, bi hêsanî xira dibe; ji ber ku bênaverok û bêarmanc in. A herî girîng jî, hun di hunerên têkiliyan de, ne xurt in; di bingeh de heza we ya avakirina têkiliyan nîn e. Hê jî hêza avakirina têkiliyê ya piranî hevalên me qels e.

Hêza min a herî mezin çî ye? Li ser têkiliyê bi heterî disekinim, pir berfirehî digirim dest, pir didahûrînim. Wan nêzîkatiyên ku jin xwe ji teşeyê têkiliyên pir taybet têxe şûna zilam û bi aliyê dijber stû bide tewandin, ji ber çavan nafilitînim.

Di bingeh de gelek aliyên xeternak yên vê tîpê tê dîtîn, lê hema serlêdana nêzîkatiyên klasîk çênabin. Ku jê re bê gotin, “ma tu yî ya ku van mijaran hewqas serûbin dike” û felişandina wê karê demjimêrekê ye. Ji ber ku bersîv nade têkiliya taybet, darizandîna hêsan e. Ev hemû nayên çêkirin. Şûna van pirsgrêk di nava pêvajoyê de tê pesandîna û bi kûrahî tê bidestgirtin. Ez, di vê derê de hewl didim ku ji pirsên jin kê ye, hevkarîmend kê ye, kemalîzm çî ye, KT çî ye re kûr bersîvan peyda bikim. Di vê navberê de ez, pêwîstiya afirandina jina azad bawer dikim. Ji ber ku ev tîp, jineke ku dixwaze bike kole, hem jî jina herî xeternak temsîl dike. Wê demê jina puxteyî wê çawa be? Jixwe di vî aliyê de jî şer heye.

Di mijara destgirtina jina azad de ji bo pêşxistina hinek têkiliyan bi hindek tîpan re mezintirîn bertek raber dike û bi şêwaza tunekar nêzîk dibe. Naxwaze bi vê armancê têkilî bîn pêş xistin. Tebî di vê de jî çekên klasîk ên tê zanîn hene; dixwaze gelşa têkiliya taybet bi kar bîne. Ez, ku di virê de rengê têkiliya taybet esas wergirim, di vê mijarê de ber bi jina azad ve rê newergirim, wek zilamê Kurd bilivim, weke ku ezê, di mijara azadiya jinê de nikaribim bi serkeftinbim û ji gelek neyênîyan re rêvekirina min wê zêde ne dûr be. Ji ber vê yekê weke warê kar û xebata min a afirîner ji pirsgrêka jina kolekirinê re hem di aliyê asta teorîk û hem jî pratîk de biriya xwe didimê. Niha vê di gelala romanê de dîtîn zor nîn e.

Bi taybetî dema ku ber bi navîna sala 1980yan ve hemû aliyên xeternak derketin rastê û îhtîmala ku ev tîp azadiyê dixeniqîne bilind bû, ev xebat bêtir kûr dibin. Tevlîbûna hejmareke pir jinan ji xebata azadiyê re wek pêwîstiyekê derkete rastê. Tê fêmkirin ku têkiliyên azad tenê bi pêşxistina şoreşê wê derfet peyda bike û bi derketina jina azad wê hindek pêşketin bîn destgirtin. Tê dîtîn ku, di destpêkê de têkiliyên bîn avakirin wê zêde nirxdar nebe, bi azweriyên ketûber, bi nêzîkatiyên “em li kolanê rastê hev hatin, nizanim li taxê pêrgî hev hatin, li dibistanê rastî hev hatin” wê bingehê têkiliyên ê rişt neyê avakirin.

Eşkere ye ku, têkiliyên ku tê gotin rişt in li cihê şoreş bi xwe ye, di vê mijarê de rola rêxistina pêşeng û xebata hatî pêşxistin-pêkanîn hîmekî mezin e ji bo

azadiya jinê, pêwîst e ku girêdan pêşî di vî bingehî de pêş bikeve, ger ev neyên pêkanîn, ew têketina têkiliyên girêdana kesani bi misogeri wê bi xeternak bin. Bingehekê welatparêziya rişt nebe, şewaza têkiliya takekesî ya ku xwe bi gelê ku tê xwestin bê azadkirin û rêxistina wê ve nade girêdan, her çende ku saf be jî, di bingeh de dikare kesan çalexwarî bike. Ji ber ku ew nêvenga jê hatiye, mercên malbata klasîk û bandorbûna pergale ye. Encam jî, kesê ku dibe mijara gotinê ji ber têkiliyên van sazgehan bi misogeri wendakirin e.

Ji ber vê yekê hinek nêzîkatiyên ji jin û zilam re tên raberkirin hene. Hewldana di pêşî de wana bi nirxên bingehîn ve girêdan di vê pêvajoyê de bi kûrahî tê destgirtin. Jixwe têkiliyên seranser, sihêl, rojane û hestane tê daxistin ku wê zêde wateyekê nederbirînin, bi taybetî jî kolekirin e. Tê gotin, ji têkiliyên malbata klasîk, têkiliyên nas û dost dîr bisekinin. Zewac û hestên we yên pêkhatî zêde qîmeta xwe nîn e û ev xeternak in. Lewma di axaftinên curbicur û axaftina Tirmeha 1992yan de ka wê çawa girêdanên mezîn pêş bikevin baş hatiye ziman. Mîna van gelek nirxandin hate çêkirin. Û me lê nêrî ev hewldan zêdetir azad dikin. Ev, qasî kar zêdetir bi zanîstî, kûrahî û radîkal destgirtinê, ji şewaza têkiliyê re rê vedike. Jin, hinekî dîtir rêzdarî û hêz qezenc dike. Zilam, zêdetir rasteqînî dibe, ji kevneşopiya malbata feodal difilite. Jin, hin zêdetir çavên xwe ber bi rastînan zanistî ve vedike, hema bi zilam re na; bi nirxên bingehîn ve tê girêdan. Niha, rewşa ku zilam jinê wek malekî dibîne ji rastê radibe û ev di çonayetiya pêşketinên azadî de dibin.

## **Li Kurdistanê hezkirin hatiye qetilkirin**

---

Ev babet di gelala romanê de, di dahûrandinan de hate diyarkirin û hate destgirtin. Ev yek derkete rastê: Li Kurdistanê hezkirin jî hatiye qetilkirin. Çawa ku gelek devên mêtîngerî dibêjin “Kurd weş e, nêvenga hezkirinê, jê hatin hezkirin û hezkirin tiştek wisa nîn e, nizanin!” Bi rastî jî ev, hindê wisa ye. Mêtîngerî, di vê mijarê de rola qirkirinê leyistiye. Lewma hewl hatiye dayîn ku bê vegotin, çalakmendiya me ya şoreşgerî, çalakiyeke hezkirinê ye. Riya hezkirinê, şewaza hezkirinê bi şoreşê re tê destgirtin, hîmê objektîf tê danîn. Ka wê hezkirin û rêzdarî çawa pêş bikevin, bi girêdana çî ve wê pêş ve herin, tê daxistin. Hîmên azad, di vê derê de wateyeke mezin diderbirînin. Dîsa di vê mijarê de estetîk dikeve dewrê. Girêdana fîzîkî, giyanî û zanyarbûyînê bi estetîkê ve tê avakirin. Û dertê rastê ku ev, dikarin mirov xweşîktir bikin. Di wateyekê de hatiye destnîşankirin ku rasteqîna şerê me, di avakirina ji nû de, xurt şerkirin-dana şerkirin wê karibe ji têkiliya hezkirineke xurt re rê vebike. Dîsa hatiye daxistin ku hest û hezkirinên erzan ê di destpêkê de hêz nedaye şer, ji şer daye girtin, aniyê

haleke paşverû, heta ber bi her cure felişandineriyê ve biriye. Di vê mijarê de nêzîkatiya rast qîmeteke xwe yê mezin heye, li Kurdistanê ji gelek encamên girîng re rê daye vekirin, nêzîkatiya koletiya jinê rûxandiyê, bûye sedem ji hilkeftina mezin re, saziya şêwaza kevin a malbatê hilweşandiyê û rê vekiriye ji rûxandina jîrekatiya kevin a zilam re. Ev, di heman demê de dibe pêşketineke girîng a şoreşgerî. Di bingeh de ev, tam aliyê hunerî ye. Di romanê de aliyê herî zêde bê hêvotin ev e. Di bingeh de roman, bikiryarî û di radeyeke girîng de bi serê gelşan hatiye jiyandin. Ê em dibêjin ku, temamkirina wê û xwedîkirina aliyê bi hêza gelaleyê, bi xeyalan, azwêriyan, viyan, wire û estetîkê ve di qîmeta pêşxistinê de ye.

Di: Beriye em tevlî refan bibin, têkiliya pêşîn a me dabû destpêkirin, ew şêwaza koledariyê bû. Piştî bi wê pêvajoya ku me anî nava refan ve em, hêdî hêdî qutbûna ji koledariyê dijîn. Yanî pêwîstiya azadiyê piştî têgihîştina şêwaza têkiliyêke kole ya jiyana kevin, êdî em dikevin nava lêgerîna azadiyê. Bi rastî ji azadî çî ye? Divê di mejî de çawa bê şênberkirin? Çawa gihandina azadiyê çêdibe, azîna wê çî ye? Hewldan çawa tê pêşxistin? Bi gotûbêjan ev dikare dakeve rastê. Ji ber ku di nava refan de têkilî û qutbûnên bi vî awayî zêde tên jiyandin.

S.P: Erê, bi taybetî ew qadên ku hun jê hatine, ev hindik hatiye gotûbêj kirin, hindêk girtî maye. Xebatên di çiyê de jî hindêk wisa ne. Me, gotûbêjê zû da destpêkirin. Di sehaya Rojhilata Navîn de hindêk jî da pêşxistin. Çawa ku min got, yên li çiyê qet gotûbêj nekirin. Ji ber giraniya jiyana leşkerî, ne fersend dîtîn, ne jî dane nasîn. Yên di zindanê de jî, vê bi vaca pergalê girtin dest. Yanî şêwaza têkiliyên pergalê wisa bi şoreşgeriyê rûpoş ango cîla kirin û xwestin ku wêjeya têkiliya şoreşgerî pêş bixin. Ji derve ve gelek keçên ku axaftinên hezkirinê wan ê mezintirîn yên tîn zanîn, ji nêzîkatiya hembêzkerinê re bi heman helwestan bersîvdayîna yên hundir, bi wê pêvajoya ku dihate xwestin PKK bê felişandin re rû da. Di şênberiya halantêdana Şener de ku uslûbê felişandineriyê dihate kûr kirin ev, hate derxistin. Mînak, hevalekî ku em bi puxteya şoreşgerî û durustbûna wê bawerbûn, ka xwe çawa pêgirê çalexwariya hestan dikir, çawa vê digihand astên tirsnaq me nirxand. Mîna vê gelek têkiliyên di hundir de tên jiyîn, têkiliyên jin-zilam ka çawa şûna têkiliyên şoreş û partiyê digirin tê zanîn.

Dîsa ciwanên ku ji hundirê pergalê û şagirtiyên ku ji nêvenga 12 Rezberê tîn, têkiliyên ku pir bêşêwe, bêarmanc dijîn hene. Ew têkiliyên sexte, hindêk bi çanda TVê, ya pergalê, ew 12 Rezbera di rîya Amerîka û Hollywoodkirinê de (ev dibe şêwaza jiyana emperyalîst) ku bi wan ciwanan empoze dikin li rastê ye. Dîsa hêmanên ku jêderka xwe ji gundîtiya klasîk digirin, ji jinê re tenê nêzîkatiyêke di bingehê zayendîtîyê de ye, hemû têkiliyên hezkirinê yên sexte yê pergalê bi renekî belavî hate çespendin. Yên ku hê jî bandora vê bi ponijîn dijîn hene. Min xwe di vê mijarê de baş kir lêgerekî dahûrandinê. Ez hizir dikim ku di vê mijarê de bêtir di rewşa bi kûrahî bêm têgihîştinê de me. Me di virê de, dixwaze bila di

aliyê binkeyê de be, dixwaze bila di aliyê xwediyê nêzîkatiyên curbicur de be, di bingeh de şoreşeke rastînê pêk anî.

Di teşeyê têtîliya destpêkê ya min de, her tişt hebûn. Bandora taybetmendiyên pergala û gundîtiyê hebûn. Dîsa pir seranserî hebû. Tebî bi gor nêzîkatiya têtîliya hevalên me jî, kesayetê min tunebû. Vê, mîna çarenûsekê dîtî û weke pirsgerêkeke ku li zincirê hatiye xistin fêmkirin, ne guncaw bû. Lê, bi regekî erzanî berdan jî, ne guncaw bû. Nêzîkatiya ku wê piştê hesab bipirse hebû. Bi rengê felişandîna felişandîner û hevkarmandan, veğerandîna felişandîna KTYê tolwergirtin hebû. Di bingeh de bi wateyekê klasîk nêzîkê gelşê nabim. Heta ne di wateya klasîk de, ne di wateya nûjen de. Di têtîliyên min ê jinê de puxte girîng e.

Em, dixwazim di aliyê pênasekirina pirsgerêkê de bersîvan bidin. Em, pir rêxnedar nêzîk dibin. Yekcarê em ve napejirîn; malbat, divê a-wiha be, têtîliyên jin-zilam wiha tê avakirin, zayendîtî wiha tê derbirandin û têrbûnê peyda dike. Ez, naxwazim bi pirsên wisa re qîma xwe bînim. Tam berevajî em pir rasteqînê nêzîk dibin. Em, hem astên wê yên zanistî, hem giyanî, hem jî siyasî hemû aliyan di nava hev de dibînin û xwe digihînin şewaza nixandîne. Heta yê azad çi ye? Pêwendîya di navbeyna hezkirin û azadiyê de çawa tê avakirin? Pêwendî bi xweşîkbûnê re çawa tê avakirin? Ez dixwazim wê bidim û wê didim gotûbêjkin.

Ger bal bê dayîn, di nava milîtanên binkeya me de nêzîkatiyeke wiha zêde pêş neketiye. Her yek ji wan ya înkâr dike, ya jî bi koletiya xwe tê girêdan; pir xweperestî heye. Heta ku serbest bûn berdan wê hev û dî bînin kîjan rewşê, bi rastî jî tebatkirina mirov zor e. Eşkereye ku ev tekilî wê pir hindik azadiyê esas bigire. Heta wê aliyan bîne rewşa nenaskirinê. Bi hêsanî hatina aliyekê rewşa pîrejînokekê zêde zehmet nîn e. Ev rewş di şoreşê de, wê ber bi jê xwarinê û felişandîna mezintirîn a şoreşê ve rê vebike. Disiplîn nîn e, pergala nîn e. Tebî her kes ji ber egera têtîliyên nas û dostan wê par bixwaze, ev jî, wê ber bi rawestandîna şoreşê ve bibe. Tekiliyek bi serê xwe jî, dikare bi felişandîneriyê ve encam bigire.

Di aliyê din de şewaza serokatiyê kû tê xwestîn pêşkeve û di azadiyê de bixwebawer e, pêşî hemû têtîliyan qut û perçe dike. Ji mijara mulkiyetê derdixe. Dixwaze zilam ji nêvenga zilamê serdest derbixe. Dixwaze jinê û zayendîtîyê ji rewşa bûyîna hêmana bikaranînê di bingehê mulkiyetê de derbixe. Bi çemka serdestiya zilam re ditêkoşe û hewl dide ku bipirse ka jin çi ye. Mînak, di rasteqîna civakê de ji bo zewacê dikarim bibêjim çi? Mamoste Yalçîn, di nixandîna bi navê “Li Bexçeyê Kurd Soz û Peyman” de ramanên xwe hindek pêş dixê. Min, pêwîstî dîtibû ku di derbarê zewacê de nixandînan pêş bixim. Pir balkêş in û nixandînen wisa ne ku bi baldariyekê hindek encam dikare jê were derxistin. Tebî tevî ku ne li hember pevrebûna me jî, tê fêmkirin ku ew curbicur bîçimên jiyanê dixwaze zewaca ku di şeweya têtîliya taybet de be, dixwaze ya îro li Tirkiyê ku tê xwestin bi regekî belavî bê kirin be, gelek tiştan bi xwe re dibe,

heta diqedîne. Ji bo nimûne, hinek encam derketine, dibêje, “malbat li ser navê hezkirinê tê avakirin û ev encameke xwezayî yê hezkerinê ye!” Heta dibêje, “Ev diqedîne!” Ji nêzîkatiya me vê yekê derxistiye; hindêk jî dikare were vê wateyê. Kartêkerên ku di bin bûyera zewacê de peyda dibin, pê dihesê ku xeniqandiner in. wekî din jî, ji nêzîkatiyên me hinek xalên bingehîn selimandiyê: Bûyera zewacê dîtiye; zewace dê-bav, ezmûneya zewaca min a puxtayî û di hundirê civakê de zewaca Kurd a ku pir ziwakar e, xeniqandiner e, bandora wê ferq kiriye. Va, di vê derê de ji bo şoreşa me dibêje, “Dikare bibe çalakiyeke mezin a hezkirinê!”

A ku dixwazim bibêjim, dibîne. Ew beş, ji bo lêkolînkirinê pir nixrdar e. Naxwazim wê beşê zêde dubare bikim. Dibêje “Li ser malbata pîroz çalakiya Abdullah Ocalan sisê ne. Yekemîn, dibîne ku zewaca dê-bav, bav diqedîne. Bavê wî di pergala malbata pîroz de mîna yekî dînbûyî ye. Duyemîn, ezmûneya zewaca wî bi xwe êdî bûye cendereyek. Sêyemîn, malbatên Kurd. Herî hindik di pêşiya 1992yan de li hember metirsiya bûyîna şervanên PKKê malbat zarokên xwe direvînin, dibine Ewrûpa û didin zewicandin. Tirsê wê bireve gerîla, dixwazin bi zewacê bin bixin. Ev çalakiyên komî ne.” Dîsa dibêje “Bi çalakiya azadkirinê di encama wê bersîva ku tê dayîn de, di nav alîgirên mulkiyetê de tirs heye. Di civakên ku tirsê ji nava radikînan de, mulkiyeta taybetî ya çikûs nabe. Tirs mitleqa çikûs e. Mulkiyeta taybet, çikûsiya berhevkerî ye. Zewac, mulkiyeta taybet a herî veşartî ye.” Dîqat bikin, vana di hevdişîna me de ji bo ku zelalî peyda bibe dinivîşîna. Wiha didomîne, “Dixwaze bila mara mele be, dixwaze bila bi nasîna dêrê be, dixwaze bila ji hêla rayedarên taxî yê laîk ve bê înzekirin, mar, peymanê hiquqa deyndariyê ye. Di bingehê wê de, ne ji bo destpêkirina pevrebûnê, hesta berdehamiyê têxe bin ewlayiyê heye. Mar, tirsê ku wê hezkirin biqede ye. Ji ber vê egerê hezkirinê qedandin e. Yekbûyîna her du zayendan, tenê ku di nêzîkatiyê de bêdawîbûn hebe, layiqê mirov e. Bi hev re jiyîn serûwenek e. Dilwêrekiya her qas hev û dî ji nû ve keşîfîkirinê ye. Ku her qas nû be, pevrebûyîn jî, bêdawî ye. Hezkirin, tenê bi dilwêrekiyê guncaw e. Evîn, tenê mafê wî/ê yê/a ku ji hezkarê/a xwe re dikare asîmanan zevt bike ye. Gel ji bin zincira koletiyê ango kedkaran ji bin zincîra mulkiyeta taybet rizgarkirin, bi zevtkirina asîmanan ve wekhev e. Zevtkirina asîmanan, qezenckirina bawerdêriyê ye. Ê ku ne bawerdêr e, hêza hezkirina wî nîn e.” Mînak, di derbarê sîstema Sovyetê ya hilweşiyayî de dibêje, “Ez bawer dikim ku berteka Abdullah Ocalan li hember çavbirçîtiya zayendî ku wek azadiyê tê dîtin di reel Sosyālîzmê de, mezin e.” , “Serok APO, bawer nake ku beriya rûxandina malbata pîroz a feodalîzmê, Kurdistan azad bibe. Malbata pîroz, tê wateya tîkiliyên dîl û jina dîl. Ev dahûrandin, çalakiyê azadkirin e. Ji malbata pîroz re bersîvdayîna APO, çalakiya azadkirina jinê ye. Di pêvajoya jin a gerîla de jî, weke ji cendera jinê tolwergirtina xwe ramiyaye. Rahavêj e.”

Soz û peyman, di vê beşê de li ser van disekine. Yanî li ciyekî tiştên ku tégihîştiye daye kurtekirin. Tebi di van dahûrînan de wergirtina azadiyê guncaw e. Hunê ji bo gotûbêjkirinê zîrek bin.

A ku ez dibînim, qada ez jê hatime weke ku gotûbêjên wêrekanê nîn in, rev heye. Hin têtikiliyên ku we jiyaye, we terkeserê qeyranê kiriye. Ev yek li ba min çiqas hatiye jiyandin û çawa encam wergirtiye da ku we ronî bike pêşwazî kirim. Yanî min, di ciyekî de her kes ji vê para herî mezin û lewma wêrekî bigire vegot. Tebî gelek ji wan ne azweriya xwe, ne koletiya xwe, ne jî hestên xwe tînin ziman; ser vedişêrin, dixine nava qeyranê. Niha min jî jiya, lê ya min, va ye bi tevgerê azadiya mezin bersîvdayîn e. Ez, di bingeh de taybetmendiya zewac ango têtikiliyên kolekirinê dikarim bêtir kûr û dahûrîn bikim; dikarim çalakiya azadiyê rapelikînim.

Tebî ez polîtîkayê bi rê ve dibim. Di ve mijarê de wek we nikarim terkeserê qeyranê bikim. Ez di bin navê “Têtikiliya min a taybet de” nikarim xwe hilweşînim û bûyeran biafirînim. Mîna, hemû teşeyên têtikiliyan, polîtîkayê û heta xebatên leşkerî dame xurtkirinê. Bila li ba dahûrandina her tiştên ku hun dijîn, binkeya siyasî û leşkerî jî xurt bibe. Pir kêma heval dîqatê vê dikin. Mînak, derkete rastê ku azadbûna jinê tevkariya gerîla ye. Pêşiya artêşbûnê vekirin, çalakiyeke wisa ye ku di cîhanê de pir hindik şoreşan pêk aniye. Min ji vê re wêrekî nîşan da. Min got, “pêwîst e mirov wêrekî nîşan bide ku wê jin di gerîla de karibe rol bileyze ango di artêşbûnê de karibe cî wergire.” Lê, min çawa wêrekî nîşan da? Min vê wêrekî bi çî ve girêda? Azadiyê ve û bi çalakiya azadiya jinê ve. Niha me hêza şidiyayî ya jinê hindek daye avakirin.

Lê gelek kes hê xwe negihandine vê. Zêde qîmeta vê nizanin, nikarin bibin çare. Ev geşeke cuda ye, lê serokatî di şenberiya xwe de vê çareser kiriye. Em, di vê mijarê de wêrekî didin partiyê û we hemûyan. Ev, hinekî dîtir we azad dike. Ger ku sehaya serokatîyê hinekî dîtir we azad dike, sedemê vê hêza baweriyê bidestgirtin e. Sehaya serokatîyê, çalakiya azadiyê hindek pêş de biriyê, jinê pênase kiriye, azadiyê pênase kiriye. Vê bi çalakiyê pêş ve biriyê. Ji ber wê yekê pê tê bawerkirin û ji ber ku bawerî pêk tê, azadîxwaz jî hindek diponijin.

Hunê pala xwe bidin vê û hinekî dîtir, li ser azadiyê baponijin. Dîsa li vê derê rîya erzan nîn e. Wê kesayeta we wergir qezenc bike. Wê di aliyekê de bibe siyasî, bibe leşkerî, di aliyê din de jî, wê xwe bigihîne piroziya hestan û azadiya têtikiliyan. Hunê, li hember wan bermayên ku we di kevin de jiyaye, bi serkeftin dawî lê bînin û asteke pêşketîtir bigirin. Heta hunê, di vê mijarê de estetîka xwe pêş bixin. Hunê vê bi teşeyê kulîlkbûna şoreşê pêgirê nixandînek bikin. Bi kurtasî me got, şoreşgerek bi van aliyên xwe ve jî mijul dibe, xwe xurt û temam dike.

## Em demxeya mulkiyetê ya li ser zayendîtîyê radikin

---

Da ku ev gotûbêjên me di taybetmendiya watedar û pêşxistinkar de bin, ya/ê dibêje “Ezê bibim milîtan, di vê de biryarmend im” divê li vê binêre. Pêwîst e xwe bigihîne hêza birêvebirina vê. Ez, li pratîka we hemûyan ya di bingehê nêzîkatîyên kevneşopî de dinêrim, di teşeyên qeyranan de encaman dertînin. Gelek heval azwerî û hestên xwe yê azadiya jinê ger fersend bibînin wê ber bi cukên şaş ve biherikin. Dikarin bi serdestiyê ve encam bigirin. Dikare bi serdestiya zîlam bibe, bi hestên jina kole barkirî bibe. Yek jî dikare pir taybet bibe. A herî girîng ku girêdana xwe bi peywîrên bingehîn ve nebe, dikare di teşeyekê pir zêde nepixandî de derkeve rastê. Dibe ku aliyê estetîk qet tune be. Dibe ku aliyê civakîkirin, netewîkirin û welatparêzîkirin di pîlana duyemîn de bimîne. Bi rastî jî hemû hindêk wisa çêdibin.

Tebî em, li hember van rexnedar in. Em, ji têkiliyên wisa re di nava partiyê de, îcar di nava artêşê de zêde cî nadin. Rast tevî bibin û azad bibin. Bi azadbûyîne ve têkiliyên watedar dikarin bên pêşxistin. Lê ev çendî zor e, çî çalakiyeke mezin bi xwe re pêwîst dike eşkere ye. Niha tê zanîn, gelek hevalên me vê sehayê têkiliya azad înkâr dikin, dapaçîn dikin, fersend nadin azweriyên pîroz, hinekî din jî averê dikin. Ev hemû zêde watedar nîn in. Ez çalakiya xwe didomînim. Jina ku bi xwe bawer e, helbet emê fersend bidîne. Her ku em dixwazin hewqas hevgirtî bimînin, hingê emê cî bidin azadiya jinê. Bila pala xwe bidin zemîneke azad û xwe bigihînin derbirîneke azad û xwe bigihînin derfeteke çêtirdîtina azad. Lê zewacên erzan, hestiyariyên erzan çespendin, bi ya min pir metirsî ye. Dixwaze bila bingeh ji jinê bigire, bila ji zîlam bigire mijara cî nedayîna vê bi hostatî pêşxistin girîng e. Ev, herî zêde xwedî şensê ji tevgera azadiya jinê re zemîn û riyekê wergirtin e.

Di vê mijarê de bi taybetî hunê hinekî din biramin. Wê ji azadiya we re baweriya we pêş bikeve. Hunê, hem pênasekirina xwe de, hem di meşandina xwe de hêz qezenc bikin. Ev, helbet wê we ber bi helwestên xurt; li hember serdestiya zîlam dibe, li hember ketûbûna jinê dibe, we bîne şûngeheke xurt. Wê hingê wate û girîngiya têkiliyên li ser vê bingehê hebe.

Di gelala romanê de ev, di teşeyê serê gelş de hatiye xwestin ku bê dayîn. Dîsa di dahûrînan de, di derbarê vê mijarê de serê gelşan hene. Ger binke nikare binirxîne, ev bêberpîrsiyariya wan e. Di vê mijarê de, ji baldarî û hêza nîrxandina berfirehî ya serok pîmen e.

D: Serokê min, bi taybetî ew seha ku em jê hatine çemka azadiyê tam nehatiye tîgihîştin. Em jî tînegihîştibûn. Mînak, li ser navê azadiyê, li ser navê viyana azad ji zayenda dijber re bi temamî bertek raberkirin û redkirin hebû. Nêzîkatîyên bi vê şeweyê hebûn.

S.P: Erê, di hinekan de redkirin heye. Lê bele, ji vê redkirinê şunde ku fersend bibîne zevtkirin û gotina “Tu hebûniyeke zayendî ya bêteşe yî, ezê te wisa bi kar bînim” heye. Di bin wê de durûtiyek heye. Pêwîst e bê dîqatkirin. Yê/a herî zêde red dike, her qas dikare bibe xeternak. Pêwîst e, ew têkiliya seranser û şewaza têkiliyên ku bi hêsanî tên pejirandin, zêde neyê bawerkirin. Pêwîst e mijar di kûrahiya çawa ku me pêkaniye de bê destgirtin. Pêwîst e hindêk puxte bê destgirtin. Bi taybetî qismê jinê, divê qismê zilam baş nas bike. Niha bi vê rewşê ji we hemûyan re bê hiştin, têkiliyên ku hun pêş bixin wê bi seqetiyên ve dagirtûbin. Ji ber ku her kesê dibêje, “Ez PKKYî me” weke mirovan dihesibînin. Dema ku hun dikevin nava têkiliyê jî, hun diqedin, mahf dibin. Ezmûneya min pir net danî rastê ku rewş ne wisa ye. Ezmûne ya mezin, têkoşîna mezin heye. Pêdiviya we ya kûrbûn, ponijandin û azadiyê pir alî fêmkirin heye. Vê yekê gav bi gav di nava partiyê de bidine sepandin. Pêwîst e hun vê yekê hindêk bi hostayî çêbikin.

Ma li hember zayendîtiyê bertek, naxêr! Min zayendîtiyê jî di vê mijarê de hindêk gihandiye raveyê. Ez, hê jî hendazetiyeke mezin nîşan didim, da ku demxeya mulkiyetê ya li ser zayendîtiyê rabikim. Hema her roj dikarim bibêjim, keça ku dibêje, “Ez, ez im!” jî, taybetmendîya wê ya zayendîtiyê di bingehê mulkiyetê de pêşwazîkirin bi giranî ye ango di wateya zewqa bêteşe de dikeve nava nêzîkatiyê. Bi ya min her du jî hev û dî tamam dikin. Yek ber bi bûyera fahîşetiye ve dibe, ya din jî xwe bi hûrhûrîkirin dibe çil awayî firotinê. Min jî di ezmûneya xwe de vê di nêzîkatiya aliyê dijber de hindêk dît; zayendiya xwe tam tamam firotin. Di bingeh de rûyekê din ê vê fahîşetî ye. A di hundirê civakê de bi belavî tê jiyandin, mîna keke vê ye, yanî wek mulkiyetekî baş dîtin û firotin. Teşeyekê firotina ku eşkere bûye fahîşetî ye, ya din jî tenê bi zewacê pêk hatiye. Dibe ku zewacê wek damezrakeke fahîşetiye nanirxînim; evê şaş bê fêmkirin, nikare bê rakirin û min têxe rewşeke zor, lê zewac ez dikarim bibêjim ku fahîşetiya dumend e. A li derezewacê ye jî, fahîşetiya giştî ye.

Di bingeh de pêwîstî heye hem fahîşetiya giştî hem jî fahîşetiya dumendî bê vekirin. Di bingehê vê de gihandina hezkirina mezin dikare pêk were. Ev jî pêdiviya çalakiya şoreşgerî ya mezin û hêza ramanê bi xwe re pêwîst dike. Kesayetên ku pir ne xurt in, nikarin vê bigirin. Di vê nirxandinê de hezkirin, weke baweriyeke mezin û bi hêzê ve girêdayî ji rastê re hatiye daxistin. Ger ku bibe, ev tiştên ku min jimartine, dibe ku bîndêr baskirin. Li tîpên herî qirase binêrin, dema dikevin nav damezraka malbatê, bi rastî jî piştî yek-du salan ji fahîşetiye re rê vedikin. Çavê jinê jî, zilam jî li derve ye. Jin jî hezar caran dixapîne, zilam jî hezar caran dixapîne. Ev fahîşetiya dumendî nîn e, ma çi ye? Heta niha jî bêrî û hesreta min a herî mezin di van mijaran de derbaskirina fahîşetiye ye. Tebî ez nikarim durûtiya alîgirî tebat bikim. Yanî heya niha jî hindêk baweriya min bi min heye. Ez hê jî li pey mezinbûnê me, li pey hezkirinê me, li pey xurtkirinê me.

Lê têgihîştina piranî hevalan di asta têgînan de jî di rewşeke pir paş de ye. Gelek zilam, gelek jin bi regekî rast nêzîkê pênasa kar nabin. Lê dîsa jî şoreş hêvî ye, hêvî jî ber bi pêşketinên mezin ve rû digire. Çareserîya erzan nîn e.

Bi kurtasî, nêzîkatiya zayendî ya bêteşe bi rastî jî bêrêzdarî dike. Ez nikarim vê bi kesayetiya xwe re bidim pejirandin. Zewaceke wisa bibe, têkiliyêke taybet wisa bibe, têkiliya hesteke wisa bibe, ez jê re girtî me. Di bingeh de dîqat bikin, ez ji jinê re eleqeyêke bilind raber dikim û dixwazim wê bilind bikim. Di vê mijarê de jiyaneke pir cuda dixwazim derbasî şênberiyê bikim û ez bawerim ku, li qada navnetewî jî hindêk zor û bandorê dame çêkin. Lê heya niha jî weke peywireke rişt dibînim. Ev pirsgerêk ne bi înkarakîyê, ne bi hişkatiyê, ne bi serdestiya zilam, ne jî bi çemka erzanî ya “pêdiviya min heye” tê çareserkirin. Ger ku îro li hember dijmin min derbe nexwaribe, ji ber ku min li hember jinê derbe nexwariye û di vê mijarê de ez bi serkeftin bûme. Heke ku hewqas jinên azad li dora min dicivin, ji ber hin tiştên ku ez bidim van hene. Heke ku ez, qasî çî zilamê ku nikaribe, tevgera jinê dimeşînim, ev ji ber wê hêza ku ez gihîştîmê wisa ye. Di bingehê rêkxistinê de jî, şoreş heye, azadî heye. Nexwe çima ez wisa me? Çima yên din ne wisa ne? Min, li kesan zorê kirinê, bi hêza rêkxistinê û bi hêza otorîteyê jî kesî neaniye. Kûrkirina tevgerê azadiyê mijara gotinê ye. Ger ku pêwendîdariya we jê re hebe, hunê hewl bidin ji bo rê wergirtinê.

D: Serokê min, bandorkirina vê tevgerê li ser KTYê jî mijara gotinê ye. Bi taybetî bûna serokwezîr a Tansu Çîller encamê ji me bandorbûnê ye.

S.P: Tebî, KT li hember tevgera me ya jina azad, ji jor de bi Tansu Çîller bersîv daye. Ew jî di kesayetiya Tansu Çîller de dixwaze jinê bikişîne sehaya serokatiya dij-şoreşê. Bi rastî jî dema ku çû Kurdistanê û gelek jinan kişande sehaya perwerdehiya xwe, ev yek bi vê ve pêwendîdar e. Dîrekt bi bandora me Tansu Çîller derkete rastê. Jixwe di kongreya DYPê de binketina qismê zilam weke encamê çalakiya me bû. Yek jî pêşketina azadiya jinê, Tirkiyê wêrekdar kiriye. Bêtir jî heye; gotûbêja mezin a rewşenbîran di bingehê van dahûrînan de ye. Bandorbûna tevgera azadiya jinê ya li Tirkiyê jî bi şidet e. Ev teyisandina xwe dide organên çapemeniyê jî. Lê bi regekî çalexwarî, bi regekî ji puxtîyê vala derxistin çêdikin. Ji bo ku dij-şoreşê re ango jiyaneke ketûber re xizmet bike, vê bi kar tînin. Ew gelşekî cuda ye. Lê eşkereye ku pir bandordar e.

Divê mirov wêrek be. Bi misogerî qasî bastûra vacêka saxlem, bi hêza hêstên peşketî rasteqîna bingehîna a ku ji şer qut nebûye dîtîna, va di bingehê welatparêzî, dîrok, gel, partîbûyîn, rêkxistinbûyîn de bêyî ku berevajîketina berxwedêriya jiyana rojane ya şoreşgerî, pêşxistina hêza hest û hezkirinê girîng e. Tebî dîsa divê ku yên dixwazin çalexwarî bikin bînin dîtîna. A yekemîn de jin, hindêk wêrek dibe, azad dibe, lê gelek zilam ango çemkên serdestiya zilam hene ku dixwazin vê bi kar bînin. Ji ber ku hun zêde ne polîtîk in, di vê mijarê de we xwe zêde

negihandiye hêçandinê, ev yek dibe sedem ku hun qels bimînin û gelek xeletiyane re rê vebikin.

Bi kurtasî, hunê pejnker nêzîkê perwerdehiya xwe bibin, ji bo pêşketin û veguherîna kesayetiyê hunê qîmeteke bilind bidinê û zemîna partiyê zêde zêde binirxînin. Hunê di ber çav re borandinan her timî bikin, bermayan bavêjin. Hunê nûbûniyan li ser xwe kamil bikin û bizanin ku bi bendemayîn û hesretên erzan ev kar pêş de naçe. Ev dikarin we pêş de bibin. Dikarin tîpê milîtana azad ê jinê û asta azadbûna tevgera jinê pêş de bibin. Bi girêdana şoreşa giştî ve, li ba peywirên we yê pêşketinê, dikarin bibêjim ku peywireke we yê din jî wisa heye. Yanî ez hizir nakim ku yê pir aliyane ve nikarin wate bidin azadiya jinê, tevkariyekê bidin partîbûyîn û şerkirinê ango di hizir ku wê di vê mijarê de kêmbimîn. Ger hun bi xwe bawer bin, hun dikarin ya herî pîroz bibînin, bibihîsin û pevrebûyînê li ser zemînekê rasteqînê bidin rûniştandin. Hun dikarin vê, bi îdfaya xwe ve girêdayî, bi azweriya xwe ve girêdayî, bi bengîniya xwe ve girêdayî, bi şoreşgeriya xwe ve girêdayî pêk bînin. Lê dema hun vê nekin, ketina qeyranên erzan, afirandina astengan û di vê de pêkolîkirin jî, felişandinerî ye. Ger zêde bê heterkirin, wê ji vê re bê gotin “astengkirin” û were avêtin. Bêyî bikevin van rewşên wisa, ger zor be jî hunê xwe bidin rîya pîrozbûnê.

Niha rasteriya serokatiya PKKê wisa ye. Ji bo pêşvebirinê, bi xwesteka mezine tevlibûnê raber kirin, xwedîbûna meşa azadiyê ya pir baldar û pejnker, babetek e ku em tim li ber çavê xwe digirin. Serokatiya tevgerê di vî bingehtê de meşa xwe xurtir dike û hewl dide ku vê ji hemû binke û gel re bike mal. Bi vê wateyê, em nikarin xwesteka ku dixwaze meşa serkeftinê xurtir bike paşçav bikin.

Xebata me ya îro ji vê xebatê re hindê kêrahî da qezenckirin. Emê bixwazin ku bêtir bi şênberî gohdar bikin. Xwe di ber çavan re biborînin û pirs pêşxistinê berfirehî bikin. Bersîv bila misoger, encam wergirtî û bi taybetî jî di çonayetiya xizmeta perwerde û pratîkê de be. Di rabirdûyê de çî bûye bila bibe, wire û xîreta pêkanîna xwe neşikînin. Ez di hizir ku bi desteka me hunê karibin derketinê pêşketî çêbikin. Bi vê teşeyê layiqbûna bîranîna Berîtan (Gulnaz KARADAŞ) dikare pêk were.

**23 Tirmeh 1993**



“Ger hun xwestekên jinan pêk bînin,  
hunê gaveka qirase ya rizgariyê bavêjin”

## ÇAWA BIJÎN

Bi giştî her şoreş. di dirêjahiya pêvajoyên dirêj de pirseke herî bingehîn a ku dipirse, di derbarê pêwîstiya çawabûna jiyane de ye. Xwesteka filitandinê. Ji şewaza kevneşopiyên hînbûyî ku di radeyeke dawî de kevneperest in, ji pêşketinê re girtî ne û jiyane dixeniqînin, şûna jiyaneke tê de pir bervêdan peyda dibin ji nûyê re di vê bingehê de. Ji pêkhateyekê re bi eleqe û bi pirsê dest pê dike, ew hewldanên ku vê bi teorî û pratîka şoreşger ve pêş dixînin, pêwîst e di vê wateyê de ji pirsê wisa re bersîv bidin.

Şoreş, ji pirsê “Çawa Bijîn” re bersîv e. Şoreş tenê bi serê xwe ji bo pêşankirina pîvan û pratîkên leşkerî, siyasî û rêxistinî nîn e. Ev tev ji bo pêkanîna bine û seresaziya jiyaneke civakî ye. Ew hewldan in ku şûna teşeyên têkiliyên navbera kesan de, yê ku li ser zexta çexwarî, kedxwariya bi her cureyê û di vê bingehê de li ser derew û durûtiyê ne, ku bi hevpariya ji zext û kedxwariyê dûr ketiye û li ser keda hemû kesî ye, bi viyana wekhev û azad dixwazin ava bikin. Ev dîsa ew nirx in ku pêvajoyên şoreşê de pir tîrê dîqatkirin û tê xwestin ku cîbicî bibin. Azadî û sistematîka têkiliyên azad ji bo meznahiya her şoreşê bersîvekê çêdikin.

## Ez di bingehê bervêdan û bertek raberkirina her tiştî de gihîştin teorî û çalakiya şoreşger

---

Dikare bê gotin ku, rasteqîna Kurdistanê qasî ku bi çi welatî re neyê berawirdkirin sofînerî ya vê pirsê diçespîne û hewqas jî bersîva lezgînî dixwaze. Min xwest ku pratîka jiyana xwe bi kurtasî bidim. Çawa ku hun dizanin, di “Çîroka Vejnê” de pratîka jiyana xwe, ji zaroktiyê vir ve vegotibûm. Va, çawa di wirê de jî tê dîtin, hema ji her tiştî re bervêdan û bertek raber kirim; pergaleke ku hema her tişt di aleyhê de ye, dema ku min çavên xwe vekir venekir, li hemberê derketim û li dijî cîhana xeniqandîner bi sêrîrakirinekê çalakiya xwe ya yekem dame destpêkirin.

Şoreşgertiya me ya 1970yan pir şunde ye. Zarokî û salên min ên dibistanê jî di bingeh de, li ciyekî bi pergale re lihevnekirin, yanî di aliyekî de xwesteka pergale li xwe rikibandin, lê di aliyê din de jî jê filitandin e. Nakokiyên ku bi rêpîvan û bêsinciyên tên zanîn, rêpîvanên malbatî û rewşên aboriyê û hema bi her tiştî re tên jiyandin ber bi bervêdaneke mezin û ev dihêle ku li ser kesayetiyê zext û sêrîrakirinekê re rê bê vekirin. Min, hewqas sêrîrakirinekê çima guncaw dît? Xwendevanekî bi baldar dizane ku kesayetekî dixwaze rê vebike ji bo azadiyê, ji vê pê de bi çi awayî nikare tiştek çêbike. Di mercên hinek malbatan de dibe ku jiyana zaroktiyêke têrbûyî guncaw be. Yanî hinek malbat, bi derfet, axaftin û bi hêza xwe ya xistina bin temenê pergale, dikarin zarok tevî rîyeke wisa bikin. Zarok, ya ber bi olê ve, ya ber bi asta aborî ango di hundirê pergale de bi gor xwedî derfetên pêşveçûnê û dîsa bi gor rewşa otorîta malbatê tên perwerdekirin û dixine rê. Di vê bingehê de rêpîvanên ku cîbicî bûyîne hene. Îcar heke ku hinek jî rewş dest bidin ango mirov karibe xwe bi derfetan xwedî bike, rê wergirtin hewqas zor nîn e. Di temenê piçûk de dikevin vê riyê.

Tebî jin zêdetir di bin zexteke şidiyayî û di bin çavdêriyê de tên mezinkirin. Zêdetir rêpîvanên xedartir ser wan tên çespanandin; tê xwestin ku jiyaneke stûtewandî û rajêrî bipejirînin.

Dema ku min rewşa xwe kurtasî kir, bêşik dikarim bibêjim ku heman tişt ji bo min jî derbasdar bû. Yanî stemkariya malbatê, bêwateyî ya pergala gund û mercên bi her awayî şensê pêşketinê nadin; ew tiştên ku tu wek baş, rast û xweşik dizanî bi wana negihîştin, bêhêviya ku bi xwe re diafirîne û heta bertek, ew jiyana ku mirov bi dilê xwe nikare bibe... Mirov çi dixwaze, bersîv qasî ku tunebin hindik in. Yanî bi dilê xwe nikarî bigerî, nikarî bi zimanê xwe biaxivî û zêde xwedî çand nîn î. Nêvengên pir weş, şikîner û pêşketinê belên nakin, di vê mijarê de malbateke zêde hatiye pelîşandin. Bi taybetî jî di wateya malbata kevneşopî de pelîşandin û bêhêzî tê jiyandin. Va, ev tev hem egerên mirovên me ne, hem jî encam û armanc in.

Jiyana min, va wisa dest pê kir. Min çi dikir? Çi tiştê ji destê min nehatiba jî, derdiketim çiyê, ji malê direviam. Yanî mitleqa di nava mijûlahiyekê de bûm. Dema ku wan rojan tînim bîra xwe, di vê mijarê de ez têdigihîjim ku, di nava tevgerîneke wek cîwa de peyda dibûm. Hemin mijûlahiyekê peyda dikirim. Heta tevgera vala nesekinandinê hebû. Yanî ew mezinên ku pîvanên xwe yên taybet hene, çavên wan tim li ser min bû. Digotin, va virê xet kir, dest avêt virê. Dixwestin bi gora xwe pergalekê biçespînin. Tebî em jî pir bi tevger bûn. A ku me pêş dixist, bi yê cîdayî re şer bû. Ew pergala ku hemû pê qayilbûn, ez pê neqayil bûm. Ez li pey eleqedariyên cewaz, nêzîkatiyên cewaz, azweriyên cewaz, peroşmendên cewaz baz didam. Jiyanê ne bi rengê ku pergala dixwaze, di şêwaza ku li xweşê min diçû bû.

Divê pergala çawa be? Tebî di virê de jî pîrsa, “Çawa Bijîn” sotîner e. Bi min re bi çarenûsê nerazîbûn, çarenûsa ku ê din ji min re qayil dîtine nepejirandin û hewldana bi hêza xwe diyarkirina çarenûsa xwe hebû. Bi gotîneke rastir, ji jiyaneke wisa re bersîveke wisa hebû. Min negot, bêderfet e, zor e. Tevî ku hemû kes di radeyê dawî de, bi vê sincê re dibû yek, her ku ez çûm û çûm. Min ew tiştê ku xwesteka pîraniya hebû bigihîjinê, lê nedigihîştinê, esas girt; ew tiştê ku dixwestin biramin, lê nediramiyan, dixwestin çêbikin, lê çênedikirin, xwest vana çêbikim ango ew tiştên ku yên din dikin, ez naxwazim bikim re mijûl bûm. Ev qonax hemû, di bîngeh de, bertek e li hember wê jiyana ku tê çespanandin.

Di salên dibistanê de ango dema ku ez bi pergalekê re nasdarî bûm, min dîqatê rêpîvanan dikir. Di bîngeh de ev taktîkê jiyana min bû. Di xwiyangê de bi rêpîvan û rewatiya civakî ve pir girêdayî bûm. Lê di hundir de jî, bêyî lêpîrsîn nakim û min nedikir. Dîsa di cara yekem de pir girêdayî bûm. Lê ber bi çûyînê ve min bi kûrahî lêpîrsîn çêkir. Bi heman şeweyê hewl didam ku bi pergalekê re di nava ahengê de bim. Lê dîsa jî, berkekeke pir rehdar bi min re pêş diket. Bi mamoste û mezinên xwe ve pir dilsoz bûm; lê tim û tim mezinan lêpîrsîn dikirim. Ev di bîngeh de rewşa heyî bi awayekê anîna pêş çavan ango zêde gotûbêjnekirin, lê çawa ku hebe bi wî halî nepejirandin bû. Di bin re di bin re lêpîrsîna wê bike û ger derbaskirin pêwîst be, derbas bike. Min di wateyekê de li jiyaneke tim wisa nihêrî.

Hun jî pê re ahengekê nîşan didin, di hemû temenê xwe de jê dûr nabin, lêpîrsîn nakin ango rawetiya pergalekê qet nasnakî û ev jî dibe anarşîzma bêteşe. Ya vê neqlê bi gotîneke, “em pergalekê nasnakî” tenê wek li hember derketîneke ji bertekê peyda dibe ku ev yek jî ber bi binketîne ve dibe. Libat, bi anarşîstî û bi şêwaza ewanî çêdibin. Di bîngeh de bêrî, bi pergalekê re lêhatin e.

Bi vî awayî lêpîrsîneke ku rehdar dibe û pergalekê bi rehdarî di lêpîrsînekê de diborîne, pêk hat. Ez weke malbat, ol, hiqûq, pergala siyasî, xebata aborî, jiyana gund û bajêr, çi bûyer, kirû û têkilî nema ku bi rexnedarî nêzîk nebûm. Tebî min vana ji sala 1970yan vir ve gihand asta teoriyê. Di destpêkê de çawa ku we jî jiyabe, eleqe û bervêdan hebûn. Yanî hê rewşa bilindbûna teorî tunebû. Ev piştî

daneheviyekê çêbû û em tevlî vê bûn. Yanî piştî ku bingehê zanistiyê hate wergirtin, hemû bervêdan û lêpîrsînên xwe ber bi teoriyêke şoreşger, vê jî li Kurdistanê navê welat lê kirin, ta pêwîstiya nasname û xwe bi salan lêpîrsînkirin heta ku navdayîna weke xwedî nasnameyekê ve birim. Min vê ber bi çûyîna ve, teoriyêke partiyê, rêgezêke partiyê û koma pêşin ve gihand.

Ev, di heman demê de jî pîrsa “Çawa” re dibe bersîvek. Di gelala romanê de dema dest bi xebata komeke şoreşger hate kirin, min hewl da ku, ka di nava bersîvek çawa de vebêjim. Ji sala 1975an şunde komeke şoreşger dest bi xurtbûnê dike. Di bingeh de ev li hember pergale bi awayekê bersîvek e. Koma serhildêr, têkiliyên azad (di nav de jin jî hene) dîsa mirovên ku ji hawîrên cuda û herêmên cuda yên welatên din hatine hene. Ev yek di aliyekê de me têrbûyî dike û dibe bersîvek.

Li virê çawa dibe? Hun dizanin ku têkilî di radeyêke dawî de qels in, têkiliyên dilsoziyê tayê pembû ne. Eleqê û têkiliyên hevalbendiyê qels in, di bingeh de kê di hundirê civakê de çî be, vî dije. Malbata kê çî be, wê temsîl dike. Çîna kê çî be, wê temsîl dike. Heta hêviyên kê çî bin, di bingeh de ew e. Şoreşgertî modaya sala 1970yan bû. Yê me jî wek pêwîstiya modayê tevlî bibûn. Lewma guhertineke puxteyî û rehdar nehatibû destgirtin. Encam, bi têkiliyên me yên ku nabine şoreşger tim timî belavbûn çêbû; kom bi zehmetî pêş ket; rewşa arastenebûna teoriya rehdar û pratîka rêxistinî pêk hat. Bi seranserî nîrxandina qonaxê û veqetandinên hêsanî kete rojevê. Têkiliyên hevalbendiyê nû tîn pêşxistin û di van têkiliyan de, di bingeh de azwerî heye. Mirov dixwaze vana bîne asta girêdana herî bi îdîa. Lê têkiliyên hundirê pergale hewqas xurt in ku mînak, dibistan û malbat li ser her tiştî tîn girtin û ji ber vê egerê xwestek nîn e, hêz ji bo pratîka şoreşgerî bê dayîn. Lewma kom, wê pir li hewa bimîne û berjewendî li ku derê ferman bide wê li wê derê jê qut bike û biavêje.

Me di van salan de jana vê kişand. Şoreşgertiya erzan, hilweşandinên hêsanî û xwe zêde nedana pratîkê... Ez vê qonaxê weke qonaxa dilsozî û ramana hevalbendî, netew û welatparêziyê, mînanî qonaxa bi tayê pembû ve girêdayî dinirxînim.

Yên we jî pêvajoyên mînanî ve ku we jiyaye hene. Yanî pêvajoyêke girêdayê tayê pembû. Di bingeh de mebesta şoreşgerî heye. Tê xwestin girêdan û têkiliyên nû bîn avakirin. Lê berjewendî û pergale qet fersend nadin. Hemû perosmendî û azweriya min a wê demê, di vê wateyê de li zinar û kesayetiyên hişk dikevin û paş ve dizivirin ango xwe navegerînin dilsoziyên pir bandordar.

Tebî di heman demê de li wirê têkiliya jinekê jî heye. Li rexmî hemû mebesta baş, rasteqîna çîneyiyê pir hişk bû; rasteqîna malbatê li ser her tiştî serdest bû. Şoreşgertî hindê di xwiyangê de bû û wê girêdanên bingehîn ê bi devletê ve girê dida. Lewma têkiliyêke şoreşgerî zêde pêş nediket. Li rexmî tevahî zordayîn û hincet pêşxistina me, rasteqîna hişk bêtir giran derket. Dema ku şoreşgertî pêş ket,

çawa ku li wirê tê dîtin, kesayetiya pergâlê, kesayetiya ku bi hawîrên dewlet û hevkarmandên serdest ve girêdayî ye derdikeve pêş û xwe her ku diçe diçespîne û naxwaze ji serdestiya xwe dest berde. Di vê mijarê de bi her cure listokan diceribîne. Durûtî, bêrêzdarî û bêastî xwe zêdetirîn zirav diçespîne. Ji pergala xwe qayil e, wê hembêz dike. Eleqeyeke herî piçûk nîşanê têkiliya şoreşger nade. Ev, ew pêvajoya jiyana pir xeter a ku em dizanin ve encam girt. Tecrûbeyaya têkiliyeye şoreşger heye. Di bingeh de tevî ku gelek hincetên bîrdozî, siyasî û hwd. dihate rêzkirin û dîsa tevî ku pêwîstiyên welatparêzî û sosyalîzmê dihate bîrxistin, ev tev dikarbûn di axaftinê de bimînin. Kom pêş dikeve li hember vê, ew komê bi gor rasteqîna xwe eyar dike. Guherîn û veguherîn li aliyekê her tiştî bi gora xwe eyar dike; û her ku diçe vedigerîne berjewendiyên dewlet û malbatê. Jinantiya xwe jî di bingehê têgînên ku pergala weke, “pêwendiya taybet” ya jî “warê têkiliyên taybet” pênase dike, da ku girêdanên taybet bide pêşxistin, vê di bin navê zewacê de bi kar tîne. Ev tev di bingeh de têgînên formalîte ne. Yanî di hundirê pergâlê de navê wan hene, lê di pratîkê de çi aliyê wan ê rişt nîn e. Tê gotin rêpîvan û tenê tê fermankirin. Em jî dibêjin, bila wisa be.

Ev, bi ya min rewşeke jiyandina we hemûyan e. Va, dema ciwanek tê bîst saliya xwe, mitleqa yekî/ê dixwaze û pêwîstiya hezkirina yekî/ê bi xwe re dibîne. Bi ya min di virê de bi pergâlê ve girêdana koletî heye.

Ezê li virê hindê rastîna xwe vebikim. Di bingeh de li ser navê ku her kes di vî temenî de hindê tiştan dirame, ez ne evîndarê hizirandina vê bûm. Heta ez, hayjixwe bûm û li hember derdikevim. Min dixwest şewaza şoreşgertî pêş bixim. Lê çawa ku min got, bi şewaza şoreşgertî nedibû. Ji ber ku rewşeke mostere û derewînî hebû. Ez bi xeteriyê hesiyabûm. Yanî min dizanibû ku şewaza kevneperest, wê kesayetiye bixeniqîne û ji ber vê yekê jî neketim rewşeke wisa.

Li virê weke ku eleqeya we dikişîne, hun lêpirsînê dikin. Hinek ji we rewşên hestiyarî yên ku jiyane hene. Mîrov dikare bûyera hezkirinê hindê pêgirê nirxandinê bike. Ez eşkere li xwe mukir werim ku, wê demê min zêde bawer nedikir hezkirinê ango jê hatin hezkirinê, wê pêk were. Gelo we çawa ceriband? Bûyera hezkirinê û jê hatin hezkirinê we çawa jiya? Min, wan çilûheşt pirsan ji ber vê bûyerê pirs kiribû. Mîrov dikare di ciyekî di van hemû pirsan wiha daxîne pîrseke bingehîn: Ma dema hezkirinê ye, ma nêvenga hezkirinê ye? Yanî di mercên welat û di rasteqîna civaka me de, gelo bi her awayî ev gengaz e yan na? Lê hemû kes hindê zêde van tiştan diceribînin. Bi ya min ev kevneşopiyek e. Ango pergâlê tiştê wisa eyar kiriye ku weke “her kes dike, tu jî bike”, “her kes dizewice tu jî bizewice”, “her kes dibê keç ango zilamek wisa, tu jî bibe” weke pîvanekê bi kar tî. Min, di bingeh de bi bevêdanê bersîv dayê. Yanî di lêpirsîna kesayetiya xwe de vê pîrsê çareser kir û min nexwest ku xwe wisa bibînim. Dema ku min xwest ez çêbikim jî, min xwest şewaza xwe bidim meşandin. Di heman demê de min xwest ku bi vîyan û hêza xwe çêbikim.

Di Kurdistanê de hêza mirov jî bi hewldana şoreşgerî dest pê dike. Hewldana şoreşgerî hêz dide avakirin û ev hêz jî ber bi viyanê ve dibe. Viyan jî ji têkiliyeke wisa re dikare wêrekî nîşan bide. Ez di wê baweriyê de me ku pêwîst e hezkirin wisa dest pê bike. Hezkirin ne bi gor sazîyên pergalê û ew hêza dide te, divê bi gor hêza te ya pêşxistina şoreşê dest pê bike. Tebî çawa ku min got ev nagihîje serkeftinê. Ji ber ku pergal bi xwe astengeke mezin e. Weke latekî li te dikeve û te vala derdixe.

Di pêvajoya şoreşger a piştê de bûyera hezkirinê ku hate gihandin zelaliyê, ger bibe bibe di şeweyeke tund bersîvdayîna li hember nêvenga bêrêzdarî ya mezin a heyî û nêvenga nakokî ya mezin û zextkar dikare pêş bikeve. Têkiliyên heyî, têkiliyên kirîn û firotinê ne. Ha ji te re hewqas qalan, ha ji te re vê keç ya jî vî xortî filan dewlemendî, ha ji te re hewqas zêr, cilûberk... Vana tev di bingeh de aliyên pêşxistina bêrêzdarî ya kar e. Ma jixwe ramana xwe nîn e, civakbûna xwe nîn e, siyaseta xwe nîn e, hêza xwe nîn e. Bi pere û pulan, bi cilûberkên rengûreng dixwazin hev û dî bixapînin. Ji ber wê yekê jî eleqeya me nekişand. Min vê wek bêrêzdarî dît û hesiband. Lewma me girt hundirê pêvajoya lêpirsînê. Va, min negot, “her kes nas û zarokên xwe hene, bila rewşeke min jî ya wisa hebe.” Temam rewşeke min a wisa çêbû, lê ez radest nebûm. Aliyê xwe yê herî balkêş jî ev der e. Di hundirê kar de çiqas hest hebin bila hebin (aliyê me yê herî bi avantaj jî ev e) dema ku bi nirxên bingehîn ve kete nava nakokîyan, dîlnebûna hestan girîng e. Yanî girêdana partiyê li ser hestan dîtin, bi ya min bûyereke mezin e. Heke ku min pir zehmetî kişandibe jî, min vê hêzê nîşan daye û xistina riya welat pêk aniye. Va, di vê derê de li têkiliyê gerîn girîng e. Nirxandineke bi hingaf e. Ez neketime nava “pir hez dikim, di oxira hezkirina xwe de cîhanê dişewitînim, ezê xwe bikim xwelî” nêzîkatîyên sivik ên wisa. Min tim xwestiye ku ya dijberê xwe bikişînim.

Ev, riyek e ku li Kurdistanê belkî jî zilamek yekem car diceribîne. Zilamê herî qirase yê Kurd jî, ji bo malbatê, ji bo perçeyek zevî, ji bo jinekê dikare bibe mirovkuj. Heta dikare ji bo mirîşkekê şer bike; bi egera dijunekê sihêl dikare bikeve nava şer. Lê dema ku dor tê dilsoziyeke bingehîn, bibêjî “werin em di oxira welatê xwe de, di oxira gelê xwe de, di oxira azadiya xwe de hinek tiştan bikin” nayên. Îcar ji bo vana ji malbata xwe, ji mal û mulkê xwe devjêberdan ne gengaz e. Tu nikarî wî bikişîni. Yên ku dibêjin, em hene jî, ew tîpên axayê feodal yê hevkarmandên kevin ê mîna Barzanî ne. Vi karî ji bo firotinê dikin. Kurdayetîya wan mînanî têkiliyên kirîn û firotinê ne. Tê wê wateyê ku ferqa min heye û ev pir girîng e, heta dikarim bibêjim ku tekane ye. Ev mirovên ku pir qîmet didamê, ji malbat û pergalê qut nedibûn û hêza xwe tevî hêza me nedikirin. Ango dixwestin yek bidin, deh bistînin.

## Li hember faşizma 12 Rezberê me doza azadiyê vegerand rastîna jiyana gelekê

---

Îro 12 Rezber 1993 ye. Derbeya 12 Rezberê çawa ku di salên pêşî de bi sirûdên leşkerî derbas dibûn û digotin ya tev ya hîç. Bi rastî jî di salên 1980yan de ku di qonaxa tarîtiya dîrokê de em li ber tunebûnekê bûn, van salên zextê me çawa rakir û çawa pêşwazî kir? Dibe ku niha pir hêsanî were. Em dikarin bibêjin em xurt in û emê ser bikevin. Lê ez hewqas ne rihet im. Serpirîştîya giştî ya Tirk di rojnameyên îro de dibêje “emê heya biharê tune bikin.” Bi rastî pêşî digotin emê di navbera çilûheşt demjimêran de tune bikin. Niha jî, ji biharê talox dikin heya biharê. Ev, ka çiqas lewaz ketiye nîşan dide. Yek jî ka kî wê kê tune bike ev jî mijara gotûbêjeke cuda ye. Lê dîsa jî mebestê tîne ziman, hem jî di asta herî jor de. Di dest de tiştê tunebû, yek kadro hebû. Heke ku çend milîtan peyda bibin jî, ew jî wek baruteke çend avêtinî ye. Hêvî û nêvenga bêçaretîyê hindê bibînin, çalakî û berxwedêriya mirov bibînin. Mirov çawa xurt dibe? Vê bi teşeyekê baş fêhm bikin. Azîm û viyana we heye. Lê hun çiqas dibine çare? Zanîn ne bes e, jiyandina zindan û îşkencê rewşê bêtir xirab dike.

Dema cara pêşîn ez hatim vê sehayê, rê hevalê min ê hêja ku bi min re cara yekem derketibû rê, xaniyekî yek ode peyda kiribû. Sedreke text û nivînekî singer hebû. Tê bîra min, li wê derê roja me ya yekem de me çend zeytun û fîringî peyda kir. Bi rastî jî em du kes bûn û me wisa derbas kir. Bi nan û pîvazan me debar kir. Emê çend heftî li ber xwe bidin ne diyar bû. Bi derveyê welat re, bi rêxistinên Rojhilata Navîn re bi tu awayî têkiliyên me tune bûn. Hun dibinin, îro ez li virê me, bi sed hezaran mirov li piya ne. Her roj bi dehan leşkerên dijmin diterpilin. Rojane mesrefên me çiqas e, hun dizanin. Dema me dest pê kir, em deyndar bûn. Ev çîroka xwe ya sêzdeh-çardeh salan heye. Rê çawa hatin derbaskirin, roj çawa bi helkehelkê hate borandin? Me xwe çawa eyar kir? Pêwîst e weke bingehîn waneyên jiyane yên fêrker bèn dîtin. Ez hizir nakim ku di dîrokê de mîna keke wisa cuda ku xwe bi vî awayî dabe kar hebe. Ji ber ku têgihîştina vê pêk nayê, her kes erkdariya pêwîst û karê dikeve ser mil nizane bike.

Derbeya 12ê Rezberê, tevgerê ku di cîhanê de ya herî faşîst, ji hêla emperyalîzmê ve ya hêrî zêde hatiye destekkirin, di hundir de desteka raya giştî bi wateyeke mitlaq pêk aniye û şensê serkeftinê sedîsed hatiye plankirin bû. Jixwe kesî li pey xwe jî nenihêrî. Em hedefê vê derbeyê bûn û belkî jî hêzekî ku herî zû bèn qedandin bûn. Wek mucîzeyekê tê. Hê jî di nava gotûbêjeke mezin de tê peydakirin. Lê li hember dijmin berxwedan û serkeftin rewşeke pêkhatî ye. Me vê zû de derbas kir. Tenê ne berxwedan, tenê ne pêşketina siyasî û leşkerî xistina bin ewlariyê, ev tev di astên mezin de ne. A herî girîng giyana xwe ji nû ve

qezenckirin e. Ji nû ve çêkirina kesayetiya azad pêşketineke mezin e. Her şoreş di wateyekê de bi kesayetiyên kevin tên çêkirin. Şoreşa ku bi kesayetiyên kevin bên çêkirin sedemê çerçkirina paş ve û piştê jî felaketên ku werin serê şoreşê ne. Dikare bê gotin ku, li vê derê di heman demê de, hemû kesayetiyên ku bi paş ve çerç bikin, yekem car dana veguhertin mijara gotinê ye. Kesayet di vê derê de heya dawiyê tên dahûrandin. Tevahî nîşanên vegera welat tên derbaskirin. A di partiya Bolşevîk de nehatiye çêkirin, di PKKê de hatiye çêkirin. Hewl hatiye dayîn ku şoreşa Kurdistanê bi her cure pêşgiriyan bê astengkirin. Lê PKK jî hewqas kûr dibe. Ev jî destkeftê e. Ev, di hundirê welatekî ku nav û navdêriya wî ji bîr bûye û di nav rasteqîneke gelê ku kesek jê re nasname layiq nabîne de tê çêkirin. Ev rasteqînên eşkere ne.

A pêkhatî tenê ne bi aliyekê ve, pêwîst e bi hemû aliyan ve bê dîtin. Ev ji bo kesayetekê/î xwedî îdîa û milîtanekê/î girîngiyê mezin hildigire. Di vê bingehe de cîhan jî were serê, wê bi hêsanî neperçiqe û berevajî serkeftina wê bi temamî hatiye ewlayîkirin. Kurtasî me biriya xwe da serê û me heya virê anî.

Ev çawa çêbû? Em dikarin çawa egerên wê, ê wenda dike, ê qezenc bûye, ê dide qezenckirin pênase bikin? Birame, mitale bike, binivîse, xet bike... Heta ev tevgerêke pir dewlemend e. Di kîjan bingehe de pêşketin çêbûn? Ez, bixwebawer im. Qasî ku bixwebawer im, ma gengaz e ku pêşketin pêk neyên? Em vê wek qonaxêke nû ya pêşketineke diyarî dibînin. Cokên ku ber bi binketinê ve diçin hatine xitimandin, ciyên rizî yên ku ber bi ketinê ve rû qermiçandibûn hatine avêtin. A dikare bije aj da, kete wê riyê. Ger xeta nebe û wek berê dubare neyê jiyîn, wê herî hindik me biwestîne. Ger ji xeta bîrdozî û siyasî ya ku araste dike, bêpêveberdan meş pêk were, ew cîhana ku di teşeyekê rewneq de dihate arezûkirin, wê bi serkeftinê pêk bîne.

Wate, li hember faşîzma 12 Reberê bi vî awayî bersîveke dîrokî û gerdûnî mijara gotinê ye. Ev, ne faşîzmeke ketûber e: Ji bo gelê Kurd tuneker e; ji bo gelê Tirk jî, tevgerêke faşîst, mitlaq xistiner û koledarî ye. Tevgerê e ku, emperyalîzma navnetewî bi tevahî destek didê. Tevgerê sepandinê e û bi her awayî paşverûtiya şewaza Hîtler jî li paş xwe dihêle. Me li hember vê, pêşketinê mezin pêk anî. Di demê paş de li ser vê bêtir wê bê sekinandin. Me doza azadiyê vegerand rasteqîna jiyana hemû gelekê û ev yek demxeya xwe li rasteqîna jiyana we tevan da. Rastîyên bingehe, rêgezên jiyana yên rehdar hene ku ev wisa bû. Puxte hindêk di van rêgezan de veşartî bû ku ev wisa bû. Rastîna ku ji vê re serokatî kir di vê mijarê de hem rastiye temsîl kir, hem jî gavên pratîk di cî de avêt ku ev wisa bû. Di rewşa berevajî de ji destê faşîzmê kitek mirov jî filitandin ne gengaz bû. Hinek rêveberên 12 Rezberê hê jî dijîn û her ku vê rewşê dibînin qehr dibin. Mînak Kenan Evren, digot “ger bişkoka leşkerê min bikeve ez heya seharê nikarim razê” lê mixabin niha di rojê de, ne tenê bişkoka leşkerekî, bist-sî belkî jî, bi sedan leşkerên wî dikevin. Hingê ev zilam wê bitepişe. Bi rastî jî

ditepişin. General wek zengil dilerizin. Halê wan ê li ser piya bimînin nîn e. Rewşa vana gaveke pir paşketî ye. Ji ber ku ev pişkek in û xwe bi kêşandin û pîvandinê amade kirine. Artêşa Tirk hêzeke herî rêkxistî û hêzeke herî komîserhev bû. Lê niha qehr dibin.

Baş e, kê vana anî vê rewşê? Şêwaz, tempo, teşeyê xebatê, hedan, rik, azwerî, bawerî û zanebûna wî çi bû? Çiqas hêz da, çiqas qadan pêş xist û anî halê dîrokî? Divê mirov bipirse. Ev salveger çî bûn? Di vê wateyê de waneyên dîrokî derxistin û ji bo xurtbûnê bingeh çêkirin pêwîst e. Qismek ji endamên partiyê erjenga van salan nedîtin. Qismekê girîng jî di van salan de pakrewan bûn. Lê em heya îro şahidê vê pêvajoyê ne. Em ji rasteqîna gel û netewekî ku ber bi qedanê ve diçû û neçar bû ku xwe bi ziman û nav bike, îro, me xwe gihand rastîneke gelekê ku dibêje “qezenckirina min nêzîk e!” Me, ji mirovên bêhenase, bi hezaran şervan li çiyayên azad bi jiyaneke çawa dixwazin ve anî rûbarê hev û bi jiyaneke ve kire yek. Pêwîst e em bi vana têbigihîjin û nav lê bikin. Çawa çêbû? Belkî nîrxandina teng û seranser a rojane têrî têgihîştina her tiştî neke. Şiroveyên curbicur nikarin her tiştî di zanebûnê de bi cî bikin. Kesayeteke şoreşger ku bi van rasteqînên mezin ve ne girêdayî be, nikare rastiyê temsîl bike û rola xwe bileyize.

A dibe li rastîna me dibe. Qasî dibe jî mirov dibêjin, “em westiyayî ne.” Halbûkî ji westanê çî berhem nemaye. Dema ku mirov pêk neyîne, rewş wisa dibe. Ez ji her kesî bêtir, ê ku di nava zorîyê de bûm. Di destpêkê de yê ku hate hedef girtin bûm, kesayetekî çarmedor hatî dorpêçkirin bûm. Lê çawa tevgeriyam, çawa biriya xwe damê û çawa berê xwe damê? Çawa gihîştim vê rewşê? Me şêwazeke wisa xist rastê, em bûn derbirîneke arasteyek wisa ku bi hêsanî pê nayê têgihîştin. Jixwe di berê de jî li hember rasteqîna faşîzma Tirk û kevneşopîya dagir û leyanê serî rakirin çêbibûn. Bi deh hezaran girse rabibûn ser piyan. Lê di navbera du heftiyên de her tiştê xwe wenda kiribûn. Xala xapînok a ku ev zilam harkiribû, digotin qet tiştek nemaye û ev çalakiya bi zanebûn a yek kesî ye. Heya 1980yan jî nîrxandina MÎTê, di texlîdekî wisa de bû ku dihate wateya ev kesayetekî bi zanebûn e. Ango digotin “çare çar di bin kontrolê de ye.” Bi vî awayî nêvengeke ku ew dizanibûn de bûm. “Hin tiştan difikire lê, rojane pêşgirî heye; ger em bixwazin emê di qasekê de nefesê lê biçîkînin.” Di vî biçimî de difikiriyam. Rast e, rojên ku me koma pêşîn derxiste rastê, rewş wisa bû. Da ku ez xwe bidime pejirandin, diviyabû sê-çar salan bijîm. Pîrsgirêka Kurd heye yan na, di vê mijarê de heya 1970yan bi şik û dudilî jiyam. Di navbera qonaxa 70-75an de da ku ez ji komeke piçûk re bidime pejirandin, min bi hewldaneke ji hezar delavan av tîne, raber kir. Da ku ez vana rabikim çalaktiyê, dîsa di navbera 75-80yan de me çalakiya propagandayê ya ku nehatiye dîtî bi rê ve bir. Da ku em tevbigerin û biryar bidin, em bi salan fikirîn.

Dem a ku ev hemû qewmîn pêk dihatin, dewletê me dixiste şûna mêşan. Digotin, “nikare ji ser masê jî rabe” Wê emê wisa bibin, ev yek nedihate hişê çî

kesî. Piştê dema ku dijmin têgihîşt pir metirsî ye, rejîmê guhert. Xeletiyêke mezin kir. Me ji destê xwe filitand. Azînen kontrolkirinê têr nekirin. Cara yekem ji destê vana binkeya kesayetiya xwe ya partiyê rizgar kirim. Hevgirtî çî bû, hesasiyet çî bû; ev cuda bûn. Me xwe, giyan û zanebûna xwe ji bin serdestiya hezar salan rizgar kir. Ger di vê astê de bê fikirandin, di wateyê de ev şerê namûs û rûmetê ye. Me, şerê rûmetê yê ku çî kes nikaribû bîne hîşê xwe, bi serê xwe da û vê yekê ber bi çûyînê ve zivirand partiyê.

Dema ku em hatine sala 1980yan, di bingeh de hewqas pêşketina her tiştî mucîzeyek bû. Ne ku jiyandina piştî sala 1980yan dema ku em hatin û li 1970yan sekinîn, em li xala ku me digot, “temenê me hewqas e. ev bi xwe jî hewldan û serkeftineke mezin e” de bûn. Ew destê MÎTê ku dirêj dibû, di qirika me de bû. Ez dihatim şopandin û ger bixwestana, wê min biqedandina. Dijmin, dema ku Heqî qetil kir, tenê xwest ku vê bide hîskirin. Pir hêsanî dikaribû mudaxele bike. Yani rewş wisa bû. Ev tevgerê esîl e. Di navenda Enqerê de, bi wateyê de di hembêza MÎTê de em ji tevgerê re rê didine vekirin. Ew jî bi gora xwe me dixê şûna pitikekî, lê piştê ka em pitikekî çawa ne, wê bi erjengî ferq bikira. Bi gotineke din, ew nêzikatiya bi wateya hespê truva wê bi erjeng bidîta. Ger ev nebana, derketina Kurdayetiyê ne gengaz bû. Rewşêke wisa di derketina komê de esas girtin ne gengaz bû.

Ev jî pêvajoyek bû. îcar di 1979an de ji Amedê derketin û vê yekê zivirandina partîbûnê û hindek jî vegerandina çalakiyan, her pêvajo bi serê xwe dîrokek e. Çawa ku min got, piştî 1980yan wêrekî nîşandana berxwedanê û berdehamkirina berxwedanê tiştên nayên bawerkirin bûn. Me van hemûyan çêkir. Min li jor jî got, mêjû 12ê Rezbera 1993yan e. General, kuştarker û artêşa Tirk a ku nikare gav bavêje qadan, li rexmî hemû dorpêçan serhildana Kurd a ku li ber xwe dide û radest nayê girtin, rasteqîna Kurdistanê ku xwe gihandiye cîhanê û meşa desthilatîyê ya ku zorê dide serkeftinê!..

Me bîst-bîstûpênç salên dawî ya jiyana xwe wisa borand. Netewek nîn e, komeke rişt ku bi xwe bawer e jî nîn e. Weke ku em bi derziyê bîrê bikolin, ji pêşketinan re me rê da vekirin. Ma navê welat heye, mêtîngeh e yan na? Ma te bawer kir, tu ji bo komekê heyî yan na, tu çiqas heyî, qiruşek perê te heye an na? Va, bi van hemû pirsan ve me dest bi kar kir. Va dê tu wisa di nava berpirsiyariyan de peyda bibî. Ger tu vana çenekî, tê wê wateyê ku tu bi vê tevgerê tenegehîştî. Yê ku tenegehîjin, rola xwe nikarin bileyizin. Yê ku mafê van rastînan nikarin bidin, nikarin pêşketinên şoreşgerî derxînin rastê. Li ser berxwedêriya zindanê, berxwedêriya çiya û bîranîna pakrewanan, mirov tenê dikare rastînan wisa binîrxîne û bi gor van rastînan ji nû de qezenc bike, bi tenegehîştina hêviyan û bi taybetî jî hêza viyana mezin binyadekê bide çêkirin. Em heya van rojan wisa hatin. Nirxandin, encam derxistin û xurtkirinê zanîn, peywira

her kadroyê partiyê û kesayetiya serkarî ye. Têgihîştina vê û xwedîbûna gavên mezin pêwîst e.

Min qala dîroka partiyê kir. Ev, dîrokek di cî de û xwedî wateyek mezin e. Heke ev wisa bê têgihîştin, di zanebûnê de hemû pirs û hema her mijar wê wateya baş peyda bike. Tevlîbûna gerîla û şoreşgerkirina jiyana civakê, yanî di her mijarê de van nêrînan bingeh girtin hatiye têgihîştin. Yên ku dikarin vê rasteriyê bigirin, ji her pirsê ku derkeve rastê re, di bingehê vê rasteriyê de dikarin bersîv bidin. Ez hêvî dikim ku, hun pêşketina xwe di vê çarçoveyê de çêtir kûr dikin, partîbûnê, heta leşkerbûnê bêtirîn rast û rasteqînî digirin dest. Di vê bingehê de ya ku qezenc dike PKK û berxwedêriya PKKê ye. Wê zêdetir jî bibe. Di vê de çawa ku tu şik peyda nabin, dikare di vê bingehê de ji jiyana înkarkar û nav pergala ku bi gor mercên mêtirgeriyê hatiye eyarkirin, qutbûn pêk bîne. Bi vî awayî jiyanekê bi xweserî ya me û pêwîst e em bi gor viyana xwe qezenc bikin, aj bide. Ev, ji nû de zayînekê rasteqînî ye; di nav mercên welatê me de jiyana azad roj bi roj bi viyana me ya puxtayî ve û bi çalakiya wê ve pêkanîn e. Ji bo mirovekî nirxa herî pîroz a ku mirov pê bide ev çalakî ye; bi rastî jî nirxa herî pîroz ev hilgavtina azadiya mezin e. Bijarteka jiyanê ya tikûtenê ku em karibin ji mirovên xwe re pêşwazî bikin ev bû, me karibû vê pêşkeş bikin. A girîng dayîna vê bû. Ji bo vê xwîna ku hatiye rijandin di cî de ye, êş û îşkenceya hatî kişandin di cî de ye. Heke ku qîmeta wê bê zanîn, mirov dikare xwe bigihîne bîçimê jiyanekê ku tê pejirandin û welatekî hatiye qezenckirin. Va, mirov jî ev e. Mirovê ku dibêje “ez dixwazim bijim, ez dixwazim çarenûsa xwe tayîn bikim” arezûyên wî jî ev in, xwe çêkirina wî jî dîsa ev e, wisa dibe. A hatiye çêkirin jî ev e.

Nexwe di sala 1993yan de li hember faşîzma 12ê Rezberê bi bersîvdayneke mezin, dema ku me karibû peywirên xwe binin cî, di vê bingehê de destpêkê ji bo pakrewanên me, ji bo êş û îşkenceya hatî kişandin, ji berxwedêrên zindanê û yên çiyên re û ew her kesê ku pê eleqedar dibe re ya herî baş daniye rastê. Di vê wateyê de jî li hember dîrokê bi eniyekê paqij û vekirî, li pêşberî paşerojê bi hêviyek mezin em radibîn û rê werdigirin. Bêguman encam serkeftin e.

Bi gor para xwe hewl dam ku herî kêma xeta çêbikim. Ew dilsoziya ku hemû heval nîşan û guzarîşt dikin, me afirand û pêş xist û hem jî bersîvdana herî baş pê da. Bêguman nixandina jiyana me bi xwe jî xeta hîmî ya van pêşketinan e. Mirovekî bi biryar û sozdayî, pêwîst e hîle û hemû stemkariyên dijmin zanibe; Li hember van derkeve, lê bi dijderketineke ku bi hêsan nahilweşe û nakeve esas bigire û xwe bigihîne asta jiyanekê. Ev ne di bîçimekî, “ezê li ber xwe bidim, êdî çiqas bihedirînim” de, nêzîkatiya kesayetiyeke ku dibêje, “mitlaqa emê bijîn û bidin jiyandin” de ye. Ji awayekî din re cî tune. Ji mirina bêdem û bêserkeftin re neqeb tune. Pêwîst e jiyan her hebe, wê kes nikaribe vê ji destê te bigire û bistîne: Me, di vê bingehê de nixdarî da jiyanê. Pêwîst e mezin birîdayîn û qezenckirina jiyanê, qasî hêza ramana mezin bûna xwediyê azweriyên mezin, hemû daneyên

jiyanê û azweriyan di vê bingehê de ponijandin û ji derveyê vê, çi tiştên peyda dibin re bê gotin, bisekine. Ger ji te jî bingeh bigire, pêwîst e li hember vê rê nedî çî kêmasî û nebesiyên herî piçûcîk jî. Şêwaza min ev e. Ger ku di vê wateyê de nebesî pêk hat, divê kesayet xwe jî nebexşîne. Da ku her kesî tevî vê bike, xebat û şêwaza lêxistinê ya nehatî dîtîna biçespîne, heke ku pêwîst bike hemû pergalê li hember xwe rakirin, tenê ji bo qezenckirina mirovekî jî ger bi vê daxistina her tiştî rastê û bi vî awayî li hember jiyanê rêzdariyê selimandin şert e. Qezenckirina wisa vegerandina rastîna mirovê ku dibêje, “ez bi rûmet im û ezê bi namûs bimînîm” û va, ne bi gotina “ez jî heme, ez jî mirovê vî welat û gelî me”, xwe pêkanîn hindêk bi vê nêzîkatiyê çêdibe. Îro ev desteka mezin ya gel, hezkirina mezin û rêzdariya mezin ji ber vê egerê ye. Di dîrokê de belkî jî cara yekem ew bêriya bi her kesî re peyda dibû û nedihat pêkanîn, me şensê pêkanînê dayê. Li rexmî hemû zorî û îşkenceyan bextiyariyeke mezin ji vê radibihîsin û pîroz dîkin.

### **Jina herî bedew, herî bi qîmet û ya herî zêde divê bê hezkirin, wê çawa derdikeve rastê**

---

A herî mezin, qîmeta ku min da têkiliyê, hêza dahûrandinê derdixiste asta netewî. Bi ihtimaleke mezin piraniya we dîlên têkiliyan in. Ji ber ku hun nebûne hêza çareseriyê, hun di têkiliyê de xeniqîne. Tebî ev jî dihêle ku ji asta milîtan û asta rêkxistin û şer re rê bide vekirin. Kesayetiyan ku ne dirende ne û zêde nikarin vekirinan pêk bînin, nikarin şoreşê çêkin. Kesayetiyan wisa nikarin bûyera hezkirinê bigirin dest û bedewbûneke wisa bijîn. Çavkaniya hezkirin û bedewbûnê ka çî ye, di bingeh de di van nirxandinan de veşartîye. Nêzîkatiya min ji jinê re ta ji zaroktiya min vir ve, jinê, hem dîlkêş û hem jî hêwlnak dîtîna ango jinê pîr xeternak dîtîna, hem jî karîna girtina taybetmendiyên wê ye. Min tim veqetandina yên kirêt in, qirêj û dîl in û yên xweşik û azad in, da çêkirin. Dema ku min xwest Hinekan berteref bikim, min hinekên din jî derxiste rastê. Ev, li ba min xetek e û îro ev xet cîhanê kiriye du qet: Cîhana azadiyan û cîhana dîlîtiyan. Hun dibînin ku ev, rê vedike ji avakariyeke û veguherîneke mezin re. Yanî niha çî têkilî peyda nîn in ku hindêk ber bi azadiyê ve bibim ango bidim pêşxistin. Heta dema ku kesayetiya keçeke ciwan didahûrînim, ger ku hindêk mebesta xwe di aliyê azadiyê de hebe, nevekirina wê nikare bibe mijara gotinê. Jixwe ez diçim ku derê, li wirê hema her kes radibe ser piyan û zindîbûnek pêş dikeve. Hema her keçeke ciwan hêz peyda dike û heta dixwaze ku xwe qezenc bike. Teşeyê wê tê guhertin, fîzîka wê pêş dikeve, zimanê wê pêş dikeve, giyana wê pêş dikeve û ev jî, ji hezkirineke rast re rê dide vekirin. Dibe ku zêdetir nehatibe ponijandin, Lê

ew t kiliy n mirov n me diki n n, va wisa derketine rast . Ger di asta ezm ney  de be j , ji pirs  “div  t kil   awa bin” re hindik z de bers v t n day n.

Di vir  de vacek heye, behremendiya nixrandin  heye. Qet ketina rew a hestan    ekirina ket b n  ne mijara gotin  ye. R zdar  heye. M nak ez bi xwe, di bingeh de pir sinc  me. Heta ji yek  oldar b tir taybetmendiye min  n sinc  hene. L , ji wan  d  z detir azad xwaz im. Yan  ji libatan   ew kesayetiye ku w  temsil dikin re, bi azad xwaz  n z k dibim. Ger ku ev jinek be, dib jim, “div  ez v  tevl  c hana azadiye bikim.” Ev j   waza n z katiyeke pir te edar e. L  d na xwe bidin , gelo hun wisa ne yan na? Hun dib jin, hest n me hene. Gelo hest n we  awa tevl  dibin? Di  waza feodal de ye, an di  waza koledar de ye ango di  waza burjuvaziye pi  k de ye? Ma pir z de, neheq   b naverok e? Ger di van hem yan de p van tune be, t  w  wateye ku hun xeternak in. Ez nikarim v   waz  bipejir nim. Dibe ku  wazeke we y  pir girt  j  hebe, ez w  j  nikarim bipejir nim. Ger tu hewqas girt    hewqas b dil b , ez  bib jim, tu  ore gerik   awa y ? M nak min  awa dil  gel  xwe ji xwe re da vekirin? Dil  we hem yan j  wisa vedikim. Hun  bib jin, ma wisa dibe? L  hun ne ar in ku xwe vebikin. Ji ber ku bi gora min dil nebe, b na  ore geriye j  nabe. Yeka/  ku bib je “min dil  xwe hedimandiye nav d rok , hedimandiye nav gor , min dil  xwe bi tay  pemb  ve daye gir dan” nikare bibe  ore ger. V   ekirin, li jiy n  heqaretkirin e.

Di nav refan de y n ket  hene. Ger ku ev fersend bib nin, dib jin, “d  em birevin.” We, v  ji ku der  derxist? Va, zilamek ango hinek ku li ciyek  t n hi tin, roja duyem n wan n z katiye ku bi  i r p vanan ve nabe yek   ne di  ore geriye re, ne j  nix n kevne opiye de peyda dibin, n z katiye xistok n  an didin. Dib jin “em netebit n” Va di nava me de j  derketin. Ev, ne hev   d  p rozkin e, li pey azwer    ajoyan xwe  uy n e.  er p   naxin. R kxistin tune, perwerde tune. Hev   d  peyda dikin   dixwazin bix nin. Hinek n wisa derketin   ew cezay  ku heq kirib n d tin. Di bingeh  cezakirina wan de, ne ku bi hev re t kil  p  xistin, xiyaret li peywir n xwe kirin heb . Ev n z katiyeke zayend tiya  awa ye ku, te ber bi hilwe andina yek ney  ve dibe? T kil  ava dik , ji peywir  direv . Ma qey t kiliya jin-zilam ango ya zayend tiye hewqas di  onayetiya s xurtiye de ye ku, te ber bi xiyaret  ve dibe? Ango dema ku tu v  digir  dest ma tu natirs ? Ger ku tu v  dizan , hing  tu  ima t kiliy n xwe ber bi aheng, hevseng, xurt   rastiye ve nab ?

Teb   waz gir ng e. T  gotin, “min xwe kontrol nekir.” Pi tre ye me dert    wek axayan dib je, “min jin  d t, min l   esipand   revand.” Jin j  wek ke en ku ji mal  direvin radibe   dib je, “min zilam d t   ez reviyam.” Te mala me  ewitand! Ma tu reviyay , ba  e li pa   i ma? Wisa nay  jiyandin. Ne zilam  wisa ne j  ke a wisa t  pejirandin. L   awa ku min got, di aliy  din de  waza min a n z katiye ji pirsgerik  re heye. Her roj hewqas di nava hewldanan de me.

Jina her  bedew, her  nixrdar, her  ya p w st e j  b  hezkirin w   awa derkeve rast ? Ev pirske ba  e. Y n ku dib jin, guneh e, n z ke jin  nay  b y n, di bingeh

de yên ku dibêjin, “dest li jinê nayê dirêjkirin” hene. Ev tê çi wateyê? Tu şerê jiyane didî. Jin jî perçeyekê jiyane yê nayê veqetandin e. Lê ev tiştin ku dibêjin, dest lê dirêj nekin û tevî nebin, hev û di xistin e. Teşeyekê din nafikirin. Ji hemûyan re navê “têkiliyên çilvirînê” danîne. Ji her têkiliyê re navê “têkiliyên çilvirînê” dayîn, di kîjan pîvanê de rast e? Erê, têkiliya çilvirînê heye, têkiliyên revandok hene, têkiliyên qasî xiyane xeternak hene. Lê bi ya min, ji her têkiliyê re navê têkiliyên çilvirînê danîn hindek zor e. Niha li ser zimanê hemû PKKê ye. Di dema pêş de ezê ji bo vekirinê hewl bidim. Çarçove diyar e, naverok diyar e, armancên wê diyar e; muhtemelen bi her awayî nirxan xurt dike. Di vê bingehe de pêşketina têkiliyekê pêk hatiye. Ew çilvirana di virê de çi ye? Bûyereke tevlibûnê, bûyereke hezkirinê, heta bûyera evîne pêş ketiye. Ev tev têgînên nû ne ango têgînên ku hewl tê dayîn ji nû ve bînin pêşxistin in. Na, dest bi dest dana hev, nizanîm di kîjan libatî de peydabûn, bi teşeyekê xeternak û çilvirîn de tê nirxandin. Tam nexweş!

Niha ez di virê de qala têkiliya zayendîtiya bêteşe nakim. Bila şaş neyê fêmkirin. Lê bûyereke flort a jirêzê, yanî ji hev û di hezkirin û mijara hêz wergirtinê, hema di cî de têkiliya çilvirînê hesibandin xeternak e. Na, ji ber ku ev di nava me de weke xiyane tê destgirtin, dibe ku wisa bin. Lê ku di şewaza em pêş dixin de bin, wisa nabin. Jineke ku bixwaze ji zilamekî hez bike, dikare hez bike. Dîsa zilamek dikare bixwaze di astên curbicur de ji jinekê hez bike. Ger tu astenga hezkirinê ji xwe re deynî, astenga tevlibûnê ji xwe re deynî, hingê tu çiqas azad î? Ma feodalîzmê jî vê nedixwest? Lê yên din jî mirov nikare birame, bi gotineke “min jî vê jinê re( ango zilamî re) tebat nekir, min xwe wenda kir” nabe! Yanî çawa dibe? Ma viyana azad dikare vê bipejirîne? Ma rast e ku kesayet xwe di têkiliyan de hewqas di rewşên nesaxlemî de bihêlin? Tebî kesek jî rast û durust wêrekiya dest avêtina van tiştan nîşan nade. Ya pir kevneperest û muhafezakar dimînin ango dema ku fersend peyda dikin hev û di direvînin. Ya jî di rewşa qîmpêanîna têkiliyên pir erzanî de mayîn heye. Ev ne nêzîkatiyên rêzdarî ne, li hember jiyane.

Mirovê Kurd dema ku ji nû de vedijî, divê ji hemû têgînan re nêzîkatiyên nû û rast çêbike. Pêwîst e em hem naverokê pêş bixin, ango di vê mijarê de pir wêrek bin. Em ew kes in ku jiyana xwe danîne rastê, xistine vê oxirê û ji her pirsgerêkê jiyane re wêrekane nêzîk dibin. Di vê mijarê de em xweperest nêzîk nabin. Ji ber ku hun fedaiyên gel in. Mirovên fedaî wê çima xweperest û xudbîn nêzîk bibin? Mirovekî wisa azad, zadegan û paqij nêzîk dibe. Çima ji bo jinê tim tê gotin, nêzîk nebin pir xeternak e? Çima tê gotin, bi qedal e û zilam bi xwe re dibe? Yê li pêşberê we ya herî hindik mirov e. Çima wisa bibe? Ev min ditirsînin. Carna ji xwe re dipirsim, “gelo ez şaş dikim, ma hewqas qîmet dayîna van keşan rast e?” Yanî ramana min tim wisa bi dudilî û nakokî pêş dikeve. Ma çima nebe û heta çima neyê vegerandin çavkaniya jiyaneke derasayî? Tebî ev di heman demê de

şerê çînayetî yê mezin e. Hê jî her roj em pê mijul dibin û her roj em ditêkoşin. Yanî rewsî pir eşkere ye, tê gotin hun serbest in. Kîjan ji we têkiliyeke ku mirov jê re bibêje, bravo dikare ava bike? Va çend heb hevalên me yên weke ku em bi teşeyekê “va, keçeke me ya ciwan xwe azad girt, xwe nexist; di têkiliyên bi zilaman re û her awayî têkiliyên xwe pîroz girt” karibin binirxînin hene?

Bi zilaman zêde ewleyî nîn e. Pîvan tune, rêpîvan tune. Tê çi biki ji zilamekî wisa? Tê dîtî ku di virê de şerekî rişt mijara gotinê ye û ev we tevan nêzîk de eleqedar dike. Hemû tiştên ku ez dikim, ji pîrsgirêkê re hindêk zêde nêzîkatiyekê wêrekî nîşan dayîn e. Hem ewle û wêrekiyê didim, hem jî bi dahûrînên mînak pîrsgirêkê hindêk vedikim. Tebî hun jî dikarin hindêkî din wêrekdar tevî bibin. Bêyî ku hun pîrsgirêkê çep û rast bikişînin ango bikevî nav lîberalizma burjuva yê kevneperest û xistok, divê em karibin şewaza xwe derxin rastê. Di bingeh de ev babetên wisa ne ku divê zêdetir berfireh bînin gotûbêjêkin. Lê hinek babet hene ku em dixwazin bi rengêkî kitekit bigirin dest. Ez, ji van hemûyan re tenê di asta hilkeftinê de nêzîkatiyekê nîşan didim.

Pêwîst e ji pîrsa “Çawa Bijîn” re bersîvên berfireh bînin dayîn. Di vê mijarê de hêza kesan hindêk jî bi dahûrîneriya ku bikevê ve girêdayî ye. Di virê de ji yê herî bawermend, ji yê herî kevneperest bêtir sincî û ji yê herî ku dibêje, ez azad im bêtir azadbûn pêwîst e. Di vê mijarê de ew helwesta ku em dibêjin, ya herî saxlem e, divê baş bê fêmkirin.

Yek jî em di qonaxa şoreşê de ne. Ev têkiliyên ku niha me ava kirine, ne têkiliyên asayî yên pergalê ne, têkiliyên destpêkirinê ne û têkiliyên qonaxêkê dîrokî ne. Têkiliyên ku bi we re ne, nikarin bibin têkiliyên ketûber. Yanî bi taybetî serokatî nikare têkiliyên taybet û takekesî pêş bixe. Ji têkiliyên taybet û takekesî zêdetir berê xwe dide welat ango nêzîkatiyên ku hemû zayenda jinê eleqedar dike pêş dixê. Divê asta jîneke giştî, taybetmendîya jîneke giştî wê çawa be, teşeyê têkiliyên ku pêwîst e bînin hezkirin wê çawa bînin avakirin? Ger hun bala xwe bidinê çawa ku hun di laboratuarekê de nirxekî didin afirandin wisa li van têkiliyan dinêrin. Ev bi gotineke, hema em têkiliyeke taybet ava bikin nabe. Ev kar, “hema em hev û di wisa girê bidin” ve jî nabe. Gelek tişt wê bînin gotûbêjêkin û bînin nirxandin. Wê li dawiyê ya herî saxlem, ya ji netew û gel re bibe mal û di asta pêşkeşiyê de ji civakê re bînin pêşwazîkirin dimîne. Pîrsa “têkiliyên jin-zilam ên saxlem, têkiliyên hevalbendîya saxlem, têkiliyên saxlem ên li ser bingehê viyana azad, têkiliyên paqij, bi rûmet û bi azwerî” wê çawa bin, sotîner û girîng e.

Dema ku ev tev tînin nirxandin, em peywîran ji bîr nakin. Peywîrên rêkxistinî, peywîrên çalakmendî, her cure peywîrên perwerdehiyê qasî şer zor in. Yanî pêşxistinî têkiliyên civakî û pêşxistinî têkiliyên hestiyarî zor in. Hest bi misogerî ne karê kesayetên lewaz e. Karê şervanên mezin e. Hest, ger ku bingeh ji pergalê digirin, bêşik paşverû ne. Bêwajî ger ku bi azweriyên şoreşger yên mezin ve

girêdayî bin, pir nirxdar in. Çawa ku min got, her hest û her têkiliyê wek “nîşana çilvirînê” bi nav kirin, jê kirin û avêtin xeternak e.

Em, ber bi çûyinê ve di bûyera Kurd de dahûrandin û gihîştina jiyana nû pêş dixin. Afirandina hezkirinê, diyarkirina asta rêzdariya mirovan û sererastkirina têkiliyên jin-zilam gihîneka herî girîng a vê ye. Pir eşkere ye, bi tonan nêzîkatiyên zilam ên nayên pejirandin hene. Dîsa wek deyzekê nêzîkatiyên kole yên ku bingehê ji keçan digirin hene. Heta ku em van tevan bi pergala nekin, emê kengê karibin partiyê bînin halê pêşeng partiyê? Ma em nikarin di Kurdistanê de ji hêz û sazgehên mêtînger li benda çareseriyê bimînin! Modela jin a Tirk, modela jin-zilam a Tirk, modela kemalist çi da jinê? Dikare çi bide me? Heta emperyalîzm dikare çi bide? Kevneşopiyên malbata feodal, welat anîne çi halî li rastê ye. Wê her tiştî tu pêk binî. Ji ber vê yekê ya ku hun ji min bixwazin nêvengeke zêdetir azad, gotûbêj û ramandina zêdetir azad û rasteqîna tevlibûna zêdetir azad e. Ev jî hene. Niha em wisa pêş dixin. Bi kêr tê, pêşketin jî watedar in. Hun ciwan in, hê gelek riya hun wergirin heye. Hun, weke jinan xwe zêdetir pêgirê kûrbûnê bikin. Xwe bînin halekî pîralî, bi viyan, hatiye ronahîkirin û xurt bûye. Ji hemû aliyên xwe re, ji her taybetmendiyên xwe re di wateyekê dardingî û arîştî de teşe dayîn pêwîst e. Yani her têkiliyê ku êdî ya we ye, hun dikarin bixin rojevê. Ev xwe peydakirin e, xwe heyî kirin e. Çawa ku tê gotin “jin navê xwe heye , bi we nîn e” ya divê tenê ne bi “nav heye” qîm bê anîn, gihîştina rasteqîna “bi xwe jî heye” ye. Ez pir zêde eleqe nîşanê vê didim. Yanî jineke heyî derxistina rastê, jineke wisa heyî kirin bûyereke pir girîng e.

Di nava me de jin pir kirêt, pir xeternak e. Jina ku wê bibe heyî bûyereke pir bi nirxdar e. Pêwîst e ev neyê çalexwarîkirin û ji qîmeta wê neyê daxistin. Jinekê heyî kirin, heyîkirina netewekê ye; partiyê dana azadkirin, jiyane gihîştandina hêzeke rewneq e. Lê çawa ku min got, ev yek di wî teşeyê ku hun dikin de qet nabe. Ev bi salan e ez pê mijûl dibim, lê heya niha jî tam pêk neanîme. Hê jî ez zorê didim xwe. Jixwe malbat damezrakeke ku me diqedîne. Heya ku girêdan bi her awayî neyên pêşxistin, ma ez dikarim xwe tevî nava çerxa wê bikim? Yeka ku di malbatê de, civakê de û hem jî di bin navê têkiliya azad de min hewqas bixwe, bixeniqîne û biqurtîne, di vê rewşê de ma çima ezê xwe pê de berdim? Ezê bimirim, lê ezê xwe saxlem bigirim.

Niha ev pirs ji bo we bêtir sotîner e. Kê bi destê we bigire, roja duyemîn dikare we bixîne. We kîjan zilamî pêş xist? We kîjan zilamî gihand viyana azad û wekhev? Hun çi qas pê ewle dibin? Divê ji bo vê yekê hun hindek xwe lêpîrsîn bikin. Beriya azwerî û hestan divê hun bibêjin, “ev têkiliya em pê rû bi rû mane çi ye?” Ez dibînim ku hun tev hindik zêde hatine xapandin û piştre jî ev li serê min dibe bela.

Tebî pêwîst e mirov rêzdar be. Hindek di asta netew de birame. Jina rastîn puxte bi puxte pêwîst e wisa be, divê bibe alîgir û hêza çareseriyê jiyane. Kîjan

hevala me ya jin vê yekê ji xwe re kiriye pirsgirêk? Ev, qet ne diyar e. Heye yan tune ye, ma xwediyê nêrînekê ye, xebata wê heye yan na? Ez hizir nakim ku bi min jî têdigihîjin. Li paş min bi awayekî, li pêş min bi awayekî. Ez wateyekê jî nadimê. Va, çawa ku min qala wê kir, ew têkiliya feodal, tîpê ku têkiliya mal-mulkê diçespîne, dixwaze bi wan numereyên jineka sihêl girê bide. Ya min hindêk hêza min heye. Bikaranîna vê hêza min ve, yekser û bi teşeyekê pir kerax dixwaze were ser kar. Li ser wê zayendîtiya ku pêwîst e azad bê jiyandin û bibe rûmeta mirov, siyasetê ava dike. Va, wisa dibêje, “zilamê Kurd bi zayendîtiyê ve pir girêdayî ye, wisa dikare bê kirîn; yek jî ji bo jinê gelşa namûsê ye.” Wisa destgirtina zayendîtiyê, bêsinciya herî mezin e. Sinc û namûs di ku dera vê de ye? Tebî dema ku ez vê napejirînim, tê gotin “çima ev zilam wisa ye?” Wê vexwendiyê azadiyê dikim, tê gotin, “naxêr! Em tenê dikarin zayendîtiya xwe hewqas bazar bikin.” Ez dibêjim, naxêr! Tu tenê dikarî zayendîtiya xwe bi xwezayî bijî. Ger tu bi xwazayî nejiyayî, tu sextekarek î!

Gotinên mîna, “hewqas xweperest, hewqas xwediyê mal-mulk” di nav çemka min a şoreşgerî de cî nagirin. Şer di vê bingehê de hindêk pêş dikeve û tund e. Di bingeh de ji lêkolînê re mijareke nixdar e. Yanî viyana azad bi hêsanî pêş nakeve. Tê gotin, “Çima hewqas li ser vê disekinin?” Helbet pêwîst e, em li ser bi berfirehî bisekinin. Heta hun çima tevî nabin, hun çima li pêş dibine asteng, divê hun hindêk vê fêhm bikin. Lê min sepaniyê ku qîmeteke mezin didim azadiya we. Vîyan û zanebûna we ya azad serî rakirî ye. Derfet û fersend ketine dest. Hun nikarin înkâr bikin ku jiyana niha ji ya kevin bi qîmetir e. Jiyana niha pir bilindtir e û biryara we pêş dikeve. Ev jî bingehê rêzdariya mirov e.

## **A ku em dikin, şerê heyînê ye li hember her tiştê ku li ser jîyanê gefê dikin**

---

Ev gotûbêj wisa bi rê ve diçin. Hun jî berfirehî tevî bibin. Ez hizir dikim ku ji pîrsa “Çawa Bijîn” re bersîvdâyîneke ku ji hemû netew re bibe mal û heta nix tevî mirovatîyê bike, gengaz e. Ez hewl didim ku çarçoveya gotûbêjê wisa bidim pêşxistin. Gelo hêza nêzîkatiya we çawa ye? Tebî eleqê û nêzîkatîyên we jî qîmetekê diderbirînin. Ji ber ev ne wisa ye ku karibe yekalî pêk were. Divê hun xwe tevî bikin. Hizir dikim ya herî rast ev e. Kêmasiya xwe heye yan na, nizanîm. Dibe ku hinek babetên zêdetir bixwazin bîn vekirin hebin. Di destpêkê de jî min got. Derfetên ku hun dikarin herî zêde rehet bin, ji her pirsgirêkê girîng re, ji her tiştêkî ku wek tabûyê tê dîtin re pir hêsan nêzîkbûnê nîşan bidin hene. Em dibêjin, çî bextewarî ye ku bi destê xwe em ji nû ve mirovên xwe diafirînin. Mirovatî vê fersendê bi dest girtiye. Ez rewşa we nizanîm. Rewşa min ji bo

gotûbêjkirinê hindek derfet dide. Weke kesekî li pêşberî we hem wêrekî dayîn hem jî, bûyîna min di hêza çareseriyê de zemînekê pêşkeşkirin mijara gotinê ye. Hunê vê rast binirxînin. Di her halî de hunê gelek hêz bigirin û tebî di vê navberê de jî tevî bibin. Hun tev dikarin bibin namzetekê hevalbendiya baş.

Di rewşa we de gava ku têtetina têtikiliyan pêk tê, bi ihtîmaleke mezin bi aliyên rizî ve, yên ku ne saxlem in têtetin çêdibe. Yanî di bingeh de ya ku tê parastin, ew genên in ku we bi pergalê û bi rasteqîna civakê ve girê didin. Cewaziyeye min a din jî di virê de dest pê dike. Min xwe bîst salan bi rengkî rewneq tevî têtikiliyan kir. Mirov dikare bibêje ku di nava yên heyî de, ev şewaza tevîkirina herî xurt e. Ez bi hemû heza xwe ve ji lîstikê re heme. Ji bo avakirina rêxistinê bi hemû rişta xwe ve heme. Li gelek elemanê rêxistinê dinêrî, wek fantaziyekê dibînin, weke ku demên xwe yên vala binirxînin dibînin. Dîsa dibistan û malbata wan, çareçar didome. Cewazî di vê derê de bû. Şoreşgertiyê weke fantaziyekê, weke luksekê, weke modayekê layiqê xwe didîtin. Tebî dema ku ev wisa dibû, ew têtikiliyên ku digotin şoreşgerî ne, di qîmeteke ku pir xapînok, ji puxte qut, zêde kûrbûn nîn e, bi rehetî tê karanîn, pê tê leyistin û tê hêlîştin dima. Di vê xalê de berxwedêriya me her ku çû pêş ket. Her wekî ku şoreş, tiştêkî herî nirxdar e, wê gavê divê mirov bi hemû hêza xwe û bi hemû aliyên herî nirxdar ve xwe tevî bike. Hun dizanin ku ev vejeriya şerê rêxistineke mezin. Me bi rengkî rewneq biriya xwe da ser rêxistinê, afirandina rêxistinê, ew hêza ku me di têtikiliyên takekesî de nikaribû pêk anîba, lêgerîna nav rêxistinê da ku em pêk bînin, pêşxistina bîrdozî û siyaseta nav rêxistinê û tim û tim da pratîkê. Ev ji çi re bersîv e? Ev, di bingeh de ji pergalê û di nava pergalê de ew hevalbendiya ku me nikaribû peyda bikira jê re bersîvekê mezin bû.

Li wirê têtikiliyên xwe yên bingehîn di gelala romanê de datînim rastê. Ger hun bala bidinê, di şewazeke pir balkêş de ye. Di aliyekî de eleqeyên min ên rewneq, nêzîkatiyên min û heza min a kêşvan, di aliyê din de jî kevneperestiya awarte ya aliyê dijber, sarîtî û xeniqokî ya wek qeşayê, di bingeh de rewşeke ku wê bi ku derê ve bibe nediyar e... Bi can e yan ne bi can e, ew jî ne diyar e. Carna wek marekî gezoker, dîsa carna wek marekî sar, lê dîsa jî kişîkîşînek heye. Ez çima dev jê bernadim? Ew çema vê şewazê terk nake? Gelala romanê hindek jî vê têtikiliyê di naveroka xwe de peyda dike. Ji ber vê yekê bingeh digire: Di bingeh de gengaz e ku têtikilî neyê avakirin, dikare hema di cî dê terk bike, lê dikeve pey. Taybetmendiyekê din jî, va di vê derê de ye. Heya dawî neanîna têtikiliyekê dev jê bernedan ango ka çi ye û ne çi ye, eşkere kirin heye. Baş be baş e, xirab be xirab e; ger bibe bide jiyandin, ger bê avêtin bavêje. Bêtêkoşîn, bêhesab, bêlêpirsîn dev jê bernedan, lê di heman demê de qedandin... Yanî şewazake têtikiliyê... Ne her tiştê xwe di oxira wê de bişewitîne, ne jî nişkave xwe bide şewitandin! Na, hewl bide ku tu aliyê dijber fêhm û çareser bikî. Bi hizra min ev, di heman demê de şerê têtigihîştina peyvê ye, pêvajoya rexnedayîna wê ye. Ger bê dîqatkirin rexnedayîna

li wê derê pir balkêş e. Têkiliyê kom û partiyê, di komê de têkiliya jinekê û li wê derê têkiliya şer bi pergala civakî re pir bi hostayî, hem jî bi hedan û eleqeyê tê birêvebirin. Bi gor rêpîvanan tevgerîn, ger ku bi qasî serê derziyê puxteya pêşketinê hebe ji bo girtinê hewl dayîn, têkiliyeke ku hevalên milîtan yên nirxdar rojekê jî nikarin bitebitînin ango nêzîkatîya ku dixwestin bi mirinê ve ceza bikin, deh sal bi xedarî û ber bi çûyînê ve di astên bêheddar de wêrekî nîşandana jiyandinê heye. Tebî asta vê ya dewletê, herifandina li ser rêxistinê, lê bi vê ve girêdayî pêşketina rêxistinê jî mijareke nirxandina siyasî ya cuda ye. Ev der ne karê wêjeyê ye. Di encam de çi derket? Rexneyeke mezin li ser malbatê, dahûrîna jinê, ji vê derê pê ve encamên ku gihîştin çêbû; yanî encama “divê têkilî çawa bin” derket.

Asta têkiliyên di navbera mirovên Kurd de çi ye? Korgirêkên têkiliyê, têkiliyên mirî, têkiliyên bi tayê pembû ve girêdayî, îcar têkiliyên ku bi nirxên bilind ên bingehîn ve nehatine girêdan, pergala têkiliyên li welat û gelê xwe xiyamet, a ku bêhêz dikeve, ji dijmin re lavelav dike, pêşkeş dikişîne, wê çend pere bike? Di vê bingehê de têkiliyên jin-zilam çi ye? Ev têkilî li derdora zayendîtiyê bêteşe hatine avakirin. Me vê yekê baş derxiste zelaliyê: Dixwaze di jiyana gund de, dixwaze di ya bajar de, di bûyera Kurd de ji berjewendiyên bingehîn ên netewî, siyasî, çandî, heta civakî û aborî hewqas dûrxistin pêk hatiye ku, di vê bingehê de tunebûna nirxan di astekî hewqas pêşketî de ye ku, di destê mirovan de tenê û tenê ajoyên wan ên bêteşe mane. Ev çi ne? Ev ajoyên bîrçitîyê ne, ajoyên zayendîtiyê ne. Dema ku ev jî di bîçimekî herî bêteşe de tên peydakirin, bersîva wan dibê “ya rebî şikir, em îro jî ter bûn.” Di vê bingehê de qîma xwe bi nanekî ziwa û girarê bîne! Dîsa bi têkiliyeke jin-zilam ê herî bêteşe mal û mulkê esas bigire! Lêgerîna xweşikîyek herî piçûcîk û civakbûnê nîn e, îcar ramandîneke girêdayî bi bingehê siyasî ve qet nîn e. Çi ma li paş? Ger te xwarîneke savarê peyda kir, ji te re bravo! Ku te jin ango zilamek peyda kir, wê tu bibêjî “hebûn û tunebûna min ev e!” Bi rastî jî encam ev e. Dema ku tişt bi yekî tê dibêje, “hebûn û tunebûna min çû.” Xwe qediyayî dihesibîne. Ma cîhan hewqas e? Çi hat bi cîhana siyasî? Cîhana te ya leşkerî heye yan na? Cîhana te ya çandî û felsefî li ku derê ye?

Em dikarin bêtir vekin. Ma cîhan qet nîn e? Di mirovên Kurd de cîhan nîn e. Ji ber ku dijmin her tiştî ji dest girtiye. Ger bê dîqatkirin, rewşeke giyanî ya ku dijmin afirandiye heye. Bi taybet jî malbat vegeriyaye damezrakeke mezin çexwarîkirina mêtîngeriyê ango xistinê. Di vê dere de ji têkiliyê jin-zilam zêdetir, têkiliyeke rencdar, nayê kişandin û jiyanê jehr dike mijara gotinê ye. Ez bi xwe ji vê têkiliyê reviyam û bûm şoreşger. Her ku min têkilî û jiyana nayê tebatkirin ya di malbatê de didîtim, diketim nava erjengê û min xwe diavêt Enqerê, dibistan û şoreşgertiyê. Malbata Kurd kêma-zêde malbateke wisa ye. Dibe ku hinek malbatên hevkarmand cuda bin, lê asta gelemperî wisa ye. Ez hizir

dikim ku ya min jiyaye di ve mijarê de jiyana herî di quncik de ye; teşeyê têkiliya rewşa herî xizan, herî zor û herî bêdîa ye. Her wiha ji van têkiliyan bi lezginî qut dibim. Ev têkilî ji min re qet tiştê belên nakin, hingê dive ez bi xwe biafirînim. Yanî bi xwe birame, bi xwe peyda bike. Ev jî, di pîvanên awarte de rê vedike ji hewldanên min ên rê vekirin ango gihîştina nirx û şêwaza şoreşgerî re. Ez xwe ji her kesî zêdetir neçar hîs dikim. Ev dibe eger ku ez xwe tevî bikim, hewldanên xwe bipojînim bikim, hema hema bi her awayî peywirên şoreşê hambêz bikim. Teorî be teorî, çek be çek, ev yek dibe neçariya peyda kirina her tiştî.

Me di dirêjahiya vê pêvajoya nixandî de, ji bûyera nehezkirina mezin re pênasê çêkir. Min nihêrî ku, rasteqîna ku ez dijim, rasteqîna netewekî ye. Dema ku min wê rasteqîna rizîbûyî, êdî wisa bûye ku di derbarê wê de gihandina biryara “mirî ye” çêbûye ango fermana “wê bê kuştin” hatiye dayîn dît, wa hingê ber bi vejînê ve rê wergirtin û xwe bi gor wê afirandin pêwîst dikir.

Dîqat bikin, wateyê hewldanên min ên din jî, hewldanên vejînê ne. Ez vî navî hê lê nakim, hewldanên zindîkirinê ne. Hema hema her tiştê ku derdikeve pêşberî min perçiqandî, çilmisî, bêdîa, bêeleqe, bêcan, hindê ji jiyane dîr e. Jiyane bi min re hêz qezenc kir. Çima? Ev jî niha li Kurdistanê bûyereke mezin e. Min xwe çawa veşand çavkaniya jiyane? Ez barkêşê ramanê me; min xwe xistiye rewşa barkêşê hest, azwerî, hêz, çek bi kurtasî her tişt î. Ev tê çi wateyê? Ev, li hember dijmin ango li hember her tiştê ku li ser jiyane gef dike, şerê heyînê ye. Di vî mijarê de hewqas mezin dikim ku zorê didim asta netew û heta derbas dikim.

Hun dibînin ku, di vî bingehe de têkilî li ba min bêtir berfireh in; li ser bingehe zanistiyê ye, bingehe sincî û felsefî nû ye. Ya herî girîng jî bi hêz ve girêdayî ye. Yanî têkiliya şewazeke şoreşger e. Bi şer diafirînim û her tiştî di vî bingehe de belav dikim. Min xwe arasteyê pirsgerêka têkiliya jinê kir; di wirê de min berê xwe da koletiyê, bûyera kolekirinê û mal-mulkirinê. Min di hingekî de gelek endamên azad derxiste rastê. Di berê de ji jinekê pir û pir direviam. Tê bîra min, diçûm ba melê gund û jê dipirsyam, “jin di dawetê de dileyizin, ez li wana binêrim ma guneh e, yan xêr e?” wî jî digot, “di sêsed metreyî de dikarî binêrî, zêde guneh nayê jimartin.” Ez yekî wisa bûm ku, di qonaxekî de vî dijiyam. Lê niha ji pirsgerêka re tevlibûneke min a awarte heye. Di berê de pir keçeke ciwan û xortek ku dihatin ba hev hema digotin, “me hev û dî eciband, me çav berda hev” û diçûn. Niha hun dibînin: Qismê jinê hewqas pêşketiyê ku, keçên ciwan ên ku ji koletiyê rizgar bûne li hawîrdor me kom dibin, têkiliyê milîtan pêş dikevin, dibine artêş, hema hema baz didin hewldanên bi her awayî. Asta pir pêşketî û lêgerînên têkiliyê pir pêşketî hene. Hun tev ji dikarin têkiliyên pir berfireh pêş bixin. Wisa nixandîna pir teng nîn in, yek jî hevalbendîya pir berfireh û rewşa avakirina hevalbendiyê heye.

Hevalbendiya ku piraniya we di keviyê de derbas nedibû û hêz pê re peyda nedikir, em çawa pêş dixin? Dema ez hê zarok bûm azwerî ya min bû; min digot, pêwîst e jin jî di lîstikê de be, di jiyânê de cî bigire. Niha em ji vê re bersîva herî berfireh didin. Rasteqîna jinê ya ku civak derveyî dikir, niha bi têkoşînê hêdî hêdî xwe tevî nava jiyânê dike. Di berê de têkiliyeke jinê têkiliyekê zayendîtî yê herî bêteşe bû. Zilam ango jina herî gewre di vê mijarê de bi têkiliyeke pir bêteşe nêzîkê hev dibûn. Jixwe zewac jî wisa ne. Ez hizir nakim ku zilamekî Kurd di keçeke Kurd de hêza ramanê bigere, bawer nakim ku hêza gotûbêjê bigere. Jixwe tiştêkî wisa jî ne gengaz e. Çûyîna ba hev, bi teşeyekê tu kê yî, çi yî pirskirin jî tune. Ji dûr ve bi îşaret û nîşanên birû û çavan derbirîna ecibandinekê mijara gotinê ye. Ango nêzîkatiyeke wan hestên ku dikarim bibêjim kevnare û di hinav de pir zêde hatî xwedîkirin bi teşeyekê “rojekê emê hev bibînin û bigihîjin hev” serdest e. Di bingeh de min van tevan hilweşand û şikand. Xeyalên hesretê çî ne? Hestên kevnare çî ne? Heta ez dibêjim, ev tev xeternak in. Ya ku tu bijî, bibe, rast hez bike, hezkirina xwe eşkere bike. Tebî dema ku ez hezkirinê eşkere dikim rêpîvanan datînim. Li wirê te dikişînim ber bi welatparêziyê, azadibûnê, partîbûnê û şerkirinê. Ku tu egîr bî, di hezkirin û azweriya xwe de xurt bî, li wirê xwe nîşan bide. Egîrdî di van sehayan de dibe. Ji ber ku ev nebin, tu ne tiştêk î, penç pere qîmeta hezkirina te nabe.

Tebî ev bankirinên bi îdîa ne, bahaneyên egîdiya rasteqînî ne. Ku hebe, ji têkilî û rasteqîna keçên ciwan û xortan re wê tu bibêjî biravo! Ku pêk neyîne, jixwe miriye. Ango wê jiyana xwe deyne rastê û hezkirinê qezenc bike. Dema ku ez li derdora hewqas ban mirovan dikim mafdar im ango bi esasê têgihîştî me. Jiyan di vê bingehê de tê qezenckirin. Her wiha yên puxtedar in tevî dibin. Ev şewaza têkiliyeke nû ye. Keça ciwan a ku dibêje, “ez egîr im, bi îdîa me” wê li ba min be. Wekî din çare ya wê nîn e. Ji ber ku di vê qonaxê de yê ku vê mijarê herî zêde pêş dixê, zelaliyê dide qezenckirin û rast tevî dike ez im. Yanî dema tê gotin, bûyera serokatîyê ve xwe girê bidin, tê vê wateyê: Serokatî di aliyê dîrokî û civakî de, di vê qonaxê de dibe hêza hîmî ya dahûrîner. Hêz û têkiliyê din zêde mirov nadin jiyandin. Ew têkiliyên we yên ku bi rêxistin, zilam, jin, malbat ango rêveberiyê re hene, yanî çawa dibe bila bibe, di her aliyê de têrbûnê çênake. Aliyekî vê yê din jî, zêde hezkirin û rêzdarî tevî jiyana mirov nake. Çima? Ji ber ku kêr e û serkeftina xwe tune. Zilam bawêriya xwe ya şoreşê hebe jî, ka wê çiqas karibe çêbike diyar e. Ne şoreşgerekî xurt e. Ji ber vê yekê jî nikare te bigire, nikare bi te têbigihîje. Tu jî zêde nikarî têbigihîjî û bigirî. Ev nakokiyeke ku li benda çareseriyê rastî ye. Helbet yê ku li çareseriyê digere di têkiliyan de jî xurt e. Yekî ku çareseriyê di esas de hel dike, têkiliya jin ango ya jin-zilam rast digire dest û dikare berekî rast bide têkiliyê.

## Hezkirina ku bi welat û çîneyetiyê ve nayê girêdan ne tu tişt e

---

Me di Axaftinên Tirmehê de hinek bingehan danî. Me di salên borî de jî heman tiştan got. Ew rast bûn û niha jî bûne dîrûşme. Hezkirina ku bi welat û çîneyetiyê ve nayê girêdan, ne tu tişt e. Ji bo ku girêdan pêk were, helbet pêdiviya hewldaneke puxteyî heye. Di axaftinê de dixwaze, lê di pratîkê de berevajî pêk tê. Wê tu çi bikî ji xort ango keçeke wisa? Têkiliyên wan çend pere dike? Ber bi hezkirinê ve nabe, dikuje, dişewitîne. Tebî ez dibêjim ev, bersîvên ku me ji pirsra “Çawa Bijîn” re dayî ne. Rast e, zor e; hezkirin qasî şer zor e. Afirandina hezkirinê, avakirina hezkirinê, pêkanîna jiyaneke ku hezkirinê bingeh digire, tê wateya ji şer bi serkeftin derkitenê. Ev jî beramberê avakirana artêşê, avakirina rêkxistinê ye û bi misogerî ji peywiran re bi serkeftin bersîv dayîn e. Piştî wan mafê we yên ji hev û dî re qîmet dayîn û pêşwazîkirina hezkirinê dikare hebe. Çawa ku min got di vê mijarê de durûtî û seransertiyê re zêde cî nîn e. Jiyana ji te re pêkanînê şert dike. Tu pêk bînî dikarî bijî, tu şer bikî dikarî bijî. Her ku jiyana azad dibe, pêwîst e bê hezkirin û mirov jî bêyî vê nabin. Hunê bibêjin hê jî li derdora wan pirsan diponije. Lê kê mafê xwe yê jiyaneke heye, kê alîgirê azadiyê ye, kê maf û wateya wê didê û kê sexteyên vê ne? Dahûrîn bi şev û roj bi vê ve mijûl dibin. Hun bi navê endamên azadiyê ku ji qadên curbicur hatine, bi pirsgerêkên curbicur derketine û tevî bûne. Hun, zêde nebûne hêza çareseriyê. Hun dibînin ku, niha rewş hindekî dîtir cuda ne. A rast jî neçar e wisa be. Beriya her tiştî mercên wekhev û azad pêwîst in.

Karekî dî yê ku min kiriye, ji mirovekî re qîmeta herî baş a ku ez berpêş bikim, dayîna fersenda hinekî dîtir azad ramandinê ye. Ev, wê fersenda libatkirina azad bidê, bêyî çespendin û beriya li ser serdestbûnê, wan mercên ku viyana wê/î derdixe rastê biafirîne. Dîqat bikin, a ku em didin hemû gelê Kurd jî ev e. A ku em didin jinan jî ev e: Viyanê derxistina rastê, şerê viyanê. Ev têtûz hate meşandin. Ji ber ku yê viyana xwe nîn e, bêteleqe ye û zêde nikare hezkirinê derxîne rastê.

Me got, canên mirî. Mirov bi bedenên mirî nikare hez bike, ji mirov nayê hezkirin. Dibe ku ji hinekan re ecayîp were, lê di vekirinê de feyde heye. Bedenên piraniya jinên Kurd mirî, bêhnketî, sar û pir bêteşe ne. fîzîka wan hindek wisa ye, giyana wan çilmisî ye. Asta ramanê qet nîn e. Keça gund bigire, keç ango xortê burjuvaziyê piçûk bigire, jê re bibêje bibêje, ne tu tişt e; qasî tûtî nikare peyvan dubare bike. Wê tu çi bijî? Hezkirin, di hest, raman û parvekirina jiyaneke de tevîbûn dixwaze. Lê ya me wek çiyayê qeşayê ye ango çilmisî ye. Bi yek-du peyvan her tiştî jê dike û davêje. Wisa ye, yanî bi her awayî bêrêzdarîyê diçêspîne. Mirov ji vê jiyaneke çî tédigihîje? Keçikek, xwezî bi xortek wisa tîne,

xortek jî bi keçek wisa xwezî tîne û di demeke kurt de hev û dî mehf dikin. Çima? Ji ber ku têkilî ji nirxên bingehîn pêmen in.

Ez eşkere bibêjim; têkiliyeke wisa naecibînîm û layiqê tu kesî jî nabînim. Belkî li ser we zêde mudaxele dikim, lê pêwîstiya mudaxelekirinê dibînim. Ji ber ku ji teşe bigirin heya uslûp û nêzîkatiya we pêwîst e her tişt bîn edilandin. Niha mirovekî azad li Kurdistanê jiyana xwe di radeyeke yekemîn de, ez bi biryar dikim. Ev qasî asta biryarên netew diçin. Yanî dîsa jî dibêjim, dixwazim bi çi re bijîm? Pêwîst e hem di pîvanga jin û hem di ya zilam de ya herî bi namûs, a herî durust wê çawa be? Bi gotineke din, tenê ne di aliyê sincî de ez bibêjim, aliyê siyasî û felsefî de wê çawa be? Yên ku dixwazin cîhaneke nû ava bikin, wê ji kîjan kesayetiyên ava bin? Jinek wê çawa be? Hizir nekin ku ji ber xwe ve derdikeve rastê. Ger ev şêwaza me ya bi nirxandinên pir çetîn derxistina rastê nebe, niha piraniya we keçên malê bûn, koleyên zilaman bûn. Mudaxaleyên heyî hindik zêde we ber bi hizirandinê ve dibe. Di bingeh de polîtîkayek e û di nava partiyê de tê birêvebirin: Jinê serbest berde, dixwaze bibe kole. Jê re asteng deyne, bila demeke dirêj li ser piyên xwe bimeşe, biaxive, gotûbêj bike, çek jî bigire destê xwe. Em binêrin ka wê karibe çi bike? Yanî pir eşkere ye, di nava civaka me de jin, ji siya zilam nikare derkeve. Tu bi keseke hewqas rajêr re wê karibî kîjan azadiyê par vekî? Zilam jî piştî ku jineke hewqas kole dibîne, di xwe de wê çiqas hestên azadiyê karibe pêş bixe? Weke malekî koleya wî heye, li serê bi her cure zext, kedxwarî, îşkence û lêdanê disepîne. Di vê wateyê de ev zilam jî qediyaye û yekî serobero ye. Jinê jî zilamekî wisa ji xwe re layiq dîtiye. Yanî di ciyekî de hewayê ku saq e gore liyaq e! Ew vê dixîne, ev jî wî dixîne. Ew bi teşeyekê herî dexel nêzîk dibe, ev bi teşeyekê herî dexel nêzîkê wî dibe. Va di vir de xistina kesayetiyê, qedana hezkirin û rêzdariyê derdikeve rastê. Bi rastî jî di malbata Kurd de jiyana me ev e.

Tebî ev tev rewşên giran in. Mercên ku hun jê hatine, hindik zêde we di van rewşan de daye jiyandin. Lê hun dibînin ku nêvenga me bêtir cewaz e. Yanî ez li ser hêza xwe ya puxtayî hewl didim ku hin tiştan bikim. Dahûrîn, hîtab bangawazî û têkiliyên min ên di derbarê asta takekesî, komî, partiyî û netewî de hene. Ji ber ku ez dilbestê azadiya mezin im, bi wateyekê di mijara jinê de bi hezaran derdixim rastê. Bi hizra min çi zilam nikare hewqas berfireh be. Zilamek têkiliyên xwe bi jinekê re pir sînordar in. Îcar ku zilamê Kurd dibe mijara gotinê, bi taybetî di vê qonaxê de teng in, wisa zêde nikare wateyekê lê bike. Ev jî xeternak e. Min hindek wate lê kir, fireh girt û derket rastê ku wê karibe encaman bide. Ger ku jinekê dabana girêdan ango min bi miritî xwe dabama girêdan, belkî jî wê netewek biqedaya. Heke ku di bûyera wê tekiliyê de min xetayek mezin kiriba (ev xeterî jî hebû) belkî jî emê ji bûyîna netew derketibana.

Erê, we çarçova nêzîkatiyê hindik zêde jiya. Hizir dikim ku bi gor kevin bêtir dana qezenckirina raman û bergeh derkete rastê. Di kesayetiyê we de ji berê

zêdetir ewleyî heye. Hun bi xwe diramin ku, pêwîst e hun bi xwe bibin ê xwe. Li dijberî zilam, ji wê tîpa ku di radeyeke dawî de stû ditewand, hun tèn halê gihîştina kesayeteke ku behremendiya hîlbijartinê pê peyda dibe. Erê, texmîn dikim. Çi wê çawa tê hezkirin, çi çawa tê jiyandin, çi çawa tê pejirandin, çi çawa tê reddkirin? He rhal di van mijaran de kê-m-zêde hêza viyanê hate qezenckirin.

Ez her dem dibêjim: Keçeke ku ji hezkirina min re wêrekî nîşan bide, pêwîst e hewqas ji welatê xwe hez bike, hewqas zêntûj be, hewqas karibe hêz nîşanê pîrsgirêkên rêkxistinê bide. Ku neke ez zêde hez nakim. Ma wê bi zorê xwe bi min bide hezkirin ango bi zorê min ji xwe re bike mal? Helbet asta jiyana ku min girtiye heye. Ku li hember rêzdar be, wê hewqas nêzikê dozê be. Jixwe di vê derê de veqetandina zayendî nakim. Ji ber ku min hindê ezmûnan jiya. Jina dijberî min dixwest xwe misqal bi misqal bazar bike. Weke di çiyekî de ji min re bibe mal, di çiyekî de ji KTYê re bibe mal, di çiyekî de ji hevkarmandiyê re bibe mal. Tebî min jî dixwest wê ji welat re bikim mal. Têkiliya li paş wê jî dikişandim. Ev vedigeriya şerekî mezin. Lê ya we ne wisa ye. Li çi tê nihêrtin û biryar tê girtin? Dibe ku weke zilamekî Kurd ê jirêzê girte dest. Yanî bi teşeyekê ku te hindê pê leyist, zayendîtiya xwe bi kar anî, tuyê “kîro” çare çar bidî girêdan nêzik bû. Gelek têkilî hindê wisa ne. Lê min selimand ku ez ne zilamekî wisa me. Texmîn dikim cara yekem li hember vî karî şaş ma. Ji ber ku hizir dikir ku min kontrol dike. Tebî di Kurdan de gelek têkilî wisa tèn kontrolkirin. Hem jî ev belavbûyî ye.

Gava ku dît ez ne yekî wisa me, ya li dijberî min çi kir? Hingê “ev zilamî çawa ye, weke yekî ji vê zayendê xwe çawa têrbûyî dike, gelo bi keçên din re têkiliyên wî hene yan na” xwest ku bi vê teşeyê halanê bicerbîne. Va, “ma zilamê zewicandî bi jinan re têkiliyên wisa ava dike?” Gava ku bi çend jinan re têkiliyên siyasî çêbûn, di cî de halan dike. Heta dibêje, “bikuje, jinê nede jiyandin, tenê yek jin ez im, li derveyê min çi jin tune.” Yanî wê bi jinên din re têkiliyeke herî piçûk neyê fikirandin û weke ku yek ji wana neyê derxistin pêş, wisa têkiliyeke feodal a hêwilnak çêbû. Di vê mijarê de hinek mînak hene ku dişehitînin. Tebî çîroka vê kûrtir e. Ger ku têkilî bèn vekirin hunê bibêjin “çawa bûye ku xebera me jê tune.” Lê bi ya min di nava kar de dewlet jî hebû. Dema ku dewlet, jin û mîrzadetî bû yek, ev derkete rastê. Ez jî zilamekî ku dike mal im. Yanî di Kurdistanê de bûyereke mezin a ku derketiye rastê me, ecêb birî ya xwe didimê û dixwazim ecêb bi kar binim. Jixwe mezin dileyist. Têkiliyeke jin-zilam, têkiliya dewletê û ev jî bû têkiliya şer. Di bingeh de hindê jî min wisa çêkir.

Bi ya we, ma divê min nekiriba? Ger ku nekiribama, PKK dernediket rastê. Ev her hal şêwaza meşeke dahiyane ye ku bi ser dijmin ve diçe. Her kesî bi guman dişopand ku ev çarçove çarçoveya MÎTê ye. Lê ez tam berjêrê navika kar dibûm. Çawa dibe? Ev, di çiyekî de xwe bi întîharvarî xistina çalakiyê bû. Lê di vê mijarê de leyistina taktîk û rola baş heye. Di heman demê de durust e. Ez bawerim ku tûreyên we bîst û çar demjimêran nahedirîne. Lê yê min dihedirîne. Ev, min di

polîtîkayê de ber bi pejnkariya mezin û hostatiyê ve bir, li ser xwe ber bi serdestbûna awerte ve bir. Ku min jinê hema ceza bikira, her hal wê derketa rastê ku ez ne zilamekî cewaz im. Ne kuştim, ne jî xwe xistim. Ma ev wek pêwîstiya namûsê wisa çêbû? Naxêr, şerekî pir zirav, pir hosta meşandim. Çawa ku hun dibînin li wirê dewleta Tirk wenda kir.

Wê di pêş de ev baştir bên fêmkirin. Tebî wê jî li pir hevalên me xist, mehf kir. Vî kontrgerîlayî belkî jî ew hêna bi rê ve dibe. vac ev e; vaceke kujoker û xeniqok! Di xwiyangê de têtîkiliyeke jin-zilam bû, lê di puxtuyê de têtîkiliyeke siyasî û civakî ya mezintîrîn, têtîkiliyeke stemkar û îşkencedar bû. Di bingeh de gelek têtîkîlî wisa ne. Di têtîkiliyan de hun çima bi erzanî wenda dikin? Çima hun bi têtîkiliyan mezin nabin? Ji ber ku hun pir bi hêsanî radest dibin. Di nava we de ya herî gewre hundirê bîst û çar demjimêran de ku radestê vê têtîkiliyê bibe, ma dikare feyde jê bibîne? Hilkeftineke rast ji têtîkiliyê re çêneke, ma dikare xwe biedilîne? Binkeya ramanêke saxlem nîn e, hezkirin û rêzdariyeke saxlem nîn e. Çi ye? Li ser têtîkiliyan ajo, xwedibîni û fersendkarî serdest bûye. Ev têtîkîlî çiqas be tu jî hewqas î. Naveroka vê çiqas piçûk be, tu jî hewqas piçûk î. Xwe nexapîne! Li gelek hevalên me yên jin û zilam dinêrim, di bingeh de mirovên têtîkiliyên piçûk û acuc in ango têtîkiliya wan nîn e. Ev bîst-sî sale ez teoriya van têtîkiliyan pêş dixim, perwerde ya wê amade dikim. Kîjan ji we bi min re tevbigere ezê wê hindêk pêş bixim. Ev bi ezmûneyeke mezin ve dikare bibe gengaz. Lê em we bi têtîkiliyan re rû bi rû bihêlin, belkî jî hun qasî sîsîkê hejîrê ne. Dema ku li wê mirovê dinêrim, ber dikevîm.

Çawa ku min got, ez têtîkiliyan asê nakim. Lê têtîkiliyeke wisa ava bikin ku mirov ji we re bibêje, bravo! Min şertê xwe danî: Çawa mirov evîndar dibe? Bila yek di wan pîvanên min danî de evînê pêk bîne, ez wê biçepikînim. Em wê bi nirxekî mezin derbirînin, pîroz bikin. Lê li têtîkiliya herî mezin dinêrim: Bila ji rêxistin û şer dût bikeve, wê pirsgerêka malbat û jîyanê derkeve rastê. Ez çî bikim ji evîneke wisa? Ma ez vê li serê xwe bixim? Ji min re ne hestên merezî, hestên qehremanî pêwîst in. Ji min re girêdanên pir qehremanî pêwîst in. Eyb nîn e, ezê bi girêdanên wisa welat qezenc bikim. Ji min re ne zilamên wisa, ne jî jinên wisa pêwîst in. Pir eşkere diaxivim, ma ezê çî bikim ji hestên merezî? Ez tenê hevalê xweşikîyê me, hevalê pîrozîyê me. Ma dikarin bibêjin, “em jin in, em reben in, zêde neyê bi ser me ve, cins û cîbîliyeta me wisa ye.” Naxêr, ez bi jîneke wisa re najîm. Ma hunê bi zorê min ji xwe re bikin hevbeş? Ez di jinê de xweşikîya hêwilnak digerim. Di jinê de egîdî û pîrozî digerim. Yanî puxte û teşe digerim. Jîneke wisa tune. Tune be, ez jî xwe tevî qirêj û zengê nakim. Belkî hinek ji vê bitirsîn û bibêjin, “ma serokê me mirovekî çawa ye ku xebera me qet jê tune bûye.” Tebî ku serok hebe, serokekî wisa ye. Ger serokatî be, serokatîyeke wisa ye. Nexwe yên bi awayên din bi taybetmendiyên serokatîyê ve li hev nayên. Bila serok xweşikîyê nede, pîrozîyê nede, serok nebe bangawaziya

wê pîroztiyê: Yekî wisa ne serok e, her tiştek e. Heke ku we di vê bingehê de nekişînim, wê li ku derê bimîne serokatiya min! We ji welat re nekim mal, we bi egîdî nekim elemanê şer û meşekî, wê li ku derê bimîne serokatiya min!

Eleqedarbûna me di vê çarçovê de ye. Min wêrekî nîşan da û bi hewqas jinan re eleqedar bûm. Me wan hewqas kire yek. Hewqas kir xwedî hêz. Bi ya min nikare piçûk bê dîtin. Ev jî di araviya vê nêzîkatiyê de çêbû. Heke ku di bin bandora nêzîkatiyên din ên pîrsgirêka jinê de mabama, yek jineke şervan dernediket rastê. Vê jî ji bîr nekin. Yek ji we nedihate nava refan. Ger ku çemka jina feodal li ser min serdest ba, ma gengaz bû ku di nava refan de yek jinek cî bigirtana? Tebî hun vê jî nizanin. Hunê bibêjin “ma çi eleqedariya me pê heye?” Naxêr, ew têkilî hate dahûrandin û hun bi vî awayî derketin rastê. Ji ber vê yekê ka ev çîrok çawa ye hunê lêkolîn bikin.

Em berhemên çi ne? Ez bi we hevalbendiya tam wekhev û azad pêş dixim. Ev ne eyb e. Bi ya min, ya eyb di tevlibûnê de nepêkanîna pîrozti û mezinahiyê ye. A eyb hezkekirin e. Têkiliyên bi tevahî aliyên xwe ve bê hezkirin derxistina rastê, têkiliyeke ku mirov jê rûmet bibîne peyda bike derxistina rastê, têkiliyeke kesan bi xwe ve girê bide û bi taybet jî bi peywiran ve girê bide, ango bi jineke wisa re jiyandin eyb nîn e, berevajî bi ya min pêwîst e ya herî çêtir bê dîtin, ev e. Gotineke mîna, “min xwe wisa dabû girêdan, wisa firotibû, ez wisa koleya kevneşopiyan bûm, mal û mulke vê derê bûm” yek carî heqaret e li mirov. Erê, girêdan dibe, lê çawa ku min got, girêdana mezin jî wisa pêş dikeve. Tebî ev zor e, jixwe ya ku ez dixwazim pêş bixim ev evîn e; Evîna Kurd e, evîna mezin a Botanê ye, evîna rêxistin û çalakiya mezin e. Ku were hesabê we, tevli vî evîné bibin. Ku neyê hesabê we, ji çarenûsa xwe bianirin û li mala xwe bimînin. Piştî nebişî, “Rêhevalê me ne eşkere bû, rastînan bi deqerûyî dananî!” Di hezkirina xwe de hun azad in, le hezkirin tufana ajoyên serberdayî nîn e. We tu werî zept û reptê, nexwe yên din harîti ne. Va bigire, bireve, bixapîne, bifiroşe! Li paş çi di destê me de ma? Bi her awayî kirêtiyê bije, roja duyemîn bibêje, “ezê tîkiliyan ava bikim, ew jin û jinên ez dixwazim bi wan re bijîm wê bêhnketî bin, sextekar û ketî bin, ji destê wê çi kar neyê, nikaribe biaxive, nikaribe gotûbêj bike, nikaribe biryar bide...” Ma çawa çêbû? Ez vî şerî bi tevahî aliyên ve ji bo ku bi hev re bijî didim. Gotina “zimanê jinên me kêm e, wêrekiya wê tune, ew bila zêde tevî van karan nebe, jê dîr bimîne” koledarî bi xwe ye. Ku wisa ba, me vê çemkê bipejirandana, yek ji we dernediket rastê.

Gihîştina mezinahiya tîkiliyên wisa zor e. Ez jî ji bo vê yekê dibêjim ku, avakirina tîkiliyeke azad qasî şer zor e. Ez çi bikim, di xwezaya vî karî de ev heye. Tîkiliyeke hêsan tune. Tê gotin bi zorê xweşiktî nabe; ez jî dibêjim, bi hêsanî tîkilî nabe, bi hêsanî xweşiktî nabe. Anirandin û xeyidandina we min eleqedar nake. Di puxtuya vî karî de ev heye. Ku hun jî bixînin û bibêjin “wê gavê em jî hev û dî bixînin” ezê jî we mehf bikim. Wê tu çawa vî şerî bixîni? Tebî

piranî ya we ne di ferqa vê de ne. Lê ev bi wateyekê zagonên APO ne. Ez dizanim ka çalakî ya min bi çi awayî çalakî ye. Zagonên li ser jinan diçespînim ka çi ne, ez dizanim. Gotineke, “me van tiştan hizir nekiribû” nabe. Ger ku te hizir nekiribe, tu serûwenperest î. Ê min jî çemka min a namusê heye. Çemka min a hezkirinê heye. Mirovekî ku hewqas Sal in hedan kiriye, xwe hewqas dişiplîne kiriye, bi hêsanî nayê xapandin û nade xapandin. Dema ku ez diçim ciyekî, çima her kes peroşmend dibe? Çima radibin ser piyan? Çima qasî ji mixên xwe vala bibin ji kevin vala dibin? Hun şahid in. Hun jî hindêk wisa bin. Dema ku hun ketin ciyekî, bila her aliyê we ronî biçirise, best bide û dilan zindî bike. Ji bo te ger ku hat gotin, “dîsa hat belaya serê me, dîsa hat çavkaniya gotûgotan” te çi fêhm kir ji vê kesayetiyê? Ma her tiştê herî baş û bedew afirandin tiştêkî zor e? Va min jî xwe afirandiye. Ma hun hizir dikin ku ji xwe ve hatime afirandin? Min, di bingeh de her roj xwe bi mehed û sindanê dida lêxistin. Tebî da ku mirov, xwe bi civakê, bi gel û partiyê bide pejiranidin, şerekî mezin pêwîst dike. Niha dost û dijmin eleqeya her kesî dikişînim. Bi vî re dibim rêkxistin û şer. Giyan û dilê Kurd diafirînim, zanebûna Kurd diafirînim, şerê wî diafirînim. Heke ku xwe bi sistemî nedim afirandin, ma serkeftin bi çemka zilamtiya rizî pêk tê?

Hun dizanin, di civakê de zilamtiya herî gewre, dîlawêrtî ye. Yê ku hindêk bi pere û bi çoyê xwe ewle be, zilamê herî gewre tê hesabandin. Em dizanin ku ev ne tiştêk e. Ger ku min tîpê zilamekî cuda xet nekiriba, ne gengaz bû ku ez sê kesan bînim ba hev? Ger ku ez yekî bi hêsanî dixape, ji kevneşopî û pergale bi hêsanî xwe wenda dike bibama, ma gengaz bû ku vê tevgerê bianîma vê halî? Diyar e ku xurtbûn hindêk wisa çêdibe. Diyar e ku serkeftin di bingehê vê kesayetiyê de dikare pêk were. Hun keç jî, hindêk di vê bingehê de dikarin werin ser xwe ve. Ji er ku teşeyên din we zêde xurt û bi îdîa nake. Nêvengên din we zêde xurt nakin. Belkî hinekî din bibêjin, “tu serokê partiyê yî!” Lê min serokatiya partiyê ji nînê da afirandin. Bi şerekî xedar dame afirandin û hê jî wisa dibim. Pîşeyê min ê rojane, şêwaza min a birêvebirinê ye. PKK nebe, PKKyekê dîsa biafirînim. Min vê aniye halê teşeyê şêwaza jiyane. Ez texmîn dikim ku me û şêwaza bûyera serokatiyê hun fêhm dikin. Her hal wê hunê hêz nîşan bidin bi têgihîştineke rast û ku gengaz be bi hev re rê wergirtinekê re.

Ez, li hember bûyera jina Kurd pir zêde hişyar im. Di vê mijarê de bi rastî jî xwedî nêzîkatiyeke pir dîrokî, pir teorîk, pir dahûrîner û têkoşinerê vê me. Hun jî weke encamê vê hindêk pêş dikevin. Hêza min hewqas e. Êdî mirov, bêtirê vê tenê di azadiyê de dikare bibe. Şûngeha we ya bûna çavkaniya hêz û asta we ya tevlibûnê dikare min hêzdar bike. Ev jî dikare ji xurtbûna we re rê bide vekirin. Pêwîst e hun hindêkî din bînin ziravkirin û heta bînin dilkêşkirin. Ger wisa nebe, wê we bipelçiqînin û dervayî bikin; giraniya we nabe. Dema ku mirovê nû tê afirandin, pêwîst e jin jî bi hendazetiyeke mezin bê afirandin. Ez dibêjim em vê bi hev re çêkin. Bila bi çespandineke yekalî nebe. Ji ber ku jin heta niha bi yekalî

hatiye çêkirin. Zilam ferman daye, jin jî bûye xanimok. Di şewaza min de ev tune. Ji min bi tu awayî li benda nêzîkatiya xanimok nemînin. Jina ku li pêşberî min e, pêwîst e çawa be, bi kûrahî biramin û hindek wisa bersîv bidin. Ez jî hê nizanîm. Dibêjim, jina çareçar çawa biafirînim. Lê hest û pejnên min hene. Dibêjim, divê ev der wisa be, ev der ê wiha be. Belkî hun bibêjin, “şoreşgerek nikare hewqas bigihîje.” Di bingeh de digihîje. Di her şoreşê de gihîştîye. Neçar e ku nirxên herî xweşik biafirîne û hema ji her tiştî re ya herî nirxdar lê zêde bike. Di vê navberê de neçar e ku di têkiliyan de ya herî tê pejrandin di pratîkê de derbixîne.

Lê ev nayê hişê tu hevalên me. Di berê de çi mabe bi wî dije. Lê teorî û çalakiya wî şoreşger e. Çawa ku min got, ev di her şoreşê de bûye bingehîn egerê serberjêrkî çûyîn û paş ve çerçîkirinê.

## **Li devereke ku her dest têkil dibin hêlin nayê çêkirin**

---

Dema ku di derbarê pirsê “Çawa Bijîn” de çarçoveya giştî tê runiştandin, hingê bi hinek mînakên bêtir şênber pêşxistina bersîvên raveker gengaz e. Ez, dîsa ji xwe dest pê bikim. Pêşî di Kurdistanê de kesayetiyeke ku mafê xwe yê jiyandê heye wê çawa xwe li rastê pêşan bike? Ez, tenê ji bo vê bersîvê xwe bi salan perwerde dikim, pê ve mijul dibim û diponijim. Dikare bê gotin ku, hewldana herî mezin didim xwe. Hewl didim ku bi zanistî, felsefe û olên ku qasî mirovatiyê kevin in, çi tiştên ku hene û çavên min dibînin, gohên min dibihîsin û giyana min radibihîse; bibihîsim, bibînim û têbigihîjim. Encam, bi gor pîvanên giyanî, fîzîkî û zanistî afirandina ku herî zêde tê pejrandin. Da ku hîtaba tevahî mirovên me bikim, pirsgirêka ku dênê dikişîne çi ye? Pir mijulbûm; dikarim li ser malbata xwe bandor çêbikim, dikarim li gundê xwe bandor çêbikim, dikarim li ser hevalên derdora xwe bandor çêbikim. Lê ev têra min nakin. Bi taybetî da ku li ser tevahî gel û netew, ku gengaz be mirovatiyê karibim bandor çêbikim, pêwîst e çawa bim? Divê ez tiştêkî wisa peyda û temsîl bikim ku her kes bibêje, “va, ev min eleqedar dike.” Ev çi ye? Ev mirovaniya kûr, netewa kûr, di heman demê de bingehê zanistiya kûr bigire, hewldanên vê bi stemkarî pêşan bike û di encam de bi bandor be.

Dîqat bikin, şerê çalakîyê çiqas bi selimandina berjewendiyên mirovan û polîtîkaya bingehîn a netew ve girêdayî ye. Yek jî dîtin, bihîstin û têgihîştin têr nake. Ev bi hewldaneke hêwilnak û xebata rojane dibe. Di encam de ev mirov hindek dikare xwe bide pejrandin. Ez xwe bi netew didim pejrandin, bi çîneyatiyê didim pejrandin û bi jinan didim pejrandin. Pêdiviya kûr a jinê çi ye? Jin di bin zextê de ye û ji jiyana civakî hatiye derveyîkirin. Ji kesayetiya xwe

bêxeber e. Hingê ya pêwîst e ez bikim, pêdiviya bingehîn a wê girtin û ji bo pêdiviya azadiya wê nêveng amadekirin e. Yê hosta be, hem vê difikire hem jî çêdike. Ger hun li paş binêrin, hun bi bazdan firiya ne û derbas bûne. Dîqat bikin, kişandina jinan hêsan nîn e. Hun keçên pir diltepîn in, jixwe hezeke we yê wisa jî tune. Hinek dibêjin, “ez dixwazim bigirim” hinek jî dibêjin, “ez didim.” Jiyana we bi çengelê vê danûsandinê ve daleqandiye. Bi viyana xwe ya azad pir hindik xwestekan hun dikarin pêş bixin. Hun xwestekan pêş bixin jî, nikarin pêk binin. Yên ku viyana xwe ya azad pêk aninê pir nîn in. Lê ez mezin diramim. Siyaseta jinê ango pêdiviya jinê a bingehîn çî ye, nêvenga wê ava dikim û hun jî ber bi wê ve diherikin. Her wiha tevgerên din, nikaribûn tevgera jinê biafirînin û temsîla nav pergalê derbas nekirin. Lê li ba me azadbûn bêtir dibe, gavên pêşdetir tên avêtin. Di vê mijarê de we serê xwe rakirîye. Hunê heya ku derê biçin, azadî diyar dike. Hun wisa diçin. Hun dibînin ku hesreta mirovaniya kûr a vê, bi temsîlkirina pir xurt ve dibe gengaz. Hun dibêjin ya em bi serokê xwe ewle ne, egerê bingehîn a ewlê ev e. Nexwe ne ku hun heyrana birû û çavên min ên reş in. Ji ber ku ez bersîv didim pêdiviyeka we ya bingehîn.

Ev dibe çî? Ev dibe afirandin û bingehkirina tevgera jinê. Jê jî wêdetir hesret, behremendiya hîlbijartinê û ecibandin e. Ev jî di kîjan kesayetê de gengaz e? Mînak di vê mijarê de min pêşbirkeke mezin daye destpêkirin. Yê jê herî tê hezkirin çî ye, kî ye? Pêwîst e ev çawa be? Me teoriya hezkirinê derxist rastê. Hezkirineke ku dikare bê pejradin, pêwîst e çawa pêş bikeve? Ji bo ku zagonên hezkirinê wate biderbirînin û di gîştî de bîr pejrandin, pêwîst e bi hinek nîrxên hîmî ve girêdayî bin. Yani şûna, “dilê min ketê, min jê hez kir” (ku ev hezkirineke ne bi gor zagonên me ye û xiyaneke) pêwîst e li zagonên me bîr dîqat bikin. Hun keçik jî, heya dawiyê bi tevgerê re ne û bi serok re ne. Lê hê jî di navberê de mesafeya mezintirîn heye. Hinek ji we wê bibêjin, “ez zilamekî bi hêsanî bijîm.” Zilamek jî wê bibêje, “ez jinekê bi hêsanî bijîm ango bi dest bikim.” Bi ya min ev, hê pir zor e. Hun dikarin bibêjin “dibe ku zor be, lê çawa dixwazî dikarî bijî, pere heye, bi her awayî karbidestî hene, derfet hene.” Zor e, zagonên vî karî hene. Ger tu berevajiyê van zagonan bikevî, wê tu bikevî rewşa van zarokên ku digirî û qarîrî dikin. Girî û qarîrî a herî hindik e. Pêwîst e girî jî bê mezin bikin. Bila ne weke ya zarokan be. Ji ber ku min jiyana xwe di bingehê zanistiyê de amade kirîye, timî dipirsîyan: Jiyana te ya civakî çî ye, têkiliyên te yê malbatê çawa ne, têkiliyên te yê dê û bav, nas û dostan çawa ne? mîlet e; zarok marok, hezkirin, evîn çî ye, wisa dipirsîyan. Bersîveke têkûz didim çêkin.

Min got, zagonên evînê, rêpîvanên hezkirinê. Hun çima tevî min nabin? Ji ber ku li we zor tê. Hun burjuvaziyê piçûk in, şûna ku hun xwe têxin nava karên zor, rojane dijîn. Lê ez ne wisa me. Ji ber ku ez hindik bi aqil im, min xwe avêtîyê navsera rastê. Jixwe soza min heye. Bi rastî jî dayik û bavê min ji min re gotibûn,

“kes keç nade te!” Ne ez distînim ne jî kes dide min. Ji bo min bû rêgezê. Çima kes keç nade min ango çima ez naxwazim? Bi hizra min, ji ber hindek rasteqînî me. Keç dayîna min tê wateya harbûnê. Min jiyana xwe wisa rêkûpêk kiriye ku bi gor rêpîvanên cîdayî yekî ku keç bide min, şewitî. Ji ber ku hewldanên min ê mezin hene, mijulahiyên min ên mezin hene. Yanî bi gor kesayetiyên pergalê min xwe avêtiye nav qumarê. Mînak ezmûneyeke min hebû: Malbata wê digot, “me dixwest bi dewletê ve girêdayî be.” Di bingeh de bûyereke siyasî ya mezin e. Bi ezmûneyek û bi girêdana dewletê, têkiliyê ku di çarçoveya qedandina dewletê de, belkî jî têkiliyê taktîk e. Lê van hemû wateyan dihewîne. Malbat jî hingê şaş bibû. Piraniya wan hê jî dixwaze têkiliya min a wê demê fêhm bike. Ka min keçê wergirtiye yan wan daye min, diyar nîn e. Hê jî şaşwaz in. Bi rastî jî taktîkek e, şewazeke pir nişkave û tevgerêke nayê hêvîkirin e. Aliyê keçê jî, ka ez ji keçê çî dixwazim û naxwazim ji pêderxistinê dûr e. Ez çî dixwazim tam jê ne dûr im: Şoreş dixwazim, bi gor şoreşê jin dixwazim. Lê di bingeh de, di nava kar de siyaseta heye. Nehate fêmkirin. Min jî çawa ku dixwest, venegot. Wana qet ji min fêhm nekirin. Ev vegeriya şerekî mezin. Her wiha ev bû, çîroka keç dayîn standinê.

Lê bi gor we hêsan e, hunê bibêjin; “me stand, me da; min pejirand û girt, min da û çareser kir.” Nebû, vegeriya pîrsgirêke mezin, ne wisa? Gelşa min a keç dayîn û standinê vegeriya pîrsgirêka dewletekî. Çima? Ji ber ku di gotinên diya min de, di gotinên min de mafdarî heye. Ji ber ku mirovekî hişmend hindek wisa difikire. Bi feodalîzm û burjuvaziyê re têkiliyên wê hene, ez jî ji jêderka proleter gel im. Ez, jêderka xwe înkâr nakim, ew qet nake. Ew min dikişîne, ez wê dikişînim. Ew dibêje, emê bigihînin dewletê, ez dibêjim, dewletê bi kar bînim û yê dixwin, pozê wan de derxînim. Li ser navê nas û dostan şerekî tirsnak, eynî wek şerekî APO!

Min wisa jî nas bikin. Diyar nîn e, ka bi min re şer dikin ango bi min re li hev tînin. Di vê de mafdar im. Ji ber ku dostanî sexte ye û rewneq nîn e. Dostaniya min destan e li ser zimanan. Di vê zemînê de li ser bihgehê dostaniyê diminim. Pir hesas im, yek tenê tevgerêke min ê ne di cî de çênabe. Hêza min a bandordar a hêwilnak heye. Rêzdar û girêdayî me. Di vî aliyê de ewle dibin. Va hê jî li van dera me. Çawa ku bixwazim, dikarim bijîm jî. Nabêjin, çû kû derê, çî dike. Mafdar in. Pêwîst e demjimêr bi demjimêr min bişopînin. Lê hinek hawîrên dostan ku pê ewle dibin, ji ber ku dizanin ji min xirabî nayê, heya niha ez azad im. Ji bo vê bi misoger stû natewînim. Min azadiyê esas girtiye. Jiyanê derve ya ku yek kitek Kurd nikare bike, min bi ser xistiye.

Ez dixwazim bînim vê gotinê: Me xwest ku em têkiliyê taybet ava bikin. Encam, vegeriya bûyereke siyasî ya giştî. Jixwe aliyê dijber jî digot, “ev çî ye hat bi serê me?” Hestiyarî heye, va me têrbûyî kir, bes e! Naxêr, qet gelşek wisa hêsan nîn e. Di virê de çîroka mirinê ya Kurd veşartiyê. Min jî wek we xwe avêtiba navsera rastê û min gotiba, “me hev û dî eciband, me hev û dî xapand,

xwar û vexwar, qediya karê me” niha Kurdayetî nemabû. Lê hun bi jiyandineke wisa, bi razaneke hêsanî hezar caran qayilin. Hunê roja duyemîn biqedin. Bevêdana we nîn e, behremendiya hîlbijartina we nîn e, lêkolîna wê nîn e. Di bingeh de ka hun çî dixwazin, hun nizanin.

Hun dizanin, aliyên qels ên mirov, aliyên ajoyî ne. Hun tim li pey ajoyan baz didin. Li pey pîroziya jîrekatî û giyanê baz nadin. Di asteke jiyana nêzîkê ajaliyê de dimînin. Berhembdariya we ya leşkerî qet nabe. Le paş malbata Kurd, jina Kurd, jin û zîlamê Kurd dimîne. Pêwîst e hun dahûrîna jin û zîlamê Kurd baş çêbikin. Zarokê Kurd, dê û bavê Kurd ku hindek mezin dibin, kur û keça Kurd... Tam nîn e, lê ez jî wisa bûm; min hewl dida ku bibim kurekî Kurd. Kur, dema tê pazdeh-bîst saliya xwe her kes dibêje, “xwedê ez şewitûm.” Navekî min ê din jî hun dizanin: Her kesî ji me re digot, “Çeteya xwedê ez şewitûm!” Vê ji me re vala nedigotin. Ev jî liyaqêdîneke çepê Tirk bû. Gava ku ez heft salî bûm, her kesî digot, “xwedê ji çî malbatî re zarokek wisa nesîb neke!” Gotinên weke, “zarokên kesî bila nebin wek zarokê Omer” tên bîra min. Di gund de navê min derketibû. Zarokê herî bêhêvî û herî diviyabû jê bê revandin bûm. Daraziyên nîrx ên di derbarê min de bi teşeyekê, “zarokê wan şewitî, ji zarokê wan kar dernakeve” bû. Bi gor çemka gundîtî, di her rewşê de nelêtî hebûn. Min dayîka xwe ji were vegot. Dayekê dema ku zaroka wê mezin dibe, dixwaze çî bike? Dixwaze bide zewicandin. Dibîne ku ev çemk di min de peyda nabe. Digot, “ji rê derket, kes keça xwe nadê, kurê min şewitî.” Dema ez ketim nav siyasetê, her kesî bi çavên şewitî li min dinêriya. Bi got ya, nav bû “çeteya xwedê ez şewitûm!”

Kes keç dide nade, ne girîng e, keç dayîn û standina min girîng e. Ji dayîn û standinê wêditir divê çî bê xwestin? Divê her kes mezintirîn seyr bike. Di asta netew de serok çî ye, serok çawa ye? Ger serok xirexavî be, ku serok bûyera mezin neafirîne, wê bixapîne. Wê serokatiya wî bibe wek serokatiya Barzanî. Serokatiya Barzanî çî ye? Gundî li pêşberî wî dest pençe dîwan disekinin, zimanê jinan tê birîn. Keçên panzdeh salî didin zîlamên heftê salî. Ew keç baz dide û diçe. Yek jî bi misogerî yê di dilê xwe de nabêje. Lê hun li min jî dinêrin: Ya ku li min nehate kirin nema, ya ku we bi min nekir, we nehişt. Çima? Ji ber ku rêgezên min hebûn, jiyana min hebû. Her roj pê dileyizî, pê dikevî nava nakokiyan. Niha hunê bibêjin, “ji bo keçên mîna me, ji bo keçên ku bi mirinê serok ve girêdayî ne, ev çawa tén gotin?” Va me dît, ka girêdaneke rastînî ye yan na, derkete rastê. Gelek jinên wisa hebûn. Digotin, qasî mirinê em bi te ve girêdayî ne. Roja diwem lê dinêrî, ka keça me reviyaye ku derê, em di ferqa wê de jî nîn in. Tebî ev keça me ji bo ku bibe keç pêwîst e şiyandar be. Tewanbar jî nakim, mafê wê ye. Ez bi pîvanên serokatiya mezin dileyizim. Ewê ji vê re çawa hêz nîşan bide? Lê keç evîndara gerîla ye, mezin dileyize. Ger tu mezin bileyizî, sedemên mezinahiyê birame. Ji min hemin çek dixwaze. Min hê çek negirtiye destê xwe. Hem jî dibêje, “ez nasekinim!” Min çek da destê wan. Va yek hat, me dît. Per û baskên

hemûyan hatiye perpitandin. Ka te soz dabû? Tebî ji bo ku moralê wan xira nebe, bi ser wan de naçim. Hingê xwe nexapîne, rişt be! Ya ku çek dixwest tu bûyî. Te çekê ji bo jiyandinê xwest. Hingê jiyane pêk bîne. Ger tu nakî, çima devleqiyê dikî? Çima bi hêsani dimirî?

Ev pirsgirêkên sotîner in. Pirsgirêka herî girîng, ka emê çawa nêzikê hev û di bibin e. Ev ji bo min heya niha jî pirsgirêk e. Ezê çawa nêzikê keçekê bibim, keç wê çawa nêzikê min bibe? Hunê bibêjin, “ma te hê jî di ve mijarê de te tiştêk nekir; ma serokek wisa dibe?” Erê, serok hindêk wisa ye, serok hindêk pê mijul dibe. Xortekî ku bixwaze wê çawa be, keç wê çawa be, wê bi çi ve girêdayî be? Ez vana diramim û gotûbêj dikim. We di panzdeh saliya xwe de biryar daye; ez hatime çilûpenç saliya xwe hê jî gotûbêj dikim. Nebêjin, “em şewitîn, di mal de man!” filan û bêvan. Na, hun qasî min di malê de namînin ya! Yê herî zêde di malê de maye ez im. Lê îdîayên min hene. Ev kar ne karekî hêsan e. Pîrejinokîbûn kirêt e. Mêrbûn jî kirêt e. Gotinên, “keça min” ango “jina min” hê jî gohên min dixerpişînin; ez wisa nikarim xwe mezin bibînim. Di xwe de hêza ji yekê re bibêjim, “keça min” ango “kurê min” nabînim. Ne ku ez ne şiyandar im, lê ev ji min re wek gotinên req tên. Ez ji zarokan re jî nabêjim, “zarok!” Bi zarokan re wek hevalekî pir nêzik têkiliyên min hene. Bi keçêke ciwan re wek hevaleyê pir nêzik libat dikim. Ji pîrikeyê heftê salî re jî wisa nêzik dibim. Ew hest û jiyana ku di tevahî temenê xwe de nejiyaye û nebihîstiyê pê didime hîskirin. Vê bi zarokan jî didim hîskirin. Ev çima pêwîst in? Ev pêwîstekên bûna mirov û rêzdariya ji me re bi xwe ye. Lê hun bi çavreşî dibêjin, “ez vî dixwazim, vî digirim!” Ew hêza we nîn e.

Mînak, ez rewşa hestên we bigirim dest. Hun dibêjin, zewaca azad, evîna azad! Ji vê tu şik nîn e. Baş e, ma hun nefikirîne ka evê çawa were pêkanîn? Ez biriya xwe didim ser we. Lê ne tenê we, biriyê didim ser xwe jî. Ev zagonên evîne ne. Ez jî neçar im bi gor wê tevbigirim. Hun jî neçar in ku bi gorê tevbigerin. Ji bo evînekê herî hindik çarçova welatekî pêwîst e. Tu li derveyê welat î. Em bibêjin ku rojekê berjewendiyên zilam xira bûn, hate mal û bi ser te ve girt, nas û dostên te girt û çû. Tu dikarî çi bikî? Ev di dîroka cîhanê de jî pir in. Tê wê wateyê ku evîn di pêşî de girêdan û bingeheke welat pêwîst dike. Divê herêmên rizgarkirî hebin. Ev nayê wateya ku çi tiştêk nayê pêşxistin. Lê welatê te di bin layenê de ye. Li derveyê welat jî her qas di rewşa dikarin dest deynin ser deyî. Tu nikarî li virê xwe bidî cîkirin û jiyanê asayî bijî. Ku ez li virê xwe bi asayî bidim cîkirin û bijîm, tê we wateyê ku ez şewitîm. Hinek kesên din dikarin li virê wek keyekî bijîn. Lê ez nikarim xew jî bikim. Çima? Gava ku ez li ser vê xwe razînim, xwe pê de berdim, wisa bihesibîne partî çû. Di zemîna Başûrê Kurdistanê de pratîka wargehî ya hevalên me heye. Va gotin, “em di Heftenînê de hindêk gundan ava bikin, di Xakûrkê de em hindêk gundan ava bikin, ku nebe vê hindêk li Zelê bidin meşandin.” Encam gerîla razandina rastê û ber bi felîşandinê ve

birin. Halbûkî ew der qadên şer bûn, qet jî rewşên wisa tunebûn. Lê bi zanebûn razandina rastê ji vê re rê vekir. Li wirê zêde rewşa ku gundan bidin avakirin tunebû. Ger ku we li wan pezkûviyan binêriya, we yê ji wan waneyan derxistiba. Pezkûvî bi navê “panga min, mala min heye” bi misogerî li ciyekî tim û tim namîne. Ger we li pezkûviyan nihêrtiba, we dikaribû gelek teorî bida avakirin. Lê gerîlayê me li ber îmhayê ye, di bin xeteriya mirinê de ye.

Ji ber ku ez mirovekî rasteqînî me, yekemîn lêkolîvanê hezkirin û rêvekarê wê me. Lê li devera ku tune ye, xwe nadim razandin. Ma ev di we de peyda ne? Qet nîn in. Ma çemka me ya hezkirinê wisa ye? Naxêr! Ez rasteqînî me, hatime çilûpenç saliya xwe. Weke xeta serokatîyê biramin. Ez nabêjim bibin weke min, Ev ne hêsan e. Lê ji bo watedayîna hinek rastînan pêdiviya we heye. Gava di bîst salî ya xwe de bûm, ez jî wisa bûm. Ji ber ku ez rasteqînî me, di van mercan de ne kes min dipejîrîne, ne jî ez kesî dipejîrînim. Ma ezê çi bikim ji keça xelkê? Ewê çi bike ji zilamekî weke min? Rastîn hindêk wisa ye. Me xwest ku em berê xwe bidin têkiliyeke fermî. Tenê min gotiye veqetîn, min gotiye şer. Ma hê jî bi we re şer didim meşandin an berevajiyê wî dikim, di bingeh de ne diyar e. A yeman çi ye, wê heyam bide diyarkirin. Dîsa rasteqînî me. Şer û hezkirin cewîkê hev û dî ne. Gava ku Kurdistan dibe mijara gotinê, eleqê û hest dikarin bikevin bîrekî jî. Ger ku min wisa nekiriba, min nikaribû bûyera Kurd bibira çareseriyê.

Bi ziyarî dişopînin. Di refan de bi hezaran keç û xort kom bûne. Bi pêşgiriyan demborî li ser têkiliyan ambargo danîn heye. Ev dibe ku ji hinekan re wek harîtiyê were. Zilam di berê de nîşanî ye, zewicî ye. Ji wî re jî ambargo heye. Ev dibe ku jê re wek harîtiyê were. Zilam dixwaze hestiyariyê pêş bixe. Jê re jî ambargo heye. Dema ku artêş û jiyana artêşê bû mijara gotinê ev disekin. Baş e, ma qet nabe? Wê bibe, Lê çawa? Va, wê demê welat û perçeyek ax qezenc bike. Çivîkek jî ji bo hêlîn çêkirinê pêşî ciyekî azad peyda dike. Devereke ku her dest têkil dibin, hêlîn nayê çêkirin. Tu li devereke ku dijmin bost bi bost layen kiriye, nikarî hêlîna evîne ava bikî. Dibêjin “em şewitûn!” Pirsgirêk ne pirsgirêka şewitandinê ye, pirsgirêka rasteqîniyê ye.

Gelek di nav refên me de dibêjin, “me xwe negirt, trajîk bû, me hinek sepandinan jî jiya.” Têkiliya keç-xort bûye, nizanim di stargehê de çi bûye. Tebî peywir li aliyekî mane. Ew bi xwe li pey têkiliyê ne. Encam, herêmekî rûxandine, rêkxistin belav dibe. Ji ber vê yekê da ku têkiliyê rizgar bike, hevalê xwe qetil dike. Di bin navê têkiliyê de mirinê amade kir. Evîn, ma wisa dibe? Zayendîtî, ma wisa tê nirxandin? Ev bingehêke pir kirêt, pir xistûner e. Dîsa hezkirinek pêwîst e. Wê demê tu çi dikî? Tu vê di stargehekê de bi şewazeke birandoxî diqedîn. Pêwîst e pêşî bi hezkirina welat ve bîn girêdan. Ji bo ku hezkirina welat pêş bikeve, pêdiviya qezenckirina welat heye. Tu, ji bo qezenckirina welat gerîla, çek, şewaz, taktîk û çalakiya wî bîne hişê xwe. Ku tu di hezkirina xwe de bi îdîa yî, wê sehaya ku ev hezkirin tê de pêk were rizgar bike, rêkxistina wî ava bike. Dibêje,

“min vana nefikirî bû.” Wê gavê tu sextekar î, xwe dixapînî. Vê neqlê jî dikeve nava arasteyeke înfîharvarî. Tu ji bo mirinê şer nakî, tu ji bo rizgarkirinê derketî rê. Em dinêrin zilam, weke ku dixwaze jiyan nake, di vê rewşê de bêrêpîvan û bêhesab dikeve nava gerîla. Ev di we tevan de wisa ye. Hezkirina we jî bêhesab û bêrêpîvan e, çûna we ya mirinê. Ev kesayetiyek e ku nehatiye dahûrandin, ev di wateyekê de kesayetiyek ku xwe razandiye qumarê ye. Ez di vî temenê xwe de ne di nava pergâlê de me. Ma di nava şoreşê de pergala kesan dibe? Di şoreşê de her tişt dereasayî ye, awerte ye. Halbûkî mezinahî, nix afirandin e.

## **Di bingehê rastînan de karibî hez bikî, hez bike, karibî bijî, bije**

---

Ji destpêkê ve me got, divê di vî karî de jin jî hebe. Wê jin çawa be? Pirseka min ji jinê re heye: Tu kê yî, çi yî, ji ku derê têyî? Bi mafdarî dixwazim jinê nas bikim, bi hemû aliyan ve dixwazim nas bikim. Çima ezê xwe girê bidim? Ez dixwazim bûyera Kurd, netewa Kurd pêk bînim. Jixwe têtikiliyên jin-zilam netew qedandine. Ma ez jî xetayek bikim û biqedînim? Ma ez fersend didim vê? Her ku ji min tê gotin serok, di wî halî de pêwîst e giraniya xwe bidimê. Ev jin kê ye, çi ye, emê çawa binirxînin? Hemû jinan bi tevahî aliyan ve em digirin nav nixrandinê. Hun tev xasûk in; kêmasiyek herî piçûk bikim, hunê karibin gelek zilaman bixapînin. Jixwe zilam pir çewt nêzîkê zayendîtîyê dibin. Mînak tenê di derbarê zayendîtîyê de rast polîtîka diyarnekirin, artêşbûnê diqedîne. Hun dihizirin ku polîtîkayê de diyarkirin bi hêsanî tê çêkirin. Hun bergeh teng in. Di derbarê zayendîtîyê de nezîkatiya mezintirîn a polîtîk heye. Ji ber ku bi vê rewşa xwe zilam û jina Kurd zayendîtîyê de hev û dî diqedînin. Dîqat bikin, zewacên diwazdeh-panzdeh saliyê de pêk tên çi ne? Jin hê nehatiye bîstûpenç salî ya xwe, penç-deh zarokan xwedî dike. Zilam jî edî qilûs bûye. Dema ku tên bîstûpenç saliya xwe, li rastê ne zilam ne jî jin dimîne. Şerê mezinkirina deh zarokan tirsnaq e. Jixwe zarok nikarin bixwînin. Jin jixwe mehf bûye. Me çi fêhm kir ji vê jin û mêtîyê? Bûyereke tirsnaq, min bi erjengî pêşwazî kir. Min got, ez di vî karî de tun im.

Li rexmî van tevan, rastîna jinê dibînim. Çawa dibînim? Dibêjim, azadiya jinê wisa dibe û pêş dixînim. Tevgera jina azad heya fîzîka wê dadixînim. Dibêjim, hevala min wê tu serê xwe wisa rabikî, lingên xwe wisa bi rê ve bibi; ev meşa te ya şêwaza kole, ev awirên te şêwaza revê, zêde di hevalbendiyê de cî nagire; ev hestên te ji feodalîzmê mane, ev eleqedariya te ber bi rev û xiyaretê ve dibe. Hema çi aliyê ku me rexne nekiriye nemaye. Tebî em jineke netew diafirînin. Ev wê çawa bibe? Wê tu bi hêwilnak bi zanebûn bî, viyana te wek

awêneyê zelal nîşan bide, fîzîka te artîstîk be, wek peykerekê be... Ez çi bikim? Hê nehatiye bîst saliya xwe, bûye jineke quncifokî. Tîpeke jina wisa ez nikarim têxim nav bûyera me ya azadiyê. Ger ku di kevin de çêkiribin, ez ne berpîrsiyarê wê me. Ger ku dixwazin di nava refên me de pêş bixin, tu nikarî hevrê ya xwe bînî vî halî. Yek carî deh zarok nabin. Mercên me yên aborî û civakî yên heyî û rastîna me ya siyasî vê ranakin. Wî jî berde, têkiliyên pêşîn jî diyar nîn e. Minak hez bike qasî tu karibî hez bikî, xwe bide hezkirin qasî karibî xwe bidî hezkirin; di naveroka van esasan de tu azad î. Gava yekem jî nikare bavêje. Baş e, keseke ku nikaribe gava yekem bavêje, wê çawa karibe bizewice? Dest şidandinek, nihêrtinek jî rasteqînî nîn e. Bi ya min divê awir yeman bin.

Du kesan li deverêkê bihêlî, roja duyem ev têkiliya me ya reviyaye, ya jî çûye xiyanetê. Emê çi bikin ji têkiliya jin-zilamê wisa? Rêzdarî û hîrmet, hevseng û pîvana xwe tune. Yanî nikarin peyvên pêşîn ê hezkirinê jî ji hev re bibêjin. “Em ji bo çi hev û dî hez dikin, çima bi destê hev û dî digirin?” Hun nikarin wateya vê ji hev û dî re vebêjin. Roja duyem bi hetikînê, bi ketin û xistinê encam bigire, me çi fêm kir ji vê têkiliya jin-zilam? Şûna ku bibe, bila qet nebe. Xort û keçeke herî qirase li ser navê ji hev hezkirinê bila di nav têkiliyekê de bin, wê bê dîtîna ku evê bibe bela serê min. Wê çawa bibe bela? “Ez nizanim çi yê te nîn im; wê tu li min binêrî, ez dixwazim rûnê; li min nenêrî, ezê bixeyidim, bigirîm...” Zilam kiriye, keça belengaz çima neke!

Ji ber ku ez mirovekî rasteqînî me, ez xwe tevî van lîstikan nakim. Hun jî xwe tevî nekin. Zilamek we bigire, wê roja duyem ava we dirbixe. Hunê feleka xwe şaş bikin. Piştî jî hunê gazincan bikin, ez bûm çi, ez çima wisa bûm? Ma te di pêşiyê de hizir kiriba. zilamê xwe nas bikira. Tu baş nehiziriyayî. Ev kar bi ramanê dibe. Ez nabêjim bila hezkirin nebe. Bila bibe, lê bila rast bibe. Ez bawerim ku di têkiliyên we de ev çend taybetmendiyan bingehîn yên ku min jimartiye, li wan dîqatîkirin jî nîn e. Hun xwe pir hestiyar dihesibînin. Lê min xwe avêtiye navsera rastê, ez dizanim ku min xwe aniye rewşa yê herî jê tê hezkirin. Keseke ku ji min rast hez bike, qasî bibêjim tune hindik e. Ez çima xwe tînim rewşa jê tê hezkirinê? Tebî ji bo afirandina asta netew vê çêdikim. Ger ku hemû jinên Kurd ji min hez nekin, ez nikarim bibim serok. Heta li pêşberê jinan nêzîkatiyeke rast newergirim, ez nikarim bibim dostê jinê; ezê bibim wek wan ên dî. Tê gotin serokatî, diviya ye ku girêdan bi vî navî ve bê çêkirin. Di puxte û teşe de her tiştên te, pêwîst e têkûz pêş bikeve. Yên din ma wisa ne? Wek Barzanî, wek axayan diçespînin û digirin. Keçê dikişîne, perê wê datîne ango çu lê dixe, harema xwe ava dîke û ji xwe re dibe.

Tebî hun, hê van cîhanan nas nakin. Wek axatiya kevin, wê du xulekan de henasa we biqedînin. Bi pergale jî nexapin, kerax e. Pergal, jinê bêtir xistiye. Bêaramiya nav malbatê, tevahî aliyên civakî girtiye. Ev pergale, ji axatiyê xirabtir e. Pergaleke xirab a din heye: Pergala kapîtalîzma kerax. Li paş a zehmet dimîne.

Di bingehê rastînan de karibi hez bikî hez bike, karibî bijî bije. Di pêşî de têkoşîneke me heye, şerekî me heye. Di keçeke ciwan de bûyera hezkirinê dema tê pêkanîn, ka ew dikare çiqas şer bike bîne pêş çavên xwe. Nêzîkatiyên min hene. Keçeke gundî jî dikare derkeve pêşberî min. Lêkolîn dikim û dixwazim peyda bikim ka çi aliyên we yên dikarim pêş bixim hene. Mînak, wan taybetmendiyên ku di Turkan Şoray a wek tîpê jina nayê gihandin tê raberkirin de peyda nabin, dikarim di wê de bibînim. Bi rastî jî, ger ku keçên gundî derketibin nav bûyera azadiyê, dikarin ji bûyera jê tê hezkirinê re bibin mijarek. Dîsa weke mînak, ew aktîrîstên jin ên navdar ku tê gotin ji wan pir tê hezkirin, bila bi nêzîkatiyeke azadiya rast bi dest were girtin, di encam de wê bê dîtin ku ji wan nayê hezkirin. Mînak, demek berê dihate gotin ku Madonna ji hezkirinê ketiye. Ew jina ku zilam wê dihebandin, niha jê re qet eleqe nîn e. Bûyera hezkirinê ji xwe ve û tenê bi mezinahiya hestan dernakeve rastê. Lê di vê rewşê de gelek jin û zilam hene. Ji nişkave li hev dikevin û bi hev tên girêdan. Ev kar hewqas hêsan nîn e. Bi têkiliyeke piçûcîk hev xistin mijara gotinê ye.

Ez di vê mijarê de jî hestiyar im. Ku heya dawiyê ji cîhana azad re tevîbûn nebe, ma ez xwe girê didim? Şerê min ê herî mezin li hember wan ên ku dixwestin min bi xwe ve girê bidin pêk hat. Diya min xwest girê bide. Min ji dayika xwe re got, “gava ku te min anî cîhanê, bi pir fikirandin û paşerojê gelalekirin neanî.” Tebî têkiliya me wisa bû. Gotineke pir balkêş bû û hê jî di hişê min de ye. Min gotibû, “wek ên te wê zarokên min nebin!” Tê fêmkirin ku baş fikirîme. Hunê bikenin û biborin. Lê gava ku berpirsiyarî hebe, zarok wisa nayên çêkirin. Tuyê ji cîhana zarokan re çi tiştekî pêşwazî nekî. Ne dibistan, ne saxlemî, ne welat, ne azadî heye; çi tiştek nîn e. Zarokan raxî rastê. Ev nabe. Ez ji vê re dibêjim, li ber ajalîyê jiyandin. Çi bextewarî ji min re ku neketim gunehan. Ji zarokan re pêşî welatek, derfeteke azadî û jiyandina azad pêwîst e. Şûna ku mîrekî we yê xirab hebe, bila şensê we yê jiyandina azad hebe, bêtir baş e. Mêrê xirab, heya ku hun hatibana bîst saliya xwe wê we cangizok kiriba. Li ser navê cerbandinê yekê ji we em bidin mêr, piştî heftiyekî bigirin pêşberê xwe: Heke ku papa we derneketibe, ji min re çi dibêjin bibêjin. Çima? Ji ber ku rewş guncaw nîn e, merc ranakin. Bûyera hezkirinê wisa bi hêsanî nayê meşandin. Van karan ne min anî vî halî. Ez şopandinerê zanistiyê me, dixwazim felsefeyeke azadiyê bisepînim. Encam bû wisa. Pirsgirêka jinê, pirsgirêka hest û hezkirinê wisa derketin rastê.

Ji xortekî re çavên xwe negirin, rexne bikin. Min jî necibînin, rexne bikin. Dibe ku ê min jî aliyên ku hun necibînin hebin. Rexne bikin û bibêjin; em vê dera te naecibînin rast bike. Ji ber ku mafê we heye. Yekî ku bi navê serokê we xwe derbas dike, bi vê teşeyê rexneyên xwe pêş bixin. Çawa ku serok dixwaze şekil bide we, hun dikarin wisa şekil bidinê. Bi gor jineke Kurd, divê zilamê Kurd çawa be? Hunê bersîva vê pirsê di min de peyda bikin. Ji ber ku yekî di asta seroktiyê

de dixwazim xwe bidim birêvebirin im. Heke ku hun xwesteka jinên Kurd pêk binin, hunê gaveke mezin a rizgariyê biavêjin. Hun nebêjin jî, ez xwe bi gor jina Kurd eyar dikim. Divê her jin karibe min bicibîne. Hun dikarin bibêjin, heval ma ne bes e? Ne bes e, pêwîst e bêtir xwe bidim ecibandin, pêwîst e bi her tiştên xwe, xwe bidim ecibandin. Ev pir girîng e, ji ber ku ez nikarim bibim sextekar. Asta netew ji min re hewqas girêdan berpêş dike, ez jî neçar im ku rişt bim. Ez çawa zorê li van keçan dikim û dibêjim, “wiha şer bikin, wiha bi zanebûn bin, wiha bi rêkxistin bin” ez neçar im îdealên wana temsîl bikim. Hun jî, ji pirsra divê em çawa bên pejirandin re bi teşeyekê watedar dikarin bersîv bigihînin.

Ji bo zilam jî, zilamekî çawa? Hun dikarin bibêjin, “me pirsra çawa zilam ji zû de çareser kir!” Bi ya min hun xelet in. Dibe ku hinek aliyên hun dicibînin hebin ango hinek tîpên ku hun dilikî bibin jî hebin. Dibe ku ji çanda Yeşilçam ango ji çanda feodalîzmê bandordar bibin. Lê bi ya min ne bes e. Xwe bigihînin çemka zilamê nû. Ez dibêjim, ji dest dirêj kirinê heya bi her awayî libatî, divê bi temamî bi gor xwesteka we be. Ma eyb e? Wisa xwestek pêş xistin mafê we ye. Zilamê ku destê xwe ji were rast dirêj nake, rast nêzîk nabe, hunê çi jê bikin? Yê ku hezkirin û rêzdarî nîşanê we nade, hunê çi bikin jê? Yên wisa hunê li serê xwe bikin bela. Bi rastî jî di mercên heyî de zilam, li ser jinan wek totirne ye. Hun di aliyê fîzîkî de jî qels in, bi piranî diperçiqin û diçin. Pirsra zilamekî çawa ji bo we jî sotîner e. Lêgerîna zilamê ku ji fîzîk heya hestan we neperçiqîne girîng e. Hema fikirandina zayendîtiya bêteşe ne pêwîst e. Têkilî hema ne ji bo zayendîtiyê, ji bo pêşketina giyan û zanebûnê, heta pîrozkirina zayendîtiyê ye. Ev pevratiyeke pir xurt a jin-zalam bi xwe re derdixîne. Hilnaweşe ango bi hêsanî nayê lîstikê, xiyamet li welat nake, nabe vajiyê azadî û giyana takekesî ya mirov. Têkiliyên wisa ji bastûra jiyane re rê vedikin.

Tebî em dibêjin, emê vê bi şer biafirînin. Ez bi xwe jî mijara vê me. Ji pirsra çawa zilam re bersîv didim. Ez hewl didim ku ji pirsra çawa jin re bersîv bigihînim. Vê bi hedan û rikeke mezin bi rê ve dibim. Min xwe avêtiye rastê, ji rexneyan re jî vekirî me. Hun jî rast nêzîk bibin. Em dikarin bi hev re bigihîjin hinek encamên girîng. Qet eyb nîn e, şûna ku bi karbidestî û hêza xwe keçeke diwazdeh salî perçiqînim û bikim pîrejinok, di wê de hêza viyana bêdawî pêş bixim; xweşiktiya wê, hesret û behremendiya hilibjartina wê derbixim eşkeretiyê. Ev ji bo min bêtir azîneke ku tercîh dikim. Pêwîsteka herî girîng a rêzdariya min ji min re ev e. Li hember jin ango keçeke ciwan qet nabim perçiqandiner, qet wê ji xwe re hewcedar nakim, qet nayînim halê kesayeteke rajêr û pêvek. Bila jin azadiya xwe bide axaftin. Çareseriyê wisa dibînim û ez bi xwe jî vê dixwazim.

Pîvanên min ên jiyane berfireh in. Bila tu kes şaş fêm neke. Jina ku bi min re pîvanên jiyana xwe pêş dixwe, dikare hîtabê tevahî asta netew bike, dikare di hemû peywiran de serkeftin belên bike. Bûye jin ango mêr, girîng nîn e. Bûna rêheval pêk hatiye. Mirov piştî ku bû rêheval, dikare zewacan jî çêbike. Lê pêşî bi

misogerî divê di sînorên hevaltîyê de pevghîhîn çêbe. Divê di vê mijarê de pir bi îdîa, qasî îdfayê rasteqînî û pêşxistiner bibe.

Gotûbêjên dawî dixwazim wisa hindek şênber bikim. Bi ya min ji wan pîrsgirêkên ku wek tabû tê dîtin re şûna qet nenêzbûnê, divê em ji zayendîtîyê heya estetîkê, giyaniyê heya tûjbûna zanebûnê, her tiştî bi gor şerê me yê azadiyê ango di bingeh de bi wateya pê ve girêdan û wê pêşxistin pêgirê nîrxandinê bikin. Pêwîst e em karibin gotûbêjan rasteqînî bi rê ve bibin. Pêwîst e hevalbendiya rastîni biçespînin hev û dî. Divê qet em paşçav nekin ku, ev mijar herî hindik qasî çalakiyeke gerîla nîrxdar e. Ji ketîbûnê re bi misogerî derbasgeh nîn e. Pêwîstiya xwe wendakirin û kirêtkirinê nîn e. Pêwîstiya bêrêzdariyê nîn e. Zagonên me yên jîyanê zagonên şer in. Di wateyekê de em leşker in. Ji serî heya neynûkê di her misqala me de pêşbirka ku azadiya mezin a leşkertiye paşçav nake û jîyaneke ku ber ve baz dide: mijulî di vê çarçoveyê de ye. Bi we re di vê çarçovê de em gotûbêjê dikin û diponijîn. Ez bawer dikim ku encam wê bi serkeftin be, û ev dibe layiqê wan hevalên ku mîna we jiyana xwe danîne rastê.

Qadên ku hun jê hatine we teng kiriye, azweriyên we yên azadiyê hem çespandiye û hem jî ev azwerî zêde nehatine teşekirin; bi girêdana şerê azadiyê ve nehatiye destgirtin. Ji er vê egerê reqîtî û heta dem dem jiyandina qeyranê bûye mijara gotinê. Pêwîst e ev nebe asteke asayî û bi hêsanî tê pejirandin. Pêwîst e daxwaza azadiyê dîsa hebe. Lê giredana şerê azadiya wê, girêdana jiyana azad pêşçav kirin, pêwîst bike nûkirin û vegûhertinê de derbaskirin bê pêkanîn, bi vî awayî tevlîbûn divê bê rasteqînîkirin. Di demên dawî de esas tiştê em dixwazin bi hemû binkeya xwe bidin jiyandin ev e. Jidil tevî bibin, xwe rast bidin jîyanê. Yê ku qezenc dikin wê dîsa hun bin. Bi vê wateyê jî rasteqîna serokatîyê bi tevahî alîyan ve têgihîştin û sepandin wê ber bi jîna azad û têkiliyên azad ve bibe.

**12-13 Rezber 1993**

“Tabûyên we yên pir mezin hene,  
hun li hember derketinekî re jî wêrekî nîşan nadin.  
Ev tenê ne bo jinan,  
Ji bo zilaman jî derbasdar e.”

## **CÎHANEKE BÊ QEZENCKIRÎN HEYE**

Em bi têngînan zelalî didin qezenckirin, li ser jiyana kevin rexne pêş dixin. Em pirsra pêwîst e jiyana nû çawa be timî dipirsin. Kesayetiyeke ku radibe şoreşê, weke ku hewl dide ji tevahî aliyên kevin ên civakê qut bibe, jin jî da ku azad bibe diviyaye ku ji hemû zincîrên koledariyê qut bibe. Kevneşopî, sinc û statûya ku li ser jinê tê çespandin, tenê di çarçova malbat, hawîrdor û pergalê de bertek raberkirin bi serê xwe ji bûna şoreşgertiyê re têr nake. Ger ku jin, yek jî ya nû bibîne, bi jiyana nû bigihîje û hilkeftina bi xwe dana pejirandinê pêk bîne, wê

karibe bikeve riya azadiyê. Lê hinek mezin tabûyên we hene; hun wêrekî nîşanê li hember derketinekî jî nadin. Ev, tenê ne ji bo eniya jinê derbasdar e. Ez tenê ne ji bo civakê, ji bo binkeya ku xwe veguestiye nav partiyê jî dibêjim. Ev di nav binkeya zilam de jî heye. Bi wan dahûrînên qonaxa dawî ku me pêş xistiye, me hewl da ku vebikin. Di vê mijarê de em dibêjin, bi gor disîplîna rêkxistin û leşkerî tevbigerin. Ev xirab nîn e, kes di zêderiyan de nikare zêde wêrekî peyda bike, lê bi serê xwe ev çareseriyek nîn e. Di çiyê de, bi çek di nav mercên wekhev û azad de cîgirtina jinê gaveke pêş de ye. Bêyî zexta zilam rabihîse jiyandin jî, pîvananeke wekhevîyê ye. Lê di mijarên bingehîn de jiyana hatiye dahûrandin an na, naxêr!

Dibe ku her qas alîgir bi çewtî berê xwe bidin hev; gelş pir balkêş e. Mînak yên jêderka gundî ne, bi lezgin û bi îşaretên birû-çav dikarin hev bixapînin û birevin. Pêwîst e em bi rasteqînî binirxînin. Çawa bû ku hinek şervanên me fersend peyda kirin û hev û dî revandin û çûn xiyaneta herî xirab kirin? Va, rêveber e, lê li ba wî ku jinek qelsî nîşan dide, bi hêsanî di bingehê pir xweperest de hemû peywir û pîvanan dafîne aliyekî, heta xiyanetê dide ber çav û dikeve nav têkileyên bi her cure bêhevseng. Ya herî xirab jî, teşeyên têkiliya hevalbendiyê li pêşberî hev nadin pêşxistin. Bi “Xêr hatin”ekê jî bi teşeyekê rast çênakin. Bi taybetî hin kes di mijara hezkirin û evînê de du rastiyan jî nikarin bînin ba hev û helwesta xwe raber bikin. Ev rewş bilavî ne. Gelek libatên ku li ser navê hezkirinê dikare bê diyarkirinê, bi rihetî bi teşeyekê çilvirînê pêgirê şiroveya herî xeternak tê kirin. Bi taybetî ji aliyê zilaman rê tê vekirin ji bo fermana dardekirina jinê. Qaşo ew bi xwe jî hatiye xapandin. Hewqas dikare bikeve nixandineke neheq û newekhev. Di aliye din de ka bi rastî çilvirîn e yan na, ew jî ne diyar e.

Baş e, ya ne çilvirîn e, wê çawa be? Tu kes vê ji xwe re nake pirsgirêk. Weke ku zincîrekî nû bi xwe ve dadileqîne û li hember jiyana dibe mehkum. Dema ku em bêtir kûr dikin û em dirêjê qada civakî dibin (ku ji vê re pêdivî heye) bi hatina nav partiyê ne nedikare nişkave azad bibe, ne jî ji hînbûyînên kevin difilite. Bi taybetî ji binkeya kevneşopiya sincî ya kevin filitandin bila li wir bimîne, ev bêtir tê çespendin heta tê ziravkirin.

Pêwîst e li virê ji hinek têtînan re bêtir zelalî bê anîn. Me, ev yek-du salên dawîye di vê mijarê de hinek dahûrînan da pêşxistin. Me li ser çonayetiya jiyana gundî û jiyana burjuvaziye piçûk a li ser esasê zayendîtîyê çavdêrî pêk anî. Çemka namûsê a li ser vê bingehê û heta ew bandorên civakî, aborî û siyasî ku vê esas digirin bi hendazetî bi kar anî. Di xwiyangê de kesên ku pir dijberê zayendîtîyê disekin, di bingeh de tê dîtin ku di nav nêzîkatiyê zayendîtîya pir bêteşe de ne. Tê zanîn ku ev yek hem di jinê de, hem jî di zilam de di asteke pir kirêt de tê birêvebirin, zayendîtî tim wek amrazekê xistinê tê dest girtin û kes nikarin xwe ji vê bidine filitandin.

## Nêzîkatiya çewt ji zayendîtiyê re û mezintirîn bêçaretiya civakê

---

Dema ku em li gelemperiya cîhanê, em hizir dikin ku, emperyalîzm vê pirsgirêke bi gora xwe bêtir erênî û di aliyekî pêş de çareser kiriye, lê li welatên rajêr û li nav gelên kole jî zayendîti hatiyê veguhestin ber bi rastîna xistina civakî ya giring. Nedîtin gengaz nîn e ku, civakên wek me bêtir paşketî ne, çemka zayendîtiya pir hoveber û teşeyê herî xistî, di nav hev de dijîn. Girêdanên vê bi mêtîngiriyê ve hene. Wisa rewşeke zextê û xizaniyê afirandiyê ku, ji bilî ajoya birçîtî û zayendîtiyê wekî din tu fersend ji civakbûyîneke din re, îcar ji siyasalbûyîn û bîrdozîbûyînê re nas nekiriye. Di bingeh de çemka namûsê, çemkeke bîrdozî ye. Lê di nava me de ji vê çi tê fêmkirin? Jin, keç nizanîm nîşaniyeka zilam heye. Bi gora xwe yên ku çav berdidin van, bênamûs in; dema ku wana baş neparast, hingê ew bi xwe bênamûs e. Ez hizir nakim ku derveyê vê naverokeka xwe ye dî hebe. Ka ev çi qas kêr e, niha em baştir têdigihîjin. Di bingeh de pir êşkere ye ku, ev çemk jinê jî , keç û nîşaniyê jî rizgar nake. Li ciyekî ev çemk di hundirê xwe de ya herî bênamûs e.

Niha zayendîtiyê wisa tabûkirin, takekes bi ku derê ve dibe? Ber bi şûngeheke kesayetiya ku ji civakbûn, derfetên aborî û hêzbûna siyasî dîr dikeve ve dibe. Di destê kesayetiyeke wisa de ji bilî dana axaftina ajoyan pê de tiştêk namîne. Ev pir şênber e. Heke ku ajoyên birçîtî û zayendîtiyê di bin sînorekî teng de bin, ev her du hev û din hêwilnak xwedî dikin. Her ku ajoya birçitiyê pêş dikeve, zayendîti pir pêş dikeve; her ku ajoya zayendîtiyê pêş dikeve, ê din jî pêş dixîne; her wiha her du hev û dî kûr dikin û ev bêçaretiya mezintirîn a civakî ye. Pir wêdetir jî tê anîn rewşa çemkê. Ev di nava me de çemka malbata hoveber, çemka “jina min, mêrê min” û çemka zarokan pir hebandinê ye. Zaroka wê felç bûye, lê ew zaroka xwe di cîhanê de hebûna herî nirxdar dibîne. Halbûkî zaroka wê xirabî ya herî mezin aniyê serê wê. Le bi ya wê ev gengaz nîn e. Ez hê ji şaş dibim; min vê di ezmûneya jiyana xwe de jî vekir. Ji bo zarok çi tiştêk tune, lê wê tu çawa mirîtiya wan ji zarokan re rave bikî? Her ku hezkirina te hewqas rast e, tu çima zarokan hewqas bi êş û janan rû bi rû dihêlî? Hemû di nava vê nakokiyê de dixeniqin. Malbat xwe difiroşe, xwe pêşkeşî piyasê dike, bi şêwazeke herî xirab ji bazirganiya mirovan re rê vedike; zarokên xwe jî difiroşe, heta keça xwe jî difiroşe. Û bi gora wê ev çemkek e. Di bin nakokiya qirase de dixeniqe. Bêtir yên bèn diyarkirin hene. Hemû jiyane bi gor têrkirina çend ajoyan eyar dike: Têrkirina ajoya birçîtî û ajoya zayendî. Çima li rêkên dî yê têrkirinê nagere?

Va, ji ber vê yekê ji we dipirsim: Çima têrbûyîna rêkxistinî qels e, têrbûyîna siyasî qels e û têrbûyîna leşkerî qels e? Bi gor min, ji ber ku hun di sînore birçîtî û zayendîtiya bêteşe de mane, lewma. Mirov dikare bandora vê jî bihizire. Dibe ku kevneperestiya di vê derê de ye, ew kevneperestiya ku di asta rêkxistinî û siyasî de be. Heke ku hun jiyane bi teşeyekê têrkirina birçitiya zayendî ya pir bêteşe de binirxînin, dibe ku hun têrbûyîna siyasî, têrbûyîna rêkxistinî nehizirin. Gava ku mejiyê we tim bi van kirûyan ve eliqî ma, hunê gelek tiştan wenda bikin. Her hal di gelek kadroyên me de ev heye. Tiştê ji evîne jî fêr dikin, bi dibêtiyeke mezin azweriya mezin azayendiyê ye. Pêwîst e nêrina keç ji xort re, xort ji keçê re bê derbaskirin. Ê ku derbas neke, tu wî bikujî jî, nikarî bikşîni xeta rêkxistinî û siyasî. Her wekî ji nişkave dikare bireve jî. Ev mijar bi xwe re dehan-sedan ezmûneyan derxiste rastê.

Pîrozkirina bûyera zayendîtiyê çi ye? Pêwîst e zayenda jinê, zayenda zilam, hindek bi civakbûn û ber bi siyasalbûnê ve bê dest girtin. Wisa girêdayî hev dest girtin, xurtbûna bîrdozî û polîtîk û besbûna pratîk pêwîst dike. Da ku ev bê raberkirin divê hînbûyînen bêteşe yê jiyane bîn avêtin û bîn derbaskirin. Wê çawa bê derbaskirin? Em dizanin ku zewaca koledariyê pêş dixê ne çare ye. Di bîngê de zewaceke bêteşe vejena mirov diqedîne, li derveyê rêkxistê dihêle. Gihîştina gerîla û xeta rêkxistinê pir zor e. Encama wan zewacên ku di panzdeh salî de tîn çêkirinê, hilweşandin e; em vê baş dizanin. Pêwîst e ev pêvajoyê berevajî bibe û pîroziyê bibe. Em dixwazin hezkirinê pêş bixin, lê zemîn, hêz û çemka vê li ku derê ye? Zewacên bin panzdeh salî, çawa ku min got diqedîne. Derketina ser vê jî, bîçimên bêteşe napejirînin.

Wê tu bîçimê pîroz bicarbînî. Wergirtina vê bi helkirina hinek pîrsgirêkên rehdar ve girêdayî ye. Pêwîst e alîgir siyasî, rewşerbîr û civakî bin. Di halê berevajî de wê jin li zilam, zilam li jinê çawa binêre; weke hebûniyeke zayendiyayê bêteşe. Gava ku bi jinekê re were ba hev, ku di bîçimê hêza axaftinê de nêz nebe, wek hevaleyê nebîne, evê bibe têkiliyeke pir sosret. Ev nabe hatina ba hev a du mirovan. Ev sînoren mirovbûnê derbas dike. Ya yê pêşberê xwe wek zayendeke cuda qet nabîne, ya jî tenê wek zayendeke dijber dibîne. Ev, di bin sînore pir hoveber de rewşa ku tê jiyandin e. Tebî mirov ne ev e; hebûniyeke civakî ye, hebûniyeke siyasî ye, hebûniyeke dihizire ye. Dema ku te pêwîstekên vê anî cî, pîrozbûn dest pê dike. Ji bo vê yekê wê tu çi bikî? Wê tu bi civakbûn û hevalbûnê dest pê bikî. Wê tu bibî hevaleyê kûr. Bûyîna heval, di pîvanên rêkxistinayê me de rêhevaltî ye. Asta siyasî û asta rêkxistinê ya rêhevaltîyê heye.

Ev nezîkatî û nêzîkatiya namûsê ango zayendiyayê kevneşopîya kevin pev diçin. Wê tu vê pevçûnê çawa çareser bikî? Ya bi şoreşê çareser bikî, ya jî bi dij-şoreşê. Em dizanin ku dij-şoreş, bi sepandinên zayendiyayê bêteşe ya zewacên bin panzdeh salî ji xwe re bike palpişte. Em jî, her kes dizane ku berevajî dixwazin wan

zewacên ku li ser esasên zayendiya bêteşe ne bînin rewşa bi kar nayê, da ku xira bikin.

## **Kesayetiya dij-civakî nikare saxlem nêzîkê gerîla bibe**

---

Nizanim, ma pêwîst dike cardin dubare bikim ku ji vê şerekî mezin derketiye? Ajo pir hêzdar in, ji hînbûniyan bêtir hêzdar in. Ajo perçeyekê xwezayê ne; weke ajoya birçîtiyê, ajoya zayendiyê. Lê mirov jî, divê em ji bîr nekin ku dema tê ber sînorê mirovbûnê hindek ajoyên xwe sînordar dike û dibe mirov. Ango divê em ji bîr nekin ku ajoyên xwe hindek veguhêstiyê siyasî, civakbûn û ramandinê û bi mirovatiyê qonaxa sêlûnê daye pêkînanandin. Di sînorên zayendiya bêteşe de gelên Efrîqa seyr dikin. Em dizanin ka di kîjan asta zayendîtiyê de ne. Va, nexweşiya AÏDS jî hindek bi vê ve girêdayî ye. Li aliyekî di emperyalîzmê de asta zayendîtiyê ku seyr dike û li aliyê din de asta zayendîtiya Efrîqa ya hoveber ku pev diçin dibine çavkaniya vê nexweşiyê. Teqîna nifûs, encamekî vê nakokiyê ye. Standartên jiyana emperyalîzmê, standartê jiyana zayendiyê ya gelan, teqandina nifûsê ye. Wê ev bi serê xwe bikaribe xwezayê wêran bike û civakê bîne rewşa nayê jiyandinê. Hunê bibêjin ku, “ji bo me hewqas ramandina gerdûnî pêwîst nake!” Naxêr, em dixwazin van pirsgirêkên ku hatiye veguhêstin nav binkeya me derbas bikin. Hêsanîyê ve rev nîn e. Tebî di vê derê de pêşî civakbûnê bicerbînî. Civakbûn va, hatina ba hev e. Nêzbûna jin-zilam ji hev re ye. Ji hev re çend axaftin gotin e. Li ba me hin caran, ambargo heye, ji axaftinê re jî carna qedexe datîne; ev ne çareserî ye. Fersend nade axaftinê. Hev û di hema xapandin heye. Ev çareseriyê çawa ye? A ku em tînin çawa ye? Ji axaftinê re erê, ji nêzbûnê re erê; lê ev bi serê xwe çareseriyek nîn e. Hema dana axaftina zayendîtiyê re, na. Wê ev te bixe rewşeke herî bêteşeyî.

Baş e ya rast çî ye? Va civaka Kurd angî giştî mirovên me, Tirkiyê jî zêde cuda nîn e. Paşverûtiyêke civakî a mezintirîn û paşverûtiyêke aborî ya awarte heye. Ji vê paşverûtiya siyasî û bêhêzî dertê. Ev yek girêdanên xwe bi bîrêkxistiniyê ve heye. Lewaziya di şewaza lîxistinê de, xwe diteyisîne warê leşkerî û tu bi vê ne tiştêk î. Ev kesayet nikare saxlem nêzîkê gerîla bibe. Min xwe di ve mijarê de amade kiriye. Di lêkolîna we ya ezmûneya min de feyde dibînim. Ji aliyên min ên herî baş, bi ya min yek jî divê bibe ev.

## Nêzîkatiya min a jinê vegeriya şerê man û nemanê bi KTyê re

---

Min ji xwe re got, “ji hevaltîyê re erê.” Bi keçan re hevaltî û leyistin xweş e, lê dema ku ez hatim sînore zewacê bertekek bi min re çêbû. Min got, “wê ev damezrak min bixwe.” Pir bi dudilî nêzîk bûm. Piştê di astekî pêşketîtir de xwestim ku têtîliyê bi jinekê re kûr bikim. Lê di vir de jî min xwe wenda nekir. Dikarîbûm ketibama nav pîvanên malbata kevneşopî; pir hayjixwe nêzîk bûm. Hun dizanin, ev vegeriya şerekî mezin. Hema hema bi KTyê re bir heya şerê man û nemanê. Heke ku min xwe terkeserê kevneşopiyan kiriba, yek jî kevneperestiyê jiyaba û bigota keç li aliyekî, xort li aliyekî, ev wê min biribana feodalîzmê. Heke ku ketibama lêgerîna malbatê, ev jî wê min biribana wirê. Dîsa di têtîliya hatî avakirin de ketibama nav nêzîkatiya burjuvaziyê piçûk, wê min biribana radestbûna dewletê. Em berdin ji min derketina şoreşgerê, tenê wê kariba mamûrê piçûk ê ku xelas bûye û qediyaye derketibana. Lê berevajî, ji vê bûyerê re pir endaze û hevseng nêzîk bûm. Ji ber li hember çespanînen kevneşopî û pergale stû netewandim, ev bûyer di şoreşgerbûna min roleke mezin leyist. Niha hun dizanin, ez bi jinê re mijul dibim û nêzîk dibim. Nêzîkbûna herî mezin em pêk tînin, lê hê jî pîrsgirêkê bi çavên “hat çareserkerin” nabînin. Evê, ji pêşketinê re hindêk rê vekir, ev nayê înkarkirin.

Baş e binkeya giştî ya kadro çî dike? Bi rastî jî me ditirsîne. Carna hema dimîne hetikî derkevin. Hev û dî dibînin, dibêjin, “em hestiyar bûn” Ev nêzîkatî roja duyem ber bi revê ve dibe. Hatina ba hev çima kirêt dibe û piştê ji revê re rê vedike? Halbûkî pêwîst e pir gotûbêj bikî. Pîrsgirêkên te yê hezar salan hene. Tu dikarî gotûbêj bikî. Yek carî dikarî bikî heval, bikî rêheval. Em dixwazin hevalbendiya şer, hevalbendiya rêxistinê zêdetir pêş bixin. Gelo ev hezkirin tê zanîn, ango tê bawerkerin ku ev hezkirin pêwîst e? Me danî rastê ku hezkirin li ba me hatiye qetilkirin.

Mêtîngerî qirkirina hezkirinê ye; di heman demê de ji têtîliyên saxlem a di navbera her du zayendan re gora qirkirinê daye kolandin. Pergal jî rojane di kevneşopiyan de bi tevahî qirkirina têtîlî û hezkirinê ye. Ev jî dane ne.

Baş e emê li hember qirkirina hezkirinê çawa têtîliyên rizgariyê bidin? Ev jî dahênanê zanistî ye. Her ku qirkirin heye, hingê li hember vê qirkirinê divê berxwedan jî hebe. Ger ku vê paşçav bikî, tu nikarî hezkirinê pêş bixî. Nirxandineke min pir di pêşî de hebû: Şoreşa me di heman demê de şoreşeke hezkirinê ye. Ev jî têtîliyên zanistî ye; wisa ne pênaseyeke remzî û wêjeyî nîn e. Li hember qirkirina hezkirineke rastînî, çespanîna şoreşa hezkirinê pêwîst dike.

Ev, bêşiphe, di navbera zayenda jin-zilam de jî bêtir bi ponişîn hatiye pêşxistin. Ji vê re em dibêjin, hest! Tenê ne di navbera zayenda jin-zilam de, em neçar in ku di navbera hemzayendê xwe de jî pêş bixin. Nêzîkatiya rêzdariya zilam ji zilam re, heye yan na? Mêtîngerî û feodalîzm mehf kiriye. Rêzdariya jinê ji jinê re heye yan na? Naxêr; dexesî, hev û dî nekişandin her wekî fena kurmekî van têkilî, jidiltî, hezkirin û rêzdarîyan diqewêre. Tuyê van hemûyan çawa asteng bikî? Pêşî bi hevnasînê. Ez ji were bibêjim, hun hê di sêlûna hevnasînê de ne, hunê şaş bibin. Pêwîst e hevnasîn hindêk di bingehê dîrokî de bê çêkirin. Li ser navê zayendê ji ku derê têyî ku derê; kîjan pirsgirêkan dijî? Hevnasîn, dibin ew bersîvên ku ji van pirsan re bîn dayîn. Nexwe ajal jî, dema ku zayendên dijberê xwe dibînin, hema bi ajoyî nêz dibin; ev bûyereke hevnasînê nîn e. Pênaseya mirov li ser vê yekê ye. Ger ku hun li derdora pirsên “di nav dîrokê de çi hat serê min, rewşa min a dîrokî û rojane, peywira min çi ye?” gotûbêjê pêk bînin, dikarin derfeta derketinê peyda bikin.

Heke ku tu vê hevnasînê pêk neyînî, wê tu kîjan têkiliya evînê pêş bixî? Evînê jî di wateya biyekbûna mirov di her astê de nehizirin.

Bûyera evînê têgîneke bêtir cewaz e: evîn, azweriya ku ji bo azadbûna mirov tê rabihîstin, ji xweşîkbûna mirov, tevahîtiya libatên mirov û ji hêza mirov re rêzdariya ku tê nîşandan e. Em qala evîna takekesî nakin; di vê mijarê de ne tştek e. Bi gotineke, “canê min vê dixwaze, vî dixwaze” nabe. Li pêşiya te wêranî û qirkirinek heye. Heya ku tu wan derbas nekî, neborînî tu nikarî tişteki bikî. Nêzîkatiya “ya emê bigirin û birevin ango înkâr bikin” çewt e. Pêşî heval û rêhevalbûn pêwîst e. Em vê gotûbêj bikin.

Pêşî em kî ne, em çi ne, em ji ku derê tên? Em dixwazin civakeke nû ava bikin. Civaka nû, wekhevî, azadî, rêzdarî û hezkirinê destpêkê em di navbera xwe de pêk bînin. Di vê mijarê de herî kêr hêza te ya pirsîkirinê û derbirîna rêzdariya herî kêr nebe, ku tu bibêjî, “em civaka nû û sosyalîzmê ava dikin” we qîjîk jî bi vê bikenin. Ev, hev û dî xapandin e. Ji jinekê hez bike, roja duyem ji rêveber re bi meliqandinê wê bixwaze mesafe wergire û bibêje “a hêrî baş wisa ye!” Rêveber jî bi karbidestîya xwe jinê hema wek axayekî bigire bin serdestîya xwe, dikîşîne xulamtiyê û dixwaze bi kar bîne. Te çi kir li virê? A kevin bi awayekî herî xirab li serê me kir bela! Wekhevî û azadî li ku derê ma?

Di nava refên me de niha serbest bihêlî, nîve wan jina kevin, nîvê din jî mêrê kevin in. Ka wê me civakeke nû ava bikira. Xewnên me yên civaka nû, hêvî û armancên me, tu bi harkirina pergala malbata kevin tûnî ber qedanê! Ev xeterî ne xeterîyeke ku xwe hindik dide hîskirin. Em hewl didin ku çareser bikin. Dibe ku hinek bifikirin ku ez bi karên ne pêwîst ve mijul dibim, lê wisa nîn e. Keç û xort divê çawa hev û dî nas bikin? Dibe ku ji were wek pirseke pir fişarde were. Lê bi ya min hê jî ev qonax tê jiyandin. Ji naskirinê wêdetir, gelo hun dikarin hêza nêzîkbûnê ji hev re nîşan bidin? Heke ku hun nîşan bidin, bravo! Heta min vê got:

Di bingeheke rast de yê/a ku dikare evînê pêş bixe re ezê bibêjim, bravo! Di bingehên rastînê de hezkirinekê, evînekê ger ku dijîn, wê mirov şanaz bibe. Lê rewşeke wisa heye yan na? Her du hatine ba hev, tu lê dinêrî felişandina rêkxistinê pêş ketiye. Ezê çawa ji vê re bibêjim, evîn, hest û azwerî?

Hebûn û tunebûna te rêkxistin e; lê bi vê nêzîkatiya xwe tu rêkxistinê diqedîn. Ma me negot, bi awayekî din em dikarin çêbikin. “Piştçeper pêwîst e, ger ku nebe ji bo me rev pêwîst e!” Ma evîn wê wisa biba? Ma hêza evînê ji vê re rê bida vekirin? Naxêr, tam berevajî. Li welatekî ger ku qadeke te yê çalakiya serbixwe kêm-zêde tune be, yek carî nêvenga hezkirinê nîn e. Ji bo hezkirinê welat pêwîst e. Zêde tevî nêrîna “hezkirin li her derî dibe” nabim. Çivîk jî tenê dikarin nêzîkê hêlîna xwe bi hev şa bibin. Ê wan jî bi gor xwe çemkeke azadiyê heye. Tu nikarî li Ewrûpayê evînê çêbikî. Karkerên me çûne, xweziya xwe bi Ewrûpiyan tînin. Xwezî bi Yeşîlçama ku Ewrûpa jî henekên pê dikin, tînin. Nizanim, xwezî bi Amerîka tînin. Li Yeşîlçamê tenê rezîltî û hetikîn pêş dikeve, ne evîn! Baş e bi teşeyê ku hun dihizirin de emê welat çawa rizgar bikin; çawa bi gel ve bên girêdan; de îcar ber bi girêdanên rêkxistinê ve çawa herin? Ger ku bi salan e ev nayê pêkanîn, hingê evîn qet nayê pêkînanîn. Ev di dahûrîna dawî de çawa pêş dikeve?

Zayendîtiyê bi gora xwe dikarî di her astê de bijî, lê di siyasetê de serkeftina te nabe. Di rêkxistinê de serkeftina te nabe; ger ku nebû, wê tu birçî bimînî; ger tu birçî mayî, ne tu wî aliyê, ne jî ew alî dikare te debar bike. Di encam de alîgir dikevin nava hev û wê bixwaze ku xwe bifiroşe ciyekî cuda. Di bingeh de pirsgirêk pir alî ye. Di xwiyangê de hun dikarin bibêjin, “du ciwan in bi destê hev girtin, bi hev şa bûn, ev kar bû û qediya!” Lê em dinêrin qet wisa naqede. Pirsgirêka hestan bi serê xwe qasî çiyayan e. Ez hatim vî temênê xwe hun dizanin, ez têkiliya rêkxistinê hêwilnak pêş dixim, di girêdanên rêkxistinê de bi hun jinan re têkiliyan pêş dixim, lê hê jî ez nabêjim, “tu hewqas xwediyê hezkirin, hewqas xwediyê evînê yî.” Ez dikarim bibêjim, “em li mal man!” Rasteqînî me. Ez hezkirinê di asta gel de diramim, di asta welat de diramim. Ji min re tê gotin, “tu serok î.” Tebî serok neçar e ku ji bo hemû jinan, ji bo hemû zilaman hezkirinê berhem bike. Ger ku neke, wê bibe yekî sexte. Lê ez li wê ya hun dijîn dinêrim, hun dibêjin, “ya emê destê xwe ji vî karî bikişînin ya jî xwepereştiyê heya nav mixê xwe bijîn.” Nabe; ji ber ku nabe jî, hun nagihîjin pênaseya hezkirineke rast û pênaseya têkiliyeke rast. Qeyran dest pê dike. Erê, rêkxistin jî wenda dike, lê tu jî diqedî.

Niha di vê mijarê de rastîn wê çawa derkevin rastê û bên çareserkirin? Di vê mijarê de şewazeke me yê têkoşînê heye, bêtir naxwazim vekim. Bi misogerî dikare bi civakbûn, siyasalbûn û rêkxistinbûnê ber bi çareseriyê ve biçê. Pirsgirêkê jêbûnî nake, lê girêdanên wê misoger in. Îcar di mercên têkoşîna me de, di jiyana me ya partiyê de bêtir misoger in. Ger ku ji yekê tavîz hate dayîn,

yên din paş dikevin. Te yekê înkâr kir, wê yên din qels bihêlî. Emê hevsengê çawa bigirin? Ji bo vê yekê dibêjim, komple şoreşgertî! Wê tu asta têkiliyan pir hunermendane biafirînî û rêxistinê ji bîr nekî. Şer, jixwe bûyereke e ku tu di kozikê de dijî. Dîsa azweriya te ya welat, jixwe bingeh û zemînê her tiştî ye. Wê tu hindêk bi van pîvanan herî ba yê dijberê xwe. Tu dixwazî bi xortekî qeşeng re, bi keçeke xweşik re yekitî ava bikî, wê demê wê tu têgîna bingehîn esas bigirî. Xweşiktî tenê di vê bingehê de dikare wateya xwe hebe. Pîrozî ango bi kêr hatina têkiliyeke di navbera zayendan de, tenê di vê bingehê de dikare derkeve rastê. Di halê berevajî de wê di aleyh de encam bigire. Ku tu bibêji, “ka bisekine azweriya xwe bijîm, ka bisekine zewaca xwe bijîm, ka bisekine xwe bijîm” hingê tu encamê vê jî bidî berçav. Di nêvenga rêxistinê de yên ku xwe didin jiyandin ka hatine çi halî we dît. Ger ku wisa bû, tiştek namîne. Zor e, pêşengî wisa hêsanî dernakeve rastê. Hun çima bêpertav dimînin? Hun di vî aliyê de jî xwe pêgirê dahûrandinê nakin. Ev teşeyê dahûrînê pir zortir e. Di bûyera rêxistinê de yên ku xwe nadahûrîn, hindik dimîne di nav stêrkên çavan de bixeniqin. Radibin ku xwe bikujin, ber bi revê ve diçin. Di vê mijarê de xwe dahûrîn nekirin, stêrkên çavan de dixeniqîne, ber bi xwe kuştinê ve dibe. Îcar xweperestiya du kesan pir zêdetir xeternak e.

## **Tu dikarî di rêjeya pêşxistina hezkirinê de şer, di rêjeya pêşxistina şer de jî hezkirinê pêş bixî**

---

Her wiha dahûrîna malbatê bi dahûrandina me ya takekes ve di nav hev deye, lê bêtir berfireh e. Şoreşgerkirina malbatê ango şoreşgerkirina têkiliyên jin-zilam, ji şoreşgerkirina takekes zehmetir e. Hunê pêşî wan kevneperestî û hînbûyînen di van waran de bibînin. Ger ku gengaz be di vê bingehê de kuştina kevin hunê bigirin berçav. Di her tiştê ku li ser esasê kevin e, hezkirin û hest tune. Heke ku hebe jî, du hundirê wê hezkirinê de xiyaret heye, qirkirin heye; weke kes jinê hezar caran xwe daye înkarkirin, aniye rewşeke peñç pere ango aniye halê yeka bêrûmet. Me çi fêm kir ji vê hezkirinê, ji vê têkiliyê? Ger ku hun bixwazin, ezê bibêjim, bicerbînin. Di vê mijarê de jî hun azad in, lê yek heftî derbas nabe, ev têkilî ka wê çi bi serê we ve bîne, hunê bibînin. Ma çima? Sedemên vê tîrêzkirin. Jin di aleyhê zilam de mîna dolabekê dixebite ango fena aşekî wî dihêre. Zilam ger ku heftiyekî tirûş bike, ezê bibêjim, bravo! Heke ku jin ji rûmeta xwe tavîz nade, zilam em rojane têkiliya zayendê bigirin heya xwarin-vexwarinê nizanîm, bi her awayî têkiliyê de serdestî dixwaze. Zilam, bi gora li ser jinê heqaretkirin, bi tiştekî nehesibandin, bêrêzdarî nêzîkbûn hatiye teşekirin. Di vê wateyê de paşverûyeke super e. Jin jî, dibêje, “rûmeta min nema, ez bûm

pîrejinokek, ketim nav dest û piyan; fizîkî, giyanî, ramanî qediyam!” Li jineka gundî binêrin ramana wê qediyaye, fîzîka wê kulînce bûye û tepîşiyê. Di bedena wê de tiştêkî mîna giyanê dîtî ne gengaz e. Zilam wê çî bike ji jineka wisa? Wê pehîn lê bixe, haqaret lê bike. Ma nêzîkatî ne ev nêzîkatî ye? Tebî jineke wisa nikare tiştêkî bike, qediyaye.

Ka ew evîna ku we avakiribû, hestên we hebûn; lê ji bo wê di bîst salî de jiyana mir. Ez li hember jiyane rêzdar im. Yek jî di vî aliyê de min sond xwariye ku jiyane rizgar bikim! Ezê di tîkiliyên jin-zilam de vê astê nepejirînim. Ev, bi min vegeyîya şerekî mezin. Nexwe ne xwe tînim rewşa mîrekî wisa, ne jî a dijberê xwe tînim rewşa jineke wisa. Çawa ku tê dîtî îro ev şer gelemperî bû û vegeyîya şerê azadiya zayendekê.

Erê, niha ya ku bi we re didim şerek e. Li hember wê jiyana we ya di nava partiyê de ji şerekî pê de ne tiştêk e. Bi rastî jî hun şer di aliyê zayendî de dijîn. Hun vê li ser navê azadiya zayend bi rê ve dibin. Bi awayekî dî alternatîfa vê jî, teşeyê jiyaneke din e. Heke hun bixwazin, bicerbînin, lê roja duyem hunê gaziç nekin. Hunê nebêjin, “bila rêxistin bi min alîkar be, min bikişîne piştçeperê, min derxe derveyê şer!” Li Ewrûpa çend kes derketin. Bi rastî jî nizanin rast û durust bijîn. Ezê ji vê re nebêjim zewac jî. Ew niha xayînen herî mezin in, fersend peyda bikin wê partiya me biqedînin. Yên ku revîyan Başûr jî hebûn. Ew jî ger ku fersend bibînin wê partiya me biqedînin. Keçeke ku li serê me bibû bela hebû. Me deh salan li ser piştê xwe hilgirt. Di dawiyê de navendiyekî me girt û revîya. Perê me jî bir. Peywirên pir girîng hebûn, li wan xiyaret kir. Ma dijraberiyeke herî gewre derbeyeka wisa dikare lê bixe? Wê bi xwe digot, “ew derbeya min lîxistî eşa wê bi salan rabihîse.” Li egîdiyê binêrin! Wisa bi dehan mînak derketin. Dîsa gerîlayek hebû, yeka bi kênehati bû. Çawa xapand; li ser esasê karbidestiyê çû, niha di qawîşa îtîrafkaran de, “orispîyek” e. Êşek pir mezin e, lê rastî ne. Dixwazin hemû keçikan bînin vê rewşê. Qaşo hev û dî girtin û revandin. Qaşo tevgera rizgarkirinê damezrandibûn!

Naxwazim mînakên di nava partiyê de zêde vekim. Ezmûn û tîkoşînen ku min jiyaye vegot. Pir stratejîk, di heman demê de komîk! Pirsgerêkek e zehmet. Evîn qet hêsan nîn e, karek e ku rêzdariya mezin dixwaze. Bîngehê wê jî, li ser esase rêxistin û serkeftinan e. Ez eşkere bibêjim; jina ku bi ser naxîne, ezê çima qasî metelîkekê qîmet bidimê? Dixwaze bila zilam be, bila jin be, ku te nîrxdarî nedît rêzdariya te nabe. Ku rêzdariya te nebe, hezkirina te nabe. Ji vê jî, tîkiliyeke hêzdar dernakeve. Pir eşkere ye: Bila rêxistin bin bikeve; welat, mîlet, gel hemû ji dest herin, wê tu jî bibêji, “min evîne rizgar kir, min li Ewrûpayê jiyane eyar kir, xwe spartim filan rêxistinê!” Ev, bînamûsiya herî mezin e. Bi vê teşeyê rizgarkirina hev, bi vê teşeyê şîdandî parastina hev ma namûs e? Ku tu vana bigirî û perçe bikî, tu mafdar î. Bi vê wateyê helwest rast e. Li aliyê dî dinêrî, hizir

nakim ku li tu ciyekî din hewqas azadî, wekhevî, rêzdarî û hezkirin ji têkiliyan re bê dayîn û kesekî dî ji bo vî karî hewqas mijul bibe.

Bi kurtasî em têkoşînê bi rê ve dibin. Bila çî kes ne li benda çareseriyên hêsan be! Ev mijaran ked dixwazin. Her wekî ku em li hember hestan rêzdar in, wê demê emê pêwendiyên wê bi kedê re ava bikin. Pêwîst e di vê mijarê de nerêzdarî li hember kedê çênebe. Yanî xwe ne pê de berdin, ne jî rahêlin. Nebin haletên nêzîkatîyên zilamê enzan. Ger ku keda we nebe, bi taybetî bi palpiştiya qismê rêveberên zilam, xwe nexin rêka rizgariya erzan ango mesafe wergirtina di nav rêkxistinê de. Ne erzan hez bikin, ne jî bila erzan ji we bê hezkirin. Xwe rast bêxin riya hezkirinê.

Hezkirin pêwîst e. Şoreşger ger ku rast nêzîkê bûyera hezkirinê nebin û hezkirinê pêş nexin xeternak e. Me dîrûşmeyerî avêt rastê: *“Tu dikarî di rêjeya pêşxistina hezkirinê de şer, di rêjeya pêşxistina şer de jî hezkirinê pêş bixî!”* Teşeyekê rast e. Ev şerekî di her astî de ye; ez ji ezmûna xwe dizanim. Çima hewqas eleqe nîşanê zayenda jinê didim? Ji ber ku min şer pêş xistiye, lewma. Ez di berê de ne wisa bûm. Hun çima niha bi hûrgilî û pejnkerî eleqeyekê pêş dixin? We hindek eleqe ji şer re nîşan da lewma; di hezkirina keça ku dixwaze tevî gerîla bibe de pîrozî dest pe dike lewma. Tebî tenê xwestin ne bes e. Heke hun rêkxistin, şewaz û taktîkên wê pêş bixin, hunê bigihîjin girêdanên hezkirina herî nirxdar. Û ji vê derê welat rizgar dibe. Her ku wisa ye, bibin hêza rizgariya bingehîn a welat û mirov. Hebûnên pir rêzdar derxin rastê.

## Mirov di hêza atomê de behreyek e

---

Her ku em gotûbêjên pirsgirêka jinê wisa di quncên cewaz de digirin dest, armanc xitimandinên di jiyana partiyê de dana derbaskirin û bikarainîna milîtantî ya şoreşger, bêyî ku zêde astengan ve rû bi rû bimîne, ber bi herikandineke geş ve birin e. Çawa ku tê zanîn, mirov embara vejen a mezin e. Ew vejen her ku veşartî dimîne dirize, li nava xwezayê belav dibe û bi gor zagonên xwezayê bi kar tê. Em hewl didin ku mirovê dije ji bûyîna potansiyel derxin, vegeştînin vejenê, vê jî weke warekî dahûrîner ê bingehîn ber bi şerê siyasî û piştî yê leşkerî herikandinê ve bînin rewşa hêmanekî çîst. Bi rastî jî mirov di hêza atomê de behreyek e; gelş şayana teqandina wî ye.

Hunê bibêjin, ka çî pêwendiya vê bi pirsgirêka jinê ve heye? Mirovê ku ji zayendîtiyeke bêteşe nefilitiye, mîna teqandinê ye. Lê weke Çernobîl teşkele çêdike; tenê mirovan dikuje, felç dike û ber bi seretanê ve dibe. Dizanim mirovên ku dîl kirine hene, jin hene. Bi tevahî behreyên xwe ve xeniqîne, bêyî ku bijîn mirine. Divê ev bê perçekirin. Çima hewl tê dayîn ku potansiyela kesayetiyên

averêbûne bê çistkirin? Ev bi temamî jin û têkilî eyarkirineke bi gora berjewendiyên mêtîngeriya kerax yê çîna serdest e. Ta ku li hember vê şer neyê vedan, rêzdariya jiyane nayê pêşxistin. Ji ku derê ve bê nêrin bila bê nêrin derbaskirina qirêja derdora cîhana jinê bi derbekirinên şidiyayî li ser esasê têngînên nû, li ba vê yekê herikandina vejeneke paqij-zelal û anîna rewşa hebûniyeke ku kesayeta jinê peyda dike û çist dibe, bêgotûbêj peywireke şoreşê ye.

Em bi vê bawer in û ji bo vejena jinê derxistina eşkeretiye, tevahî hêza xwe datînin rastê. Zexta çîneyetî, kevneşopî û sinc, dîsa venêrana mezintirîn a civaka serdestiya zilam, jinê aniye rewşeke nikare henase wergire. Şoreş, her ku kom, gel û civakên di bin zextê de derdixe eşkeretiye, di aliyê din de jî, ji vana hêz dide avakirin. Ev ji bo jinê bêtir pêwîst e.

Di destpêkê de rasteqînê bi çewtî û rastiyan ve naskirin, piştî jî veguhertin pêwîst e. Pîştî ku çewt-rast ango xweşik-kirêt hate diyarkirin veguhertinê dana destpêkirin pêwîst e. Bi vî awayî peywira çewt û kirêt derbaskirin, rastî û xweşikîyê serdestkirin dikare pêk were. Vê jî şoreş çêdike. Pirsgirêk objektîf e û warekî peywira şoreşê ye ku nikare di ser re derbas bibe. Li ba me ev kartêkerekî herî xitimandiner e. Hem di hundirê partiyê de, hem jî derveyê partiyê de kesayet neketine riya hev xurtkirinê. Hê jî riya terpilandinê dijîn. Mînak hun dibêjin, “Pergala wêkhevîyê”; wêkhevî çi ye? Em zewacê bigirin dest; em ji vê re bibêjin meşa pevretî ango pevreyî ya nijada mirov. Heke di vê de pevretiya armanc, pevretiya biryar hebe, diyar e ku ev hevalî hatiye pêkanîn. Lê ev damezraka pevreyiyê ku damezraka malbatê ye, ger ku hatibe rewşa xistin û ketibe rewşa amraza bi rasteriya meşê ve dikeve nav nakokiyê, di vê rewşê de, ku ew hatibe şûngeha dijrabêrê berjewendiyên civak û netewê, wê demê em nikarin qala têkiliya saxlem a hevalî û zewacî û têkiliya azad bikin. Lewma di vê bingehe de malbatê bi rexneyeke tund pêgirkirin û dîsa têkiliyan ji rexneyan re vekirin jênerevîn e.

Ev têkilî û jiyaneke çawa ye; va, di nêvenga partiyê de bi hewldanên piralî em dixwazin pêş de bibin. Aliyek vê yê ku neyê têngihîştin û bê lomandin tune; ji ber ku peywîrek e. Jixwe jin, ji ber zext û rewşa nayê pejirandin a ku civak diçespîne, diherikin nav partiyê. Sedemê bingehîn ev e. Pêwîst e hun bergîdana vê bibînin. Partî, bi dayîna nêzîkatiya azadiyê, jin jî bi meşandinê berpirsiyar e. Divê mirov xwestekên xwe berevajiyê vê nexîne. Bi taybetî jî divê bêriyên xwe bi şerê xwe re bike yek. Her wekî ku şerê partiyê, bi wateyekê şerê jinê ye jî. Pêwîst e avakirina pêwendiya navbeynê baş bê zanîn.

**Şûna stû tewandinê  
di riya têkoşînê de her roj mirin bêtir di cî de ye**

Şûna ku mirov bibe mehkûmê kevneşopiyan û were xeniqandin, di oxira azadiyê de têkoşîneke mezin vedan hezar car çêtir e. Şûna stû tewandina mercên ne bi salan ku bi qasekê jî mirov nikare bihedirîne, di riya azadayî de her roj hezar caran mirin bêtir di cî de ye. Azadî, di pêşiya nan û avê de tê. Dema ku hun bibêjin, “Nan û av pêdiviyêke bingehîn e” û spasî bikin, hingê hunê li hember nixekî bingehîn ê jiyane berevajî bikevin. Ev bingehîn sedema serberjêrkî çuyîna we ye. Lê ger ku şûna vê de, hun ber bi azadî û têkoşîna wê ve biçin, ev helwesteke rast e.

Pênasa pêşketina PKK wisa tê çêkirin. Bi rastî jî, di bingeh de ev taybetmendiya PKK jinê kişandiyê. Em bi dahûrînan ji vê re zelaltî tûnin û dîsa ka wê çawa pêwîstîkên vê bîna cî didine diyarkirin. Bêguman çareseriyêke wisa reçetewarî ango qasekî nikarin pêk bînin. Weke di çareserkirina her pirsgerêkê de, di vê derê de jî ji têkoşîna salan re pêdivî heye. Wekî din çawa ku di her warî de heye, ev war jî pêdiviya xwe bi afirandineriyê heye. Ya herî girîng jî ev, bi rêxistinê dibe. Rêxistin jî wekhevê şer e.

Bi taybetî gotûbêjan ku min di vê mijarê de pêşxistine, hindê takekesî ne; partî jî wê gotûbêj bike û ji xwe re bike mal. Her wiha tevlibûna gotûbêjan hem mafê wê ye, hem jî peywira we ye. Ger ku hun, nekevin berevajiyê yekîtiya partiyê, ku hun taybetmendiya wê ya xurt dike dîqat bikin, dikarin ew tiştên ku tê gotin tabû nasnekin, pirsgerêkê gotûbêj bikin û têxin riya çareseriyê. Rêzdariya ku em ji jinê re, bi vê wateyê ji zîlam re jî nîşan bidin, şûna ku di bin bandora giran a kevneşopiya de nale nal bikin, ji azadiyê re hêz nîşandana wan pêkanîna e. Derbirîna herî rasteqînî ya rêzdariyê ev e. Heta em dikarin bibêjin ku taybetmendiya herî mezin a şoreşa me, mirov weke hebûniyêke rêzdar diyarkirin û pêwîst e rêzdarî ji rûmeta mirovbûnê re bê raberkirinê derxistina rastê ye. Ger ku em bêtirîn şênber bikin: Pirsgerêkê heye. Gundî, berî gihandina 15 salî bi çareseriyêke bi awayê sergerêdanê encam dikan. Burjuvazî û emperyalîzm, jinê bi awayekê herî xirab tûnin rewşa meta û bêtir bêwijdanî dibin çareseriyekê. Wê vedigerîna metayêke tazî. Çareseriyê sosyalîst an jî azadiyê wisa nabe. Ne ya feodalîzmê ku jinê bi heft pacan servedîşêre û ne jî ya emperyalîst kapîtalîzmê ku tîne rewşa altaxê mekanîzmayên zir li sûkên vekirî nabe şêwaza çareseriyekê. Nêzîkatiya azadiyê mirovanî ye. Di vê bingehê de nêrîna me ya cîhanê heye. Di pêşî de gotûbêjkin ji bo têgihîştina vê ye. Gotina, “Here keça filankes bîne û were, vê keçikê bibîne û bi kar bîne, derxîne reklamê, di piyasê de bi kar bîne” bi yek axaftinekê bêrêzdarî ye. Ji vê jî wêdetir heqaret e, dijun e, ji mirinê xirabtir e, hereşeya jiyane ye.

Her wiha pirsgerêkê jiyani ye. Jixwe jin, ji ber vê sedemê dixwazin werin nav partiyê. Dîsa ji ber sedemê di nava partiyê de bi mafdarî di nav hinek bendemayînan de ne. Hun ji bendewariya xwe ya azadiyê re çareseriyên rast

dixwazin û ji bo vê jî bi qehremanî xwe feda dikin. Bi sedan hevalên me yê jin da ku radest nebin, stû netewînin di hundirê pêwendiya vê azadiyê de xwe feda kirine. Bi bombeyekê, bi guleyekê vê helwesta zadegan nîşan dane. Vê nedîtin, dîtin û maf nedayîn bêrêzdariya herî mezin e. Ji van nirxên mezin re maf nedayîn, tê wateya bi bîranîna wan ve negirêdayînê.

## **Koleyan jî mafê hevrêtiyê bi têkoşînê qezenc kirin**

---

Ger ku çarçove wisa be, divê têgihîştina we pêş bikeve. Divê hun bi wêrekî veqetandina rast û çewtiyan bikin. Weke ku di her têkiliyê de hene, di vê derê de jî awayên ku ji şoreşê re xizmet dikin hene. Emê van veqetandina çêkin. Rewşên ku jê re bê gotin “erê” ango “na” hene. Ev der warê azadiyê ye. Qasî ku em vê derxin zelaliyê, emê biparêzin û serkeftina wê pêk bînin. Dijminên vê jî hene. Di nava partiyê de şerê herî bi ponijîn di vî warî de tê dayîn. Jina ku hatiye veguhêstin nav partiyê, tê wateya ku ji bo bûyera destpêk çêkirinê wê li ser şerê herî mezin bê dayîn. Tê wateya di têkiliyên jin-zilam de naskirina derfeta nêzîkatiya wekhev û azad. We, vê rastîne baş nedît. Lewma ji têkiliyan re sawî, zarokî, bêast û seranser nêzîkatî nîşan da. Ev, bi gor kevnepîyan derbirîna sivikiya we ye. Halbûkî me ji bo şerê mezin hinek destpêkan da çêkirin. Weke ku jin tevî partiyê bû, ma rizgar bû, naxêr. Tenê şensê şerê mezin bi dest girt. Me çek da destê jinê, ma xwe selimand, naxêr. Ji bo xwe biselmîne, me fersendek dayê. Tabî yê ku vê pir berevajî şirove kirin hindik derneketin. Yek-dudo gule diteqîne, xwe têxe şûna şoreşgerê çare çar. Dîsa di nava refan de bi hêza hinekan çend rojan li ser lingan mayîne wek selimandina kesayetiye dinirxîne. Ev nêzîkatiyên pir zarokî û xweperestî ne, gavên destpêkê ne; yê mayî wê ji hêla têkoşînê ve bê diyarkirin. Ma jixwe we platforma şer vedanê girt, lê wê şer qezenc ne kir; ji bo qezekirinê wê pir hewldanên we hebin. Tabî li ser jinê di çesandina têkoşînê de peydabûna me, riya tekane ya ku wê bi ser xwe ve anîne ye. Em bi her tiştê ku di alehiyê wê de ne re şer dikin. Bigihîjê her tiştê ku mafê te ne, lê ev bi têkoşînê dikare bi ser keve.

Kole, demeke dirêj mafê xwe yê hevrê girtinê tunebû, bi têkoşînê mafê hevrêtiyê qezenc kirin. Xulam jî zêde mafê xwe yê hevrê girtinê tune bû, di encama têkoşîneke dirêj de vî mafê bi dest girtin. Proleterya jî tam azad nebû xwediyê hevrêtiyê. Sosyalîzm ji vê re hindek derfet da. Dema em dirokê dinêrin, pêşketina malbatekê jî bi gelbûyînê, di welatekê de bi kombûyînê û bi dewletbûyînê ve pêwendiyên xwe hene. Çima di qereçiyên de damezraka malbatê zêde pêş neketiye? Ji ber ku cî û warên wan, nasnameyeka netewê diyarî tune ye.

Van hemûyan, ji bo hinek pêşdaraziyên we hilweşînim û we bi rastînan re bidim nasandin dibêjim. Mirovên hewqas seranser û bêhêz dikarin çi bikin? Tenê ne jin, zilam jî wisa ye. Dema hun vê rewşê dijîn, emê behremendiya we ya dana ecibandinê çawa pêş bixin ango wê bi kîjan rûyê pêk were? Ma we vê qet hizir nekiriye? Ne şerm e, ez jî di wateyekê de hewl didim ku xwe bidim ecibandin. Ji ber ku serok, di ciyekî de yê xwe dide bêrpêşkirin e. Gelo wê gelê min, min bi cibîne yan na, ango wê jin min bi cibînin an na, her çende ku pirsgirêkeke wiha tune be jî, wê tu dewlemendiyeke wisa biafirîni ku gel te bipejirîne. Tu nikarî wek axayekî xwe li ser bidî runiştandin. Nikarî jê re mîrtî û paşatiyê bikî. Tu nikarî bibêjî: “hindek can lê hebe bila ew jî derkeve.” Tu nikarî wî li pêşberê xwe bîni halê acucan. Lê nêzîkatiyên we yê kevneşopî wisa ne. Di vê bingehê de pêşwazîkirina we ya mîr, pêşwazîkirina we ya çîna serdest, pêşwazîkirina we ya xortan heye. Gel û welat çi ye? Çi li ku derê ye? Çi ji ku derê hat, çu ku derê? Ez li ku dera vê me? Hun pirsên mîna vana nakin û bersîv nadin. Hun dibêjin, “wisa hatiye wê wisa here.” Tebî şoreş dixwaze vana biguhere.

## **Apocîti, ji hilkeftina karên herî zor xwe nepelikandin e**

---

Her ku ez ez im, van mirovên me yê ku vê rewşê dijîn naecibînim. Ev kesayet û mirovên ku bêdîa, sivik, bêçare û bêberhem in, bertek raber kirim û berê xwe dame şoreşgertiyê. Ji pîrsa mirovê ku pir xwedî pirsgirêkan e ka çawa dikare xwe dewlemend bike re hewl dam ku bersîv peyda bikim. Di derbarê asta netew, asta civak, heta asta mirovanî de, yanî bi asta enternasyonal gelo wê karibin min hindek gohdar bikin û hindek têbigihîjin de ponijîm. Lê hun bêtir di çarçoveya malbatê de nêzîk dibin. Ji pirsgirêkê re hewqas teng û paşmayî nêzîkbûn nabe. Da ku rûmetekê biderbirîne, pêwîst e ast hêzdar be. Tebî ev jî bi çeka partiyê û bi hêza rêkxistinê pêk tê. Tu dikarî bi zênên xwe ya siyasî, bi behremendiya xwe ya dahûrîner, bi hostatiya xwe ya şerkirîne bibî dewlemend. Di encam de wê tu daringî jî, arîşen jî bîni. Hingê hêz û xurtî ya te ye. Mirovên wisa dikarin bi hev re bimeşin. Di asta navnetewî de, bi seroktî çima kes min napejirîne? Ji ber ku gelê Kurd pir xizan e. Her ku neyê rewşa hêzeke stratejîk, di hevsenga navnetewî de neyê şûngeheke ku karibe rolekî girîng bileyize, dizanim ku wê qîmeta min jî zêde nebe. Ev yek min bir serokatiya stratejîk. Di bingeh de ger ku hun bi şibandinekê gelê Kurd têxin şûna jinê, hunê baştir fêm bikin. Mînak we jinan çima kes zêde rişt nahesibîne? Çima zilam pir erzan nêzîk dibin? Pir bi mafdarî ew bendewariyên wê yê ku nêzîkatiyeke hezkirîneke rast, debar, saxlemî û perwerdehiyê danaynin pêş we? Ji ber ku hun xizan in, yanî bêhêz in. Zilam di

yek derbê de dibêje, “Ez vê jinê bi çendî û çawa bikirim!” Çima? Ji ber ku zêde giraniya we tune. Mînak keçeke Alman bi gor keçeke Tirk bihayek diderbirîne. Li pêşberî deh zilamên Tirk bêtir giran e. Zilamên Tirk ji wan keçan re “jinantiyê” dikin. Lê heman zilam, li hember keça Anadolê weke totirna ye. Va, pêwîst e êm bi vê têbigihîjin. Çima ku tê keça Tirk wisa ye? Ma jixwe çî hêza wî heye! Jixwe ramana wê di rewşa qedandinê de ye. Dilê wê davêje yan na, ne diyar e.

Ji ber ku ez ketim erjenga vê, min dest avêt pirsgirêka azadiyê. Ev hemû dibe ku ji we re tiştêkî bîr neyênin, lê belê ji bo min weke ku vejena hîdrojenê roketan deh dide, weke sedemê dehfdanê ye. Statuyên nayê pejirandin hene. Ev ji PKKê re rê vedike; ev jî ji pirsgirêkan re riya çareseriyê ye. Lê hun tenê dikarin bigirîn. Hun dibêjin, “Wey çî bi serê min hat!” û mîna çarenûsê dibînin. Qencî û bedewî ya min bi teşeyekî ku kesî ji we necerbandiye, bi çavên çarenûsê lê nenihêrtin a min e. Hema hilkevê û têkil hev bike, encam çî dibe bila bibe; Apocîtî hindek ev e û rast e.

Ev tenê ne ji bo we, ji bo zilaman jî pêwîst in. Çîroka jiyana xwe baş dizanim. Dema ku têkiliya jin-zilam dibe mijara gotinê, di jiyê min ê ciwan de ne kesî min bextewar didît, ne jî min tiştêkî wisa ji xwe re layiq didît. Min got, ku her tiştî bi viyana xwe ya azad nedim afirandin namerd bim û hewl dam ku wan têkiliyên sipariyê pergalê bigirim; di salên ciwantiyê de, eyb nîn e, hewl dam ku bi jinekê re têkilî deynim. Me vê eşkere kiriye. Piştî em bi vê baş têngihîştin ku, ew tiştên ku ji hêla pergalê ve hatiye amadekirin û pêşxistin ne guncan e ku bi gor kêfa xwe bigirî û bi kar bîni. Her tiştê ku pergal pêşkeş te dike ji bo berjewendiyên xwe ne. Li hember vê di helwestekê de peyda bûn, di bingeh de nêzîkatiyeke mezin e.

Her wiha pêwîstî heye ku gelek têkilî û kesayetiyên ku bingehên xwe ji pergalê digirin weke mafdarî bi şik nêzîk bibin. Ez vê di wateya polîsiyê de nabêjim. Di nirxandineke min de, her çende ku bi şewazeke nepixandî hatibe gotin jî, min ji bo jinê gotibû, “Zayendeke ku çonatiya xwe ya bûna sîxurtiya objektîf herî belavbûyî ye.” Çima “Sîxura objektîf” e? Super teslîmê viyana serdest bûye. Kesayeteka ku hewqas bûye rajêrê viyana serdest, desthilatiya zilam û desthilatiya çînayetiye, helbet “Sîxura objektîf” e. Ev rasteqîn koletiyê, radestbûnê û lihevhatinê har dike. Ji ber vê yekê me pir giraniya xwe da nêzîkatiya azadiyê. Me vê jî got: Ger tu jinê tam azad bikî, wê tu rê vebikî ji bo şoreşeke pir radîkal. Ev nirxandin rast e. Ji ber ku gelê xizan qîmeta xwe ya stratejîk tune. Di aliyekî de jî tam girtîbûn, ji bo te zemîna hêz derxistina rastê pêşwazî dike. Ger em qasî navên xwe li xwe layiq nebînin ketibin, bizanibin ku me bihayê xwe pir wenda kiriye. Ev yek ji bo malbat, jin û zilam jî dikare bê gotin. Qîmeta jiyaniya nebe, ev tê wê wateyê ku hinekan te pir xistiye. Hingê ma tuyê ji vê re bibêjî, “Çarenûs!” Ma tuyê bibêjî, “Wisa hatiye wê wisa here.” Naxêr! Sedemên vê civakî ne, çareserî jî civakî û zimanê wê jî têkoşin e.

Pir eşkere ye ku em bangawaziya uslûp û azîna têkoşînê li we dikin. Beriya her tiştî pênasê û armanca têkoşînê heye. Piştîre jî kesayet û têkiliyên ku qîmet bi dest xistine. Tê dîtin ku vegotinên min bi piranî guncawê rastîna we ye û pêwîst e jî.

## **Ji pîrsgirêkê re nêzîkatiya netewî, wê ji warê navnetewî re jî tevkarîyekê berpêş bike**

---

Yên ku vê gelşê dikin tabû, hestiyarî li ser hestiyariyê, şilekî li ser şilekî, zayendîtî li ser zayendîtîyê diçespînîna kê ne? Yê ku dijminê gelşê ne. Yê ku dîrekt ango endîrekt jinê nahesibînîna, ew in ku hezkirinê nezaniya. Ya ku vê layiqê xwe dibîne jina kole ye. Yê ku xwe bi şepêldanê diborînîna kê ne; çî kes in? Jina ku bi birîna xwe têngîhîje, bi koletîya xwe têngîhîje û bi gora vê têkoşîn venade çî ye? Ger ku têkoşîna wê ne zadegan, rêgez û biryarmendî be, ev tê wê wateyê ku di nava lîstikên jina rezîl de ye. Ji bo zîlam jî derbasdar e; tenê bi stû tewandîna jinê ve mijul dibe. Ev zîlam ka partî çawa û çima eleqe nîşanê jinê dide nizane. Dîsa bûna heval ango rêheval nizane; roja duyemîn têkiliyan averê dike. Zilamekî wisa ji bilî şoreşgerek her tiştê e. Pîrsgirêk, kesayetîyê di derxistinîna zelalîyê de ye, li cîyekî ev peywira kaxizê turnosol dibîne.

Hun dibînin ku mijar têkilhev e; bi we jinan re kesek wêrekî nabîne ku civîneke rişt li dar bixe. Heke ku ez, ka pîrsgirêk çiqas teorîk e û heta di aliyê siyasî û rêxistinî de çiqas girîngiyê hildigire vebêjim, dibe ku zîmanê we şaş û paş bibe. Ev destpêka bi aqîlbûna we ye jî. Hun hêdî hêdî giraniyê didin ramana xwe, ev pêşketîneke baş e. Me li hember statû, helwest û jiyana kevin a ku koledariyê wek çarenûsê dibîne şer vedanê baş da destpêkirin. Me pêşî mercên anîna halê jîneka ku dikare birame, gotûbêj bike û serbixwe li ser piya bimîne afirand.

Hun baş dizanin ku yê herî nêzî we jî, bi we re civîna gotûbêjê li dar naxin. Dibe ku yê hun jê pir hez dikin ango evîndarên we jî tenezûl nakin ku bi we re gotûbêj û nirxandîneke rişt li dar bixin. Tim diçespînîna û dixapînîna. Naxêr, ev ne nêzîkatiya dildaran e, xapandin e. Li pêşîya têkiliyên me yê azad gotûbêj û nirxandinên rişt danîna we û her wiha hizra we ya kesayetîna nirxdar her ku azad dibin, her ku serbixwe dibin wê bibin layiq pîr tê fêmkirinê. Li ba redkirin û înkarkirinê wê û ew nêzîkatiyên ku tim dixwazin bi her cure xistin û sihêlkirinê serdest bikin nepejirandin jî tê fêmkirinê. Ger ku hun hindêk rêzdariyê daxwaz dikin, di sazgeh û komeleyên civakî de hindêk riştî daxwaz dikin, va wisa tê bidestgirtin.

Gotûbêjên di nava partiyê de di vê astê de pêş ve dibim. Hun Jî, di bin ronahiya vê gotûbêjê de çi pirsgirêkên hema bên hişê we nêzîk dibin. Ma zilam dibêje pirsgirêka zayendî, ha ji te re nêzîkatiya vê; ma dibêje pirsgirêka evînê, ha ji te re zagona evînê; ma hezkirinango pevretî-pevreyî bi mirovekê re dixwaze, ha ji te re rêpîvana vê; ma estetîk û xweşîkiyê dixwaze, ha ji te re azîna wê... Ger ku bê dîqatkirin, li virê kêfîyet tune, nêzîkatiyeke rasteqînî heye. Lê hîsên we cuda, azweriyên we cuda ne. Di helwesta xwe de pêkolînkirin ku kevneperestî ye, ku li hember rêkxistin û partiyê tê wateya berxwedanê û bi taybetî jî çavreşiya di vê mijarê de ku dibe xiyaretê bi mînakên xwe ve hatiye dayîn. Hêsan nîn e têkiliya jin û zilam, têkiliya nas û dostên rastîn. Ev, ne înkarkirina têkiliyên jin-zilam e, guherîn û veguherîna têkiliyan pêkanîn e. Jixwe têkilî, kevneşopî, dogma û qedexeyên ji hêla pergalên ve tîndiyarkirin rastiyê nadin me, berevajî me dixapînin. Şoreş jî, rastiyê dide, lê belê ev jî afirînerî dixwaze, zadeganî dixwaze, pîrozî dixwaze.

Hê jî hinek dibêjin, “Tu baş vedibêjî, lê çareserîya şênber nîn e!” Çareserîya şênber wekî din wê çawa be? Her wiha ji çareseriyê têgihîştina wan îla hatina du kesan ba hev, hev girtin û revandin e. Yanî têkiliyêke ritm tê xwestin. Ev hoveberbûn e, ji astê ketinango înkare. Ji asta netew re çareserî anîn bi van nêzîkatiyên me ve pêwendîdar e. Malbata netewî, hezkirina netewî, rewîştina netewî, evîna netewî, jina netewî, zilamê netewî û heta di her astê de têkiliyan bi vê çarçovê girtina dest, ya herî rast e. Hun dizanin ev, bi qasî asta netew, enternasyonal e jî. Ger ku asta netew hate dahûrandin, wê ji asta enternasyonal re jî tevkariyê berpêş bike. Pir êşkere ye; divê hindêk wisa pêş bikeve.

## **Wek aliyekî çarenûsa xwe bi azad diyar bikin**

---

Hun dikarin gotûbêjan pêş bixin. A ku herî zêde hun ji me bixwazin azadiya gotûbêjê ye. Wê zexta nêvengê nebe, lê pêwîst e hun jî, ji disîplîna rêkxistinê re û di vê mijarê de çemk û çespandinên çewt ê mezintirîn re bergîdaneke rast bidin. Ya herî girîng jî divê hun bibin aliyekî bijarte ya jiyana rast û têkoşîner. Pêwîst e zimanê we vebe, mejiyê we bixebite û dilê we biavêje. Di vê mijarê de pêwîst e hun afirandin û xurtbûnekê pêk bînin. Yanî hun aliyek in; bi ya min neyên eyarkirinango bi gor zilam neyên eyarkirin, bi gor xwe bînin eyarkirin. Saxlemî û azadiya we, bi navê zayendekê ji bo diyarkirina çarenûsa we çi pêwîst dike wî bikin.

Nêzîkatiya azadiyê ev e. Ew pirsgirêkên ku hun pir di warê taybetî de dijîn, dikarin di vê çarçovê de bigihîjin çareseriyê. Dibe ku di rabirdûyê de hinek

tékiliyên we yên sivik hebin; wana ne zêde ji xwe re bikin dert, ne jî zêde bêriya wan bikin. Cîhaneke ku hun wenda bikin tune. Lê cîhaneke ku hun qezenc bikin heye. Heke ku wisa be, nekevin bin bandora rabirdûyê û bi berteka ku li hember wan raber bikin, hun dikarin meşekî rewneq bidin destpêkirin. Her wekî têoriya me ya azadkirina gelê me jî hindêk wisa pêş ket. Dîsa pratîka me ya azadkirina takekesî jî, ji van babetan hêz wergirt. Bikevin nav şêwazeke tékiliyê ku van hemûyan bingeh digire. Çi nav datîna deyne, ev gunçaw e, nirxdar e. Dîsa çi nav lê dikî bike, şêwaza ku vê çarçovê diçirîne û derveyî dike, gunçaw û nirxdar nîn e.

Hunê karibin xwe bigihînin vê çarçovê? Di vê mijarê de hewldanên min hene. Hun bi vê têgihîjin û li ser pêşketina xwe dirikibînin? Di gotûbêjan de nekevin çewtiya azînan. Nizanim di rabirdûyê de çi hate kirin; nizanim di navbera min û filan zilamî de çi bû û hwd. li pey van xalan ketin, bêastkirina gotûbêjan e. Heta dibe ku hun bibin evîndar jî, bibin nîşanî û zewicî jî, lê ev pirsgirêkên azadiyê, dîsa jî derbasdar in. Dema ku tê gotin gotûbêja jinê, hemû kes sevikiyê fêhm dikin. Lê tam berevajiyê vê rişt e. Pêwîstî heye ku ji tevahî tékiliyan re neyê gotin “çilvirîn” û neyê jêkirin û avêtin; tékiliyên pir nirxdar dikare bê pêşxistin. Di vê mijarê de bi şertê ku ji rêgez û çarçoveyê re bê diqatkirin, vana ji xwe re nekin rûpoş û rasteqîna rezîlî, dij-civakî, dij-siyasî û rêkxistiniya xwe neveşêrin. Bi rastî jî vê rêgez û çarçovê bi xwe bidine pejirandin, weke ku wê pir pêwîst be ji nêzîkatiya we ya mirov û zilam re û dikare we pir hêzdar jî bike. Heta ev, peywirek e. Yanî tenê ne pêdiviya gotûbêjeke teorîk, peywireke rişt yê rêkxistinî ye. Her wiha divê hun zilaman perwerde bikin.

Hunê li ser vê gelek bihizirin. Pirsgirêka we li virê ne xweperestîkirin e. Me xweperestiya rêkxistinî gotûbêj kir û yên di oxira xweperestiyê de ka xwe anîne çi halî me dît. Hun jî xweperestiya hestiyarî nekin. Bi teşeyekê, “tenê daxwaza min, tenê evîna min, nizanim hestên min” rêkxistinê serûbin nekin. Bila hestên we bibin kolektîf, hezkirinên we bibin giştî, rewşa we ya ecibandinê yek kesî ji xwe re neke pût. Jixwe ku hun wisa nekin, hun qet nikarin xwe bigihînin çemka me. Ez qala asta netew dikim. Jixwe ku asta netew, lêgerîna xweşiktî, têgihîştina hezkirinê, têgihîştina ecibandinê, têgihîştina redê, têgihîştina kirêtî her ku pêş nekeve, hun di wateya takekesî de jî, nikarin rast tercîhê pêş bixin. Lê belê nêzîkatiyên we mezintirîn xweperest in. Yekî ku hun bi azwerî pê ve girêdayî bin hebe, heke hun bimirin jî dev jê bernadin. Xayîn be jî, hun pê re diçin. Fîzîka we neçe jî, dil û hestên we diçin. Vana ne ji bo tewanbarkirina we, ji bo ku hun rastînen pir jiyani bibînin û bi gor vê xeleqeyên bingehîn bigirin, dibêjim...

## **Em di şexsê kesan de asta netew û civakî didahurînin**

---

Erê, bi gotûbêjan em dikarin mijarê bêtir kûr bikin. Hevalê C. hun çi dibêjin?

C.: Li welatekî mîna Kurdistan pirsgirêkeke wisa di vê astê de anîna rojevê pir hêsan nîn e. Ez hizir dikim ku hê ji niha de anîna vê rojevê, ew şoreşa ku tê xwestin û di aliyê vala derxistina xefikên dibêtî yên dijmin de girîng e.

S.P: Xefikên li peşiya şoreşê di pêş de dîtin û di aliyê derbaskirinê de hun dibêjin ku xwedî girîngiyeke mezin e.

C.: Belê. A ku ez dibînim, ev, ne tenê li hember paşverûtiya jinê, di heman demê de li hember paşverûtiya zilam têkoşînek e ku tê dayîn. Bi vê wateyê jî, girîng e. Lê belê xala herî girîng ku pêwîst e hevalên jin bibînin; nêzikatiyeke çewt weke ku bi hewldanên xwe gihîştine vê têkoşînê heye. Ji ber wê yekê jî helwesteke ku zêde qîmetê nezanîn heye. Halbûkî bi hewldanên Serokatiya Partiyê gihîştin vê nêvengê. Pêwîst e vê baş binirxînin û li ser vê bingehê azadbûnê pêk bînin. Tenê bi vê şewazê dikarin xwe bidin pejirandin û pesendkirin; bi awayekî din zor e. Pêwîst e di vê mijarê de hewldanên mezin pêşan bikin. Tenê bi hewldanên partiyê pesendkirin zor e.

Bi ya min partî pirsgirêkê pir net datîne rastê. Bi rastî jî, lawên gelê ku ne xwedî welat in, di van mercan de rabin û qala hezkirina takekesî bikin, rast nîn e. Ma jixwe pêkanîna vê gengaz jî nîn e. Yên ku welatên xwe nîn in, azadiya wan jî nîn e. Di vê rewşê de heta ku em dikarin bila em bibêjin, em azad in, ev nabe rastîn. Îcar ew “Zewacên şoreşgerî” yên di nav mercên Tirkîyê de çi pêwendiyên xwe bi zewacên şoreşgerî ve tune. Heya ku azadbûn pêk neyê, têkiliya azad jî, pêk nayê.

S.P: Yanî ji zewacên kevneşopî bêtir xeternak e.

C.: Belê. Jixwe xeternak, çêkirina vê li ser navê şoreşgeriyê ye. Di rêjeya ku welatê mirov azad dibe de, mirov dikare azad bibe. Hingê mirov dikare têkiliya azad jî bigire. Ger ku ev nebe, bi çi cure têkilî dibe bila bibe, eşkere ye ku ew nabe têkiliyeke azad. Ez bi xwe bawer nakim.

S.P: Hevalê C. di asta rêgez de rast nêzik dibe. Lê em berevajiyê vê nakevin; bi şertê ku ev rêgez bê bingeh girtin, mirov dikarin hezkirin û ecibandina xwe deynin rastê. Tebî wê rêgez û armanc neyê paşçavkirin. Bi gotineke, “min armanc ji bîr kir, dilê min pê ket” partî li aliyekî û welat li aliyekî bîn hiştin, wê li paş rev bimîne. Bi rastî jî, di bin navê daxwaziya azadiyê de, gelek jirêderketin hatin pêşxistin. Ger ku hun mebest baş bin jî, heke ku hun armanc û maweya têkiliyên ku ava bikin bi gora rêgezê baş û baş kontrol nekin, bi rastî jî hunê pir bi debengî wenda bikin. Pêwîst e hun pêwendîya di navbera rêgez û pratîkê de pir haydar bin. Ji ber ku çawa di vê mijarê de tê hizirkirin, zêdetir di bin navê rêgezê de înkarkirin, di bin navê pratîkê de ketîbûn tê jiyandin. Pevretiya teorî û pratîkê çawa ku di her gelşê de pêk tê, di vir de jî pir pê ve girêdayî ye. Rêgeza azadiyê derbaskirina jiyane, tam karekî şer e. Bi taybetî jî pêwîstî heye ku hun rastîna

Serokatiyê baş têbigihîjin. Em bûyeran hem digihînin eşkeretiyê, hem jî di pratîkê de bi rê ve dibin.

Di bingeh de ez, bi we re ne tenê çareseriya takekesî pêş dixim. Belkî hun komek in û hatine veguhestin nav partiyê, lê ji bo dahûrandina asta netew û hemû civakê, em we digirin dest û dihêvojin. Ji ber vê yekê, xwe bi rengekî çawa ku teng nêzîkbûn tê raberkirin û bi erzanî dibêje, “ez azad bûm, bi takekesî min qezenc kir” xwe nexapînin. Dema ku hun bibêjin, “min qezenc kir” hunê hingê asta netew bidahûrînin. Lê di van mijaran de ka hun çiqas teng in, hun bi xwe dizanin. Bi rastî jî her kes tengtiya rêkxistinî heya nav mixên xwe dije. Dîbê qey pirsgirêkê di asta takekesî de çareser bike, wê xwe bifilîtine. Naxêr! Çareserkirina pirsgirêka jinê ne bi avakirina nas û dostan ango bi malbatekê, di asta netewî de wergirtina azadiyê, dîsa di şer de qezenckirina serkeftinê ye. Her kes dipirse, “pirsgirêka jinê çi ye; çareserî wê çawa be?” va wisa dibe.

Ger ku li gotina çepê Tirk bê nihêrtin, dibêjin, “zewaca şoreşgerî.” Lê ev, ji zewaca şoreşgerî bêtir dişibe her tiştî. Ez dibêjim ku zewaca qereçiyên zêdetir watedar e. Min vê gotibû, pir hêrs bibûn. Min dabû zanîn ku, ji têkiliyên babistîn bêtir xeter dibînim. Navê wan rêkxistinê naxwazim dubare bigirim devê xwe. Piştî derket rastê ku ev têkiliyên dijraber ne. Nêzîkatiyên ku di pratîka çepê Tirk de wisa xwe debar dikin, li ser canê azadiyê xwendin e. Bi rastî jî PKK di vê mijarê de rastûnan pêş xist, anî gihanekeke girîng. Divê ez bibêjim ku têkiliyên sosyalîstêkî herî mezin ê Tirkîyê yê burjuvaziyekê piçûk ê naedil in. Jinê aniyê rewşeke herî kerax. Ez belkî di malabata Saqîb Sabancî de xweşikîyê bibînim, lê di malbata wan çepgirên sexte de nikarim xweşikîyê bibînim; bêtirîn xistin heye. Debengiya burjuvaziyê piçûk û xwe xapandin heye. Heta ji wî kapîtalîstî bêtir rewşeke xirab dije. Hema dişibe kapîtalîzma li Sovyetê. Lê eşkere ye ku kapîtalîzma hewqas nixdar nîn e. Nêzîkatiya yê me yên kapîtalîst ên burjuvaziyê piçûk, bi gor nêzîkatiya kapîtalîst ên mezinê Tirkan li çepê nîn dimîne. Tebî nêzîkatiya şoreşgerî heye û hewl dide ku temsîla xwe ya xurt pêk bîne. Ez bawer im, hun hindêk têdigihîjin. Hevalê Z. yê ku mejiyê xwe herî zêde dide mijulkirin, çi dibêjî?

Z.: Di bingeh de li vir pirsgirêka partîbûnê heye. Ji ber pirsgirêkên gihîştina kesayeta gihandî, partîbûn nayê jiyandin. Di pirsgirêka azadiya jinê de jî wisa ye. Di bingeh de ew hedefê ku em dixwazin bigihîjinê, em dibînin. Li pêşberî me sosyalîzma heye, cîhaneke xweşik heye. Em dixwazin herin wirê, lê belê dema ku hatina xala pêkanîna wê azadiyê di xwe de çêkîrin pêk tê, hingê şerê binyadî tê jiyandin. Dîsa di navbeyna armanc û rasteqîna heyî de nakokiyek tê jiyandin. Di bingeh de ji wê hedefê tu caran qutbûn çênabe, yanî ew hedefê tê xwestin em ber ve biçin, ji bo me pir xwerû ye. Xalên ku hevalê C. destnîşan kir ez jî dixwazin diyar bikim. Di bingeh de nakokî nayên veguhêstin ber bi paşerojê ve. Çareseriya pirsgirêkê di bingehê afirandina civaka azad de, bi wateya diyarkirina hedefê

pusulayê rast danîn e. Lê îro di xala çareseriyê nakokiyên tînan jiyandin de, zêde nêzîkatiyeke milîtanî û nêzîkatiyeke zêde wêrekane nayê pêşan kirin. Bi rastî jî nakokî di herikandina xwe de diçin; wana qeşakirin û paşerojê ve veguhêstin wisa nabe. Pêwîst e bi van nakokiyên re bê şerkirin. Ger ku hedefê paşerojê rast hatibe selimandin û azîninê şer jî rast hatibin têgihîştin, êdî pîrsgirêk bi nakokiyên re saxlem şerkirin û tîkneçûyînan e. Ez bi nêrîna pêwîst e pêkanîna rastiyan bi paşerojê ve bê taloxkirinê ne bawer im; hê jî îro de divê ji bo vê şerê bê kirin. Bi taybetî jî dema ku pîrsgirêka jinê dibê mijara gotinê, ev, şerê xwe çêkirina jinê û xwe peydakirinê ye. Heke ku jin, di xala wendakirina jinê û wendakirina hezkirinê de ye, ev selimandîna rast, şerê jinê yê xwe çêkirin û afirandinê ye. Ev şerê xwe bi kedê peydakirin, di heman demê de bi zayendê dijber re azadane şerê biyekbûn û şerê wî jî afirandinê ye. Hizra min ew e ku divê ev di nava hev de bîrêvebirin. Ji ber ku dema tê perçekirin, şer jî lewaz dikeve. Şer bi tevahî nayê têgihîştin.

## **Yên ku nayên xeta rêkxistinîyê nayên tîkiliya azad jî**

---

S.P: Tu sepandinên min çawa dibîni? Pîrsgirêkê jî paşerojê re taloxkirin e, yan na di nêvenga dijwariya şer de jî nêzîkatiya wêrekane ye?

Z.: Bi ya min nêzîkatiyeke xurt e. Li vê derê herî hindik di aliyê xwe de xalên ku ez hewl didim pê tîbigihîjim hene. Beriya her tiştî şerê di asta serokayeti de tî birêvebirin...

S.P: Pêwîst nî e, bê gotin Serok û bê îlahkirin; di heman demê de asta partiyê, yanî asta milîtan mijara gotinê ye.

Z.: Asta partiyê bûyereke pîr ciwaz e. Asta Serokatiyê pîr hêzdar e û li ser dahûrîna dîrokê pêk tê. Asta dahûrîna hem hevalên jin, hem jî hevalên zilam pîr qels e. Dema ku em di aliyê rastiya xwe de vê digirin dest, dema em tînan kişandin nav şerê ku tî xwestin bê pêkanin, di bîgeh de em ferq nakin ka em hilkişiyane nav şerê çawa; şaşwaz dibin û li çep û rast bela wela dibin. Pîrsgirêka bîgehînan di vê xalê de tî jiyandin. Yanî ez dihizirim ku, pêwîstiya ew nakokiya di virê de tî jiyandin bê dîtin, heye.

S.P: Yanî em, mînanî rewşa rêkxistinî ku hun ketinê rû bi rû ne. Yênan ku weke takekesiyê rast nayên rêkxistinîyê, di sehaya tîkiliyekê de jî nayên rastiye, nayên partîbûnê. Vê bi gora xwe tîxin teşeyên cewaz û ber bi nêvenga asêkirin û kevneperestiyê ve diçin.

Z.: Ez jî dixwazim vê xalê destnîşan bikim: Hêza çareseriyê nakokiyên di asta Serokatiyê de pîr mezin e. Di me de hê tîgihîştina nakokiyên jî nî e. Hewqas di

asteke jor de çareserî tê çespandin ku, ew mirovên ku hê bi nakokiyên xwe re nasdar nebûne, di bin vê de diperçiqin û têngahîjin.

S.P: Hingê hunê di şer de jî biperçiqin.

Z.: Di vî aliyê de, bi taybetî di asta Serokatîyê de şerê ku tê vedan (min berê jî destnîşan kiribû) bi ya min di hundirê xwe de gelek rîskên ku hildigire heye. Mînak ez bi wê xalê zêde têngahîjim. Yanî li min zor tê. Ji ber ku ew, belkî jî ew hevalên karibin pêşketinê pêk bînin, li beranber xwe perçiqandina di bin barekî giran de bi xwe re tîne û rê ji jirêderketinan re vedike.

S.P: Hîzir nakim. Ya we di teşeyekê “bi gora min çemka min a partiyê heye, çemka min a rêxistinê heye; divê çawa ku dilê min bixwaze di jiyandinê de azad bim.” de ye.

Z.: Naxêr, ez naxwazim wê bibêjim.

S.P: Gelek dişibê. Tenê wek jinekê dixwaziya we ya jiyînê heye. Tebî ez, carna wê xwesteka we ya ku weke jinekê dixwaze bi gor xwe bibe, digirim ber topan. Belkî hevalê Cuma jî vê ferq dike. Gelo hun wateya vê dizanin? Zilam, xwedî çemkeke nîşaniya seqet e; ez bi hewayê ve difîrînim. Bi gor xwe xwedî çemkeke jinantiyê ye; tinazê xwe bi vê dikim. Ev tev bi gora we ji lêdanekê bêtir dijwar in. Carna pir berevajiyê ya ku hun dibêjin dibêjim. Ez dibêjim, “mafê te yê hezkirinê nîn e, mafê nêzbûnê jî nîn e!” Bi taybetî di asta Serokatîyê de ev pir pêwîst in. Ev nêzîkatî, di hêvotina mirovê Kurd de, jina Kurd anîna ser xwe ve, di asta pêşengiyê de, di rewşa pêwîstekên ku werin cî de ne. Hun vê mijarê weke takekesekê asayî bidestgirtinê esas digirin. Em, bi çemkeke mînanî burjuvaziyê piçûk a wekhevîyê rû bi rû ne. Asta Serokatîyê asta netew e.

Ez, bi tu awayî nexwesteka we ya dîtîne fêman nakim. Di bûyera rêxistinê de jî hun wisa ne. Bi hizra min, çemka burjuvaziyê piçûk a wekhevîyê asta gelek hevalên me ye. Hun rêzdarîyê jî wenda dikin. Niha jî, weke yeka ku qet asta netew nedîtiye min wisa bi takekesiyê şirovekirin, jinê jî bi xweperestî şirovekirinê ve pêgir girtin xeteriya bingehîn e. Em van keçikan tev hindik zêde tînin bi ser xwe ve. Mînak di gelek hevalên ku ez dibînim de (hem keç, hem jî xort) hinek tabû hene. Ger ku ji keçekê re eleqeya wî hebe, divê ew bibe ya wî. Di nêzîkatiya keçikê de jî, rewşeke mînanî vê heye. Dema tu dibêjî, dev jê berde, ev bi gor hinekan êrîşkarî ye; li ser wan nîrxên wî yên pir pîroz, li ser bêriyên wî êrîşkarî ye. Di bingeh de naxêr; berevajî wî rakirina nakokiyekî ye. Kîşandina nav têkoşinekê ye. Belkî jî qencî ya herî baş a ku ez karibim bikim ev e. Di vê derê de nebibêjim mînanî lîstikeke sînemayê, mîna wê hun bi lîstikekê ve rû bi rû ne û hindek jî ev lîstîk pêwîst e. Bi awayekî din keç û xort bizewicîne ango nîşanî bike, gelo piştî heftiyekê ji wan mirovan berhemek bimîne? Ger ku pir azweriyên paşverû hembêz bikî, gelo wê di te de derfeta hezkirina welat û heta tîkiliya azad bimîne?

## Mirov rîskê nede ber çav serkeftin nayê qezenckirin

---

Van tevan bi renekî teng nixandina we, bi kêmahiya têgihîştinê dikare bê guzarîştîkirin. Divê hun bi lezginî vê derbas bikin. Cîhaneke mezin a ku bê vekirandin heye. Ji tabûyan dûr bisekinin. Ez nabêjim têkiliyên pir êşkere ava bikin. Ez ji vê nefret dikim û bala xwe pir didim astê. Bi ya min bi jinê re tevgerîn divê di asteke artîstîk de tim pêş bikeve. Divê axaftinên herî bedew, têkiliyên herî bedew, gotinên herî bedew di sehaya vê têkiliyê de werin ziman. Nêzîkatiyeke pir girîng e. Gelek kes vê bi dizî çêdikin. Dibêjin “warê têkiliya taybet e.” Ez hindek berevajiyê vê dibêjim. Ger ku gengaz be vê hindek derxin êşkeretiyê. Min got ya, li asta netew belav bikin. Xweşikî û hezkirin ji bo tevahî gel pêwîst e; ji bo hun jê re bikin mal hewl bidin. Ew tiştên ku hun weke tiştên xeternak dibînin, nêzîkatiyên mînanî vê ne. Tebî di vê mijarê de wêrekiya we nîn e. Ji ber ku em jî hîtabê asta netewekî dikin, emê hindek wêrekdar bin. Mirov rîskê nede ber çav, serkeftin nayê qezenckirin. Ez nabêjim pir û pir ezmûnên evîne li dar bixin, pir û pir têkiliyan ava bikin û xirab bikin. Ya ku ez dibêjim ev e: Qasî ku hun bi rêgez in, di pratîkê de hewl bidin ji bo bûyîna dewlemendî û berhemdariyê. Xwe perwerde bikin, rêhevalên xwe perwerde bikin. Ger ku yekî ji we re bûyera hezkirina rastînî didamezrîne, divê bersîvên we yê erjeng hebin. Nekevin nava nêzîkatiyên erzan. Ji vê re bersîvên pir watedar ên ku bê dayîn hene. Mînak hun ji min pir hez dikin, gel jî ji min hez dike, ne wisa? Peywirên pir dijwar datînim pêşiya we. Bergîdana hezkirinê şer e, wisa dibêjim, baş têbigihîjin. Tevahî netewekê didim hizirandin. Bi sedan jinan didim hizirandin û jina azad hindek wisa derdikeve rastê.

Tebî gelek hêmanên ku bi asta têkiliyên me têngahîjin hene. (kontrgerîlayan di derbarê min de pirtûk nivîsandine) Tim û tim mînak didim. Hêmana Fatma (Kesîre Yildirim) jinantiya xwe ya herî dawerî, weke bazirganiya qonaxa merkantalîst (doktrîna aboriyê ya ku tim wergirtinê bingeş digire) bi çemka bazirgan û tefekara herî pêşketî, bi şewazeke xapînok a ku dixwaze yek bide û hezar bistîne, bi kar dianî. Zayendîtiya xwe, jinantiya xwe, hêza xwe, civakbûna xwe heta siyasîbûna xwe jî dema ku hewl dida tevî nav partiya me bike, qaşo hewl dida ji bo biryardayîna da ku bi min re par vebike, lê nihêrtim ku hêştirê bi kurtan ve bar dike. Bi palpiştîya min wê tevahî partiyê teslîm bigire û min jî ji xwe re bîne rewşa zilamekî herî sadiq. Min çawa vê fêhm kir? Dema ku min vê çemka dihate çespendin dît, min derbeyeke xedar weke ku her zilamê me dike, parî parî nekir. A min şewaza encam wergirtinê heye û bi gor vê min biriya xwe dayê. Pêwîst bu ku ew ji bo min bibûyana bûyera têkoşîneke mezin; min wisa kir.

Me çi dît di virê de? Bergîdana têtikilyên dayendeyî ên pergâlê, dibe ku pir bin. Dikarî ji vê feyde bigirî. Lê ew jî dikare hemû hêza te daqurtîne. Li ser navê hêz tevîkirina partiyê dibe ku partiyê jî bifelişanda. Weke takekesekê xwest ku xwe xurt bike. Ger ku tu ne di nava rast helwestekê de bî, wê tu bi erdê ve bibî yek. Tebî em bi înkârî nêzîk nabin. Di çîna jor de jî şoreşgerên nirxdar dikarin derkevin, lê ev yek îstîsna ye. Pêwîst e encam bèn derxistin ji vê ezmûna ku hatiye jiyandin. Ji bo ku di têtikilyê de azadî bê bingehegirtin, bi hezarûyek awayî hiziriyam. Dema ku kesek bi kesekî din re dikeve nava têtikilyekê wê çi bigire, wê çi bide? Nêzîkatiya wekhev û azad wê çawa be? Ger ku me vê ezmûneya mezin bi serkeftin neborandibana, pêşkeşkirina me ya çarçova saxlem a îroyîn jî gengaz nedibû.

Ev hema hema ji bo her kesî hindik zêde derbasdar e. Lê ez bawer im ku kesekî dî di ciyê min de ba, ya wê di mabeyna bîstûçar demjimêran de qirên bikira, wê encamên vê bijiya ya jî wê jê re bibana pêvek. Ev têtikilyekê wisa ye ku pêwîst e di asta netew de bê gelemperîkirin. Ji ber ku her kes hindik zêde mîna vê pîrsgirêkên xwe hene. Ji vê ezmûneyê min vê derxist: Zayendîtî çi ye, bi vê çawa tê leyistin; ji çînên cuda bûyîn çi ye, ev çawa tê kirîn û firotin, têtikilya hêz wergirtin û dayînê çi ye? Yek jî me encama hevalbendiyê derxist; em li ser bersîvdana pîrsa hevalbendiya rastîn ponijîn. Li ser hevalbendiyê gelek nirxandinên me pêş ketin. Min gelek nirxandinên teorîk ji nava jiyane derxist. Di bingehekî xedar de şerê nav rêkxistinê hebû. Gerîla hebû, yek jî di vê sehayê de şer hebû. Bi gotinê hêsan e; ez di virê de neketim nava jiyaneke din. Naxêr, min di tevahî jiyana xwe de şer giştî kir û ji hemû jinan re mal kir. Dema ku wê hewl dida ji bo xeniqandina hemû jinan, min dixwest ku ez hemû jinan rakim ser lingan. Va çareserî.

## **Hesteke sihêl jî**

### **dikare hêviya gelekî bi erdê ve bike yek**

---

Ev çareserîya ku me gihandiye wê astê re ji eniya dij-şoreşê bersîvek çawa hate dayîn? Hun dizanin, di zindanê de, di halantêdana Şener de, hevaleka me ya herî li ber xwe da, bi hilkeftineke sexte xwestin ku li hember partiyê bînin rewşa derbeya herî mezin. Tebî ev jî êrîşeke bi evînê rûpoşkirî ya KTYê bû ku li ser

PKKê diçespand. Heke ku ew tecrûbeya min dijiya neba, ev çîroka evînê bes bû ji bo PKKê bi erdê vê bike yek. Çirokeke wisa hatiye eyarkirin ku di xwiyangê de hestên erjeng hene. We nameyan xwend. Li bin pesindanên helbestan “tu pir raserê Roza Luksembûrg î, tu temsîlkara jina cîhanê yî” azweriyên ku nayên hiş û aqil, pesindan tev bi îmze ne. Min nêrî, hevala min hişk hatiye girêdan. Min pir di jêr de girt û pir bi zanistî nêzîk bûm, da ku em vê lîstîka KTYê xirab bikin. Ji bo derbaskirina encamên dîrekt ango endîrekt pir girîng bû û bi ser de çûm. Şêwaza têkiliyeke wisa bû ku, ji hemû zindanê re û ji hezaran hevalan re hatibû teyisandin.

Ew hevalên me yên ku yek perçe çerm û hestî mabûn; di rojîya mezin a mirinê de nexwarin û venexwarin, dilêriya mezin nîşan dan û berxwedaneke ku di nava dîrokê de mirov rastê hempayê wê nabe raber kirin. Di aliyê din de jî me nihêrt ku, tê gotin, “mafên mirov, mafên xwarin û vexwarinê.” Di hundirê zindanan de ji me jî pirtir gumrehiya jiyane çêbûye. Rêhevalan ji bo rûmeta partiye xwe anîn rewşa çerm û hestî. Me cendekê Kemal Pîr dît, dibê qey xwe dane ziwakirin. Tu jî, ji bo hindêk xwarina zêde, qaşo ji bo hindêk zêde mafê mirovan, dixwazî tevahî partyê bikşîni bin xizmeta xwe.

Hindek halantêderên din jî derketin. Azadiya jiyaneke bêsnor diçespandin. Ma di cîhanê de ev gengaz e? Ma dijmin dikare vî mafî bide? Ger ku bide, ev ne xapandin e? Ma di zindanê de mirov dikare evînê bije? Tu esîr î. Belkî canê min jî bixwaze, lê ev ketîbûnî ye. Ma ya rast, li ser çarenûsa netew, li ser çarenûsa berxwedanê, li ser çarenûsa şer hizirandin nîn e? Ji dijminê ku hewqas tişt bi te kiriye re, ya rast ne ew e ku tu jî hinek tiştan pê bikî? Ger ku pêşketineke berevajî çêbe, wê ev bibe averiyeke mezin, hem jî li ser navê evînê wê bibe averiyeke mezin. Nameyên bi azwerî nivîsandine. Tê gotin, “ez wisa ji te hez dikim, wisa te hembêz dikim” û hwd. Temam hez bike û hembêz bike, lê hindêk riyên vê yên rasteqînî jî birame. Ev çawa gengaz e?

Me hewl da ku em vê bi bî bixin. Me nihêrt ku, li hember me berxwedanên mezin hene; hê jî ji ber vê yekê rûniştin heye. Wê di nava pergale de birûnên, wê li Ewrûpa birûnên. Wê bi gora xwe evînekê bijîn. Bila li serê xwe bixin, vê evîn û hesta ku asta netew diqedîne...

Yanî ez tînim ku derê? Di xwiyangê de hesteke kesani ya sihêl e, lê ku tu binê wê vekolî hêviya gelekî bi erdê ve dike yek. Tê wê wateyê ku têkilî, wisa gelşeke hêsan nîn e. Li hember van çîrokên evîn û hestan min şer veda. Dijminên me zêde dibin, lê parastina welat, parastina partyê beriya her tiştî tê. Felatkirina mirov jî tenê di vê bingehe de gengaz e.

Di asta netew de dahîrînên mînanî van, dikare bêtir bîn pêşxistin. Ji bo min dikarin vê jî bibêjin, “bi damezraka zewacê ve dileyize.” Jixwe hin kes dibêjin, “jînan ji rê derxistiye.” Ev axaftin pir tê gotin. Wê hê jî bibêjin. Yek car jînan ji rê derxisten çi ye. Ew rîya ku we jînan xistiye, rîya kê ye? Ev rê jînan dibe ku

derê? Pêwîst e em gotûbêj bikin. Ew riya ku zilam diçespînin dibe ku derê? Riya jina pêvek ji çi re rê vedike? Zarokên ku tînin û mezin dikin, ji dijmin re çawa xizmet dikin? Pêwîst e em vana gotûbêj bikin. Evînên sihêl bi karesateke çawa ve encam digire ango bi xitimandinê kesan çawa zû diqedîne? Pêwîst e em vana gotûbêj bikin. Ez mijarên din jî tabû nabînim. Zayendîtî, ne têgîneke ku bê qedandin, têgîneke ku divê bê pîrozkin e.

## **Bi armancan ve girêdana şidandî mitlaq dide qezenckirin**

---

Bêguman ev dahûrînên ku em didin pêşxistin, da ku kadroyên partiyê karibin derxin zanebûnê û bi taybetî jî gavên pratîk bavêjin, wisa hêsan nîn e. Hemû pirsgirêkên şoreşê wisa ne. Ger tu ber bi ya hêsan ve herî, ew dibe şemitandina helperest. Ger tu şewaza me bingeh bigirî, pir rîskên xwe hene, lê tu dikarî encam bigirî. Tebî hewqas jinan ber bi çiya ve kişandin, bi zilaman re beranber girtin tim bi rîsk e. Lê hesabên sedsalan jî, di nêvenga şerekî dijwar de pirsîn, ya herî rast e. Rîska xwe heyê, lê hesab pirsîn jî tenê di ciyên wisa de dikare pêk were. Ger tu bi xirabî bi kar bînî, wê tu artêşa xwe wenda bikî. Hingê jî bedêlê bi serê xwe bidî. Bergîdaneke din ê rîskê jî ev e. Ger ku te jinê girt pêşberê xwe, tuyê wê azad bikî; heke te wê kiriye pêvek (çemkên li hember min wisa dikirin) wê tu bergîdanê bi serê xwe bidî û ku te xwe xist, wê tu biqedî. Bi awayekî din nabe. Tu asta netewî diafirînî; wê hemû jin û zilam bikevin nava pêşbirkekê. Emê bi awayekî din çawa karibin wê ketîbûna mezintirîn derbas bikin? Li virê va hêza hezkirinê, hêza evînê ku te di nava vê pêşbirkê de xurt dike bimeşîne, na ku tu bikevî paş refan û hindêk jî bikişîni paş refan, wê gavê ya ku tu dikî tevgereke herî paşverû ye û nayê pejirandin.

Gotûbêj û dahûrînên di nava PKKê de di vê bingehê de ne. Ez hizir dikim ku wê gelek peywirên ku bikevin ser milên we hebin. Mînak, ez bawerim we jî di rabirdûyê de pirsgirêkê girtibû dest. Lê hun dinêrin dahûrînên me bêtir kûr in û ji bo peywiran jî, nêzîkatiyeke cuda pêwîst dikin.

Z.: Rast e, Serokê min. Dahûrîn gelek pêşketî ne. Lê di gihandinê de em pir zorî dikişînin. Yanî dahûrîn di asteke pir jor de ne. Tebî şûngeha civaka me jî diyar e. Lê jin bêtir hatiye xistin. Ji ber ve egerê jî, di yek carî de gihîştin, jixwe bêderfet e. Ez dixwazim diyardeyên Serokatîyê bişibînim wan hilkeftinên dîrokî yên dî. Mînak derketina hinek serokan heye. Bi taybetî, di xala gihandina hin

hedef û armancên jinê de gavavêtinên pir bi serkeftî pêk anîne. Mînak, di qonaxa Mihemed de, derketina Îslamiyetê û dîsa derketinên dî jî hene. Di Kurdistanê de jî wisa ye. Em vê yekê di kesayetiya Serokatîya xwe de dibînin. Lê bi ya min pir giran û ji bo gihîştinê jî, pir zor e.

S.P: Tebî di wateyekê de em pirsgirêkê di aleyhiyê zilamê heyî de çareser dikin. Helbet pir zor e. Hemû zilam di vê mijarê de xwedibîn in.

Z.: Serdestiya zilam giran e.

S.P: Yekî wiha gotiye: “ma ez xê im serdestiya xwe bi destê xwe ji rastê rakim!” Hindek rastîne diderbirîne, lê êdî em hindek di lehê jinê de tevgerîne didomînin. Ji bo min teşeyê têkiliyê herî nayê tebatkirin teşeyê hev pejirandina jin û zilamekî ye. Bi ya min divê têkilî asta xwe, yan rewneq bin, weke helbestekê be, yan jî wek vehûna hunerê bê hûnandin, yan jî pê re bê şerkirin. Hun nêzîkê pejirandîneke pir erzan dibin. Yek jî li serê gotûbêj dikin. Pir pir gotûgota wê dikin û şer derdixin. Bi ya min di virê de wendakirina mezin a civakê heye. Babetekê ku ez wek taybetmendiyê xwe digirim dest, di vê mijarê de xwe bêastnekirin e. Di mijara jinê de têkiliyên min xurt in. Hinek rêgez, rabes û helwestên ku ez raber dikim hene. Rûmet, rêgez, hewldan û hwd. tev tê de hene. Li hember paşverûtiya jinê hedirandin, ji hedarkirina li dijî mêtîngeriye pir zortir e. Di temenê xwe yê pir piçûk de li hember dê û bavê xwe berxwedanê nîşan dam. Bi birayên xwe re hê jî di nava şer de me. Pêwîst e ev ji bo wê wateyekê biderbirîne. Ji ber ku ne babetekê wisa ye ku hema mirov derbas bike. Di mijara jinê de jî, têkoşîneke wisa mezin heye.

Heke hun dereng têgihîştîbin, di têgihîştinê de zorê dikişînin, divê hun vê, bi çemka xwe ya sawî û teng ve girêbidin. Jixwe mezinbûna PKKê di giştî de heye. Ez dihizirim ku di nava keç û xortên PKKê de pîrozbûneke diyar heye. Heta yê gav davêje nava PKKê di vê mijarê de dilêr e. A herî hindik xeleqa pêşî ya hezkirinê girtine. Tebî ev bi serê xwe têr nake. Hatina nav rêxistineke weke PKKê, di nav rêxistineke weke PKKê bi hêsanî hêza xebat û şerkirinê raberkirin, dikare hezkirinê bide destpêkirin. Lê belê bi vê qîmanîn, bi vê leyistin nemerdiya herî mezin e. Şaş helwesta di virê de ber bi karesatê ve dibe.

Di bingehe de ev tev ji hêla Serokatîyê ve tîn hizirandin û ji partiyê re weke polîtîkayekê tê teyisandin. Di nava partiyê de, e ji polîtîkaya zayendîtiyê bigirin heya polîtîkaya evînê tev hene. Heke hun bi vê tînagihîjin, sedemê bi paşdemayîna xwe ve girêbidin. Em ji girêdana jinê bi rêxistinê bigirin heya girêdana hestiyarî nêzîkatî hene. Em ji girêdana jinê bi gerîla bigirin heya civakbûnê re tevkarî berpêşkirinê nêzîkatî û polîtîka hene. Ger ku hun tînegihîştîbin, vê bi paşdemayî ya xwe ve girêbidin.

Jin pir helbest dinivîsîn, distrînin, hestdar in. Yê me jî, di tîkiliyan de şewaza me ya strandîne, xwendina helbestan heye. Em helbest û stranê ne ji bo vehesandinê, ji bo wêrandina asta netewî dixwînin. Ji Serokatîyê wekî dîn tişt

nayên xwestin. Zoriya serokatîyan di virê de ye. Wê kadro jî hindek bi vê têbigihîje û bisepîne, vê disîplînê wê nîşan bide. Ez hizir nakin ku hun di rabirdûyê de hewqas têdigihîştin.

Z.: Di nava partiyê de pêşketîneke girîng heye. Vê bi civakê dana pejirandin, ji binkeyê re dana pejirandin gaveke girîng e. Lê...

S.P: Dibe ku hun şaşwaz bibin, ditirsim ku hun pir zorî bikişînin.

Z.: Em di wê xalê de mane.

S.P: Di nava PKKê de keç rabûne pêngava melekbûnê. Çi ye melekbûn? Hun dizanin pir zor e. Hun mirovên ku mirinê dane berçav in, hem jî layiqê vê ne. Ev tam nehatiyê têgihîştin. Jixwe her tişt tam hatiba têgihîştin, pêdivî bi Serokatîyan nedîma. Hilawestîneke diyarî em pêk tînin. Misoger e ku pîrozî heye. Dijminên wê jî pir in, dostên wê jî. Eşkere ye ku wê hêsan nebe. Ez jî xwe rojane digihînim gerîlayekî. Ez pêşengekî xurt dikim. Hun jin jî pêl bi pêl tîn, hewl didim ku pêşiya wan vebikim. Yê ku hatin, li hawîrdor me mîna dêranekê bûn, şekl û fesala wan tunebû. Ya herî xirab, dihizirin ku bi xwe van pêşketinan pêk anîne. Ne wisa ye, helwdanên cîhanekê pêwîst dikin. Ev têngihîştina we, bêtaloxî û kêmahîyeke mezin e. Ez hizir dikim ku çewtîyeke mezin jî di virê de tê çêkirin. Mirov dikare birame ku nêzîkatîyeke taybetê şoreşên mezin, di vê mijarê de hatiye pêşankirin. Ew şoreşên ku tê gotin pir zanistî ne, her tiştên wan nîvî nîvî proje û ûtopya ne. Ev mijar, ji bo me jî, ji bo Îslamîyetê jî wisa ye. Hz. Mihemed, ji bo îslamîyetê dibêje ku, olê dawî ye. Kapîtalîzm qala biratî û aştiya bêdawî dike. Sosyalîzm dibêje, komunîzm gihîneka herî dawî ye. Ev proje ne. Em, ji bo jinê qala wekhevî û azadiyê dikin. Ev jî projeyek e. Lê pêkanîneke sînordar jî, pir nirxdar e, gaveke qirase ye.

Şoreş niha di mijara jinê de wisa seyr dike. Heman tişt ji bo zilam jî derbasdar in. Pirsgirêk yek alî nîn e, weke goşt û neynûk e. Em êşkere bin, qasî qutbûna ji rabirdûyê, heya lêkirina xeleyeyên azadiyê divê em bi îdîa bin. Em neşikînin û nerijînin. Bi taybetî jî, divê astengî neyên çêkirin di şer û jiyana rêxistinî de. Ger ku di rewşeke wisa de mayîn çêbibe, pêwîst e hema helwest bê raberkirin. Şewazekê ku jiyane xurt dike, em li her cîyê û di her demê de bidin rûniştandin. Ji bo vê yekê jî em bi xwe bawer bin. Ew qencî, rastî û xweşikîtiya me wenda kiriye, em qezenc bikin. Em di riya rast de ne. Ger ku em bi armancên xwe vê girêdayî bijîn, dîsa çeka têkoşînê bi gor mercên şênber li xwe bikin û bi kar bin, emê hemin qezenc bikin.

**24 Rezber 1993**



Şoreşa Kurdistanê cara yekem  
Di hemtaya navnetewî de dikare bibe şoreşeke jinê

## ŞOREŞA KURDÎSTANÊ ŞOREŞA AZADIYA JINÊ Û CIVAKÎ YE

Em di qonaxeke pir girîng de diborin. Divê em hemû hêz û behremendiya xwe tevbigêrin. Pêwîst nîn e ku ev bê gotin jî. Lê mixabin ev di dema xwe de nayê têgihîştin. Tam berevajî, ji bo reşkirin, kirêtkirin û neyênîkirin çiqas gotin û libat pêwîst dikin, hewqas tê raberkirin. Gotûbêjek tê birêvebirin ku dilê mirov tîne ber devê mirov. Ev gotûbêj wêrekî didin dijmin. Di mercên herî zor de jî, min, ne axaftineke ku bêhêvitiyê bi xwe re bîne serf kiriye û ne jî tevgerînek pêşan kiriye. Lê ev nayê fêmkirin. Tim sihêlbûna xwe, çonayetiye komekî û aliyên kirêtiyê çêdikin, didin axaftin.

Kadroyekê PKKê ya rastînî, di têkiliyên xwe de aliyên kêşvan, felatkar, ronahîkar û ajotkar yek kêliyek jî nikare paşçav bike. Li ba vana, pêwîst e ku bertek, revandin, radest girtin, xirakirin, xeniqandin û ber bi xitimandinê ve birin weke şewaza koletiyê bê redkirin. Di vê mijarê de şerê me yê mezin heye. Pêwîst e bê dîtî; ji ber wê yekê tu mafê kesî nîn e ku bibêje, “têkiliyê çawa dixitîmînim, çawa dehf didim, çawa radest digirim, çawa diçespînim, çawa vala derdixim, çawa çep-rast didim kişandin, çawa tînim halê nayê jiyandinê, çawa ber bi şîlobûnê ve dehf didim û çawa dizivîrînim têkiliya bêhêvitiyê. “Ev tev ji dijmin re xizmet dikin. Têkilî, divê bibe têkiliya hêviyê. Têkilî, wê di nava xwe de derfeta serkeftin û pêkanîne hilgire û di oxira wê de nêzîkatiya jidiltî û xweşbînîtiyê pêwîst bike. Wê tu şensê eşkerekirin û dahûrîne tim û tim bidiyê ku, têkilî û jiyana hindek pêşveketî bibin.

Di şerkirinê de jî xweşikbûnê zanîn, taybetmendiye tevahî mezin şervanan e. Ger ku kesayetiya serkarî ya şerekî girîng pir balkêş nebe, nikare wî şerî bi rê ve bibe. Bihizirin, ger ku ez vê taybetmendiya xwe hindêk pêş nexim, nikarim kesî bi xwe bidim gohdarkirin. Nexwe, ew şervanên ku wek we di pir zorî û zehmetiyê de ne, wê birevin û herin. Ezê hemû hunera xwe deynim rastê ku ev bila bibe şerê herî xweşik. Yanî bûyer li ser min zorê dikin. Bi meşandinên rojane tim û tim tê kirêtkirin. Tê rewşa nayê tebatkirinê. Ez, van tevan dibînim, şêwaza şer û jiyana xwe xweşik û kêşvan dikim. Hun dihizirin ku ev, ji xwe re çêdibim. Xwe xurtkirin, xwe anina halê hêza meşandinê şêwaza têkoşînê pir zor û xwedîbûna mercên wê yên têr, berpirsiyariyeke mezin e. Ger ev nebe, têkoşîn nayê vedan. Li piraniya serleşkerên me binêrin, kar û xebata wan şer, jiyana û têkiliyan kirêtkirin e. Ev, nakoyeke wê yê mezin e. Mixabin, em ji uslub û hîtabê bigirin heya şêwaza şirovekirinê, ji pêşî vekirinê bigirin heya hêvî dayinekê, heya ji bo çima û çawa divê kar bi serkeftî be re diyarkirina rêk û azînan, di van hemû mijaran de serleşkerê ku xitimiyê heye li pêşberê me. Zor bela çend derfetên ku me daye destê wî, di nava hewldana qedandina wan de ye. Bi koman serleşker ango şervanên me yên wisa hene.

Ketina min rewşeke wisa, tê wateya qedandina şer. Şerê dozeke pir girîng tê dayîn.

Em, bi hemû hêza xwe ve, bi rêpîvana, “serokatîyeke rastînê wê çawa be” ve girêdayî dimînin. Ji ber ku libatên nêvenga me kirêtkirinê zêde ne. Hema ji her tiştî re nêzikatiyeke kirêtkirinê heye; dema ku têkiliyên jin û zilam dibe mijara gotinê, ev, pir balkêştir e. Di van mijaran de pêwîst e ku gelek mesafe bê wergirtin. Pêwîst e ji têkiliyê re bi hostayî nêzîkbûn, ji têkiliyê re bi xweşiktî nêzîkbûn, ji têkiliyê re tam bi hûrbijêriya hunerekî nêzîkbûn, perwerdekirina kesayetiya serkarî rastînê û ji jiyane wane derxistin û gihîştin, bibe taybetmendiyeke wî yê jêveneger.

## Zayendîtiya bêteşe qedan e

---

Wê di zayendîtiyê de jî viyan hebe. Ger ku ez vê bîrxistina piçûk bikim, dibe ku bêtir balkêş be: Ez çima pir xwedî viyan im? Ê me jin-mêr ango jin-zilam di zayendîtiyê de xwedî felsefeyekî ye. Heta wateya temamê cîhanê di biyekbûna zayendîtiyeke sihêl de dibîne. Di bingeh de “gihîştina miradê” ajoyeke zayendî ye. Ev di ajalan de heye, di mirovan de heye. Rewşeke xwezahî ye. Di heman demê de; ji ber ku ajo heye, em tewanbar nakin, asayî ye. Lê belê, yên me encamên siyasî ku ji vê derxistine, ka çi ye û ne çi ye pir girîng e.

Zilam, di zayendîtiyê de tam li serdestiyekî digere. Ger ku di zayendîtiyê de bi serkeftî nebû, dihizire ku ji zilamtiyê ketiye û dikare xwe bibe heta xwekuştinê jî. Ev çima wisa ye? Pêwîst e di vê mijarê de jî, gihîştina encamên rast pêk werin. Gava ku zilam di zayendîtiyê de bi serkeftî nabe, xwe weke ku nikare jiyan bike dibîne. Di jinê de ev rewş xwe cewaz nîşan dide. Zayendîtiyê ji bo ku zilam di nava destê xwe de bigire, di bin kontrola xwe de bigire, weke çekekî herî mezin bi kar tîne. Bihizirin, di vê derê de çemkek derketiye rastê. Dema ku zilam di zayendîtiyê de bi ser dixîne, xwe weke zilamekî tam ango wekî dîktatorekî dibîne; jin jî, di bingehê derbaskirina hemû rebentî û lewaziya xwe de, xwe tam weke makekê dibîne. Hinek jî, ketîbûna zilam di vê mijarê de tîne berçav û xwe tevî pê re jiyînê dike. Va, di vê derê de zayendîtî, ji çemka namûseke xeternak re rê vedike. Piştî ku dibêje, “ez bi zayendîtî malê filan zilamî me” û li ser vê ku êdî çemka namûsî ava dike şunde (di nava me de rêgeza sinca bingehîn ev e) ya ku dertê rastê encamekî pir xeternak e.

Welat tê dagirkirin, bi hezar caran li welat tê tecawizkirin, hema hema bi her awayî tecawiza mirov a civakbûn û siyasîbûn bi xedarî tê kirin, le ji bo vê mûyekî xwe nade livandin. Li ser navê namûs û rûmetê yek hesteke wî/ê xuya nake. Mînak bi gora min ji çemka niştociyên Efrîqa ku bêtir asayî û nêzîkatiyeke eplaqî ye, mirov dikare qiymet bidê. Zayendîtiya xwe qetiyen weke amrazekê bikaranînê nahizirin. Vê yekê weke namûsê jî nanirxînin.

Di nava me de ev çima wisa bûye? Bêguman ji bona vê jî di gelek aliyên; dîrokî, civakî û olî de pêdiviya rave anînê heye. Yanî divê em di nav şênberiya xwe de lêkolîn bikin. Lê, di derba pêşî de ya ku bê gotin, ev şewaza jiyanê tîpekî qediyayî ku pir xeternak û pir kevneperest e, em ji welatbûnê bigirin ta bi her cure pêşketina azadiyê re berevajî ketiye.

Heke ku em bêtir şênber bikin; hun viyanê wenda dikin. Biyekbûna zayendîtî ji bo piraniya we, weke amrazekî têrbûyîn û qedanê, ji aliyekî zilam bûyîn, aliyê din de “gihîştina mirada xwe”, di aliyê din de jî, weke tiştêkî “cîhana xwe” peydakirin e. Û mîna vê gelek encam. Asayî ye; dibe ku biyekbûna zayendîtiyê de têrbûyîn peyda be. Bûyereke asayî ye, di bingeh de xwazayî ye. Lê bi vê qîm pê neanîna me girîng e. Cîhan, çemk û nakokiyên ku em li ser vê lê dikin, pir girîng in. Mîna ku “gihîştina mirad” a zilam her tiştî çareser dike, weke ku hemû nakokiyên çareser dike, tê gotin, “min keçê girt, min mêr peyda kir.” Yek jî, heke cîhaneke piçûk ji wan re debar bike û mehaneya wan jî hebe, jiyan qediya; hezar carî vê dubare dikin. Jin jî, zilam jî bi gora xwe felsefeyeke xwe ya jiyanê heye. Jixwe hemû civaka me wisa ye. Zayendîtiyeke pir bêteşe, pir xwezayî di nava me de qedan e. Pêşketinên siyasî û civakî yên bingehîn re wate dayîn, dîtina jiyana ku bêtir dikare bê xweşik û dewlemendkirin nîn e, hebe tunebe zayendîtiyeke bêteşe ye.

Civak xizan, zilam xizan, jin xizan e, tenê yek zewqek tê hişên wan ew jî, zayendîtî ye. Di tevahî nirxên din ê jiyânê de, felsefê de, siyasetê de zewq tune, xeternak heye. Tiştêkî bê rêkûpêkirin nîn e. Zewqa herî sihêl, zewqa zayendîtî ye. Hindek jî di rewşa ajoyên xwezayî de ye. Ev, xeternakê bêtir têkilhev dike.

Di vê mijarê de pêşgiriya ku min girtî ango di pratîka xwe de hinek tiştên ku dixwazim bidim pêşxistin hene. Bêguman di vê mijarê de min, civakê hindek kêmtir dît. Yanî ev şêwe zayendîtîya wan di temenê min ê piçûk de bi min re bertek da çêkirin. Her wekî di rasteqîna malbata me de, di dê û bavê xwe de vê dîtîm. Zêde nizamî, lê di bûyera zayendîtîyê de, ez di wê baweriyê de me ku pirsgirêkên wan ên mezin hebûn. Wisa li min tê ku şerê wan li ser vê bingehê bû. Min hizir dikir ku, bi vê ve jiyânê tînin radeya nayê tebatkirin. Zewaceke bêhevseng. Têkiliyên pir bêhevseng, pir biyanîbûyî û encam; ew rewşa xeter a ku malbata Kurd dikevê. Min di pêş de dît ku, ka jin û zilamê Kurd xwe çiqas mehf dikin. Min selimand ku, hemû zilamên gund di nava lêgera zayendîtîyeke pir sihêl de ne, ji bo vê şerê jinê dikin, li ku derê keçek hebe, di vê bingehê de dixwazin zû bi zû dest bigirin. Heta dema ku bavek ji kurê xwe re keçek tîne jî, hizirandina xwe jî dibe. Di nêvenga gund de ev rewşên wisa jî hene. Dema ji kurê xwe re keçek tîne, rewşa çavberdanê jî belavî ye, hun nizanin. Ev, rewşeke derûnî ye. Di bingeh de zêde jiyana pratîk peyda neke jî, di nava civaka me de wisa rasteqîneke derûnî-civakî heye. Va, yek encama ku jin jê derxistiye ev e û di biçimê, “qet tiştêkî min nîn e, rewşa min a bûyîna jineke bêteşe heye; ezê vê bi navê namûsê li ser zilam bidim çespanî û temenekî wisa bijîm.” de ye. Êdî di vê rewşê de jin, xebitandina hişê xwe, xurtkirina viyana xwe gengaz nîn e. Yanî ji 15 saliya xwe pê ve miriye. Jiyanêke din a xweşik dibe ku hebe, derfetê azadiyeke dî dibe ku gengaz be? Vê nahizire. Bi fîzîka xwe ketiye, bi giyana xwe çûye, bi ramana xwe jixwe qet tune. Va, zayendîtî di vê derê de rolekî pir xeternak dileyîze. Halbûkî zayendîtî, diviyabû ku berevajî rolek bileyîze, di nava me de wisa çalexwarî ji bêviyanîyê re rê vedike.

Çima ez, ji vê bûyerê re zû dest bi rexneyan kirim û nexwestim bi hêsanî bikevim bin bandorê? Çima nexwestim viyanê ji dest berdim? Ev, taybetmendiyekî pir girîng e. Ez bawer dikim ku ev taybetmendî, di yekî we de jî hêsanî pêş nakeve û nayê dîtîn. Jina pêşberê min (Fatma-Kesîre Yildirim) vê ferq dikir: Taybetmendiyê ku di tu zilamê Kurd de peyda nabe. Di zilamê Kurdê klasîk de taybetmendiyê heyî jî, bi bandorbûneke zayendîtî ya herî piçûk de, bi vir an jî bi wir ve tewandin, anîna halê çemandin û çawa tê xwestin arastekirin e. Ji ber ku vê pir baş dîtîbû, bi şêwazekê, “jinantiyê hindek bi bandor binirxîne, di nava partyê de dikarî hemû zilaman bêxî bin bandora xwe” wisa nêzîk dibû. Qelsiyêke wisa pir kûr ê zilamê Kurd mijara gotinê ye. Ev der, pir balkêş ê û pir qiymet heye ku li ser bê sekinandin; pêwîst e encamên girîng bînin derxistin. Taybetmendiya min li vê derê pir balkêş e. Mînak hevalemî din be, va ye hevalê

Kemal Pîr, wê di cî de serî rake û bi awayekî “ma tişteki wisa dibe” ê nêzik bibe. Lê ez, ger pir bi hêrs bim, di çemka pêwîst e ne wisa be, qetiyen rast nîn e de bim jî, hema li ya pêşberê xwe serî li azînen lêxistin, daleqandin, jêkirin, avêtin û devjêberdan ango revandin, nadim. Pozîsyona min a li vê derê ji pir balkêş e. Di bingeh de tu zilam ji mala xwe nareve. Ez reviyam û 15 roj neçûm wî ciyê ku ew jin lê bû. Hem jî di demeke ku pir kar hebûn de. Bi gelemperî zilam, jinê diqewitîne, rêpîvan ev e. Tevî ku ez pir bandordar bûm jî, ji malê reviyam.

Ev jî şewazek e. Bi xeternak ye. Ka em binêrin wê çi bibe? Û bêşik em aliyê dijber kontrol dikin. Ez ji bo vê yekê da ku weke zilamekî kevneşopî nenirxînim, rewşeke ku mirov 10 demjimêr nikare tebat bike, bi hedan 10 salan tebat kirim. Mesele ji, “têkiliya zayendîtî, viyan çi ye, ne çiyê” wêdetir diviyabû ku bûyer bê têgihîştin.

Ev jin ji malbateke hevkarîmend tê. Dibêje ku Kurd, sosyalîst û jin e. Niha ev tev dibin çi? Ma sosyalîstek dikare wisa bibe? Ma Kurdek dikare wisa bibe? Ma rewşenbîr-entelektuelek dikare wisa bibe? Aliyên din gumanan bi xwe re tînin. Dixwaze jinantiyê çawa bi kar bîne û di bin rûpoşa sosyalîstiyê de çi bike? Kesayetiya feodal-komprador, di bin rûpoşa Kurdayetiye de dixwaze bi ku derê ve bibe?

## **Tîpê jin û zilamê Kurd ê klasîk li hemberê hev binketî ne**

---

Ger hun bala xwe bidinê tam serûwenek e. Ji serûwenê jî wêdetir pevketineke mezin, bi gora min şerekî mezin e. Bi ya min, ji ber ku hun bi van şeran weke şerên xwe tînegihîjin, asta dahûrandina we ya civakî û ya zeximkirina tîkiliyan pir paşdemayî ye. Bi rastî dema ku ez dibêjim destpêkirinên balkêş vê destnîşan dikim. Bi misogerî di vê derê de heta dawiyê ez durust im. Di bingeh de ji her cure rastiye re vekirî me. Lê qasî ku aliyê dijber jî bibîne, serdestê viyana xwe me. Bihizirin ku li vê derê şûna min de zilamekî din heye! Ya wê tam bikeve bin fermana jinê, ya dê jinê berde, ya jî dê bikuje. Wekî din rêka navîn nîn e. Hem ji

di nava 10 demjimêran de, te nizanibû di nava heftiyekî de encama ku derkeve pêşberî wî ev e.

Li rastê malbateke ku xwe pir dispêre dewletê heye. Li ser komê hinek tasarufên xeternak mijara gotinê ye. Niha ez, ya karê komê, karê Kurdayetiyê wê berdama, weke mamûrekî piçûk bigotama, “wey xwedawo ji van karan re tovbe” ya jî hewl dabama ku dawiya vî karî bînim. Yên we tevan bi îhtîmala mezin di tîkiliyan de, di şêwaza nêzîkatiyê de rewşên cewaz ê ji vî hene. We seqaya tîkiliyên siyasî, civakî, çandî û giyanî nedaye ber çav. We gotiye, “zayendî xweş e, zewq tîne” û viyana we şikestiyê ango rewşa zayendiyê nedîtin, nebihîstin, û nejiyandin bûye mijara gotinê. Ev bûyer di hinekan de pir bandordar e. Hizir dikim ku ev jî qasî yê din ber bi encamekî xeternak ve dibe.

Di zayendîtîyê de ponijîna azwerî û hestan tebî pêwîst e ku di çarçoveya dîrokî de bê runîstandin. Têkilî ji bo sosyalîstekî pir girîng in. Ku ketûber bigire dest, wê di serî de bin bikeve. Di bingehê dîrokê de jin, zayendîtîyê de rasteqîna qedaneke mezin û vederbûyîneke mezin dije. Çi eleqeya xwe bi azadiyê ve nîn e. Zilam, jixwe qurbanê şaşitîyên mezin e. Biramin, hema hun tev wisa dest bi tîkiliyan dikin. Ma sosyalîzm ma, berxwedan ma, azadiya viyanê ma? Viyana paldayî tim bin ketiye. Va, zorî li ser me çêdibe, di kişandina we ber bi azadî û viyaneke xurt de. Niha pirsigirêka min a herî mezin ev e.

Di vê xalê de zayendîtîyê çawa ber bi çareserkirinê ve dibim? Esas we dikaribû vê encamê di pêşiyê de têbigihîsta û formulê kiriba. Mîsoger e ku dijmin vê tîkiliyê ji sedsalan vir ve bi kar tîne û ji çemka namûsê em bigirin heta çemka zewqê xistiye nava çelaxwariyekê. Ez vê dibînim. Lê divê pêşgirî bibe çi? Va, yê ku li ser xwe dispînim hene. Mesela min dikaribû jineke hêsan peyda bikira, di temenê piçûk de bi gor usûla gund dikaribûn min bizewicandana. Heta bi hizira min di malbatê de lêgereke wiha jî hebu. Lê wêrekî nîşan nedan ku ji min re bibêjin. Jixwe tê bira min digotin, “tu bi vî halê xwe nikarî bizewicî, nikarî keç payda bikî!” Jixwe mebesteke min ya wiha jî tunebû. Halbûkî pir kevneperest bum. Tê bîra min, ji meleyê gund re pirs kiribûm û gotibûm, “mele, lîstîka ku jinên bêhvan dileyîzin heye, ma nihêrtina min guneh e?” Mele fetva dabû û gotibû, “Dikarî binêrî, guneh nîn e!” Min hingê bi wêrekî nihêrî. Li ser bingehê fetvayê, di temenê zaroktiyê de hindêk wisa dibe. Di bingeh de bi edeb û terbiye me. Hingê bi rêpîvanên olî ve girêdayî bûm. Bibêje, “nenêre!” nanêrim. Guneh e, nêzîk nabim. Tebî piştê bi gor pîvanên çîneyî û sosyalîstiyê nihêrtim. Di Siyasalê de dixwînim, zarokên burokratên herî jorîn hene. Jixwe dîsa jî hildikişim, bandordar dibim. Yek peyvekî jî bi kar nayînim. Dev ji lêgerîna zayendîtîyê berde, wê demê evîna min kevneperestîya min bû.

Wê demê bi gora xwe, lêgerîneke min a sosyalîstiyê hebû. Bi pirsigirêka netew re mijul dibim. Derveyê wê min nikarî “merheba” yekî jî bidama. Belkî jî min kêşvan didîtin. Ji ber ku tê bîra min dema ku min peyva Kurd bi kar anî,

çepikandineke mezin girtim. Yên ku diçepikandin tev jî nîvî nîvî keç-xort, zarokên burjuva bûn; min di bîçimekî awarte de destek dikirin. Lê tevî vê, nikaribûm gotineke, “Hun çawa in” jî bibêjim. Dîsa jî eleqeya wan hebû. Li Dibistana Navîn bi zarokên burjuvaziyên piçûk û burjuvan re xwendibûm. Balrakêş jî didîtîm. Lê tu caran bi “merheba” yeke erzan, têtikilik, ji zarok û keçikeye burjuva re gotineke “Tu çawa yî” tunebû. Li rexmî ku pir xweşik jî didîtîm, tenê yek “Çawa yî” jî nedigotim.

Yanî ev gelşa nîrxên hazir e. Ê we, rewşa dizîna xweşiktiya xelkê, perê xelkê û derfetên xelkê heye. Ê min jî, di radeyekî dawî de xwe girtin heye. Tê wê wateyê ku ev, bi gora helwesta çîneyî û helwesta netew pêk tê.

Kevneperest im, lê ev pêşketinên wisa nîşan didin ku lêgerîneke azadiyê di hundirî min de pê re pê re didome. Li keçên gund dinêrim, zilamên kal girtine. Hê jî di hişê min de ye. Da ku bibe mînak dibêjim. Yanî keçeke ku pêwîst e bibe heval, lê min nihêrî ku zilam şerekî wisa kiriye, ger bibe ji bo xwe, ger nebe jî, ji bo kurê xwe standiye. Gelek keçik tên bîra min, dixwestin ji min hin tiştan fêr bibin. Tebî wê demê hêza min a ku bi keçe têbigihîje û zanyariyê bidê nîn e.

Bi ya min ev neheqiyên mezin in. Yanî li ser çarenûsa keçeke liberçav, hewqas li derveyê viyana wê çima şer dibe? Xwişkê xwestin. Ev kî ne? Hê jî tê bîra min, qet bi xwe nedame pejirandin. Ev zava kî ye? Hindek pere û hinek tiştên din didin xwişkê. Qet şewazeke baş nîn e û hê jî piçûk dibînim. Ev têtikilik, têtikilikê koletiyê ye. Mîna vê bi hezaran bûyer bi te kom dibin û lêgerîna azadiyê derdixin rastê.

Va kirêtîyên zayendîtî, ew pîrsgirêkên li hawîrdor me keç û xortên gundî bi têtikilikê zewacên demekî kurt de encamên derdixin rastê. Bêkar û xebat, ji bo cihêzekî, ji bo qalaneke hemû xortanî û hemû ciwaniya xwe qurban dikin.

## **Ji bo têtikilikê azad şernekirin li azadiyê xiyantekirin e**

---

Ev hemû hiştin ku em hayjixwe bin. Hişt ku em herin ramana ev kar wisa nehêsan in û wê pîrsgirêken mezin peyda bibin. Dumahîkê di vê bîngê de ketim nav ezmûna têtikilikê.

Di vê derê de çawa ku hun dihizirin, ma hema şikestina viyanekê û ketina nav têtikilikê jin-zilam a hêsan heye yan na? Li xwe binêrin, yek jî li min binêrin: ji ku derê digirim û tînim ku derê? Em, di bûyera jinê de xweşiktiyekê nû û nû derdixin rastê. Ango em, xweşiktiya di kesayetiya jin-zilam de û derfeta jê hez kirinê bi rastî jî, hem bi zanistî, hem jî bi hunerî nû û nû dihêvojin. Di vê mijarê de me hindek pêşketin pêk aniyê. Di têtikilikê de -bi ya min divê jin xweşik be-di

temênê min ê piçûk de û heta bi azweriyeke mezin lêgera min a xweşikiyê heye. Ji 7 saliya xwe vir ve kesan wisa dinirxînim. Pîvanên xweşikiyê curbicur in. Ji tevgerînê em bigirin heta fîzîk, ji taybetmendiya hîtaba xurt em bigirin heta vacbûnê, wisa hinek taybetmendî hene. Hê jî di hewldana de ka em dikarin pîvanên xweşikiyê çawa derxînin rastê de me. Ma lêgerên we yên wisa hene? Ma di oxira wê de têkoşîneke we heye? Bi ya min nenirxandina xweşikiyê heta ramana paşverûtiyê jî wisa pêş dikeve. Keçeke ciwan pêgirê koletiyê kirin, li ser bingehê peran firotin pirgirêkeke mezin derdixê rastê. Keçeke xweşik tenê ji bo peran ji zilamekî re malkirin pir kirêt e û nikare bê pejirandin.

Ev çi tîne? Ma nêzîkatiya azadiya jinê di te de pêş dixê? Çima yekî pir kirêt li ser bingehê malê xwe, perên xwe, hêza xwe here keçekê bigirê û bibe? Çima ? Di nêvenga gund de mînanê vê gelek têkilî hene. Hinek li ser hêza xwe, hinek li ser hêza malbata xwe, hinek jî li ser bingehê perên xwe dikin. Û keçikên baş yên gund, ew keçên ku em dikarin bibêjin xweşik in, wisa direvînin û dibin. Di nava civaka me de gelek nêzîkatiyên wisa hene. Tev di 12 de saliya xwe de ne, lê feodalek, kompradorek wan keçan ji xwe re dikire. Li Serhedê gelek keçên wisa ji hêla bazirganên Qeyseriyê ve çawa hatin revandin ber bi rojava ve! Ev tev mirov didin hizirandin.

Civak bi pîranî hindêk wisa ye. Û ev, birîneke mezin a civakî ye. Li ser van tevan tu bi ponijîn nehizirî, wê tu çawa bibî xwedî çemkeke azadiyê, çemkeke xweşikiyê û heta wê tu şoreşgertiyêke çawa bikî? Ma di we de ramanên wisa pêş ketin? Bi ya min li hember vê rewşê têkoşînedan perçeyekî welatparêzî yê nayê veqetandin e. Ji ber ku xweşiktiya jin û keçên me wisa firotin, qasî xiyaneta welat xeternak ye. Bazirganên Qeyseriyê (tev jî faşîst in) tînen, keçên me yên xweşik ku di radeyêke dawî de dikarin pêş bikevin, dikirin, dibin û diçin. Yê ku perên wî heye li her deverê keçan dikire, dibe û diçe. Ev qasî xiyaneta welat rûdaneke xeternak ye. Jixwe yê ku li nirxên xwe yên mirovatiyê wisa binêre, welatê xwe qet nabîne. Em dizanin ku nedîtiye jî. Ne ji dîrokê, ne ji xweşiktiya xwezayê, ne jî, ji xweşiktiya têkiliyê fêhmî dîke. Ev tîp xiyanet kiriye. Em dikarin nirxandineke wiha pêş bixin: Di mijara jinê de yê ku vê kirêtiyê layiqê xwe dibîne, dixwaze bila keç be, dixwaze bila xort be, qasî bêwelatiyê tevî tewanê xiyanetkirina azadiyê bûye.

Çima? Va, di vê çarcova ku divebêjim de neheqî, tevan û kirêti hene. Te vî tewanî kiriye, hingê wê tu çawa bibî welatparêz û çawa bibî azadîxwaz?

Şerê ku hun di oxira jinê ango oxira zilam de didin çawa ye? “Bigirim, birevînim û bikim mal!” Tam di bîçimê ku pergala diçespînê de ye. Şerê we nîn e. Ji ber wê yekê jî, hun kirêt dibin. kirêtiyên mezin, rewşên nayên pejirandin hene. We nexwestiyê ku hun vana bibînin jî. Niha, ji vî şerê ku min li ser navê rizgarkirina hemû xweşiktiyan pêş xistiyê, hunê bibêjin: “Ma şerekî wisa dibe?” Erê, şerekî min ê wisa heye. Ne tenê şerê felatkirina xweşiktiya jinê ye, di heman

demê de şerê felatkirina xweşiktiya xwezayê û dîrokê ye. Erê, ma ev tev nebin, hunê çawa bibin welatparêz? Wê çawa azweriyên we yên azadiyê pêş bikeve? Çi di we de heye, çawa pêş dikeve? Ji çiyar bi hêsanî bireve, qet wate nede nîrxên dîrokî, nêzîkatiyeke, “jin, yan amrazekî zayendîtî ye, yan bigire ji xwe re bike mal, çi dikî bike, bi kar bîne!” wisa heye. Yeka/î dil û jiyana wê/î wisa be nikare bibe şoreşger. Di wê/î de xweşikî, îcar rêkxistinî û şervantiya wê pêş nakeve.

Bi îhtîmaleke mezin kesayetiyan we hindêk bêçareserî ne. Tebî vê, ne tenê ji bo pîrsa hate pîrsîn re, ji bo gelek pîrs bîn bersivandin destnîşan dikim. Di tîkiliyan de ji dîtina maf û kedê em bigirin, heta rewşeke pîr kirêt bi xwe dana xwarinê, hemû binketinên we nîşan dikin. Bi vê rewşa xwe eşkere ye ku hunê nikaribin di taybetmendiyê welatparêziya mezin de peyda bibin û nikaribin bibin şervanekê azadiya mezin. Tîkiliya vê bi zayendîtîyê re wisa ye. Çawa xwestin ku bi çeka zayendîtîyê me bixînin? Li hember vê şerê min ê mezin çawa pêş ket? Di derbarê jinê de civak çawa tê xistin û di vê mijarê de şerê min çawa pêş dikeve?

Tebî ji bo zîlam jî ev derbasdar in. Zîlam jî, hindêk wisa ye. Zîlam di nav nêzîkatiya, “zîlam divê wisa be, wiha xwepêşandana hêz dike; ji simbêlan bigire heta meşê wateyekê xwe yê cuda heye” de ye. Ez bi salan e dihizirim ku bi vê bûyîna zilamekî saxlem pêk nayê. Yanî zîlam jî pîr bi hêsanî naecibînim. Hun hewqas mijul dibin, pîvana zilamekî ku dikare bê pejirandin, heya niha jî min tam dernexistiye rastê. Bîrekî mezin kirêt dibînim. Ma ez xwe zahf diecibînim? Nexêr! Lê ku ez, xwe zêde nêcibînim jî, ji bo vê dixebitim. Dibe ku hinek ji we bêqîsur bibînin. Lê ez her roj bi xwe re şer dikim. Ez, xwe wisa bi hêsanî napejirînim. Lê ji hemû kirêtiyan xwe re erêyê hun didin. Hun dibêjin, “zilamekî weke min yê yeman ma tê rexnekirin, zilamekî weke min çima nayê têgihîştin?”

Wê tu bi çi yê xwe bêtî ecibandin, bi çi yê xwe xweşik î û bi çi yê xwe pesnê xwe bidî? Gelo li pêşberî van rasteqînan, tuyê bikaribî ji xwe re bibêji, “Ez zîlam im!” Ne di wateya zayendîtîyê de jî, di wateya şanazê de, di wateya hesta zîlamtiyê de çiqas zîlam î? Belkî jî, ji jinekê bêtir bûyî jin. Ma zîlamî hebana, em di vê rewşê de diman? Tebî ev bi salan e ez, vê pîrsê ji xwe dipîrsim. Di nava me de hewqas dîlawêrtî tê çêkirin, lê heman zîlam li hemberî nîrxên herî bingeîn ji jinekê xirabtir e. Dîlawêrtiya vê çend pere dike?

Hun dibînin ku, wisa hêsanî nêzîkbûna pîrsgirêkan çênabin. Ger ku min, wek we zayendiyê şirovekiribama û dabama meşandin, ez zû de qediyabûm. Lê ez, şervanê xweşiktiyê mezin im. Di felatkirina jinê de jî, xwedî hewldanên mezin im. Di oxira afirandina xweşiktiyê de hewldanên min ên pîr mezin hene. Ew nakoyîyan ku hun dijîn, ez çirkekê jî layîqê xwe nabînim. Bi ya min, aliyên şoreşgertî yên wisa jî hene.

Gelo hunê karibin baş bîr binin ku, şoreşa me şoreşeke xweşiktiyê ye, li hember kirêtiyê şoreşa şerekî ye? Gelo hunê têbigihîjin ku, destgirtina zayendîtîyê

jî, nirxekî xwe yê şoreşî yê mezin heye? Di bingeh de, li ciyekî ez, nakokiya zayendîtîyê derdixim rastê. Ew hevalên ku di vê mijarê de bêçareserî mane handanê çareseriyê dikim. Hewqas keçên ciwan û hewqas xort di nava refan de ne. Bi gora çemkên xwe yên kevin hema dikarin hev bêxin bin bandorê, bidin xapandin û bi hestiyariyên erzan bi hev re; ya hema soz didin, ya jî bizewicin. Pejneriya di vê mijarê de, ji bo her kesî derbasdar e. Lê belê baş bala xwe bidinê, ez xwe wisa nadim xapandin; hatime 45 saliya xwe, piraniya we hê 20 salî ne.

Em vê zagonê diseşînin. Temam, hun dikarin werin ba hev, lê çawa ku hun hizir dikin, wek wan têkiliyên di navbeyna zayendan de ku we di berê de ava dikir, wê nebe. Baş e wê çawa bê avakirin? Gelek ji we dibêjin, “Ciwaniya me ji dest diçe!” Dîsa hişmendên ku dibêjin, “Ev zarok hema bizewicin, bigihîjin mirada xwe ma nabe?” di nava me de hindik nîn in. “Evînên mezin bijîn, ma nabe?” Ez dibêjim, mijara ka dibe yan nabe gotûbêj bikin. Heta mijara têkiliya zayendîtî ka çawa tê pêşxistin jî, gotûbêj bikin. Ger ku hun, li rasteqîna şerê me xiyanet nekin, ango ku wê ji şer re tevkariyekê çêbike, we biçimê rast peyda kiribe, ez ji we re bibêjim: Bravo! Şertê min heye; bila me ji şer dûr nexîne. Evînê gotûbêj bikin; mezin evîndar bibin, bes ku me ji şer dûr nexîne ango dijmin neynin wî halî ku karibe li ser serê me serkeftinê ragihîne. Hingê ez, evîn û têkiliya te biçepikînim.

Helperestên me ango yên ku pir xeternak nêzîkê pirsgirêkê dibin çi dikin? “Lê dîsa jî divê evîn hebe!” Min dîroka kûr a evînê danî rastê. Hinekan got, “jin belaya serê me ye, em pêşgirên demborî bigirin ango bi hinek pêşgiriyan ve tim û tim biborînin” Ev tev bi pirsgirêkên giran ve derketine rastê. Bi gora xwe, pergala wan a evînê ava bûye, em ji wan re tevahî partiyê vekin! Lê yek tenê ji vana bes e ji bo qedandina partiyê. Di bingeh de bêkontrol û bêviyan e. Ku ez, jor heya jêr têkilî avakirinê serbest berdim, wê ji çadira qereçiyên xirabtir bikin ango roja duyemîn wê radestê dijmin bibin. Viyana wan a şerkirinê namîne. Zayendîtî û evîneke di wateya ku ev têdigihîjin de pir xeternak ye. Bi rastî tenê ji bo têrkirina zikê wan jî, pêwîst e ku çend yekîne bînin xebitandin. Ji bo ewlekariya wan bê pêkanîn, ev pêwîst e. Ji bo evînê ewlekarî pêwîst e. Ji bo evînê pere pêwîst e, nizanîm çi pêwîst e. Ji bo van tevan jî divê çend yekîneyên gerîla bikevin dewrê.

Niha di vê mijarê de, gelek rewşên ku rêveber ketinê hene. Ger ku hindek hêza me ya kontrolkirinê nebe, wê hinek biryargehan bînin vî halî. Jixwe hindek anîne jî. Divê em, vê pir gotûbêj bikin. Me got bila di rêveberiyê de hindek jin jî hebin. Lê rêveberiya jin-zilam, şûna ku hindek pêş bixin, têkiliya jin-zilam ber bi qedandinê ve dibin. Rêveberî tê rewşa ku nikare kar bike. Me lêkolîn kir, yekî ku bi jinekê re, bi xortekî re bi mehan gotûbêj dike (ev di radeya yekemîn de berpirsiyarê perwerdeyê ye) sê mehan neçûye bi endamên perwerdê re hevdiîn çênekiriyê, qet neaxiviye jî. Qasî ku xwe bi mehan bidin tiştêkî wisa, yên hewqas ketî hene. Piştî me nihêrî ku, ev belavî ye.

## Li ba me evîn yekîtiyeke mezin a siyasî ye

---

Niha, ev tev weke pirsgirêkan didomin. Bi ya min divê dîsa jî jin di nav de hebe. Hema bi renekî girêdana erzan, şûna jinê danîna aliyekî, rasteqîna wê derxistina rastê, nakokiya navbera zayendan çareserkirin, dîsa di şûna têrbûniya erzan û têrbûniya nas û dostan, peydakirina ya rast û hêzdar pêwîst e. Em, hêza zayendîtîyê û hêza jinê derxin rastê. Ji ber ku ji zayendîtîyê re azadî tê xwestin. Di vê mijarê de em nikarin bibin çewisandiner. Her ku rêgez wisa ye, ka em binêrin çiqas azad dibin. Çawa ku min got, felsefa me ya jiyana nû li ser bingehê têkiliyên wekhev û azad e.

Evîneke ku roja pêşîn li wargeha me ango di yekeya şer de li ser serê têkiliyê dike bela, ezê çawa karibim erê bikim? Vê hestê û têkiliyê ezê çawa karibim asayî bibînim? Îcar ku dijmin hê di serî de bi sîxurtiyê ketina dewrê esas girtibe, li hember vê helwesta me pir zelal e.

Di vê rewşê de, kê xwe di pratîkê de diselimîne ango jî vê jî wêdetir wê çawa xizmeta pratîka şer bike? Temam bêyî jin şoreş nabe ango bêyî jin zilam jî nabe, lê têkiliyên jin-zilam a ku ji rizgariyê re xizmet dike çawa dibe? Herî hindik em vê gotûbêj bikin. Em lez nekin ango rewşê nas bikin. Divê em bizanibin, ka bi hev re hezkirinê, evînê, xwarin-vexwarinê, axaftinê çawa par ve bikin. Ku tu bibêjî, “Emê bi zayendîtîyeke bêteşe nasdar bibin” yên ku mirov in nikarin vê wisa bigirin dest. Em dixwazin civakeke mirovane bidin avakirin. Hem jî ya herî azadîxwaz.

Ger ku te, hê xwe nas nekiribe, ku tu bibî dîlê ajoyên xwe, di navbera demeke kurt de em dev ji avakirina sosyalîzmê berdin, gelo civakekî piştî civaka qılan a hoveber emê karibin ava bikin? Tu nikarî bibêjî, “Ez nikarim vana biramim!” Tu şoreşger î, wê tu vana biramî. Emê civakeke nû ava bikin, hem jî di bingehê azadiyê de. Ger ku tu bibêjî, “hestên min têkbinê lê dixê, ajoyên min serî radikin, vacê gohdar nakim!” peşk li şoreşê ket. Ger ku tu bibêjî, “Ez evîndareke çavreş im!” evîna te şewitand, qedand, ji dijmin re kire êm. Ger ku tu bibêjî, “Mejiyê min tevlihev e, ez nikarim bihedirînim!” tu ne ji bo çêkirina şoreşê, ji bo bûyîna belaya ser hatî. Helwest, objektîf wisa ne. Ya li paş mayî, evîn bûyereke zor e. Evîn, bûyereke pir zirav e, azweriyeke mezin e. Evîn huner e, evîn rêkxistin e. Evîn perwerde ye. Evîn têkilî ye. Hêza têkiliyê ye, viyan e, zelaltî ye. Bigere ku tu di nava me de vana peyda bikî. Bi findê lê bigirê ku, tu peyda bikî. Ew evîna ku dibêje, “Ez bi vana ténagihîjim, ez vê evînê nizanim, evîna ku ez lê digirim wisa ye, wiha ye!” ka me anî çî halî, me dît.

Min di beriyê de gotibû, ka çima bûyera Mem û Zîn hewqas zor pêş ketiye. Di wê derê de ezmûneyeke evînê heye. Hinek zorê li pîvanên feodal dike. Di bingeh de ev, bêriya şoreşa netewî-demokratîk e. Dibe ku di mîrên Cizîrê de bûyereke wisa qet derbas nebûye. Lê Ehmedê Xanê yekîtî dixwaze. Tunebûna yekîtiyê di navbera feodal-mîrzadeyan de, va ji hikumdarên Ecem, Erebb nizamî Bîzansiyan re derfeta layan û dagirkirinê dide. Di salên 1600an de rewşa Kurdan a dewletbûnê û avakirina destpêkeke netewbûnê heye. Feodal-mîrzade û mîr, li pêşiya vê bi îhtîmaleke mezin asteng in. Çareseriyê vê dixwaze di wêjeya Mem û Zîn de nîşan bide. Nexwe kurekî mîr û keçeke mîr bi rehetî dikarin hev û di peyda bikin û bizewicin. Ev zor nîn e. Jixwe di wan sedsalan de bi tevahî zewacên navbera mîran wisan in. Hemû zewacên tebeqeyên jor, zewaca kurên mîr û keçên mîran in û zorî jî nîn e. Di bingehê hev û din xurtkirinê de hê jî çêdikin. Li vê derê rewşeke derepîvan; li ser mîran, bi gor vê qonaxê ku yekîtiyê jor an jî bûyîna dewletekî re (em dikarin bibêjin bûyîna keyatiyek jî) nebûna xwesteka zordayîne ye. Va li pêşiya vê pêşketinê ew mîr asteng in. Ev, tê xwestin ku bi destana Mem û Zîn bê şênberkirin.

Evîneke zor e. Çima evîneke zor e? Yekîtî pir zor e, dewletbûn pir zor e. Ji bo pêkanîna vê, pêwîst e ev evîn wê mîrîtiyê birûxîne û çepera feodal biçirîne. Ger ku pirtûk bê xwendin wê bê dîtin ku, daxwaziya yekîtiyekê heye. Divê gelek rêpîvanên kevin bîn hilweşandin. Gelek fitne û fesad hene; ji bo rakirina ji rastê hindek azadî pêwîst e. Bûyîna van, tê wateya pêkanîna şoreşa netewî-demokratîk. Ji ber ku şoreşa netewî-demokratîk peyda nîn e, di Mem û Zîn de pevretiyêke serkeftî nayê pêkînanandin. Yanî di ciyekî de tê wateya nepêkînanîna yekîtiya bi serkeftî ango nebiyêkbûyîna Kurdan.

Ê me jî, peywîrê pêkanîna bûyereke siyasî ya mezin heye. Yekîtiya siyasî bûyereke mezin e û em dikarin ji vê re bibêjin evîna mezin. Da ku tevahî evînen piçûk karibin wateyekî biderbirînin, pêwîst e ev yekîtî pêk were. Xwe têxin şûna Mem û Zîn; ji bo ku hun evîna xwe pêk bînin, pêwîstiya yekîtiyêke siyasî û li hember KTyê pêdiviya rizgarkirina qadeke piçûk heye. Ji metirsiyê dûr bimînin. Di halê berevajî de rewşên mîna lêgerînên zayendiyê xiyaret e. Ji ber ku dikeve bêviyanîyê. Da ku bikeve bêviyanîyê, nikare yekeyê bi rê ve bibe. Ji ber ku nikare yekeyê bi rê ve bibe, derbe dixwe. Dema ku derbe xwar, ev dibe tewanê xiyaretê. Ez hizir dikim ku, yên vê jî disepînin jî hene. Hinek ji wan çawa ku heq kiribûn hatine cezakirin. Viyana wî şikestiyê û hedar nekiriye. Tebî nikare hedar bike. Ji ber wê yekê evîn pir zor e. Bi gor hinekan, ger ku hatin ba hev hema karê wê biqedîn; ku rû bi rû ango çav bi çav mayî, tu dikarî çawa ku tu dixwazî evîna xwe bijî. Ma li pêşberê evîne tu dikarî xwe bidî xapandin? Li pêşberê rasteqîna dijmin tu dikarî xwe bidî xapandin? Dema ku te da xapandin, tu dikarî ji wê re bibêjî evîn? Ev xaflet e. Tebî ez vana dahênan nakim. Di bin serdestiya dijmin de evîn wisa ye. Mînak, li Botanê keçek hebû. Ketibû çend çalakiyên bi serkeftî; pir xurt

bû, min digot çi çalakmendeka xweşik e. Xortek hebû, ew jî ji Botanê bû, navê wî Bozan bû, çi bû, nemerd bû. Di qonaxeke zor de fersend dîtine û reviyane. Ew ketin zindana Amedê. Keçe weke jineke kexaneyê bi kar tînin, nemerdê dî jî weke îtîrafkarekî hê jî tê bikaranîn. Va, keçeke ku dikare pir xweşik pêş bikeve, lê rewşa ku ketiyê. Qaşo ew jî milîtanek bû.

Ev tev encamên pir balkêş anîn û hinek ji wan hatine cezakirin. Qurbanên evîna erzan! Hinek ji wan çûn, bûn îtîrafkar, hinekan jî bi canên xwe dan. Min, ji demeke dirêj ve bi asta evîneke pir tirsnak dest bi kar kir. Evîna min a xwedê jî hebû, min ji we re vegot. Lêgerîna min a xwedê tirsnak bû. Va, evîna min a zanistiyê û evîna min a felsefê heye. Bêyî van tevan evîn nabe. Piştî van, azweriya min a siyasî heye. Dêna xwe baş bidinê, ez ne kariyerîstekî siyasî me. Min xwe bi siyasetê jî nekiriye xirexavî, lê li rastê ye ku ez şerekî siyasî yê mezin didim. Yekîtiya siyasî ya mezin, şerekî siyasî yê mezin pêwîst dike. Di wî aliyê de, bi peywireke polîtîk ê mezintirîn ve ezê xwe girêdayî hîs bikim û çêbikim.

## Azadî bi şer tê afirandin

---

Ji şer re nêzîkatiyên tirsnak hene. Me li vê derê şer bi binyad kir. Ji ber ku her tişt bi wî re dikare çareser bibe. Şer wekî xweda ye. Tu çi qas xwedê dihebînî, wê tu hewqas jî şer bihebînî, heta wê tu bibî weke xwedayekî şer, xwedavendeke şer. Niha xwedayên me yê herî mezin xwedê û xwedavendên şer in. Kî ne ew? Kesayet û serokatiyên ku şer bi serkeftinê didin girtin. Bûyîna xwedayên şer tê çi wateyê? Heke ku hun van tevan neramin, hunê çawa jiyane rizgar bikin? Li ser serê we firokên dijmin her roj guleyan dibarînin. Ger ku dilêriya we ya şerê mezin nebe, hunê çawa evîna xwe rizgar bikin? Li dîrokê binêrin, keybanûyên xafil, keyên xafil çawa çûne? Ê we, em dev jê berdin bûyîna keybanû û key, hêza we ya bûyîna leşkerekî ketûber jî nîn e.

Niha, ji ber ku min vana got, ma hunê xwe bidin kuştin? Ma hunê bibêjin, “wey bi şanaza min leyist!” Rasteqîna dijwar wisa ye. Da ku hun bibin xwedavend, pêwîst e hun pir şerên mezin bidin. Da ku hun nebin xwedavendên feodal-dekbaz, pêwîst e hun têkoşîn vedin. Va, jina ku li pêşberî min bû, hindek jî wisa bû. Te digot qey ez key im ango ez diçim bibim key, keybanûyek kême. Kesa ku keyan diafirîne! Jixwe kar wisa nedihate destgirtin. Heta li Firansa (ez bawer im nirxandineke wisa jî çêbibû) çîrokek hebûye; keyek heye, yek jî kesa ku keyan diafirîne... Min carek nihêrî ku li pişt min qaşo di rolê kesa ku min diafirîne de ye! Ev kes, em berdin afirandina keyekî, destê xwe ji ava germ nedida ava sar. Em, min têxin şûna gundiyekekî. Mînak, gundiyekekî pir dixebite û mezintirîn ked xerc dike. Qaşo ew, axayeke destê min ji piştê di nav destê xwe de digire, ji vê jî

xirabtır pêgirtiyeye jinekî. Ji hemû zilamên me re di vê bingehê de nêzik dibe. Hunerwera wê çi ye? Şareza ye, xasûk e, jin e! Tebî ev, di nava civakê de nêzîkatiyeye pir bandordar e. Mêtîngeran gelek kesan wisa bi rê ve birine. Axayan, gundiyan wisa bi rê ve birine. Dekbazên jin, zilaman wisa bi rê ve birine. Van hemû huneran dike yek û wê min jî bin bixe. Ka ez çi me piştire me nîşan da.

Wê çawa min bi rê ve bibin? KT wê çawa min bi rê ve bibe? Dewlet hê jî hewl dide ku min têxe bin kontrola xwe. Ka em binêrin kî kê dixê bin kontrolê.

Hun dibînin ku çîroka jiyana xwe ya pir bi çiqil û şaxik, lê pir girîng tînim ziman. Her ku hun azadî û xweşikî dixwazin, di xwezaya kar de rastînen wisa peyda ne. Hin kes dikevin nava şayîşan, hin kes jî dixitimin. Keç û xortên me, her roj xwe datînin rastê. Ev, dilan disojîne. Baş e ku me hindêk rêk û rêbaz daye diyarkirin. Em we zêde nadin girandin. Nexwe rewşa we qasî girînê di rebentiyê de ye.

Ma xwedayên şer qet wisa dibin? Ma fermanarên mezin qet wisa dibin? Ma milîtan qet wisa dibin? Ez bi xwe jî bi vê rewşa xwe hê jî ji xwe dipirsim û dibêjim, “Ma gelo min rewşê rizgar kir yan na?” Mînak keç hene û ji xwe dipirsim, “Ma ez hevaltiya wan bi layiqî pêk tînim yan pêk nayînim?” Ez xwe tim û tim eyar dikim û diramim, “ji pêwendîya jinekê bigirin heya pêwendîya xweşikiyê, şer, rabirdû û rojane bi her tiştî re wê çawa be?” Di rewşa berevajî de ezê xwe wenda bikim. Ger ku wenda bikim, kêmahiyeye piçûcîk bikim, pêmeniya viyanê raber bikim, wê ev, ji gel û rêxistinê re bibe mal û xisar di wir de derkeve rastê. Yanî bikişînim derdek e, nekişînim derdek e; weke axayekî tirûş bikim derdek e, weke yekî giyan kole tirûş bikim derdek e. Ev, pîrgirêkên mezin in. Bihizirin, ez jî di rewşa yekî bandordar de me, xwe pir azad bi rê ve dibim û yekî xwedî helwesteke bixwebawer im.

Her roj ji serleşkerên me nûçe û rapor li ser raporên tînan; “Keçan weke xizmetkaran bi kar tîne, ketiyê bin fermana yekê, radestê ajoyên xwe bûye, tîkiliya çilvirînê pêş dixê.” Wisa ye yan ne wisa ye, ew gelseke cuda ye, llê eşkere ye ku serî li ber kevin tewandine. Niha hun hindêk bihizirin. Rewşa min hindêk cewaz e. Bi ya min, ger ku tu bi jinê re pêwendîdar bixwazî wilfekê pêş bixî, divê pêwendîya xwe bi azadiyê hebe. Te ji şerê van kesayetîyan re çi daye û çi dixwazî ji wan? Te jineka kole weke malekî girtiyê ba xwe, ma ji mirov re nabêjin, “qey tu şerm nakî?” Heke ku tu keçikeyê partiyê rast û durust rêxistin nekî, bi zanebûn nekî û wê ji xwe re bikî mal, ma tu ji vê şerm nakî? Pêwîst e ji rêveberên me re pîrsê wiha bipirsim. Ger ku tu wê li ba xwe weke koleyekê bigirî, tu şerm nakî; ji ber ku me wê weke şervana azadiyê kişande ba xwe, sehaya xwe. niha ev ji bo keçê jî û ji bo jinê jî derbasdar e. Da ku bibe şervana azadiyê hate ba me. Lê heke ku bi makbûna xwe bixwaze me bixîne, ji bo tîxistinê bin bandorê ku were, ew jî rewşeke kirêt e. Di wateya mitlaq de da ku ji bo xwe derfeteke azadiyê biafirîne û ji partiyê hêz bigire hatiye. Wê demê, wê ji bo vê xwe

perwerde bike, rêkxistin bike û mitlaqa bibe şervana azadiyê ya baş ku, jê were hezkirin û rûyê wê bigire.

Ma ev ne ew babetên ku me soz dabûn in? Rast û durust tu marîfeta xwe tune, ka çawa nêzîkê şer û rêkxistiniyê dibe diyar nîn e, belayek e. Heke ku bixwaze her qas bi zayendîtî û jinantiya xwe bixe bin bandorê, ev tewan e. Heke ku zayendîtî û jinantiya xwe wisa bi kar bîne, evê bibe sîxurtiyeke pir xeternak. Zilam bêtir xeternak e. Ew ji dikare her qas vê bandorê bije û dibêje, “min hedar nekir, min jinê wisa bi kar anî.” Hemû zilamên ku jinê wisa bi kar tînin jî ketine. Di encamê vê de yekîne, tîm bi tîm yeke ber bi îmhayê ve hatine terkeserkirin. Yanî heke ku di oxira nêzîkatiya jinekê de hewqas wendayî tînin jiyandin, ev tê wateya dîroka me bi rengê herî paşverû cardin dana harkirinê.

Di berê de ji bo jinekê zilamek dihate kuştin, te tîmekî kuştîye. 50-100 mînakên vê hene. Hê jî hinek kes vê bi dizî dijîn, gelek rewşên ku derneketiye derve hene. Ez tenê bi şertekî dikarim bipejirînim ku jin û zilam li ba hev bimînin; di wateya mitlaq de di zanebûn û têkiliyê de teqandina siyasî. Yanî heke ku di rêkxistin û çalakiyê de pêşketin hebe û ev jî ku rojane xwe biselîmîne, hingê mirov dikare ji vê re razî bibe. Jin dikare were û bi her cure peywiran re bibi daxwazkar û bêyî cudatî xistina nav her du zayendan, dikare bi her cure peywiran bigire û jixwe wekhevî jî wisa pêk tê. Bila di her peywirdayîne de cî bigire, lê pîvanên vê hene. Wê bi gora pîvanên artêşê û pîvanên partiyê tevbigere. Piştî ku bi gor var pîvanan tevgeriya, wê vac û wêrek û behremendiya rêveberiya vê pêşan bike. Bila di vê rewşê de bibe serleşker jî, çima nebe? Çima tim zilam rêveberiyê bike û jin jî bîn birêvebirin? Ya berevajî ew helwesta kevin a ku ji qonaxa kedxwariyê ango çewisînê maye. Di nava me de bila ne nivî nivî, lê belê li ser bingehê hêz û behremendiya xwe bila rêveberên jin jî hebin. Ger ku em bibêjin qet tune, wê demê ev kole û bi taybetî jî zayendekê xwezayî yên ku weke azad nabin hatine afirandin! Heke ku ne wisa be, hingê emê wekhevîyê bidin ber çavan.

Ev babet hemû di bingeh de ji gotûbêjkirineke berfireh wêdetir, ji ber ku we negihandiye sepandinê, bi me nîşan dide ku ka hun çiqas bi kêmayî nêzîkê peywirên xwe bûne. Yek jî aliyê vê yê rûmetê jî heye. Wê tu di peywiran de bêserkeftin bî, perwerde, rêkxistin û şer zêde pêş nexî, di ser de jî tenezûl bikî! Ev nabe. Yê ku nerehet e dikare runê. Bi rastî jî gotinên mîna, “wey hestên min hene, wey ez dixwazim bigihîjim evîna xwe, wey ez dixwazim bigihîjim dê û bavê xwe, zarokên xwe û jina xwe” gotinên bêrûmet in. Ew kesayetiyên ku rabûne şoreşê, dizanin ku gotinên wiha zêde derbasdarî naderbirînin. Naverok û wateya van nîn e. Her tişt bi şûj tê jêkirin. Em bibêjin ku zilam dixwaze te îmha bike, ka li ku derê ma evîna û hestên te! Di destpêkê de kar, vê çalakiya mezin encam kirin e.

We dikaribû vana bi rihetî bihizirîya û di ciyê cî de dabana runiştandin. Yanî rûmeta mirov van helwestan ranake. Heke ku jin ango zilamê li ba min bi

peywirên xwe ve negirêdayî be, çaçeçar peywirên xwe neynin cî, wê çima eleqedariya min jê re hebe! Baş e bi rastî jî hingê rûmet û şanaza we naşikê? Heta dema ku te fersend dît û tu bibêjî, “ em têkiliyê kûrtir bikin” wê demê tu nemerd î û wê tu bibî xayîn! Hinek rêgezên ku li ser xwe didim sepandin hene. Ger ku kar rojekê di riya xwe de neçin, bi misogerî dev ji xapandina derdorê berdin, ezê pêşî bi xwe re mijul bibim. Da ku ez biçim ba dostekî ango hevalekî, divê pêşî ez xwe çareser bikim. Ezê pêşî serkeftinê hindex biafirînim ku ruyê min bigire.

Ev ezmûneyek e û hunê xwe wisa biezmunînin. Mijara jinê jî wisa ye. Xwe di peywiran de biezmunîne, ka tu çiqas şervanekî yeman î biselimîne, piştî dikare d bingehê rêzdariyê de axaftinên te yên bi jinê re çêbibin. Jin jî piştî ku xwe hindex selimand, hingê dikare bibe xwediyê helwesteke xwedî rêzdar. Ev mijara rûmetê ye; çemka me ya kesayetiyê û namûsê ye.

Ger ku ev nebin, nikare rû li rû binêre, li çiyekî mayîn çêbibe. Îcar bi serî rakirina ajoyan, nizanîm bi harkirina qelsiyên, nizanîm bi çespendina azmerî u nizanîm çî yan têkilî nikarin bîn avakirin. Dîsa jî ji bo we ya rast di vir de ye. Bi misogerî divê jin jî li ba me be, bi misogerî evîn jî hebe, bi misogerî hezkirin jî hebe. Lê zagon, rêpîvan û zemîn jî wisa ye. Pêwîst e hun vê fêm bikin û bisepînin. Îcar şoreşger bi vebirî jî vê berpirsiyar in. Dikare bê gotin, “ew Kurdê ku tu dibêjî wê zor derkeve rastê ango şoreşgerên wisa di nava me de zor tê peydakirin” lê yê din jî diyar e û ka çend pere dike li rastê ye. Miriye, qediyaye û tiştê ji destên wî nayê.

## **Zilam, divê bibe rêhevalê azadiya jinê**

---

Ez hizir dikim, hûn niha baştir têdigihîjîn: Ka çima bi hêsanî têkilî, çima bi hêsanî zayendîtî û çima bi hêsanî evîn çênabin. Hun, niha bi vê baş têdigihîjin û me derxist rastê ku ev hêsan nîn in. Bêyî têtetina xeteriya jiyana xayîn a herî mezin çêbe, me dikarî rastînan hindex wisan bir û derfetên şerê wê bi dest bigirin. Niha qenciya herî mezin a ku em ji hev re bikin, afirandina derfetên şerkirinê ye. Ji bo keçekê dana şerkirinê heya dawiyê pê re serî bikişînin. Bangawaziyê di bingehê şer û rêxistinêke baş de bikin. Berevajî di bingehê felişandina rêxistin û şer de têkilî nabin. Lê mixabin, heya niha tev di bingehê felişandinê de pêk hatin. Ez bi xwe jî bi vê rewşa xwe (hûn dibînin ka ez çiqas hosta û viyana têkiliyên mezin in) gelo ka wê çawa be, kûr kûr diramim.

Mîn di berê de vegot; “ka çawa ev têkilî wisa bûn?” Hûn têkiliyê nas nakin, tînegihîjin; yek tiştê ku hun bikin xwe kûr kirin, ponijandin û ger ku gengaz be xwedavendkirin e. Bi awayekî din ji bin derketina karê Kurd nabe. Ger hebe

behremendiya we, hêza evînûbûyînê, hêza xwedavendbûyînê, hêza milîtanbûyînê, wê demê hûn dikarin ser bixînin.

Baş e we Serokatîyê çawa nas kir? Dostekî jirêzê jî dema ku me hindêk rast nas dike, we çima hewqas paşmayî û teng nas kiriyê? Qaşo hun rêhevalên me yên milîtan in. Ma rêhevalên milîtan ji hev re wisa nêzîk dibin? Ez diçim ba mirovên jirêzê, tev peroşmend dibin, evînê dibin. Ez jî hewl didim ku bi vê têkiliyê tê bigihîjim. Hûnê vana derbas bikin, ji rastînan re hêza veguherîna mezin nîşan bidin. Di bingeh de ez pêwîstiya bêtir kûrkirina çarçoveyê radibihîsim. Me xwest ku em vê xebatê ji torevanan re bihêlin, lê wisa xuya dike ku em neçar in wêjeya vê xebatê herî baş bi xwe pêk bînin.

Di bingeh de jin çavkaniyeke hêzê ye. Em piçûk nebînin; hêza wê hatiye ziwakirin, lê ger ku bê bikaranîn, namzet e ji bo çavkanîbûyîna hêzê. Lê di vê qasê de bûye wek bîreke kor, tê bigerî wê tu niqo bibî. Pêwîst e hûn bûyîna çavkaniya hêz a ronahîkar, balkêş û sotîner biezmunînin. Pêwîst e hûn bibin xala balkêş a şerê siyasî, civakî, çandî û wêjeyî yê bi ponijîn. Ger ku gengaz be xwe çêkin. Heke ku zilam di vê mijarê de xwedî îdfabin, bila hinek jinan çêkin. Tenê ji ber ku ji zayenda dî ye şûna înkarkirin û êrişkirinê, em hindêk rastîna wê derbixin rastê. Wisa hewl bidin û ji bo afirandina gelek hevalan, bibin alîkar. Ji ber ku keç di rewşên hindêk zor de ne. Yanî yê wan hem fizîkî hem zayendî hem giyanî û hem jî civakî pir zehmetiyên xwe hene. Rêhevalekî zilam ê baş, divê qelsiyên wan ne bi xirabî karanîne de, di aliyê derbaskirinê de bibe alîkar; divê zilamtiya xwe wisa nîşan bide. Ne di bingehê serdestiya zayindî ya bêteşe, divê vê weke rêhevalê wekhevî û azadiya rastîna nîşan bide. Milîtanê ku tê gotin, ew e ku xwedîbûna wê helwestê pêk tîne.

Biramin, jinekê xwest ku di ser min re welat ji dijmin re pêşkêş bike, hemû jinan ji azadiyê dûr bixe, hemû jinên me ji têkiliyeke sihêl re kole bike û têkoşîna wê ya xedar bimeşîne. Ev xeternak di radeyeke dawî de şênber e. Îro bi sedan têkiliyên wisa tînan serê kadroyên me. Ger ku ez ji xwe re dibêjim Serok, ger ku hûn dibêjin Serok, îcar ku ev di asta netew de êdî hatibe pejirandin, wê demê divê ez awarte bim. Milîtan jî wisa ne. Hûn nikarin her têkiliyê bipejirînin. Pir eşkere ye ku hûnê di sêdariya têkiliyê de her tiştê wê lêkolîn bikin. Çawa ku min got, hûnê li xurtiyê bigerin. Jixwe ez ji bo xwe jî li vê digirim; ji bo netew, partî û gel digirim. Çiqas zanebûn, çiqas hêza livandinê, çiqas wêrekî, çiqas fedekarî, çiqas hostayî û çiqas besbûniya bi her awayî hebe, hemû binyadên pêkanîna avakirina partiyê û rêxistinkirina kadro ne. Binyadên afirandina jina azad in. Her wiha ezê di vê oxirê de bitêkoşim û şer bi rê ve bibim. Rewşa berevajî, wê bibe hev xapandina me. Ger ku em partiyê bixapînin, emê gel jî bixapînin.

Hun dibêjin, “hema di derbekî de em radestê têkiliyan bûn.” Ji partiyê re jî, ji xwe re jî nêzîkatîyên wê tim wisa ne. Bertekên erzan, hestbûnên erzan, hema hev û dî pesendkirin û redkirin. We qedand azwerîyên milîtantîyê, evîna milîtantîyê û

çemka peywirê ya milîtantiyê. Xwesteka min ji we çî ye? Xebat weke ku hun dizanîn nîn e, weke hun dikin nabe. Niha helwesta ku me pêş xistiye, hindek rê digire. Heke ku ez ji wan ên bi hêsan dicibînin re, ji yên bi hêsan bertek raber dikin re, hestbûnî nîşan didin re, ji zayendîtiya hêsan re refan vekirî bihêlim, gelo emê karibin rojekê li piya bimînin? Zayendiya hêsan pêş bikeve li rastê viyan dimîne? Ma perwerdehiya viyanê dimîne? Her wiha a ku ez dixwazim hindek pêş bixim, weke yek çareya îdeal xuya dike.

## Evîna PKKê bijîn

---

Pêwîst e evîna we nû be, gelo hûn ji bo şerê mezin ê vê amade ne? Şerêkî pir zore, lê wekî din çareya me nîn e. Ez nabêjim hûn tev wisa bikin, lê evîna PKK e hindek evîneke wisa ye û şerê hatî pêşxistin hindek şerêkî wisa ye emê bînin pêş çavên xwe. Ez nabêjim bi bertekên erzan nêzîkê hev bibin. Ji van hemûyan encamê ku dertê; ne ew bertekên jin ango çespendinên zilam yên bêwate ne, ku dikarin refên rêxistinê û atêşê serûbin bikin. Di radeyeke dawî de pêdiviya we bi hev heye. Lê di radeyeke dawî de jî pirsgirêkên we yên ku bên çareserkirin hene. Di wateyeke mitlaq de em pêdiviya le bi hev heye, lê peywirên me yên perwerdeyî, rêxistinî û çalakî ku em bînin cî hene. Heya ku ev peywir neyên cî, tu nikarî destê zilamekî bigirî, zilamek nikare bi hêsanî destê te bigire. Da ku ev hemû di rêjeya asta pêşxistina şer de bin, ez di wê hizrê de me ku ev formûl rast e û di biçimê tê xwestin de ye. Yanî divê xwîngermiyeke we, eleqedariyeke we ka çiqas bi pêşxistina şer ve pêwendîdar e? Heta wê çiqas pêş dixê û çiqas qada jîyanê vedike? Di vê bingehe de hûnê xwe pê bidin pesendkirin û wî pesend bikin.

Di hemû pîvanên min de ev hene. Bira min çavên keça ku dixwaze min hez bike, hema li Kurdistanê û li şer e. Bi hezaran jin hene û bi hezaran pakrewan hene. Bi rastî jî ez vê watedar dibînim. Lê têkiliyên gelek hevalên me yên şervan diqedînin. Her kê ku ji bo bi min re têkilî avakirinê were, pêşî baweriya xwe bi armanca min û bi şerê min tîne. Ev pir eşkere ye. Lê gelek kes ji bo xistina keçan nêzîkê wan dibin; nêzîkê zilam dibe ji bo xistina wan. Tebî emê haydar bin. Em nikarin rê bidin têkiliyên xistinê. Jixwe Kurd, di vê bingehe de jin û zilamên xilasbûyî û qedandî ne. Pevretîya wan, pevretiyeke mirî û qediyaye. Emê çawa karibin wê şewazê bimeşînin? Di vê mijarê de hewldanên hatine pêşankirin, hewldanên pir zor in. Lê dahûrîneke Kurd e, dahûrîna asta netewe û afirandina azadiya jinê ye. Bi misogerî ev pirsgirêkeke hêsan nîn e. Hûn jî dibêjin em şervanên azadiyê ne, lê ez jî şerê azadiyê bi rê ve dibim. Gelo hûn ji bo xwe hêza birêvebirina şer nîşan didin? Ew derfetên şer yê ji were hatî berpêşkirin, hûn dikarin binirxînin? Bi awayekî din hûnê çawa di rastîna PKKê û Kurdistanê de rê

wergirin? Rastîn li rastê ne. Heke ku riyeye din hebe, hûn nîşanê min bidin, min bidin bawerkirin û girê bidin. Ji gotûbêja azad re vekîrî me. Mînak bila keç min girê bidin. Jixwe ji vê re vekirî me, sînordanîna herî piçûk jî nedanîme. Ez berdewamkarê qirêna xwe me. Hûn jî bi têgihîştina tevahî aliyên vê qirênê ve tevlî me bibin û piştê nebêjin “em tenegehîştin û me nebîhîst.”

Bila zilam jî bi vê têbigihîjin. Li rastê têkîlî ka çiqas xedar in bila bibînin. Nebêjin “zilamtiya me ya berê wisa ye, wiha ye.” Bila xwedê bela xwe bide zilamtiya berê. Zilamtiya berê, ji jinê xiraptir e. Wê tu çi bikî ji vê zilamtiyê, ev zilamî çend pere dike? Zilamtiya ku dikare hindêk kar bike, ew zilamî ye ku pirsgirêkan wisa dibîne û dinirxîne. Jixwe pêdiviya wê zilamtiyê jî bi dahûrînê heye. Tenê ne dahûrîna jinê, zêdetir pêdiviya dahûrîna zilam heye. Em dixwazin vê hindêk bi ser bixin. Ma ez dahûrîna pêş nexim, di nivî de bihêlim? Ma hingê di dest de tiştek dimîne?

Bi misogerî pêdiviya dahûrandinan heye. Ev di heman demê de kontrol e. Kontrol; pîvanên partiyê ne, pîvanên serokatiyê ne. Vana tev weke pîvanan datînim. Kontrol; jinê rast kişandina artêşê ye; artêşbûna wê ye; di bingeheê wekhevî û azadiyê de peywir wergirtina wê ye; serleşkerbûna wê ye. Kontrol; zilam jî, di vê mijarê de bi gor rastînen partiyê xwedî derketina peywirên partiyê; gihîştina çemka evîna rast, hest û hezkirina rast e. Piştî ku ev tev peyda bûn, ma dikare pêş nekeve? Heke ku bi zanebûn hinek kes xirab bikin û bi rêxistina şer bileyizin, wê wenda bibe û biçê. Li ser rêxistineke wisa ku mezintirîn dixebite, dereşer û dererêxistinî, li ser asta wê ya pir hatî ronahîkirin biçespînî, wê tu wenda bikî. Di vê mijarê de kontrol pêş dikeve, wê bêtir pêş bikeve. Pêwîst e ku hun têbigihîjin ku ji niha şunde wisa bi hêsanî bûyîna kadroyê PKKê nabe. Ma pêwîst nake? Hun dibînin, hunê şer bi vê qezenc bikin. Bi awayekî din hun nikarin ji miriyê xwe re ciyê veşartinê nabînin; wê cendek birizin û bîhn bidin.

## **Pirsgirêka jinê çareserkirin qezenckirina serkeftinê ye**

---

Çawa ku min got, pirsgirêk girîng û rişt e. Ji bo me çareserkirina pirsgirêka jinê, qezenckirina serkeftina rizgariya netewî û bûyîna xwedî welat e. Cîhanê vê pirsgirêkê çareser nekiriye, ev nayê weteya ku di çareseriyê de qet pêşketin nabe. Pirsgirêka jinê di tu welatî de qasî ya me giran nebûye. Ew bûne dewlet, di aliyê civakî de bûne netew û gelên pir pêşketî. Ji bo me ya pêwîst û girîng, bi gor mercên xwe yê şenber çareseriyek e. Eşkere ye ku wê di hemtaya cîhanê de bandora vê çêbibe. Me vê jî got: Em civakeke jinoyî ne, yanî ew zexta li ser jinê

hatiye meşandin jî wêdetir, em civakek in ku li serê mêtîngerî hatiye çespandin. Di vê wateyê de rizgarî, tam rizgariyeke jinê ye, tam şoreşeke jinê ye.

Şoreşa Kurdistanê, cara yekem di hemtaya navnetewî de dikare bibe şoreşeke jinê. Ger ku ji van dahûrînan re bal bê kişandin, şoreşa Kurdistanê tam azadiya jinê, şoreşa jinê ya civakî ye. Teoriya xwe jî, pratîka xwe jî heye. Yên ku di zanebûna vê de ne, wê wisa bi dest bigirin û ber bi çareseriyê ve bibin. Ger ku bê birin, wê ji rizgariya jinê ya li cihanê re jî tevkariyekê bide peydakirin. Bes ku li serê bi heterî bê sekinandin û ramandin. Heke ku em şewaza me derxistiye rastê li partiyê serdest bikin, ji bo gelê me wê çareseriyeye erjeng bibe mijara gotinê. Her kes di rewşa pir zanebûn û diyarkirina çarenûsa xwe de ye. Paşdemayîneke herî piçûcîk a zilam û ya jinê nabe, çespandin nabe, xistinerî nabe. Jin dikare têkûz derkeve rastê, zilam dikare têkûz derkeve rastê û şunewarekî îdeal ê wekhevî û azadiyê dikare derkeve rastê. Lê ev, tenê dibe armançek.

Rojane ez, ji bo çareseriyê vana çêdikim. Di nava PKKê de em dikarin vana pêş bixin, ger ku hêza me pê bigihîje, emê zêdetir jî çêbikin. Di rêjeya ku em xwe didahûrînin de, emê karibin mirovatiyê jî bidahûrînin. Şoreşeke bi serkeftin a Kurdistanê, şoreşeke baş a mirovatiyê ye. Pewîst e em encamên vê jî piçûk nebînin. Tebî divê em nebêjin, “şoreş pêk hat, pirsgirêk çareser bû!” Niha jî çareserî heye û piştî serkeftinê jî wê bidome, lê di hundirê merc û biçimên cewaz de wê bidome. Di bingeh de me pirsgirêkê çareser kiriye. Ez ji bo xwe didim diyarkirin ku, ji bo çareseriyê di şungeheke xurt de me. A ku min di xwe de çareser kiriye, ji bo mirovatiyê çareseriyek e. Em şoreşan tim wisa dibînin. Bila hebe mirovatî piştî hezar salan bigihîjê. Ew girîng jî nîn e. Jixwe derdekî me ye ku em bibêjin, emê her mirovî di demeke kurt de bibin komunîzmê jî nîn e. Têkoşîna ku komunîzmê di hundirê xwe de dihewand beriya deh hezar salan jî hebû, niha jî heye, wê piştî deh hezar salan jî hebe. Beriya deh hezar salan jî çareseriyên pir xurt hebûn, niha jî hene, wê di pêş de jî hebin. Pirsgirêk wê demê jî hebû, niha jî heye, wê piştî jî hebe. A girîng ew e ku, di nava qasê de, di pozîsyona rast de peydabûn e. Pirsgirêkê derxistina rastê û derfeta çareseriyê çespandin e. Tebî em vê di PKKê de pêk tînin, pêl bi pêl ji bo gelê xwe jî pêk tînin. A girîng jî ev e.

Şoreşa me mirovanî ye. Di mijara jinê de jî, şoreşa herî mezin e. Teoriya wê jî, pratîka wê jî baş pêş dikeve. Pêwîst e em çareseriyê hindêk wisa bibînin. Nexwe gotineke mîna, “me li Kurdistanê şoreş çêkir, gelo emê neşibin welatên dî” nêzîkatiyeke rast nîn e. Ma jixwe şoreşên din pirsgirêkê çiqas çareser kirin? Ew jî gelşeke cuda ye. Di şoreşa Fransa de, di şoreşa Îslamê de, di şoreşa Rus de ev pirsgirêk di pîvanên cewaz de pêk hatiye. Ji ber vê yekê li wan deran ev pirsgirêk tam nehate çareserkin. Divê em nebêjin hat spartekirin. Hêza çareseriyaya wan hewqas e. ev nayê piçûk dîtin jî.

Bi kurtasî, hunê di vê mijarê de kûr bibin, têbigihîjin. Hunê kesayetiya xwe bi tevahî bînin halê kesayetiya ku ji pîrsa “çawa tê jiyandin” re dibe bersîv. Ma hun bi vê nû têdigihîjin? Gelo ez bibêjim, zarokên netebitî angî zarokên 35 sal î? Hun xwe xerc û xerac davêjin nîveka rastê. Ma dikare ji vê re bê gotin şewaza serokatîyê? We çawa wêrekî ji vê re nîşan daye, ez şaş dibim. Ger ku hun her tevgerên xwe, her gavên xwe, axaftin û çalakiya xwe venegerînin çavkaniya jiyandê, hun ji xwe re, ne serok, qet nikarin bibêjin milîtan jî. Milîtanê rastînî hemû raman û çalakiya xwe ji bo bîdestxistina çiyekî, ji bo zoriyekî zivirandina hêsanîyê, bêserkeftîyê zivirandina serkeftinê, bêderfetiyekekî zivirandina derfetê, bêzanebûnekî zivirandina zanebûnê, bêrêxistîyê zivirandina rêxistîyê û bêçalakîyê zivirandina çalakîyê ye. Serleşker ev e. Hun çawa nû û nû bi vê dihesin? Hun di rêjeyê mezin de şewaza serokatîyê bi renegekî çewisandin, bi sertişkî xwe avêtin, dizîkirin, bi qirika hev û dî ketin, li ser keda hev û din bi erzanî runîştin, qiymet nedayîn û bi keda xwe tenegehîştin disepînin. Hun nabînin ku, tevahî encamên vê yê xapînok di giyanê de ji ketîbûnê re, di tevgerîn û libatê de ji têkilheviyê re rê vedike. Çi, çawa tê jiyandin, çawa tê bîdestgirtin, çawa tê temsîlîkirin? Hun, qet ji van pîrsan re bersîv nadin. Hun hizir dikin ku hun wisa dijîn. Ev jiyaneke xefletê ye. Di nava me de şewaza jiyana tewanbarekî ye.

We tewan, ceza, xeflet û xiyane dît. Hemû karên ku ez dikim ji bo ku xwe jî kesayetekî tewanbar û xafil derxistinê ye. Ev bi çî gengaz e? Bi kesayetekî ku dikare şer bike, ji raman û pratîka vê re hindek derfetan bide qezenckirin ve gengaz e. Ma heye şewaza jiyaneke din ku me bi her awayî rizgar bike ji tewan û xefletê? Tune! Emê çawa jiyaneke xafil û xayînî ji xwe re layiq bibînin? Qetiyen! Wê demê ev, tewanê xiyane û koletîyê ye û ji bo bexşandinê jî em dibêjin, bibe welatparêzê mezin, bibe azadîxwazê mezin. Ji bo wê jî, wê tu hindek weke min bixebitî. Ez çima hewqas qiymet didin hêza axaftinê? Ji bo baş rêxistîyê. Heke kû rêxistînî nebe, şer nabe û tu nikarî mirovan bi hev bigihînin. Heke ku te b hev negihand tu nikarî bidî şerkirin. Heke ku te neda şerkirin, tu nikarî li navê xwe jî xwedî derkevî. Wê demê berde bûyîna çavkaniya jiyandê, wê tu di destê hinekan de bibî haletê ku bi enzanî bi kar tê. Ma ev li hemberî jiyandê bêrêzdarîya herî mezin nîn e? Van hemûyan ne ku hema wisa dizanim û dibînim. Qas bi qas di ramanê de, di pratîkê de dinirxînim, li hev dixînim û pêş de dibim. Em bibêjin ku di nava me de şoreş bûyereke kîmyawî ye; pê re em dixwazin gelê me yê ku ketiye halê tenekeyeke pîr zengarbûyî derxînin û vegeînin lajwerdekî ku weke zêr diçirise. Şoreş di wateyekê de jî ev e. Ji bo kesan jî ev wisa ye. Ji kesayeteke ku pîr qirêjî û zengî girtiye, gihandina kesayeteke ku diçirise wisa tê pêkanîn. Va çalakî, hesinê ku dixebite ye. Em xwe mînanî ku di bin mehdê û sindanê de didin kutandin, dikin pola, diçirîsin, didin şerkirin û digihînin armancên xwe.

## Hunê xwe bigihînin têkilî û şerê jiyana rast

---

We yê van hemûyan, dema ku we gavên pêşî avêt, bizanibûyana. Diyar e ku hun pir şaş nêzîkê şoreşê bûne. Hun bi hezarûyek xeletiyên ve hatine nava partiyê. Dema ku min bi du peyvan dest pê kir nêzîkatiya min çî bû, niha jî ew e. Di azîne de pêk neanîn nîn e, encaman pêş nedîtin nîn e. Qas bi qas di ferqa her tiştî de me. Fersendan erjeng dinirxînim. Min encam girt û heya vê derê hatim.

Her milîtanê me vê bingeh girtiba, kariba wisa jiyaba, di vî welatî de dijmin-mijmin nedima. Çiqas şewazên jiyana kevin hebin, li me tê çespendin û weke keda me vala derxistin di roleke neyênî de tê leyistandin. Ji hewîşa ku nabe re, hunê çima bibêjin amîn? Hunê werin jiyana rast. Hunê rast nêzîkê têkilî û şerê jiyana rast û bi her awayî bingehên wê yên teorî û pratîkî bibin. Hunê bêviyan û îdîa negirin dest. Hunê bêked û bêçarê pêşwazî nekin. Hunê bêdên û bal û hisnegir seyr nekin. Hunê qiymeta herî mezin bidin mirov. Wê eleqe, têkilî û viyana we di radeya herî bilind de bin. Hewldanên we pir bi ponijîn bin û ji ramanê qut nebin. Wê azwerî û çoşa we ya jiyane di radeya evîne de bin. Şewaza we ya lêxistinê di radeya dawî de tûj û di dema xwe de be. Dîsa wê hêza we ya parastinê ya ku karibe lêxistina herî girîng asteng bike hebe. Bî gora wî pêşgiriyan wê yên mezintirîn û dên û bala we hebe.

Ger ku hun wisa bijîn ev, jiyaneke dikare bê pejirandin e. Ger ku hun jiyaneke wisa pêk bînin, hun di şer de jî bin, hun di nava zoriyan herî mezin de jî bin, çawa ku li me tê dîtin hêza hedar û tebateke herî mezin, û heta hêza bi çoşî bergîdanê hunê nîşan bidin. Hun dibînin ku li rexmî hewqas zorî û hewqas çespendinan, bi rastî jî, ez dikarim mîna “keyan” bijîm. Dema ku ez dibêjim “key” wê jiyana herî pîroz, herî zadegan û herî azad ku min pêk aniye qesd dikim. Pêşbîniyan min û rojane bi hemû hêza xwe giraniya ku didim serê, di wê wateyê de qasî ku min ji dijminê min diparêze, dikare bike xwediyê jiyaneke ku bi gelê min bigihîne û gelê min bibe serkeftinê.

Madem ku ez di nava pêvajoyên xedar ango ji tunebûne hatime virê, hun bi hewqas derfetên jiyane ve ku nikaribin xwe bidin jiyandin, ev ji bo we dibe bêtaloxî û paşdemayîneke rastînî ye. Bi ya min derfetên jiyandina we ya azad hene. Ê dimîne, tebî bi çeka rêxistinê, bi her awayî taktîkên wê ve şerkirin û jiyandinê qezenckirina we ye. Ev di qasa pêşî de jî wisa ye û di henaseya dawî de jî wisa ye. Hunê bizanibin ku derveyê vê tu derfetên jiyane nîn in. Bi rastî jî ne tenê zanîn, hunê bibêjin “jiyan ev e” û ji bîlî vê tiştêkî din re zemîn pêşkes nekin. Hunê bêwateyîyeke herî piçûk û nedîcîdeyîyeke herî piçûk jî qasî nabexşîne tûj bin.

Hunê di zanebûn û berpirsiyariya jiyânê de bin. Ez heya niha hindek wisa jiyam. Hunê hem bi rastîna serokatiyê ve pêwendiyên xwe wisa deynin, hem jî bi şêwaza jiyana wî re hewqas bikevin nava nakokiyên ango bi hezaran kîlometre jê dûr bimînin! Hun ji xwe re pir eyb û mixabin dikin. Serokên rastînê xwe dana jiyandinê dizanin. Lê belê yên ku ji van serokan ango ji van hevalan bi kîlometreyan dûr dimînin jiyandinê wenda dikin. Ji ber vê yekê em mesafeyê bigirin. Li we jî, şêwaza ku karibe we bike xwedî rol, ka çi hebe ku we bîne halê milîtanên xurt, em layiq bibînin. Hêviya we bila hebe, lê hewldanên we jî qasî ku karibe wê pêk bîne bi zanebûn, bi rêxistinî û qas bi qas xemilandî be. Em, her dem wisa bûn. A ku dide qezenckirin ev helwest e. Ez bawer dikim ku, yek kesek şêwaza min bisepîne, bigihîne heza sepandineke jirêzê, wê di rastîna PKKê de serkeftinê bigire. Piştî hewqas pêşketinan, yên ku xwe bi xwe vala derdixin, tenê dikarin qala neserkeftinê bikin. Di bingehê durustiyê jirêzê de, yên ku bi rastînan vî şerî li ser vî karî ne, heke xwe bi xwe nexînin, xwe bi xwe asteng nekin, nayên xistin û ji serkeftinê nayên wergirtin. Jiyana me hindek vê selimandîye. Hun dikarin zêdetir biselimînin û bi ser bixînin.

**Çile 1994**

“A ku zorê dide şoreşê, asta qeyrana civakî ye”

# DIVÊ EM JÎ BO JIYANDÎNÊ ŞER BIKIN Û DÎ ŞER DE JIYANÊ DERXÎN RASTÊ

Ger ku têgihîştina rasteqîna me ya civakî hindek bi puxteyî bê xwestin, wê bê dîtî ku, di bingeh de pir xitimiyê, ji vê jî wêdetir hilveçiriyaye û ji bûyîna xwe derketiye. Ev, hem asteke pir paşketî û hem jî asta xwe daye herzkirin diderbirîne. Ew rewşa wergirtina nav binkeya netewî, civakî, siyasî û çandî ya Tirk pir giran pêş dikeve. Ev giranî rê vedike ku pir paş de mayîn çêbibe. Neçareseriya mezin, qeyrana civakî di vê bingehê de kûr dibe. Herî zêde malbat, dîsa di nava malbatê de jina herî zêde tê perçiqandin, tê mehkumkirin şungeheke herî paşdemayî. Bi vî awayî jiyana malbatê, tê halê weke jiyanê zindanê ya gelemperî. Di hundirê wê de bi saxlemî takekesek nayê mezinkirin û têkilî nayên berhemkirin. Di waterekê de qirkirina mêtîngerî dizivire wêrankirin û qirkirina têkiliyên hundirê malbatê. Weke encamên vê, di malbatê de radestî, tîpên bi qeyran û têkiliyên wan ê xirabûyî û bi her awayî paşketî dibe mijara gotinê. Tebî ev jî rewşeke giran çêdike.

Dema ku me PKKê da destpêkirin, me hewl da ku di teşeyekê balkêş de em raber bikin ku dijberiya serîhildana me zêdetirîn binkeya civakî û malbata pir paşdemayî ye. Ew têkiliyên hundirê malbatê yên pir paşdemayî û nayên pejirandin, bi zorê xwe jiyandina malbatê, me hê di destpêkê de û bi kûrahî da hizirandin. Ji bo ku em hilkeftinekî ji vê çêbikin, di aliyekî de mamûrtiya piçûk a ku dewlet pêşkeş dike, di aliyê din de jî, weke pale ango hemal berê xwe dayîna karkeriya bi miz, weke riyekê diyar dibû. Tebî di van mijaran de kar peydakirin û mamûrtî sensekî weke ku di devê şêr de bû. Va, ev hemû rewşên giran, me dehî didan ber bi çareseriya şoreşgerî ve. Çawa ku tê zanîn arastebûna tevgera PKKê di nava gloka nakokiyên ku li hempayê wê nayê rasthatin bi dest girt û me giranî da peydakirina çareya serê xwe, ber bi çûyîna ve rastînan baştirîn, piralî û di asta netew de her ku me dît, me giranî da ku em vê bêtir kûr bikin û weke hêza çareseriyê klavuzê teorîk a sosyalîzmê ji ber bikin. Evê, ji wê koma sade me anî heya îroyîn û pêşketina tevgerêkî.

## **Armanc jibîrkin**

### **û amrazan hişkbawer hebandin karesat e**

---

Tevgera partiyê, di bingeh de tevgera çareseriya civakî ye. Ev hemû şerê ku tê dayîn ji bo dawî lê anîna wê asta ku bi rengê herî paşdemayî, mihû û herzkirinê

tê jiyandin, di vê wateyê de jî, mirov tîne rewşa herî şelûşeht û nayê jiyandinê ger ku gengaz be ji bo xistina riya pêşketina civakî ya azad e. Ger ku bê dîqatkirin, siyaset jî, leşkertî jî ji bo vê dibe. Yanî li hember jiyaneke civakî ya nayê pejirandin û ji koletiyê jî wêdetir di nava qedan û daqurtandinê de ye, da ku şensê rizgariya jiyandina civakekê bê dayîn hewqas kar û xebata bîrdozî, siyasî, civakî û çalakmendî em pêş dixin. Dema ku li vê pênaseyê bê nihêrtin û heke hun vê li ser xwe bînin, hinek ji we bîrdozî û polîtîkayê, hinek jî pratîkê tînin halê fetîşê. Yanî di bingeh de hun ji bîr dikin ku ev, yek bi yek amraz in. Weke hişkbawerekî, weke mamûrekî puxte û armanc ji bîr dikin, amrazan dihebînin, gotina min jê re tenê yên ji leşkertiye têdigihîjin, yên tenê ji siyaset û partiyê têdigihîjin, weke hişkbawerekî ku nikare tîkiliya xwe bi jiyana civakî re ava bike, hun xwe davêjin nîveka kar. Çawa ku min got, ev tev, hem çalakî hem jî partîbûn di bingeh de ji bo cûkek vekirina jiyana civakî ya azad, vana tîne halê nabîne ku amraz in. Di vê rewşê de rêxistin dikeve nava qalibekî pir bûrokratîk, dîsa artêş dikeve nava qalibekî milîtarîst li ser binkeya civakî jî dibe cendereyek; jiyana civakî yek jî di aliyê hêzên xwe yên pêşeng de tê xistin bin zextê. Mîna qeyran û hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, rewşeke ku em dizanin derkeve rastê.

Bi rastî jî ev çewtiyên ku di virê de tîne çêkin, ka ji kîjan neyênîyên mezin re rê didin vekirin ezmûneya sosyalîzma pêkhatî baş bi me dide fêrkirin. Lê ya we ne ev e jî. Rewşa ku em di PKKê de çavdêrî dikin, hindê cudatir e. Hun, hê negihîştine wê hêzê ku karibe sosyalîzma pêkhatî bisepîne. A rast bi wateya pêkhatî, hun ji hêza sepandina hinek mînakên jî pîşman in ango rewşeke wê ya wisa zêde pêş neketiye. A we çawa ku min diyar kir bi jiyaneke civakî ya pir paşdemayî û hatî herzkirin, pir nivî nivî û di bingeh de ka ji bo çi ye zêde wate nedayê, ji tîkilhevî û tevliheviya jiyaneke siyasî û rêxistinî peyda ye; jiyana we wisa ye. Jevqetan nîn e; ji bo çi siyaset, ji bo çi rêxistinî, heta ji bo çi leşkertî, ji van pirsan re bersîvên net ku hun bidin nîn in. Jiyanekê civakî ya çawa, jiyana civakî ya tê jiyandin çi ye, yê we di van mijaran de jî netbûn nîn e. Zilam, ne yê tê jiyandin dizane, ne jî yê pêwîst e were jiyandin net dike. Bi rastî jî ya ku hun dijîn, rewşeke tîkilheviyê ye. Halbûkî şoreşgertî qasî tîgihîştina çawa jiyîna civakî, vê derketinê jî pir baş biryar dike, li vê azîm dike, û di heman demê de ka bi kîjan amrazê rêxistinê û amrazên çalakiyên rêxistinê pêk bîne, navê vê diyarkirin û tevahîtiya xebatê ye.

Bila di hundirê malbatê de, di derveyê malbatê de be, bila tîkiliya jin-zilam be, bila tîkiliya zilam-zilam be, tîkiliya jin-jin be, nîzanim mezin-piçûk, tîkiliya dê-bav-zarok be, tîkiliya kal-ciwan be, bi her awayî tîkiliyên kom û civakan, tîkiliyên civakê hema her astên xwe di vê wateyê de tîkiliyên jêr û jorsaziyê be, tîkiliyên wê yên civakî ji pênaseyekî zexim pir dûr dimînin, di vê mijarê de şoreşgerekî ku pêwîst e wergire pir li paş vê dimîne, her wiha eşkere ye ku pîrsgirêkan re di cî de bersîv nayê dayîn. Çawa ku ji bo çi rêxistin, ji bo çi çalakî,

ji van pirsan re bersîv nayê dayîn, ji pirsan çawa jiyaneke civakî re jî bersîv nayê dayîn. Bi vî awayî gavên serkeftî jî nayên avêtin. Jê wêdetir me hindek selimand ku, sepandinên dijmin tenê li ser binkeya civakî ya heyî pêşxistina mêtîngeriyê nîn e. Hinek xisletî taybetmendiya mêtîngeriya Tirk hene. Ji ber sedemên asta xwe ya pir paşketî û hov dema ku digire bin serdestiya xwe ta ajaliyê dibe ango tîne û datîne ber sînoren mihûkirinê. Gotin ne eyb e, têkiliyên we gelakan taybetmendiya wisa diteyisînin.

Çalakiya ku ez dixwazim ji bo Kurdistanê hem teorîk û hem pratîk pêş bixim, felsefe û taybetmendiya xwe ya bingehîn ev e: Hun di radeyeke mezî de bi gor xwesteka dijmin hatine herzkirin û hindek ji mirovatiyê hatine derxistin. Ev tewanbarî giran e, lê rasteqînî ye. Em dixwazim ji vê şênberiya derketinê bidin jiyandin. Heke ku ev pênase rast be, wê demê şoreş dibe ev: Bi van her du astên herzkirinê, ku nayên pejirandin û bi tu awayî nayên parastin, bi vê re ji asta ajalbûn û hoveberbûna beranber diçe şerê derketinê. Niha ya hunê bi vê bawer bikin ya jî hunê bîn daqurtandin. Rêka vê ya navîn nîn e. Bi taybetî di derbarê PKKê de dibe, di derbarê teyisandina wê ya her qadî de dibe, karê hun dikin bi tevahî karê tevlihevîkirinê ye. Vê gavê di gelemperiya Kurdistanê de her tişt ne bi gor xwesteka dijmin be jî, ne weke ku asta pêşengiya partiyê û serokatîyê dixwaze ye jî. A herî xeternak jî ev e.

Em vê zêde nekin pirsgirêk. Dîsa jî, ji me re pênaseya rast pêwîst e. Bi rastî jî, di bingehê şoreşvaniya me de ev heye, di ya min de ev heye. Jixwe ya ku hemû hêza min a çalakî û şewaza xebata min diyar dike ev e. Min vala vala dahûrîna malbatê çênekir. Di bingeh de divê niha hun yek bi yek bîn lêpîrsîn: hewqas dahûrînên hatî çêkirin we çiqas li ser wan kesayetiyên xwe yê kêrîyê sepand û we çiqas hêz nîşan da? Hun ji virê wenda dikin. Weke hêzeke pêşeng, milîtanên pêşeng di asta zanebûnê de hin tişt bizanibin jî, ji ber ku bi jiyana pratîk ve nakin yek, pîrsên çima rêkxistinkarên baş dernakevin, çima çalakmendên baş dernakevin, çima serleşkerên baş dernakevin ji xwe re tîne bersivandin.

## Tevgera me çemka şoreşa civakî ye

---

Ev bi salan e yê me jî şewazeke me heye; me vê bi pir alî vegot. Hem di asta çemkê de û hem jî wê derbaskirina jiyane de birîdayînen me yê rewneq çêbûn. A ku min pêş ve dibe, çalakiya di rasteriya vê çemkê de ye. Hem bi rastiya çemkê bawer dikim, hem jî çalakiya xwe xedar dikim û bi vî awayî ya ku nayê bawerkirin dikare pêk were. Baş e ev çima li ba we pêk nayê? Ez tenê di wateya siyasî, rêkxistinî û leşkerî de nabêjim, di aliyê pêşxistina jiyana civakî de jî dipîrsim. Ez di nava pergala çawa jiyane û têkiliyê civakî de peyda dibim? Di

bingeh de çalاکmendiya herî mezin a vê bi rê ve dibim. Ez, çima heya vî temenî, xwe di vê rewşê de digirin? Ev, ji wan çalاکiyên herî mezin yek e. Di aliyê teqala tēkiliyên civakî de xwe wisa netkirin, tûjkirin, komiserhevkar û balrakêşkirina min, di bin de çemkeke şoreşa civakî ya mezin radikeve. Ango şoreşa bingehîn jixwe civakî ye. Yanî xebata partiyê û xebata leşkertiye amrazek e. Armanc jî, da ku hatina asteke tē jiyandin pêk were, jiyana civakî re giyanwerî dana qezenckirinê ye.

Çima wisa net diaxivim? Ji ber ku zimanê mirovên me wesle wesle û lalûte ye, tēgihîştina wî tune. Çima ez xwe vedigerînim yekî balrakêş û li her ciyê çuyî yekî ku tē rişt girtin? Ji ber ku em radestê bastûreke netewî, civakî û binkeyeke fermî ya di dîrok û îroyîn de çî netewên nûjen jê re rêzdarî nagirin û bela serê roja îroyîn e, nebûn û me li dijî wê li ber xwe da, di alî civakî de asta pejirandinê hindek werdigirin; di nava gelê xwe û dostan de eleqe dibînin; ji dijmin re jî rêzdariye didin ferzkirin. Em bêtir şênber biaxivin, min bi salan nikaribû xwe bi gundiyeke bidana gohdarkirin. Daxwaz û arezûya min çî dibe bila bibe, min ji we re vegot ku min ne bi diya xwe, ne bi bavê xwe, ne bi gundiyan, ne bi hevalên dibistan û zaroktiya xwe dame gohdarkirin. Li wirê di pêvajoyeke pir balkêş re bihûrîm. Dîsa di aliyê jiyana civakî de hinek babetan net bikim: Di nêvengeke gundî ya wisa de tēkiliyên malbatê ka çawa asteng in, bi nakokiyeye zir ka çawa malbat ji hev re tēn dijminkirin, vê çawa weke xeternakiyekî dîtîm, min ji we re vegot. Ev çî ye? Hindek pêşketina civakî xwestin e. Li pêşiya pêşketina civakî nakokiya Kurd a navûdeng heye; doza xwînê, qirêna cîran, qirêna kuçikan, qirêna keran, qirêna bostek erd... Va, xeteriya vê dîtîn e. Ev jî, wê asta civakî ya paşketî û hoveber re rewşa bertek raberkirinê ye. Ji vê bêzar dibim. Hê di zû de bersîva ku peyda dikim, dibe **gihîştina berevajiyê** ye. Gihîştina berevajiyê çî ye? Emê nebibêjin binkeya civakî ya gundiye niştecî, li hember binkeyeke ji civakbûnê re pir girtî, hindek civakbûn afirandin e. Hê di wan qonaxan de tēkilî bi hemjiyên xwe re avakirinê xwe nedame paş. Jiyê min heft-heşt, nebe deh bû, di nêvenga gund de yekemîn tēkiliya xwe ya veşartî wisa ava kirim. Baş tē bîra min, bi wan zarokên ku mezinên mala me ji wan re digotin malbata dijmin e re tēkilî ava kir. Rêxistinîyeye veşartî... Yê ku ew bi dijmin dihesibînin re weke hevalekî pêşwazî kirim. Yanî armancekî berovajiyê armancê niştecî. Têkoşîna me bi nepejirandina tēgîna dijminatî ya wan dest bi pê kir.

Ger bê dîqatkirin, ev, nakokiyeye civakî wisa berevajîkirin û pêdiviya lêgerîna çareseriyê diderbirîne; hem jî hê di wî halê min ê zarokatiyê de.

Me qala nakokiyeye nav malbatî kir. Malbat, bingehîn yekeya civakî ye. Zexta malbatê ya li ser me pir şênber bû. Jixwe di hundirê xwe de neçareseriyekê dijîya. Pîrik jixwe di jor de bi temamî qefil bûne, rastîneke qeyranê ya herî ponijîn dijîn diderbirand. Evê sîtavka xwe dida me û jixwe ev jî, rewşeke di gelemperiya Kurdistanê de dihate jiyandin bû. Dema ku hindek jî demxeya kapîtalîzmê lê hate

xistin, em bibêjin di salên 1950yan de, pergala klasîk a kevin hilweşiya. Li hember pergala nû jî, tu çekên parastin û bergiriyê tunebûn. Tebî ev jî, li ser zarokên di malbatê de wê encamên herî neyînê çêkin. Ev çi ne? Di wê qonaxê de hinekan digotin, “em ji zarokên xwe re olê bidin fêrkirin”, hinekan, “em rê bikin dibistana seretayî”, hinekan, “em rê bikin zeviyê, wê baş cot bike”, dîsa hinekan jî digotin, “bila here li Edenê bixebite, yan jî li bajarekî din bibe karkerê însaetan.” Zarokê ku tê deh-pazdeh saliya xwe, hemin malbat dixwaze bavêje nava çareseriyêke wiha, ew jî neçar e xwe li yekê bipêçe. Tu li zeviyê tevbigêrî, wê tu bibî gundiyekî xêv; di hundirê wan mercan de bixwazî perwerdehiya olî bibînî, wê tu bibî suxteyek. Di dibistana Tirk de bibî mamûrek, wê tu bibî yekî herî bintûte û mandelkar. Bibî karkerekî însaetê ango pale, di nava xwîn û xwêdanê de bixeniqî ango bi kêrî tiştêkî nayêtî, hingê jî weke lope-tolazekî her bigêrî. Yanî bijartekê din nîn e.

Tebî em van tevan hêdî hêdî hîs dikin. Ev jî dibin mîna pêlên bahreke rabûyî ku bi ser me ve tîn û dixwazin me bixeniqînin. Bandora vê di hundirê malbatê de çawa çêbû? Gava ku malbat xwest me bikişîne nava vê rabûyînê, me hindêk bervêdan kir. Ev jî dibe qirêneke civakî. Her ku diçe li hember xwesteka malbatê ya ku dikişîne ya ber bi cûkên kevneşopî yên kevin, ya jî cûkên mêtîngeriya nû bertek û serhildan pêş dikevin. Di vir de ya girîng ew e ku, bi taybetî di ezmûneya min de, şûna pejirandina yê tê çespanî, hindêk xwe ezmûnekirin, hema ji her karî re gav avêtin, lê yekî jî pesendnekirin, redkirina bûna yekemîn zarokê malbatê û di vê wateyê de xwe daxistina şûngeha bûyîna “Zarokî bêxêr.” Ev tê çi wateyê? Ev, têkilbûna nakokiyekê ye; yanî ketina nakokiya malbatê ye. Ger ku tu ketî nakokiya malbatê, ev jî tekoşînê pêwîst dike. Tebî têkoşîn jî hêz dixwaze. Ji bo ku tu bibî hêz jî, wê tu biriya xwe bidî çep û rastê, xwe seh bikî. Nexwe tu bibî serseriyek û herî. Me jî hewl da ku em ji malbatê birevin. Min çîroka vê vegot. Ji bo serxwebûna takekesî li xizman xwe hewandin, çend heftî çûna kar, tiştên li xwezayê peyda dibin komkîrin (her çende ku zêde wilfa me tunebe jî) ji bexçeyên dewlemendan hindêk tişt komkîrin ango berê xwe dayîna diziyê...Ev, tiştên ku mirovê dixwaze xwe serbixwe bike, karên di pêşî de tîn hiş in. Di vir de ya girîng, li hember binkeya civakî û malbatî ku pir paşdemayî ye û tîne ber xeternakiya daqurtîne, bervêdankar nêzîkbûn e. Encamên vê tê zanîn.

Ji vê encamê herî girîng a ku bê derxistin ev e: Heke ku we jiyaneke civakî û malbatî bêbervêdan pêşwazî kiribe, bi îhîmaleke mezin li ba herzkirina kevneşopiyan, bi taybetî nîşan dide ku hun ketine bin bandora kevneşopiya malbatê. Ev jî di radeyê girîng de kesayetiyê wê tewişandiye. Ew têkoşîna ku nehatî dayîn we hindêkî tîne vê şûngehê. Yanî têkoşîn vedan jî, bi serê xwe behremendiyê dixwaze. Ger ku we vê behremendiyê jî nîşan neda, wê hunê bikevin nava tîma lope û serseriyên. Hun dikarin rasteqîna xwe di nava vê vegotinê de peyda bikin. Hun, ya bi teşeyekê pesendkirina taybetmendiyên

pergalê têrbûyî bûne, ya bi kevneşopiyên malbatê mezin bûne, ya jî bi giranî bûne lope û serserî, bêkar, bêxebat û bêraman mane. Ev, rasteqîna we di rêjeyeke girîng de eşkere dike. Lê belê ev, nêzîkatiyeke rast û çareseriyeke mirovanî yê guncaw nîn e. Çareseriya şoreşgerî tam jî di vê xalê de dikeve dewrê, hem jî bi teşeyê xedar dikeve dewrê.

## Damezraka malbatê û têkiliyên civakî divê çawa bin

---

Ger hun bixwazin di vê xalê de, di malbatê de nakokiya dê û bav ku mejiyê we pir tevlihev dike, piştî ji malbatê filitandinê zewac (ango em bibêjin berhemkirina malbatê) ji van mijaran re ka arastebûna we çawa ye em bigihînin ronahîbûnekê. Pênaseya malbatê, di bingeh de ka wê zarok çawa gêr bibin nava malbatekê nîşan dide. Di berê de hatiye biryarkirin. Damezrakeke civakî ye ku her tiştên wê di berê de hatiye diyarkirin; ketiya nava anarşî û qeyranê, lê dîsa jî bi kevneşopiyê, bi teşeyekê giran damezrakeke ku tê birêvebirin... Kevir biteqe, ya ku hun pêş bixin wê bibe damezrakeke ku tenê dikare misqalek ji vê wêdetir derbas bibe. Va hilkeftina têkiliya civakî, ya ku piraniya we ezmûne dikin, bi gotineke moda têkiliya jin-zilam.

Niha pêwîstî heye ku ev mijar hindêk bê pêwendîdarkirin; mêtîngeriya di têkiliya civakî de divê sîtavka wê ya li ser malbatê bê dîtin.

Di bingeh de ev, di vegotinên berê de pir hene. Emê dubare nekin. Ya ku lê bê zêdekirin; bi gora puxtaya te, bi gor çanda te, bi gor hinek rastînên nasnama te jixwe mêtîngerî hin derfetên civakî nade. Wê tu ne çanda wî, ne jî zimanê wî bikişîne balê, heta wê tu jê dûr bikevî. Ger ku te berê xwe da çand û zimanê netewa serdest, ji bo jiyandinê jî divê tu pir pêşketî bî. Herî hindik divê tu werî asta burjuvaziyê navîn. Bûna burjuvaziyê navîn jî belkî ji hezaran bibe nasîbê çend kesan. Di virê de dîsa bi teng neqebekî re rû bi rû mayîn heye. Jiyana civakî, ziman, çanda te di bingeh de, di pêvajoya îmhayê de ye; dijmin te jê dûr dixîne. Tu nikarî bigihîjî ya wî jî, ji ber ku burjuvaziyeke ku te herz bike nîn e ango ev, ji hezar-deh hezarî dibe nesîbê yek kesî. Wê demê çi dimîne, wê di bin destrêjka mêtîngeriya de rasteqîna civakî bibe ango bi xeyalên wî ve tim xwe bixapîne. Ji vê re em bandora sînema, şano û televizyonê jî lê bikin. Jiyanê ku ev dinepixinin ango çelaxwariyek heye. Her roj di bin bombardimana wê de tê jiyandin. Di xala kevî ya gihandina vê de mirovên me nikarin rabin ser lingan; tê rewşa, **“Yaşar ne dije ne naje.”**

Heke ev tev rast bin, wê derkeve rastê ku jiyana heyî ji sextekariyekê peyda ye. Va tam di vê xalê de xweperestî xwe nîşan dide. Piştî ku civakbûn, binkeya civakî û pergala civakê hewqas tê rewşa nayê jiyandinê, takekes bi teşeyekê

erjeng tê kirin evîndarê jiyandinê. Yanî takekes dibêje, “civak min zêde nade jiyandin, qedan û rûxandina civakî hewqas pêş ketiye, hingê ez biriya xwe bidim xweperestiyê!” Xwe li çemka “Yê keştiya xwe rizgar dike kaptan e” angî “Qunç zivirandin”ê dipêçîne. Gava ku dibê mamûrekî piçûk, dibêje; “çi bextewar im!” Gava ku karekî peyda dike, dirame ku; “**ji min baştirîn nîn e!**” Di bingeh de kedkarek e, lê çemka wî ev e. Xwe bi çavreşî xweperestiyekê ve, nanekî ve, têkiliyeke malbatê ve, ehab-çawîşî angî hembajarî ve dizeliqîne. Ji ber ku tenê dikare xwe bi wana bigire. Şensekî xwe yê bûna civakeke pêşketî nîn e.

Hema em di vir de em werin nava rêkxistinê. Yekî wisa ger ku karbidestiyêke piçûcîk girt, bi çavreşî xwe pê ve dizeliqîne. Tebî ev tîp, ji bîr dike ka partî û rêkxistin ji bo çi armancî heye. Ji bo wî ya girîng, li virê tiştêkî wisa girtin e. Ji ber ku asta wî ya civakî nîn e û şerê netewbûnê nade, çawa ku min got, **di nava partiyê de çi dest bigire, dibêje, “yê min e.”** Xweperestî, xweperestiya karbidestiyê, xweperestiya serkarî, bi kurtasî çavên wî çi bibîne ji bo wî xweperestî ye. Bandorê ji ku digire? kesayetiyên civakî yên ku hatine belavkirin û bi her awayî ji xeternakiyan re rû bi rû mane... Bala xwe bidinê, hema hindik maye ku ev partiyê bînin rewşa nayê jiyandinê. Bingehêkî darîngî yê wisa heye.

Wekî din, divê ev jî bê ronahîkirin: Tê zanîn ku ajoya birçitîyê di giştî de mirovan çavreş dike. Ger ku civakek, pir xizan û birçî hate hiştin, di bingeh de zêde nikare birame, pêwîstiya siyasî birêvebirinê nabîne, bi hemû xwebûna xwe ve hewl dide da ku vê ajoyê têrbûyî û jiyana darîngî rizgar bike. Jixwe em dizanin ku qîsmekî zêde yê civaka me di şûngeheke wiha de dijîn. Niha em bibêjin ku, şerê nan pêwîst e, em vê piçûk nabînin. Lê mercên peydakirina nan ger zêde giran bibe û mêtîngerî vî şerî bi rastî jî anîbe halê pir bêwate, xebata asayî ya aborî û civakî angî pergala aborî û civakî tunebe, wê tu şerî çi bidî? Bi axaftineke rastir, pêwendiya şerê nan bi şoreşê vê çênake. Ji ber ku çênake jî, qaşo weke mêşê tirsnaq dixebite. Lê nikare nanekî jî rizgar bike. Li virê çi nakokî heye? Di berê de kole dixebitîn, efendiyan jî koleyên têr dikirin. Di berê de efendî yek bû angî kole û efendî rû bi rû bûn û efendî pêdiviya ewlekarî, nan û hwd. koleyên xwe pêk dianî, lê niha koletî hewqas gelemperî bûye ku, efendiyê yê me ka dewlet e, yan cîhan e diyar nîn e. Mêtîngerî, sîstema emperyalîst û bi milyonan kole... Yanî em bibêjin koleyên dewletekê yan sîstemekê. Hejmara wan bêser û ber e, diyar nîn e. Ev di heman demê de ji rewşa ku efendî koleyê xwe xwedî dike, jê xirabtir rewşekî re rê vedike. Yanî koletiya serdema pêşîn nayê hedarkirin. Ji ber ku ev koletî zik têr nake. Binêrin, di koletiya serdema pêşîn de zikên koleyên têr dikirin. Lê niha her kes bi bedêla mizêkî xwe dertînin firotinê, yê bikirin nîn in. Jixwe felişandina herî mezin a kapîtalîzmê jî, di virê de ye. Kapîtalîzm ne sîstemeke ku karibe mirovan têr bike. Sîstemeke wisa niha nivê nifûs di rewşa bêkar de dihêle... Her wiha bêwatekirina şerê nan ji hêla kapîtalîzmê ve û nebûna bijartekeke ku bêxe cî mijara gotinê ye. Lê ji ber ku bijarteka şoreşgerî nayê peydakirin, di nava

sîstema kapîtalîst de şerekî kor ê nan heye. Civakên mîna yê me jî rewşa wan a dînkirinê heye. Mirov ji tevahî derfetên hilberîna welatê xwe qut dibin, ber bi deriyên kapîtalîzmê ve baz didin. Çi ye, wê nan peyda bikin! Di bingeh de ka wê çiqas nan peyda bikin diyar nîn e; ger ku peyda bikin jî, ka wateya vê çi ye wê nikarîbin pê derxin.

Di vê halê de, di nava me de şerekî nan ê pir çewt ango rewşa biserxistinê şerê nan heye. Ev têkoşîneke civakî nîn e, dibe ku têkoşîneke aborî be. Ew jî, şensê xwe yê serkeftinê û rêka rast nîn e. Bi gotîneke din, ji wan rasteqînên ku malbatê diyar dikin yek ji wan ev e. Yanî şerê nan niha pîrsgirêka herî bingehîn a malbatê ye. A din jî, berdewamkirina nîfşê xwe û têkiliya zayendiya beramberî hev e. Ev jî, di asteke pir paşdemayî de ye. Bi rastî jî dema ku civatên seretayî dihatin avakirin, belkî ji vê asta heyî di asteke xwezayî û watedartir de bûn. Li virê babeta ku pêwîst e dahûrîna wê bê pêşxistin ev e: Di cîhanê de binkeyên civakî, siyasî û çandî yên herî pêşketî ango asta têkiliyê di çiyekî de ji têkiliya mirovê seretayî bêwatedartir e. Bi rastî jî ev, nakokiyêke dînhar e. Lê ku zayîndîtiyêke pir bêteşe çêbû, berdewamkirina nîfşekê di teşeya asta babistînê seretayî de be jî (di nava me de dem bi dem nêzî vê bûyîn çêdibe) gengaz û watedar e. Ji ber ku di qonaxa babistînê seretayî de, babistînê bi nêçîrvaniyê xwedî dikî. Jixwe cîhan vipîvala ye; qasî dixwazî nêçîrvanî bike, qasî dixwazî li ser erdê cîbicî bibe, sînor nîn e. Ji ber vê egerê di çarçova babistîn de têkiliya malbat-jin-zilam zêde pîrsgirêk nîn e. Gava ku em ber bi cîhana îroyîn ve tên, pergala emperyalîst-kapîtalîst, sîstemekî ku li ser civakê serdest kiriye peyda ye. Konformîzm, qalibên mezaxê, binkeya çandê heta binkeya malbata ya tê zanîn, dîsa jin, zilam û binkeya malbateke xwedî çend zarokan heye. Ev sîstem, sîstemek e ku wê jî bi zorê bi rê ve dibe. Derfetên gihîştina me ya vê nîn e. Heta derfetên me ya gihîştina jiyana burjuvaziyê piçûk a nîvekî jî nîn e. Di bingeh de rewşeke civakî ya di mercên babistîn de peyda ye. Lê ji bo berdewamkirina wê jî, erdên vala re, nêçîrvaniyê re, yanî komkariyê re pêdivî heye. Lê yê me ew jî nîn e. Û ev di bingeh de sedemê daringî yê herî bingehîn qeyrana navbeyna zayendan e. Di aliyekî de xwezî bi sîstemê tîne, lê di aliyê din de jî, bi xwe di asta babistînê de ye. Ne şensê jiyandina mercên dest didin asta babistînê heye, ne jî şensê jiyandina di mercên sîstemê de. Were dîn nebe!..

## **Divê em çîroka xwe rast bizanibin**

---

Êdî pêwîst e ku hun bi hinek rasteqîn û hinek tiştan têbigihîjin. Di vê mijarê de çima ji şoreşeke mezin re pêdivî heye? Esas ez tîm wirê. Ji ber vê egerê ez dixwazim xedariya hin rastînan bi we nîşan bidim. Em berevajî nekin. Ez hizir

dikim wê neyê înkarkirin ku em ji nijada mirovatîyê ne. Heke ku wisa be, ku em ji nijada mirovatîyê tîn, em neçar in ku çîroka xwe rast bizanibin. Ev jî pêwîstekek a mirovbûnê ye. Ji tewîşandin û berevajîkirinê re qet pêwîstî nîn e. Em neçar in ku rasteqîna xwe rast têbigihîjin. Ji ber vê yekê ne ku weke serûwenekî serlêdana bijarteka şoreşgerî tê çêkirin. Ji ber ku derfeta jiyânî nîn e, jî çalakî û leşkeriyê re di bingeh de, ji ber ku amrazên neçarî yên bijarteka şoreşgerî ne serlêdan çêdibe. Ev qasî nan û av pêwîst e. Ger ku ev divêtiyek be, bileyistina jiyana şoreşgerî deynin aliyekî, wê demê, ma hun dikarin xwe nîv xulek jî bêhenase bihêlin? Ma hun dikarin sê-çar roj bêyî av bihêlin? Hingê hun nikarin bêşoreş jî, bêxebata şoreşê jî bihêlin.

Di teşeyê beriya niha min vegot de, ku mirov ji ber dînbûnê ketin zorê, dibine berpirsiyarê têgihîştina ka çi bi serê wan hatiye. Bi rastî jî, di vê derê de ya ku we ber bi pûxteyîbûnê ve dibe û zorê li we dike ku pêwîstekên wê hun bînin cî, pîrsgirêkên wiha mijara gotinê ne. A ku ber bi şoreşê ve zorê dike, asta qeyranê ye. Qeyrana civakî û heta bêderfêtbûnî. Tu nikarî malbatê bi rê ve bibî û nikarî berhem bikî. Ma ev derew e? Eşkere ye. Çil teqlan bavêjî, xwe bifiroşî mêtînger, emperyalîst û xayîn jî, te nakirin. Di virê de **şoreş** dikeve rojevê. Ger ku ev rast be û tu jî bibêjî, “min çalakiya şoreşgerî pêş nexist, ez rêxistinkirinê nizanîm!” tu nemerd î, diz î, bêşeref î, talankarê nîrxên şoreşê yî, pê dileyizî. Ger ku tu ne yekî dînbûyî bî, tu nikarî van gotinan bibêjî.

## **Ne jiyîn, ne jî najiyîn jiyanê dide sekinandin**

---

Niha, divê ev têgîn hindekî din bê vekirin. Em hatin li ku derê sekinîn? Pîrsgirêka birçîtî, berdewamkirina zayendê ango em hatin li pîrsgirêka berdewamkirina nijada mirov sekinîn. Erê, em ji nijada mirovatîyê ne. Divê şerê nan rast bê çareserkin. Yek jî, divê zayend ango berdewamkirina nijad rast be. Rê girtiye, hatiye dadan. Em, ne wekî babistînan dimînin (ez dixwazim weke babistînekî li serê çiyar bijîm, lê her alî hatiye girtin, kes min bernade) ne jî arastebûna serdema pêşîn û ne jî serdema navîn gengaz e. Ez dixwazim serdema pêşîn bijîm. Hun reviyar Ewrûpa û çar aliyê cîhanê; ew der jî hatine dadan. Tam di vê xalê de şewaza şoreşgerî dikeve rojevê. Niha ger ku em bêtirîn şênber biaxivin, hinek kes (em ji wan re bibêjin zarokên malbatên baş) dixwazin dê û bav bi mehaneyekî, bi karkeriyekî rizgar bikin. Yek rizgar dike, dudo rizgar dikin, lê pîranyeke mezin nikarin rizgar bikin. Ji ber ku weke dargî rizgariya malbatê niha di mercên mêtîngerî û emperyalîzmê de bi vê radestbûyîne ve gengaz nîn e. Zilam, hindik maye nîvê Tirkîyê bêkar bike. Rojê deh hezaran kes tevlî artêşa

bêkaran dibin. Wê çawa kar bide te? Di sîstema emperyalîst bi xwe de jî, bêkarî pirsgirêkeke herî girîng e. Bi daringî ev gengaz nîn e.

Ger ku mirov zanistî be, wê sînorên van rastînan wisa bibîne û xwe perwerde bike. Tu nikarî şerê nan bi rê ve bibî, lê di aliyê din de maşelah di karê berdewamkirina nijadê de ji emperyalîst û mêtîngeran zêdetir bi lez hilberîne mijara gotinê ye. Ma niha ev, çareserî ye? Divê mirov baş têbigihîje ku ev ne çareserî ye. Ger ku tu weke takekesekî nikaribî nanê xwe rizgar bikî, berî ku tu werî bîst-sî saliya xwe, malbateke deh zarok wê çawa bidî jiyandin? Li vir jiyandîsekine.

Mirovên me ji bo rizgarkirina malbateke wisa statuya ku nakevê û napejirîne nîn e. Lê dîsa jî peyda nake. Hema cins û cibiliyet, dîsa malbat û zarok li serê wê bûne bela. Jin li serê zilam, zilam jî li serê jinê bûye bela. Hun dizanin, niha malbat ocaxa xirecirê ye. Dema ku min jî berê xwe da şoreşvaniyê, da ku ez ji malbateke wisa birevim, min şoreşgertiyê çêtir dît. Rewşa min pir şênber e. Her ku min wê malbatê didît, her roj min deh gav diavêt ber bi şoreşê ve. Min digot, wekî din tiştek nikare vê rewşê rizgar bike û ev, rast e.

Niha bi şênbertir em werin têkiliya jin-zilam. Temam eyb nîn e; çawa ku min got, ji bo berdewamkirina nijad têkiliya jin-zilam, weke nan û av, weke ajoya birçîtiyê pêdiviyeye xwezayî ye. Lê heke ku dijmin, te ji nijada mirovatî û weke hêmanekî xwedî nasname ji nijada mirov nabîne, ku dixwaze te di nava binkeya xwe de bide helandin, li virê her tişt tê guhertin. Dijmin helandina te jî pêk nayine, ji ber ku sîstem nikare bide helandin. Di berê de eşîrekî ya din tune dikir û wisa çareser dikir. Niha di asta cîhanê de bi qirkirinan jî nikarin çareser bikin. Di van mercan de mihûkirineke fizîkî jî gengaz nîn e. Di bingeh de ew jî çareseriyek e; di berê de çareseriyên wisa hebûn. Çawa ku min got, di nava jiyana xwe ya aborî û civakî ya azad de jî qet bijartek nemane. Encamê ku ji vê derdikeve, cardin dibe dînbûnî. Yanî mercên daringî we dide dînkirin, ji eyar derdixe, ji jiyana civakî qut dike. Ka hun ji bo berdewamkirina nijad her têkiliyê ava bikin! Ka berdewam bikin, bê hunê çawa bidomînin. Em mirinê bipejirînin an radestbûnê? Di hundirê radestbûnê de yek tenê jî şensekî rizgariyê nîn e! Çawa ku min got, mêtîngerî bi rewşa heyî nikare wê jî debar bike. Mirin: Hinek kes xwe dikujin. Di vî aliyê de arestebûna xwekuştinê divê baş were fêmkirin. Di nava me de rewşa gelek hevalan xwekuştinî ye. Di bingeh de, di asta jiyanêke civakî ya pir paş de seyrkirin xwekuştinî ye. Ev pir bi ponijîn tê jiyandin. Di bingeh de em ji xwe re dikarin bibêjin **civata miriyên li ser piyan**. Va, teoriya, **“Yaşar ne dije ne naje!”** tam bi gor vê li ser piyan mayîn! Erê, ne jiyandin diyar e, ne nejiyandin.

Di virê de dîsa şoreş weke bijartekekî çawa xwe dide hîskirin? Min vê statuyê nepejirand, ez dixwazim azad bijîm. Ji bo vê çi pêwîst e? Ji bo vê civak, partî, hêz û şer pêwîst e. Ez vana çima tînim bîra we? Mirov nikare xwe ji heyf lê anîn û bi

xwe henekirinê bifilitîne. Ji ber ku pirsra “**Çawa Bijîn**” derxistina pêş ji bo min hewqas şênber e ku, ka ji bo vê pêwîst e çawa têkoşîn bê vedanê, netêgihîştina we sosret e! Lewma ev rewş tenê bi teoriya dînîtiyê ango bi şûngehekî ketî yê ku li paş asta ew ajalbûna durustiya babistînen seretayî dikare bê ravekirin. Hê dijmin di eniya dişber de lê dixê, di bingeh de pir net e û rewşekî xwe yê ku zêde bê şaşwazîkirin jî nîn e. Qasî yê di nava me de rewşeke ku li ser serê xwe dibe bela, rewşeke din nîn e; Bi rastî jî rewşa herî zêde pê ve mijul dibim ev e. Min hinek gundiyan didît; xizan, feryad û fîgan dikirin. Jixwe da ku ji wan birevim, min biriya xwe da şoreşê. Tu dest lê bidî digirî, dest lê bidî diteqê. Ez dizanim ku ev ne rewşeke asayî ye û da ku ji vê em birevin me giraniya xwe da amraza şoreşê. Ev pir vekirî ne.

Baş e, hê jî di nava refên me de tevlihevkar bûyîn, dînan leyistin, nemerd û xevikan leyistin pêwîsteka kîjan hişê ye? Heya niha xwe perwerdenekirin û di çûyîna ciyekî de ji xebatekî re watenedayîn, bi çi pêwehdiya xwe heye? Ji şerê nan em bigirin heya zanyariya berdewamkirina nijada mirov a herî kêr divê hun rasteqînî bin. Di bûyera PKKê de kesê ku vê rasteqîniyê nagire, çawa ku min got ya yeka/î nemerd ya jî yeka/î xêvik e. Ango diz e, helperest e, dijraber e, di şûngeha dij-êrîş de ye, ji dijmin e. Ger bal bê dayîn, em mijarê zêdetirîn di asta gelemperiyê de digirin. Em çima wisa dikin? Hun bi paşçavkirina hindek têgînan dixwazin bijîn. Hun hê jî vê dixwazin biçespînin. Hê jî naxwazin bi tu awayî arasteyê pêşketineke kesayetiya rişt bibin.

Min vegot, hilgirtina civata babistîna a seretayî û eşîrî hêsan e, lê we bi vî halê we hilgirtin pir zor e. Hizir dikim ku hun niha baştirîn têdigihîjin ku ka çima bûyîna şoreşgerekî rişt pêwîst e. Cîhan ji te re hewqas hatiye girtin ku, jiyana hewqas anîne û çespondine ber sînore mirinê, hewqas hatiye dînkirin, ev rewş ji bo şoreşê her derfet û çalakiyê têkûz bi te dide hîskirin. Ma çima wê tu fêr nekî? Ger ku rastî hewqas sotîner bin, bijarteka rizgariyê jî ku hewqas tekane be, wê gavê bi saxlemî tuyê têkevî nava her cure kar û mafê wê bidî.

Ez ji yê erzan dijîn re, nizanîm yêr dibêjin, “em dawêşîyan, me xwe nexiste zehmetê, li pey têkiliyên erzan beziyan” re dipirsim: Ma heye hîmê têkiliya enzan? Nizanîm tê gotin, “min xwe zêde redayê!” Ma heye şensê jiyane? Ma hun dikarin bi hev re têkilî deynin? Dibe ku hinekên bibêjin, “emê bi ziravtirîn, bi rêbazên pir xasûkî bijîn” hebin. Dizîfî, durûtî û devlokîyê berde, bibe rasteqînî, bi rastînan re were halê lê hatinê, vê hindek rişt bigire. Bi rastî jî hun nikarin vê înkâr bikin: Komeke pêşeng ê rişt ango komeke ku di nava xwe de ji van tevan re çareseriyê digere, divê bi van rastînan re jiyîna rêjemend bizanibe. Ez bêtirîn dikarim sedeman vebikim. Ez çi bikim ji jiyaneke ku anîne ber devê mirinê, xistine nav pêvajoya mihûyê û ji civaka babistîna wêdetir birine? Di vê bingehê de, yek: Dijmin ji min re karekî pêşkeş bike, ez dizanim wê min bibe ku derê. Dudo: Ku xwe bixapînim, ez dizanim di jiyana civakî de wê min bibe ku derê. We heya

vê gavê çawa vê hîs nekir? Ma di giştî de serkeftin nîn e ku, bi hêsanî xew bikin, bi hêsanî xwarin bixwin! Ku em we serbest berdin, xwedê dizane hunê çi ji hev bikin?

Lê li virê em ne dijîn, ne jî ne najîn. Ger ku ev ne rast be bibêjin, bibêjin ku; “rewş çawa ku tu dibêjî ne wisa ye, bijartekên wekî din jî hene!” Azadiya gotûbêjê heye, hun dikarin bibêjin. Dîsa ya girîng ronahîkirina asta pêşengiya me ye û watedayîna pergala têkiliya wê ye. Rastîna gel wisa ye, rasteqîna jiyânî ya civak ku tê de ye û nayê tebatkirin wisa ye. Ev, ew bahaneya erjeng e, ku pêwîst e em rasteqîna şoreşê hembêz bikin. PKK, li hember vê trajediya mirovatî ya ku ne dije, ne naje, ne mirî ne zindî ye û can dide, bi temamî bijarteka jiyânî ye. Da ku ji rewşa pir trajîk, pir rezîl, pir kenok, pir tinazok, pir qedalok bifilite biriya xwe dide rêkxistinê, têkiliya rêkxistinê, siyaset dike û çalaki çêdike. Ev tev dibine amraz.

Ji bo me welatekî tê pejirandin û perçeyek ax pêwîst dike. Mirov li ser perçeyek ax dijîn. Civatên ku li hewa dijîn nîn in; li hîvê jî hê cî nehatiye vekirin ku em herin li wir cîbicî bibin. Di berê de kalên te li ku derê jiyabin, wê tu li wê derê zorê bidî çarenûsa xwe. Dîsa nasname pêwîst dike. Mirov, di biçimên civatên curbecur de dijîn. Ya te jî divê civata netewî darîçav bibe. Nasnama civakî û nasnama çandî pêwîst dike. Wê tu vana hindêk bijî û peyda bikî. Em ji van tevan pêmen in. Ku tu ji vana pêmen bûyî, tuyê ji mirovbûyî nê dîr bikevî. Dîsa ku tu bixwazî bijî rêk ev e; çawa ku min got, rêkên din yê jiyânî, **rêkên ne dije, ne naje ne**. Ev ne peytekî zanistî, viyana şoreşger ango jorsazî filan e, rewşeke rasteqîniya objektîf e. Raveya rasteqîn û ka çima di warê daringî de jiyân ber bi qeyranekî ve hatiye dehfdan e. Têkiliyên jorsazî yên din ango têkiliyên civakî, têkiliyên arişî ji vê binkeya daringî bandor digirin. Hîmê daringî ku hewqas guncaw nîn be, têkiliyên jorsazî, têkiliyên moralî û têkiliyên hestiyarî pêş nakevin. Ji bo ku pêş bikeve tenê şertek heye: Têkiliya şoreşger. We fêm kir? Şertê têkiliya şoreşger!

## **Li derveyê têkilî û şewaza şoreşgerî yê ku dihizire wê bi ser xîne debeng e**

---

Ez li ser bîngêhê vê tecrûbeyê dibêjim. Hun ji min zêdetir ne bandorkar in, ne hêzdar in, ne jî hişmend in. Ez hê jî ji bo têkiliyên min ên bi nasên kevin re (mirovên bi temen in, heta zarok jî di nav de hene) da ku têkilî bi şewazeke şoreşgerî seyr bike, qasî mirinê dikevim nava hewldanan. Çima? Yanî hun hişmend in, hun dikarin xweşik kiş û mal ava bikin, ma ez nekêrhatî me? Di bîngêh de wisa nîn e. Helwesta min bîngêhê xwe ji şayîşeke kûr digire. Pêdiviya têkiliyê ji şewazeke şoreşger re hewqas heye ku, ev hewqas diviyatiyeke ku tu di

rewşekê de yî ku nikarî tiştêkî biramî. Yê ku dibêje, dikarim tiştêkî dî diramim ango tiştêkî dî çêbikim, debeng e. Yekî wisa hem xwe, hem jî partiyê dixapîne. Niha em we tevan hindik zêde bikişînin lêpîrsînê. Em we bînin ba malbata we, ba zarokên we, ba hembajariyên we; jinekê deynin ba zilamekî, zilamekî deynin ba jinekê; wê her qas zanebûna şoreşgerî û asta hestan bê têperandin û bê wendakirin. Jixwe bajarvanîti pir xurt e; taxîti, ehbab-çawîştî di jiyana me de pir bandorkar e. Hun nikarin xwe ji wan dûr bixînin. Lê, li min binêrin, rewşa min hindek cuda ye. Bi serê xwe jî bimînim, şûngeha xwe pir şidiyayî berdewam dikim. Çima? Ji ber ku rewşa we ya paşçavkirina şêwaza şoreşgerî beriya niha çawa ku min vegot, ji neçareseriyê re, hem jî di bin navê partiyê de pîrîm dide.

Yanî hewqas jiyîna min a bi disîplîn, her roja xwe bi temamî di rasteriya armancên şoreşê de derbaskirin û bazdana min çima pir pêwîst e? Va, ji vê zemîna ku tê jiyandin hindekî dîtir partiyê dûrhiştin ango partiyê weke rêkxistineke şoreşger pêşxistin, binkeya civakî ya paşdemayî neteyisandina nava refan, pergala têkiliyên nava partiyê zêdetirîn şoreşvanikirin, bi wê şoreşvanîkirinê ve qeyranê re çareserî peydakirin pir pêwîst e. Ev jî pênasayek e. Divê ev were têgihîştin.

Di vê navberê de em ji xaleke din re zelalî bînin: Çima hest bi hêsanî nayên jiyandin? Ew evîne we yên ku hun pêgirtiyê wê ne, çima pêk nayên? Ne eyb e, yê min jî ta ji dibistana seretayî vir ve hebûn. Di virê de mezinahî qasi têgihîştina çima nayê jiyandin û wate dayîna wê çawa bê jiyandin pêwîst e. Va, mezinahî di vir de ye. Heke ku di vê mijarê de, me jî weke we çewti kiriban, em ketibana kêmasiyeke jiyane ya bingehtin, PKK û ev şer nedibû, heta jiyana we jî nedibû. Bala xwe bidinê, jiyana min çawa ye? Ev yek di bin navên cûrbicûr de weke sincparêziyeke mezin, siyasetmedarekî mezin, mirovqencekî mezin, şervanekî mezin yê nefse, leşkerekî mezin dikare bê ser ziman. Ji bo vê pêwîst e ku wisa be. Beriya niha min vegot; di eleyhiyê te de hewqas merc hene ku, tu neçarî jiyane wisa rêkûpêk bikî. Çewtiyên têkiliyê û çewtiyên mezin ê jiyane yên we tevan hene. Ger ku hun rast bi rêkûpêk bikin, hun nakevin nav çewtiyên wisa.

Ma min bi xwe, xwe serok îlan kir? Na! Yê herî zêde xwe ji vê têgînê dikişîne ez im. Derketina pêşberî mirovan jî, ka ji bo min çiqas zor e, ez dizanim. Lê weke takekesekî her ku ez şerê xwe nexistinê didim, şerê nebinketinê didim, her kes min vêga di şûngeha serok de dinirxîne. Her çende ku li min zor were jî, her çiqas ez aciz jî bibim, ez neçar im. Ev kesayetekî ku wisa hatiye rêkxistinê. Jixwe xwe weke serok îlanekirin an îlanekirin girîng nîn e. Ez bibêjim, red dikim jî girîng nîn e. Ji ber ku ev hatiye halê rasteqîn û encamekê xwezayî yê jiyane ye. Kê min bijart? Ji bo min tu demê tilî ranebûne hewayê. Di bingehtin de pêhateyeke derketibû rastê bû. Ango dahûrandin, veguherîn, rêkxistinbûn, çalaktîbûn di encamê de bûyereke wisa ku tê gotin serok, derxiste rastê. Ku ez ji xwe bipîrsim û bibêjim ka kesayetiya min, zaroktiya min li ku derê ma, ku ez bibêjim ka

xweperestiya min li ku derê ma, ez nikarim pê derxînim. Min xwe aniye şûngeheke wisa.

Di vê bingehê de sazgeheke wisa mezin derkete rastê. Di hundir de bi her cure jiyana civakî, siyasî, leşkerî ku hate kurtasîkirin ango kesayetek, sazgehek û bûyereke êdî di nava veguherînê de derbas bûye mijara gotinê ye. Wekî din çare û riya hevgirtîbûnê tune. Yanî tuyê wisa bî. Çawa ku min got, pêwîst e ku nixandînen te yên asta civakî, pênasayên dost-dijmin û di vê mijarê de bi xwe re hevgirtî bî. Di encam de wê tu bibî serok.

Di bingeh de peywîrên we yên wisa jî hene. Peywîrên we yên serokbûnê hene. Hun çawa artêşbûnê çêdikin? Ev gelşa we ye. Da ku xiyaret li puxteyê nekirin, bi armancên azadiyê re berevajî nekevin, divê hun, ka em çawa dijîn binêrin. Heke ku ev hêsan bibûya, her hal emê ji we bêtir xasûk bana û di kurtebirê de baştirîn jiyabana.

Niha em dîsa werin we: Gelo çi yê we digire heye? Di bingeh de me ji tevan re ronahî anî. Derkete zelaliyê ku di bin bandora kevneşopiyên navxweyiya malbatê de ango di bin bandora çespanînen dijmin ên dîrekt ya jî endîrekt de nikarin bijin û ka çima pêwîstî heye ku hun werin girtin nava partiyê û partîbûnê çêbikin. Lê niha hê jî bandora bermayan heye. Li virê hê jî hun qala ehab-çawîştîyê dikin; hun qala nepêşketina têkiliyên siyasî, leşkerî û jiyane dikin. Heta hinek averêkariyê dikin, bi zagonên jiyana şoreşgerî dileyizin. Hê jî yên ku pê dileyizin hene. Hunê vana bikin pirsgerêkên mezin. Di halê din de ev jiyane nayê kişandin. Ev, jiyane nîn e. Jiyane şoreşgerî zagonên xwe yên vebir hene. Ger tu bi gora pêwîstekên van zagonan tevbigerî, wê tu bijî. Ka çima pêwîst e hun xwe erjeng perwerde bikin, ka çima pêwîst e bi gor zagon û pîvanên şoreşê xwe bînin halê guncan pir zelal e. Ev ji bo jiyîna we ye. Wekî din rêk tune.

Em dîsa werin pirsgerêka têkiliyan. Niha bala xwe bidin ser rewşa min. Rewşa min di bingeh de rewşeke têkiliyên netewî û siyasî, rewşeke têkiliyên leşkerî, heta rewşeke têkiliyên çandî û civakî û dîsa rewşeke têkiliyên aborî ye. Tebî di kesayetiya xwe de ya ku didahûrînim, di bingeh de dibe netewek û dibe mirovatî. Lê sehaya sepandinê, em bibêjin ku civatên mirov ên ku em weke warê eleqeya xwe diramin. Tu nikarî vê paşçav bikî. Ji ber ku weke diviyabûna doktrîn û têgîna serokatîyê divê ev wisa bê nixandî. Baş e, ya we çawa ye? Temam, di vê mijarê de xwe gihandina min a zelaliyê hindêk pêş ketiye. Ger ku hun, di bin ronîya vê de li xwe binêrin, yê we bi piranî ya xwe peydanekirin ya jî xwe kirina axayê bermayên kedê, xwe kirina burjuvaziya piçûk ê çavleq ya jî kevinê berhemkirin e. Hilberîna kevin dibe sîxurtiya objektîf. Ger tu zêde pêkolî bikî, wê ev heya xiyaretê here. Her rewşên hingofî, ji ber bi pêkolî berdewamkirina gelşa bermayan pêş dikeve.

Dubare bala xwe bidin dahûrînen serokatîyê: Serokatî ji heft saliya xwe ta îro xwe çawa girtiye dest? Divê zarokek çawa mezin bibe, dê û bav çawa bin, wê

jinek çawa be, wê zilamek çawa be, damezrakek wê çawa pêş bikeve, wê hilkeftina rêkxistineke şoreşgeri çawa be? Di van dahûrînan de ji van pirsan re bersîvên mezintirîn tîn dayîn. Dîsa ger hun bibêjin, “ev me zêde eleqedar nake, emê disa ya xwe bixwînim”, wê demê tê vê wateyê ku bi mesogerî hun bi gora teoriya kerîtiyê dijîn. Hun dizanin, her ê ku tê li kerê siwar dibe, bar li piştê wê dike. Ma ji destên kerê wekî din tiştêk tê? Ker e ev, erka kerê ev e. Yan jî bi gora teoriya kuçiktiyê wê bê jiyandin. Di bingeh de kuçikên baş hene, kuçikên kêrnayêti hene. Bi hev û di ketin, di nava rêkxistinê de bi hev nekirin, di nava rêkxistinê de nehatina pergalê bi gora vê teoriyê jiyandinê çespendin e. Jixwe dijmin nav le vê danîye: Zagona kuçik berdana hev! Di vê rewşê de tê vê wateyê ku bi gora wî dijî. Çi mafê kesî ji vê re tune. Da ku em bi van re şer bikin, em partîbûnê pêk tînin.

## **Mafê jiyânê** **Mafê şer e**

---

Bi van tevan têngihîştin ecêb e. Dîsa didim diyarkirin, hinek qet naxwazin têbigihîjin. Ger têngihîştin, ev tev wê bînan gotin û hem jî pêwîstêkên wê bêne bicîanîn. Bi misogerî emê li xwe bêrêzdarî nedin kîrin. Baldar bin: Ez hê jî çawa dijîm, ez li ku dera jiyana civakî me? Li cîyekî ez jî milîtan im. Milîtan li ku dera jiyana civakî ye, bi kîjan pirsgerêkên jiyana civakî re mijul dibe, di kîjan astê de seyr dike? Bi vî halî xwe jî, xwe bi hêsanî naecibînim. Ez hizir dikim ku hindêk behremendiyên min derketine rastê. Di nava civakê de, li pêşberî gel, kesayetiyên wek we, li pêşberî mirovên ji her nijadî qîmeta ku tê dayîn heye. Lê ez bi vê baş amil nîn im, xwe di şûngeheke pir nebes de dibînim. Tim û tim li serê diramim. Ji xwe re dibêjim, ka baştirîn çawa dikarim derxim rastê. Çima? Divê li ser vê bê hizirandin. Her ku em hewqas gohdarî dikin, Her ku hewqas em digirine balê, tevî ku rasteqîna me hê jî wisa be, divê hindêk encamên ku hun jê derdixin hebin. Kar hewqas hêsan nîn in, jiyana hewqas hêsan nîn e. Hunê bi jiyaneke azad û ku tê pejirandin têbigihîjin.

Hun çima bûne şoreşger? Şoreşeriyêke bi curê PKKê da ku bê pejirandin, qasî mitlaq têngihîştina ka jiyana çawa tê qetilkirin, ger berdeewamkirina jiyânê tê xwestin, di hundirê sînorên azadiyê de hem zanebûn û pîlan, hem jî bi hewldan pêwîst e çawa bê pêşdebirinê, divê hun pêbawer bin ku karibin di nava partiyê de bijîn. Nexwe wê jiyana bibe îşkenceyêke mezin; di asteke pir bêsil, bêberpîrsiyarî, weke serserî û xwe kirina bar de bê jiyandin û ev qet nayê pejirandin. Dahûrînên partiyê, dahûrînên artêşê û yekser dahûrînên têkoşînê, di bingeh de tê wetaya têngihîştina jiyana me di nava PKKê de. Hun ji min ne zêdetir aqilmend in û ji min

zêdetir mafên we di jiyânê de nabe. Jixwe ya ku derdikeve rastê jî, hindek ev e. Mafê jiyânê li ku derê ye? Mafê jiyânê mafê şer e, mafê çalakîyê ye. Mafê çalakîyê, mafê rêkxistinê ye; mafê rêkxistinê jî, mafê perwerdehiyê ye, maf û peywira xwe çêkirinê ye. Ev jî di bingeh de **ji peywirê zêdetir mafek e**.

Ez vê bigihînim zelaliyê: Hun partîbûnê weke peywirekî neçarî û çalakîyê jî weke peywirekî tenegehîjin. Divê hun bi çavên mafê pîroz lê binerin. **Maf** çi ye? Maf, kiryarek e ku mirov herî zêde dixwaze, **şewazê heyinê** ye. Yanî mafê we ye bûna rêkxistinê heye; mafê we ye çalakî çêkirinê heye, ne peywira we. Peywir hindek diviyatî û dana çêkirinê di hundirê xwe de peyda dike. Di bingeh de hatina we ya vê rewşê pêk nehatiye ango beriya vê divê hun weke mafekî têbigihîjin. Hun bibêjin, “çi bextewarî ye ku mafê rêkxistinbûn, partîbûn û çalakîyê bi min hate dayîn!” Jixwe ger hun bala xwe bidinê, min bigirin dest, hinek şervanên di nava me de dibêjin, “mafê bi çekbûyîn û rêkxistinbûnê mafekî mezin e!” Tebî hinek jî dest datînin ser mafê, wisa talankarî dikin. Ev cuda ye. Tê wê wateyê ku bi partîbûn û di bingehê PKKê de mezinbûnê weke mafetî têgihîştin û dayîna vî mafê jî, divê di vê çarçoveyê de bê bidestgirtin. Piştî weke peywirekî têgihîştin gavekî duyemîn e. Peywira her kesî ye; çalakî, rêkxistinkirin û bi rê ve birin piştî vî mafî te.

Ger bê dîqatkirin, ev tev weke pêwîstekên jiyaneke xedar hate daxistin, ne diviyatîyek e. Ji neçariyê wêdetir (ev jî heye) dilitî û erezûyeke mezin mijara gotinê ye. Wekî din riyeka me nîn e. Ev hemû hinek jî dibine puxteya PKKê. Dibine hîmê PKKbûyînê. Yên ku vê pêk nayîne, yên ku bi PKKbûyîne wisa tenegehîje, di babetên din de çiqas bibêje pêşketî me, di bingeh de vala ye. Yekî wisa nikare bibe PKKyî ango zû-dereng wê bibe bela, bibe helperest û halantêderêk jê derkeve.

Ez hizir dikim ku êdî em dest bi têgihîştina hinek tiştan dikin. Di aliyê rasteqîna civakî de, hun dibêjin tiştên bî ronahîkirin hene. Her hal hun asta tîkiliyên nava refên partiyê û jiyana civakî tevlihev dikin. Da ku zelal bibe me vana da diyarkirin. Jiyanê me di aliyê hedefan de û di aliyê pergalekî çawa de civakî ye. Armanekî xwe ye civakî heye. Lê vê gavê bûye jiyaneke bi ponijîn a siyasî û heta leşkerî. Yanî di jiyana me de armanca civakî heye, heta em ji bo armanca civakî ya herî azad hene. Lê ji bo gihîştina wê jî, di vê gavê de em siyasî ne, ji vê jî wêdetir di vê gavê de em tam leşkerî ne. Çima ? Ji ber ku di biçimekî erjeng de em siyasî û leşkerî nebin, em nikarin bigihîjin armanca jiyana civakî. Ma pêwîstî heye ku em van tîgînan ronahî bikin û pêş bixin? Têgihîştina we wê zor nebe. Ji ber ku bo gihîştina jiyana civakî azad, bi misogerî divê di asteke bilind de jiyana leşkerî bê jiyîn.

**Ger tu jiyana civakî ya azad dixwazî**

## Wê tu zagona Kurdistanê bisepînî

---

Leşkertî çi ye? Leşkertî, zora herî rêkxistinkirî ye. Zor çi ye? Zor, pîrika civaka kevin ya ku avisê civakeke nû ye, amrazê dana zayîna wê ye. Dikare bê gotin ku, ev ji bo me belkî jî amrazekî herî zêde pêwîst e. Amraza zor jî, amraza artêşê ye. Artêş, rêkxistina şer e. Qasî ji bo rakirina tevahî astengan, modelê pêşeng yê avakirina civakeke nû ye. Di destpêkê de wê tu bibî artêş, wê tu artêşbûne bizanibî, wê tu bibî siyasî. Ger tu wisa bûyî, bi ihtîmalake mezin tu dikarî bi jiyana civakî û têkiliyê têbigihîjî. **Ev zagonek e;** zagona şoreşa Kurdistanê ango şoreşa PKKê. Yê din qet pêwîstî bi vê nabînin. Mînak komek partiyên din jî hebûn, vana qet biryara leşkerbûnê nedane. Vana hê ji şerkirinê re heyam peyda nekirine. Em ji van re dibêjin vesazîparêz. Pêwîst nîn e bê gotin vesazîparêz jî. Ev di bingeh de di bin çerxa mêtîngeriyê de hebûn û tunebûna wan yek e, nav heyî, lê bi xwe tuneyî ne. Ger ku tu dixwazî di Kurdistanê de ber bi jiyaneke tê pejrandin, hindek azad, xwedî nasname û viyana puxteyî ve herî, tu neçar î bibî leşker. Bi her awayî derfetên wê yê şer, hêza pêşeng, partî, perwerde û bi her cureyî amadekarî, dîsa ber bi çûyîne ve jî ku te şerê wê jî pêk anî, tu dikarî wî navî li xwe bikî; yani dikarî hilkeftina jiyana civakî çêbikî. Dikarî hindek têkiliyên jiyana civakî pêş bixî.

Niha hunê bibêjin, ev kar pir zor e; lê ev zagonekê Kurdistanê ye, yanî zagonê jiyane. Ger tu azadî dixwazî, ev wisa ye. Na, tu tevlihevîyê dixwazî, helperestiyê dixwazî, ew tiştekî din e. Hun dizanin tam jî di vê xalê de, di nava refên me de hinek serik derketin rastê. Me di aliyê paşdemayîna civakî de tewanbar kirin û gotin ku ew bi xwe serê pêşketina civakî dikişînin. Îdîayeke xwe yê dî jî, dibêjin hun pir hişkereq in û jiyînê nizanin. Hin rêkistinên din jî vê yekê di bîçimekî şênber de liyaqê me dîtin. Niha ez dizanim di hundirê binkeya me de paşdemayîneke civakî ya çawa heye. Rêkxistinên dî çawa dijîn em ji wan re bihêlin. Lê yê ku di nava me de ne, gava ku dibêjin jiyînê hun nizanin, ka em hindek wate bidin, ew çawa dijîn.

Hun dizanin, hin tîpên halantêder, yanî tîpên ku dixwestin PKKê felişînin derketin. Îdîaya wan a herî bingehîn, digotin di nava partiyê de jiyaneke ku takekesan têrbûyî bike nîn e, jiyana pir razber e û weke robotekî ye û divê jiyana civakî bê pêşxistin. Di virê de bi taybetî gava ku têkiliya jin-zilam dibû mijara gotinê, xwe weke pisporên jiyana civakî pêşkeş dikirin. Di bingeh de sivîlbûneke erjeng e; me ji vê re got, sivîlbûn.

Ka we çiqas leşkerbûnê pêk aniye, ew jî bi gotûbêj e. Me, hê bi rastî û durustî gerîlabûn u artêşbûnê pêk neaniye. Ew hê gava xwe ya yekemîn neavêtiye nava leşkerbûnê, di vê mijarê de berpirsiyariyeke herî piçûcîk sermil nekiriye, jî vê reviyaye. Lê, li ser me çawa jiyaneke civakî diçesipîne. Bi ihtîmaleke mezin

veşartî hîtabê wan çemkên jiyana civakî yê kevin ê piraniya we dike. Di bingeh de ne hinek tenê, dixwazin wê rewşa bi belavî tê jiyandin har bikin. Rast e, ji ber ku me gelek girtiye nav jiyana siyasî û leşkerî, di vê wateyê de me jiyana civakî pir felişandiye. Çawa ku beriya niha min vegot, em jiyana hoveber û zêde hatî herzkirin red dikin. Lê me, hê jiyana civakî ya azad jî pêk neaniye. Yanî nêvenga vê nîn e. Ne em xwedî axeke hatî qezenckirî ne, ne jî pêşketineke di asta gel de ya azad hatî qezenckirî heye. Baş e, wê çi bibe? Wê di asta siyasî û leşkerî ya ponijîn de seyr bike. Weke rêpîvaneke vî karî wê wisa be. Nimûne di gelek şoreşan de wisa ye. Binêrin di dîrokê de gelek dewlet hatine avakirin. Heta li artêşa Yenîçeri ya Osmaniyên binêrin. Di salên avakirin û mezinkirina împaratoriye de Yenîçerî têkiliyên xwe yê civakî û malbati nîn in. Hêzekî bi ponijîn leşkerî ne, hem jî hêzên çetîn yê wê qonaxê ne. Têkiliyên wan ê malbatî nîn in. Tu kes dê û bavê xwe nizane. Tev zarokên niqandinê ne. Zewaca wan nîn e. Hizir dikim ku ev panzdeh sala didome.

Ez nabêjim, em vî esas bigirin. Di dîrokê de, di gelek artêşan de rewşeke wisa mijara gotinê ye. Çima? Ji ber peywîrên mezin yê wê qonaxê hene, pêşî ji artêşê re pêdivî heye. Van mînanan zêdekirin gengaz e. Niha ji bo me kar bêtirîn xedar e. Ger ku em hindê bibin leşker, emê karibin hinek tiştan rizgar bikin. Heke ku tu ji leşkerbûnê, ji siyaseta wê derketî, tu kole yî. Qet tiştek di destên te de namîne. Em dizanin ku ka çi me ber bi leşkerbûnê ve dehf dide. Me jiyana leşkerî bi dilê xwe nebijart. Da ku em ji înhayê bifilitin me bijart. Bi rastî jî, da ku em ji rewşa derêxistina mirovî rizgar bibin, me nihêrî ku em bûne çalakvan. Nexwe min pêlê mîroyekî jî nedikir, ditirsiyam. Niha berpîrsiyarê “rêxistina herî zêde xwîn dirêje” me angî ji nîne destpêkirin û vî karî hindêk pêş xistim. Çima? Ji ber ku neçariyên jiyane min kişandin virê. Nexwe her kes dikarî çek bi kar bîne, lê min nekarî. Belkî her kes dikaribû bibe şerkerekî baş, lê ez nedibûm. Weke wilfeke giyanî ev wisa bû. Lê niha li Kurdistanê, gava ku zora Tirk dibe mijara gotinê, li hember wî berxwedana herî mezin a di dîrokê de bi rê ve dibim. Ev çawa dibe? Ji neçariyê, ji ber ku riyeka din nehatî peydakirin. Dijmin wisa ye. Ger tu jiyana dixwazî, zor be jî wê tu wisa biriya xwe bidî ser. Ji ber ku ez hindêk hişmend bûm û min nedixwest xwe bi rasteqînan bidim tinazekirin, min biriya xwe da pîrsgirêkên leşkerî û siyasî. Ger tu hişmend bî û dixwazî bijî, ev wisa ye. Tu bibî sextekar, bibî firarî, wê tu bidî xapandin, bixapî û birevî. Ma qet dikarî qezenc bikî? Hevgirtî bî, wê demê wê tu bibî leşkerekî erjeng.

Ez di vê mijarê de hê jî bi we şaş dibim. Ez dibêjim divê hun ji min bêtir bibin leşker. Ji ber ku ez hindêk bi bîrdoziyê, hindêk bi jiyana civakî û siyasî mijul dibim. Lê yê wek we bi temamî leşkertiye ve mijul dibin. Ji ber bi warê leşkerî ve mijulbûn çêdibe, dikarin ji min zêdetir bibin leşker; di mijara her cure artêşbûn û şerê gerîla de bibin pîspor. Ev pişeyê we yê esas e.

Niha ez ji virê dinihêrim; pirsgirêkekî leşkerî, pirsgirêkên herêmeke gerîla, ji serleşkerê wê derê deh qet baştir dibînim. Wê demê ew serleşker di bingeh de ji leşkerbûnê pir dûr e. Va, ji bo vê yekê bi ser naxîne, ji ber vê yekê artêş ava nake. Ku qasî min neçariya vê hîs bike, jiyana tenê û mitlaq di vê bingehê de dikare bê pêkanîn pêbawer be, di bingeh de dikare artêş ava bike. Hewqas derfet ketine destên wî. Me ji nînê dest pê kir û van derfetên şer derxiste rastê. Bi wan derfetên di dest de heyî dikare destanan biafirîne. Lê ketî û serserî ye; di bingeh de diviyatîyê jî, azadiyê jî nabîne. Her wiha van karan wisa avarê dîke û dibe.

Yên ku nabin leşkerî, bi gelemperîtir yê ku nabine siyasî, di vî aliyê de xwe pêş naxînin, ne dikarin bibin rêveberekî baş ê rêkxistinê, ne jî serleşkerê baş. Pîranî asta ku dijîn ev e. Baş e, ez çima bêtir cewaz im? Cewaziya min, ji ber ku têgihîştina min pêwendîdar e bi rasteqînan ve û ji ber berpîrsiyariyê tê. Ji ajalbûnê re na, ji tunebûnê re na, ji şûngeha “ne dije ne naje” re na! Qet nebe wezê xwe bi hêsanî nekim êm. Bi van hestan qîmeta têkiliyê bizanibe, qîmeta her civatê bizanibe! Baş perwerde bibe, baş bibe leşker, çekekî baş biparêze, baş bi dest bixe û baş bi kar bîne. Bi kurtasî, her cure derfetî baş binirxîne! Fersendê baş bibîne û biriya xwe bidê. A rast ev e. Heke ku ev bi we re pêş nakevin çima? Hindek serserîtî, hindek xeflet û di bingeh de hindek koletî heye. Em li bandorên giran yê mêtîngerî û civakî dinêrin. Civak, jixwe bi qedal e, kesana ji armanc werdigire. Bi van ve dibe ku ez bi vê têdigihîjim: Tê wê wateyê ku leşkerbûnî pir diviyatî ye. Di Kurdistanê de ji bo têkiliyê civakî ku hindek bi namûs û rûmet gelek pêdivî heye.

## **Her tiştên ku xwemalê kevin in eyb, kirêt, xirab û çewt in**

---

Niha da ku hun baştirîn têbigihîjin, ji asta têkilî û hestan re ku bi we tevan eyan e û belkî jî pir hesreta wê tê kişandin, hindek zelalî bînim. Me, vê timî got: Ji hestên erzan rê pêwîstî nîn e, derfet nîn e. Qirkirineke hest û hezkirinê heye. Gava ku dijmin li te xistiye, di heman demê de hestbûn, hatina hezkirinê û heta girîna te ya asayî ya mirovanî jî asteng kiriye. Xwe li pêşberî mêtîngeran hês bikin: Hunê ne bikenin, ne jî bigirîn. Xwe li pêşberî serbazên Tirk hîs bike: Ne dikarî bikenî, ne jî dikarî bigirî; weke pûtekî bisekinî. Tê wê wateyê ku mêtîngerî ji hesteke asayî re jî cî nade. Mirov dixwaze wate bide rewşa têkilî û hestbûnê we. Ez jî

wisa bûm, lê min xwe dahûrînanî û hatim îro. Hê jî şerê hestên mezin, şerê hezkirinê bi rê ve dibim. Ji bo min bi rastî jî pir zor e. Gava ku her roj biriya didim pirsgirêkên leşkertiye, artêşbûnê û şer, di aliyê din de têkiliyên xwîngerm pêş dixim. Divê ji van zarokên me çawa bê hezkirin? Têkiliyên vana çawa ji têkiliyên “ker” ango “zagona kuçik” bê derxistin û vegerandin têkiliyên mirovanî û tîn pejirandin. Ji vê re di radeyeke nayê bawerkirin de eleqe radibihîsim û ji bo pêşxistinê hewl didim. Ji ber ku di rastê de hewqas çespondina têkiliyan hene ku, hinekan ber bi xiyaretê, hinekan ber bi kerîtiyê û hinekan jî ber bi her cure ketîbûnê ve dibê. Yek jî pir kirêt e. Dîqat bikin, di çalakiya me de taybetmendiya ji kirêtiyê rev heye. Ev, pir şênber e.

Her ku ez xwe nas dikim, bi ya min kesek pêwîst e ku net biaxive, zû bimeşe û baz bide, armancê xwe bi zelalî daxîsne rastê, xweşik û pir kêşvan be. Ez, ji mirovên ne wisa tim direvim. Pêwîst e pir şênber bê diyarkirin: Egera herî bingeîn a ku me dikişîne nava şoreşê, di serî de nava malbat û hawîrdorê de ew kirêtiya ku me dît û berteka ku me li hember wê raber kir bû. Min li jin û zilam dinihêrî, tev bîrdarên kirêtiyê bûn. Hê jî tev di hişên min de ne. Min li têkiliyên wan dinihêrî, bi kirêti bûn. Min digot, wey xwedê! Min li cînan dinihêrî û wisa digot; hê jî piraniya wan tîn bîra min: Çawa têkilî, çawa jiyane, çi eybek mezin e û ev çawa vê jiyane layiqê xwe dibînin? Çawa ku min got, çîroka vê dirêj e, divê wekî din bê vegotin.

Tebî van tevan min kişandin ber bi şoreşê û partiya şoreşê ve. Bi wê şermkirinê ve arasteyê şoreşê bûm. Hun ji ber vê şermê, ji ber wê şermê hatin nava şoreşê. Jixwe welatê we hatiye wêrankirin, jixwe gelê we rewşa bi her cure şermkirin û qedalê dije. Eybên we yê mezin hene. Weke ku di asta gelemperî de wisa ye, di yekeya malbatê de jî wisa ye. Yanî hun li ku derê binêrin, eyb, eyb, eyb; kirêt, kirêt, kirêt; xirab, xirab, xirab; çewt, çewt, çewt! Li hember van tevan şer wê te bikişîne ku derê ve? Ev wê te bikişînin başiyan, rastiyan û xweşiktiyan. Va, jiyane yek jî di vê wateyê de hatiye sekinandin û di vê wateyê de wê tu zorê li jiyane bikî. Bi wan tîngînan xwe lêpîrsîn bike. Hun li ku dera xweşiktiyê ne? Kîjan aliyê we yê ne xwar, kîjan aliyê we yê ne çewt, kîjan aliyê we yê ji rê derneketî û çi tiştê we yê pê nehatî leyistin maye? Ez dikarim we yeko yeko rakim û lêpîrsîn bikim. Ev zor nî e. Ez dikarim nîşan bidim ku ka hun çiqas niqoyê çewtî, kirêti û bêşermiyê bûne.

Ez hêza xwe ji ku derê werdigirim? Bala xwe bidîne: Weke kesekî di derketina min de ne çekek, ne jî pere hebû. Ger bal bê dayîn, min bi asta nêzîkatiya xwe hêz qezenc kir: Hêza bandorkirina mirovan. Bi rastî jî qirûşek perê min û yek fişekê jî tunebû, deyndar bûm. Yek ferdekî malbatê ku karibe min bigire nebû. Lê tevi vê dîsa jî ger ku ez bûme yekî pir bandorkar, sedemên vê lêkolîn bikin. Hun nikarin bibêjin, “te wiha kir, te wisa kir, te me ango dijmin xapand!” Na, weke ku em bi dijminekî herî zêde nayê xapandin re rû bi rû ne, bi kesên weke we yê herî

nayên xapandin re rû bi rû ne. Hun pir materyalîst in, heke berjewendiyên we nebe, hun gavek jî navêjin. Di bingeh de bi we zêde viyan û romantîzm nîn e. Hun pir berjewenperest in. Hemin ji ber berjiwendiyên we dest didin, hun hinek gavan davêjin. Ya min hindêk cewaz e. Bi ya min filitandina eybê, bi zanistiyê re pêwendî avakirin, yanî hatina rastiyê û rev ji kirêtiyê hesteke pir bi sîstem e. Hun serê min jêkin, ez bi kirêtiyê re nikarim bijîm. Jin ango zilam ferq nake; her tişt hemin bi gor sînoren baweriyê wê pêgirê veqetandinê bèn kirin. Li kê, li çi çawa binêrim bila binêrim ango binirxînim bila binirxînim pîvanekî min jî ev e. Yanî nêzîkatîyeke zanistî ye. Ev tev tebî di binkeya kesayetiya me de, di vê bingehê de bandorbûnê pêk tînin.

Ji van tégînan re çiqas zelalî hatiya înanandin, çi qas mafên van hatiye dayîn û çiqas ber bi rastiyê ve hatiye birin? Vana li ser xwe bisepînin. Heke tu bi rastiyên siyasî, bi rastiyên rêkxistinê, bi rastiyên leşkerî bileyizî, pêwendiyên wan ji rasteqînan qut bikî, heya dawiyê bi kirêti, bêsinçî û bi nemerdî gelek tiştan pesend bikî, ji bilî şoreşgerekî wê her tişt ji te derkeve. Lê heke tu, xwe hindêk bi van pîvanan çêkî, wê demê wê tu bi ser bixîni. Wê demê tu zilamekî yeman î, azad î, nirxdar î; wê her kes te bipejirîne, ji te hez bike. Eşkere dibêjim: Zagona jiyane ev e.

Niha rewşa min çi ye? Hizir dikim ku hindêk eleqe ji min re dikare bê raberkirin. Hindêk şensê jiyîna min heye, hizir dikim ku daringî û arîşt ev hindêk wisa ye. Min digirine dên û balê; dijmin bi xwe jî min digire dên û balê. Dijmin jî êdî ji kuştin û dardakirinê zêdetir (ku dijmin e, dixwest wisa bike, lê hêza wî têr nekir, nake) dibêje, “dikare bije, mafê wan ê jiyîne heye.” Tê vê xalê. Ev tev girîng in. Heke ku hun bêtirîn dixwazin bibin qehreman, hun neçar in ku kesayetiya xwe di vê bingehê de pêgirê çareseriyê bikin û pêş bixin. Ev PKKî jî pir girîng e. Hun dizanin, tevgera PKKê, tevgera qehremanî ye. Di aliyê zanistî de jî ev wisa ye. Endamên wê hindêk layiqên qehremaniyê ne ango wê di şewaza gihîştina wê de bijî. Ev jî ew şewaz e ku em dixwazin bidin. Jixwe şewaza qehremaniyê hem di aliyê dîrokî, hem di aliyê civakî, hem jî di aliyê rasteqîna siyasî û leşkerî ya îroyîn de jênerên e. Qehreman nikare weke acucan bimîne, nikare ketûber şer bike. Her tişt we neçarê qehremanbûn û şerkirinê dikin. Ev jî zagonêk e. Ev, ne şewazekê ku min dahênan kiriye, şewaz û zagona gihîştina jiyana azad e.

Tebî ez xwe ji bo kêfa xwe wisa nadime girtin, tenê da ku bibe îşkence xwe li ser we naçespînim. Ango bi bûna artîstekî xwe bi we nadime pejirandin. Di bingeh de ez, bi gor zagonên mitlaq yê jiyane hewl didim ji bo amadekirinê. Hin zagonên jiyane hene û ev min, ji wisa bûyîne re neçar dikin. Hun li pey kîjan zagonan in û bi gor kîjan zagonan dijî. Yê we di rêjeyeke mezin de zagonên xirabî, kirêti û eybiyê ne. Şoreşgerek vana qet nikare bipejirîne. Di vê wateyê de hun neçar in ku şerê hundirê xwe ser bixînin.

## Zarokê Kurd yê li Awistralyayê jî dizane ku bi hêsanî nayê jiyandin

---

Niha gava ku ez vana di naveroka gelemperî de dibêjim, hin kes hê jî tên û hewl didin ku bi me waneya jiyane bidin. Jiyîna eybekî wisa bi çî kesî li pêşberî xwe napejirînim û di vê wateyê de her kes li dijberî min diperçiqe. Erê, yanî ez wê pir baş dizanim. Mafê wî/ê yê jiyînê hebûye! Naxêr, zimanê pakrewaniyên ku di xeta serokatiyê de pêk hatine ev e; rîya pakrewaniyan vebir e. Ev babeta ku hatî selimandin, bi hinek bîçimên xwe ve nayê jiyandin. Şêwaza me pakrewaniyê misoger dike, jênerêvîn dike. Serokatiya pakrewaniyê birêvebirin hêsan nîn e. Hun çiqas bi vê têgihîştine, ev jî bûyereke cuda ye. Birêvebirina serokatiya pakrewaniyê kesayetiyêke pir mezin dixwaze. Di welatekî mîna Kurdistanê de bêtî berjewendiyên xwe mirov dilopek jî xwîn narijînin. Ji hewqas cangoriyên mezin re serok kesayetiyêke pir mezin pêwîst e. Heke ev tev bi mafên xwê bê têgihîştin, li pêşiya xurtbûna we tu asteng namînin.

Çawa ku min got, di nava partiyê de pîrsgirêkên wisa nayên têgihîştin dertên ku pîr mixabin e; pîr heyfa min tê li gotinên mîna, “nayê leşkertiye, nayê rêkxistinê!” Ev, li hember partiyêke mezin û tevgera qehremaniyê çawa dikare bê pêşxistin? Tê wê wateyê ku me tiştek nedaye; tê wê wateyê ku alîkarên me, yê partiyê di nava xefleteke nayê bawerkirin û sextekariyê de ne. Nexwe xeta pakrewaniyê pîr şênber e. Serokatiya pakrewaniyê, serokatiya jiyane ye. Di jiyînê de ka hun çawa ne li rastê ye. Niha li pêşberî me wisa sekinandin ma gengaz e? Niha herî li ba gel binêrin: Tu kes rêzdariyêke mezin nîşan nede, pêşmendiyêke mezin negire, ma dikare li pêşberî me bisekine? Min îro nameyekî piçûk xwend, esas min dixwest bînim virê. Namê ji zarokê malbatekê tê. Ji bo min bi gora xwe şêwazekî hîtabê pêş xistine. Ta ji Awistralyayê tê û min pîr watedar dît. Bi çemkeke rêzdarî û hezkirina xweşik yeke yek paragraf nivîsîne. Ez bawer im ku, yê hatî nivîsandin hestên wan ên puxteyî ne. Xwerû, jidiltî û rastî ya di dilê wan de, belkî jî di partiyê herî mezin de nîn e. Yanî dibe ku gotinên bi pesin ve tijî rêz bikin, lê ev xwerûtiya puxteyî û durustî nîn e. Ev pîr girîng e. Ji ber ku baş hatiye naskirin. Ji bo zarokên ku hê nehatine panzdeh saliya xwe jiyane çî wateyê diderbirîne, bi rastî û balkêşiyêke nayê bawerkirin hatiye nixandin. Çawa ku min got, ku bi hêsanî nayê jiyandin zarokê ta li quncê Awistralyayê jî dikare baş têbigihêje.

Wê tu serleşkerê gerîla bî, berpirsiyarê sehayê bî, mirovan hewqas bidî revandin, li hawîrdorê xwe hewqas zorê bikî. Wisa nabe! Ev bêberpirsiyarî ye, kirêti ye. Yê ku wisa di vî bîçimî de, xwe li ser me diçespînin xafil û nemerd in!

Ji nav re hun çî dibêjin bibêjin. Rasteqîniya me ku hewqas şênber e, tu di nava partiyê de çawa ku pir tê gotin bi wê şewazê ne dikarî bijî, ne jî dikarî destûr bidî. Çawa ku min got, ev jî bi me nîşan dide ka PKK çawa hilkeftina jiyana civakî daye çêkirin. Dertê rastê ku ji bûyera hezkirina mezin û rêzdariya mezin re rê daye vekirin. Çima emê vê averê bikin? Emê çima vê xirab bikin? Wê demê hunê bibin gelac û averêker. Em bi vê re ditêkoşin. Ji ber ku nayê pejirandin.

Xala ku em dikevin zorê virê de ye: çespandinên wisa bi heter çima? Em li hember dijminê hundirê xwe naxwazin tevgerake felişandina tund berdeyam bikin! Tebî ev, nayê wateya “di nava partiyê de çawa ku dixwazim karim bimînim, dikarim biqelişnim!” berevajî rêkxistin beriya her tiştî helwesta kesayetiyê wisa napejirîne. Yanî tê hesibandin ku nîn e. Ger tu dikarî bibêjî, “ez wisa jî dikarim bijîm!” Bi rastî jî tu, xirabiya herî mezin li xwe dikî. Yanî tu ji xwe re rewşeke ji mirinê xirabtir layiqê xwe dibînî. Tu di bingehe de wê mirina herî xirabtirîn a xafilan heq dikî. Tu tewanekî ku nayê bexşandin dikî, bênamûsiyêke pir mezin diçespînî. Tu bêsincekî mezin î, xewreşekî mezin î, xafil î, tu serseriyekî mezin î. Bi ya min takekesê wê dikarin li ser her tiştî biçespînin, lê nikarin biçespînin rêkxistinê. Va, şûngeha te ev e. Tu, wijdana rêkxistinê, mezinahiya tevgera qehremantiyê xirab bi kar tînin. Tebî ka cezayê wê çî ye, hema tu bi xwe birame. Va, ew rewşa kesayetiyê bi nexweşî, bi tu cureyî nehata zagon û rêpîvanên rêkxistinê û ew bi serhatinên ku tê zanîn... Ev di wateyekê de helwest, tevgerî û çemkên ku pêwîst e neyê hiş, pêş dikevin.

Ev hemû weke rasteqîna tevahî PKKê di derbarê ka çawa nêzîkê mijara jiyana civakî dibe (em dikarin ji vê re huner, çand û biçimên cûrbecûr ên hiquqê jî lêk bikin) bi ya min gelek net dike. Yanî ji cîhana we ya arîşî re, ji rewşa sinc û hestên we re ka pêwîst e çawa sîtavk çêbibe derdixê rastê. Ji têkiliyên navbera rêhevalan re jî, wê çawa nêzîkbûnê çêbe nîşan dide. Têkiliya pergaleke mezin, têkiliya rêzdariyêke mezin, têkiliya dilekî mezin... Pir zelal e, wekî din encamek jê nayê derxistin. Bi armancê ve çiqas girêdayî ye? Wê berê xwe bide kîjan dijminê û li ser kîjan bahaneyê rê wergire, ku hewqas eşkere ye, di nava hevalan de hev û dî nekişandin, gijgijîn, vala derxistin, perçiqandin û revandin weke peyvan jî nikarin bînin hişên mirov. Ev tewanekî mezin e. Dîsa ji van wêdetir, nehata jiyana şoreşgerî û taktîkê weke tune bihesibînin. Yekî wisa hatiye xapandin, dikare weke encamekî wê be ango dikare bê gotinê hê xwe ji bandora sîxurkerkirina pergaleke nedaye filitandin. Vana bi lezginê derbas bikin. Ger tu bibêjî, “ezê vana bi ziravkirinê berdeyam bikim, biçespînim” wê demê ya tu sîxureki baş î, ya jî pir serserî yî. Wekî din jî gengaz nîn e.

**Ku tu li hember hest û kevneşopiyan bin ketî  
wê tu her tiştî wenda bikî**

---

Pir baş dizanim ku, çalakiya me nasnama netew û azadiya gelê me tîne. Ev hindekî dîtir ber bi jiyana civakî ya neşidandî ve dibe ango di her qonaxî de, me bi şewazekê nêzîk dike. Zimanê civakî yê qonaxa niha çi ye? Mînak beriya niha jî min got; min li ser girêdana hevaltî, rêhevaltî pir nirxandinan çêkir. Heta bi zû de ji bo peydakirina hevalekî çawa bi dizî ketim nava karûbarekî û heya roja îroyîn vê rêxistinîyê çawa pêş xistim, min vegot. Ji bo jinê jî gotibûm. Bi xort û keçeke ku eleqeya min dikişand re hewl dam ku têkilî ava bikim. Di nirxandinên din de nav derbas bû. Yanî di zaroktiyê de tu çi dikî? Dileyizî, hevaltî dikî; eleqeya min pir şênber e. Di nirxandina xwe de jî diyar kirim. Piştî ku ew jin (niha yeka pîr e) bû bûk jî, xwesteka min a pê re lîstik leyiztinê girîng e. Tê wê wateyê ku di aliyê pêşxistina asta têkiliyê de hevgrît me.

Yekî ku di zû de vê wisa girtibe dest, gihîştîye kîjan astê? Ji ber ku têkiliyên we jî hene, dibêjim. Di nava PKKê de, di derbarê vê de vac çi ye, pêşketina têkiliyê çawa ye; êdî dema dîtina vê ye. Di Kurdistanê de wateya bi nakokiyên tê dayîn û çîroka jinê bi dest girtinê pir berfireh e. Ger tu têkiliyê wisa takekesî nekî, gelemperîkirin jênerevîn e. Hun heya ku asta gelemperî nedahûrînin, hun nikarin asta takekesî çareser bikin! Têkiliyên min bi dayika min re jî hebûn. Têkiliya min çi bû? Wê bextewariya dayikekê li ser min diçespond, min jî hiqûqa zaroktiyê diçespond. Ew dibêje, “zarokek bi gor dayika xwe wisa dibel!” Ez jî dibêjim, “dayikek bi gor zarokê xwe neçar e wisa bel!” Îdfayên min pir xurt û rasteqînî bûn. Di wan mercan de min digot, “li pêşberî zarokekî pir zor e ku hun bibêjin ez dayikek im!” Ji bo hesibandina paşeroja zarokekî, di aliyê wî hindek gihandina mafê jiyandî de tiştekî ku hun karibin bidin nîn e. Divê çi bê kirin? Mînaka varik tam di wê qasê de, bi çemka zarokekî bêberpirsiyar nîşan dabûm. Mafê we yê ji zarok tiştan xwestinê jî nîn e. Çawa mezin bibe wisa, bi çi cure çêke wisa çêdike. Di temenên piçûk de bersîv ev e. Ev jî têkilî û nakokiyekê anîna ziman e.

Piştî me qala asta têkiliyekê ku di destpêka rêxistina me de me dabû pêşxistin kir. Hun ji vê re dibêjin têkiliyeke pir balkêş. Ji balkêşiyê wêdetir dişibe çî, tê wateya çî, dibe çî encamê; ev hatine vegotin. Çî biçim têkiliyeke jin-zilam e? Rastîrîn ji ber ku tam têkiliyek: Erjeng siyasî, erjeng netewî, erjeng civakî, erjeng rêxistinî, erjeng çalakî û erjeng sincî ye. Bi rastî jî di destpêkê de qet wisa nedihate ramandin. Lê ji bo berevajî neketina rasteqînîyê, li hember rasteqînîyê rêzdarî neyê wendakirin, bi hêsanî pêwendiyan bi rastînan re, ji qutkirinê re fersend nadim. Va, rewşa hestan e, jixwe ku hun bikevin nava vê tekiliyê hunê biçin. Bila nebe weke pesinandinê, lê niha jî yekî ku xwe ji vê filitandîye, weke tenê xwe dibînim. Ji virê me ber bi çareseriyê ve rê wergirt. Piştî me di vê tekiliyê de dewletperestî, her cure feodalî, her cure xasûkiya burjuvazî û her cure ketîbûn dît; velhasil bi mirovatîyê têkildar pir hindik tişt derketin ji vê tekiliyê.

Rewşa mirinê, nejiyînê derket rastê. Ger me ji serî de vana hesibandibana, bi misogerî emê ji vê erjeng reviyabana.

Min têkiliya dayikê jî girt dest. Ez hindek pê mijul bûm. Tebî hema me dev jê berda. Ew li wirê çû, ez li virê wisa jiyam. Ew jî, di bingeh de têkoşîneke lezgîn a asta têkilî û nakokiyên bû. Piştî mêtîngeran gotin, “te çima wî zarokî li ber çoka xwe mezin nekir?” Ewê jî gotibû, “ma qey min nedixwest li ber çoka min bisekine!” Li ber çoka wê mayîna min çi ye? Ev, zincirkirina min bû. Mêtîngerî jî vê dixwest. Ew dayikek e û ji ber paşdemayîna xwe di şûngeheke zorê de bû. Li pêşberî zarokên xwe nikaribû peywirên xwe bîne cî. Esas ne ku neanî cî, ji bo parastina zarokên xwe şervantiyeke mezin nîşan da. Divê mirov mafê wê bidê.

Ez di derbasbûnê de destnîşan bikim: Di Kurdistanê de dayik ji bo zarokên xwe mezin şer dikan. Mafên tevahî dayikan dayîne, em wisa girîng dibînin. Lê min şervantiya wê jî dît. Herî zêde min li hemberî çi radikir? Dibe ku bi gora xwe li hemberî hin dijminên xwe. Em nikarin bibêjin qet feyda wê nebû. Belkî jî ezê bibûma stû tewandiyekî xirab. Ya herî hindik, “kê şimaqek li te xist, tu jî hemin tola xwe rake!” bi teşeyekê çemka seretayî be jî, da ku min di vî sînore de bide girtin hendazetiyeke mezin nîşan da. Bi gora xwe têgîna wê ya dijmin hebû. Her çende ku naveroka wê têgîne nepejûrînim jî, tu nikarî têgînekî dijmin paşçav bikî û li hember dijmin jî wê tu wisa bibî şerker. Ev şopandin piştî di zarok de dikare bibe bandordar. Yanî parastina wî heye, xwe li ser piyan hiştin heye. Her çende ku teşeyê têkoşîneke pir paşmayî be jî, heya dawiyê radestnebûnê berdewamkirina wî, dikare di jiyane de bibe bandordar. Ev tiştêkî cuda ye, vekirina vê zêde pêwîst nake.

Di destpêkê de, me got bila jin jî bikevin nava xebatê. Têkilî jî hebin, hest jî hebin. Jixwe têkiliyên wisa bi her kesî re hene; me got bila di nava me de jî hebin. Lê tiştêkî ku bi her kesî peyda nabe xwe nîşan da: Bi rastînan re pêwendiyên xwe wendane kirin û di vê mijarê de hesasiyete ji dest bernedan. Hest in, azwerî ne, kevneşopî ne, pêşbiniyên civakê ne, bêtirûşiyên mercan in; li hember vana divê tu bin nekevî. Tam jî di virê de tiştêkî hun tev lê bieleqîn, li hember wê ez pêwîstiya derbasbûna berxwedanê dibînim. Careka din berxwedan. Me çiroka berxwedanê cardin ji we re vegot. Di biçimê têkiliyên min avakirî de nexwestim vê wisa pêş bixim. Berevajî, heya dawiyê ji bo qezenckirina mirovekî, ji bo birêvebirina mirovekî hewldana ku min pêşan kiriye, hizir nakim ku yekî din pêşan bike û tebatê nîşan bide. Lê me bûyîna hêza têkoşînê jî zanî.

Di vê xalê de ji bo xwe encama herî girîng ku hun derxînin û fêr bibin ev e: Li wirê zagona qedanê heye. Pêwendiya vê bi dewletê re çiqas bi zanebûn e, çiqas jixweber e, hewqas girîng nîn e. Yê li pêberî we, ji dijmin re bi zanebûn an bêzanebûn xizmet dike, ev jî hewqas girîng nîn e. Ew bi xwe temsîlkarekê çînekê ye; çi dibe bila bibe, pirsgerêka têkiliyan e. Di têkiliya zilam û jinekê de, siyasî, rêxistinî û heta leşkerrî...Di hemû babetên ku jiyane eleqedar dikan de pêwîst e

ku pîvanek hebe. We vê pîvanê peyda kir an nekir? Aliyê ku min eleqedar dike, ev e. Nexwe hun çiqas evînê dijîn bijîn, zayendîtiya we çiqas pêş dikeve bila pêş bikeve, me eleqedar nake. Yê ku me eleqedar dike hindek pîvan in. Hindek pîvanên ku têkiliyê darîçav dikin, hezkirinê, evînê, zewacê û her tiştî darîçav dikin, pîvanên xwe yên nayê tebatkirin hene. Cardin em nav lê dikin, ev zagon in. Ev zagoneke rêkxistinê, zagona şer e.

## **Rast zagona zayendîti û têkiliya zayendiyê heye**

---

Hun nikarin bibêjin ku hun ji min zêdetir evîndar û dildar in. Me, jixwe di jiyane de azweriya herfî mezin selimandiye. Di şer de me jiyane derxistiye rastê, ji bo jiyînê jî şer! Di têkiliya jinê de jî wisa. Pîvanên we, ya tam radestbûn ya jî baş şikênandin, rijandin û qedandin e. Di virê hem naverok hem jî armanca gihîştina wê cewaz e. Di navbera yê min û yê we de qasî çiyayan cewazî heye. Va, têkiliya jinê, dîsa têkiliya jin-zilam di gelemperî de weke polîtîkayekê, em hê jî bi rê ve dibin; hem ava dikin hem jî bi rê ve dibin û pêş dixin. Lê bila bal bê dayîn, em hê jî di nava hewldaneke mezin de ne. Çima? Ger bi we bimîne, ku we zilamek an jî keçekê peyda kir, wê her tişt biqede. Di nava aliyekî teng de evîna hêsan, hesta hêsan, nizanîm çi yê hêsan! Lê ez ne azweriya hêsan radibîhîsim, ne jî dikarim bi hêsanî hez bikim. Ne wisa dikarim bi hêsanî bijîm, ne jî wiha dikarim bi hêsanî bijîm. Çima? Ez hizir dikim ku yek jî hun virê fêhm bikin, wê zêdetir şênber be. Ji ber ku weke takekes, mîna tûpekî xweperest bimînim, bi rehetî dikarim xwe çareser bikim. Lê weke milîtanekî, de îcar weke serok milîtanekî nikarim xwe bi hêsanî çareser bikim.

Jixwe şerê mezin çî bû? Zarokî yekem xwe davêje ber çokên dayika xwe, zarokê keç jî gotina diya xwe nake dudo. Ku te got xort divê wisa be, jin jî divê wisa be. Ku me vana wisa bipejiranda, bi rastî jî emê wê demê qediyabana. Ku me xwe di asta têkiliyê de nedahûrandiba, bi rastî jî me wenda kiribû. Ji me rêkxistineke weke PKK, îcar asta şerekî wek yê îroyîn nedihate payîn. Em, têkiliya di navbera hest û şer de, têkiliya di navbera jin-zilam û şer de ji we re zilal dikin. Ez di giştî de li jinê naxim, yanî ne tund im. Dixwaze bila dijmin be, bila ne dijmin be, ev hest zêde bi min re tune. Lê têkoşîneke pir girîng hatiye dayîn û hê jî tê dayîn. Ez hizir dikim ku ev heval tev di hundirê partyê de her ku diçûn ji xwe dipirsiyan û digotin, “ev çi teşe jiyaneke e, diçe ku derê ve, wê çi bi serê me were?” Belkî hem dibizdîn, hem dipelikîn, hem hêvîdar dibin, hem jî balkêş dibînin. Lê misoger e ku ev şerek e û neçar e bibe jî. Yanî eleqedar im. Min got, dijminê min be jî, tu caran bi hewayekî perçiqandinê nêzîkê jinê nabim. Lê em têkoşîneke wisa diçespînin ku, ev, ne têkoşîneke wisa ye ku jin bi hêsanî

karibe rabike. Belkî jî di dîrokê de cara yekem zayenda jinê bi têkoşîneke wisa nasdar dibe û bi ya min neçar e ku nasdar bibe. Em jinê ango têkiliya jin-zilam diafirînin. Mirov dema ku li têkiliya we dinêre, tene ev dikare were hişên mirov. Li ba we jinek ango mêrek hebe nebêjin, “bi ya min ev kêrek e!” her duyan bigirin pêşberê xwe û li binêrin: Hun nikarin rêzdarî û pîvanan peyda bikin, hunê ji têkiliyan re pir hindik wate bidin.

Di giştî de pevretiyên red nakim, ev ne gengaz e. Lê em civakbûyîna dijîn. Yanî emê vê zagonê nepejirînin: Ajoya birçîtiyê mirov ber bi êrîşa ajalî ve dibe, her wiha çavên me çî bibînin bi ajalî em êrîş dikin; ajoya zayendîtî dîsa ajoyekî ajalî ye, gava ku em hev dibînin, hema derbasî êrîşê dibin! Naxêr, emê cî nedin vê zagona ajaliyê. Mezin zagonekî din ê şoreşa me jî ev e. Weke ku zagona rast qezenckirina nan heye, riya rast qezenckirina têkiliya di navbera her du zayendan de jî heye. Emê zagonekî peyda bikin û bi gor pêwîstekên zagonê bijîn. Ku te zagona ajaltiyê bi kar anî, hingê wê tu bibî pêgirê kiriyara ku li ajalan tê sepandin. Ger tu dixwazî bîni asta têkiliya mirov, wê tu pêwîstekên wê bi cî bîni. Ez eşkere bibêjim: Di nava refên PKKê de, em zagona ajaltiyê nas nakim. Bi ya min xweperestî jî cureyek ajalî ye. Yekî/a ku xwe negihandiye asta netew, asta azadiya civakî, ji xwe re wê armanc negirtiye, wê bi amrazan (yanî bi rêkxistin û şer) tevahîti nekiriye, bi ya min berevajî ye. Bi gora wê/î her çiqas bêtirûş dibe bila bibe, zayendîtî jî tê de, emê şensê karanîna nedin têkiliya wî/ê. Dibe ku yên bibêjin, “emê jî hev û di bigirin û birevin, hev û di xirab bi kar bînin” derkevin. Bila bicerbînin, dibe, ev jî şerek e. Wê tu şerê ajaliyê bidî, ezê jî şerê mirovatiyê bidim. Ya bi gor pîvanên hezkirin û rêzdariya me bikevî riya jiyane, ya jî bi awayekî din şer bidî. Bi gor pîvana hezkirin û rêzdariya me ketina riya jiyane, di heman demê de wê bibe destkefteka welatekî mezin, wê bibe şerekî mezin. Min got, leşkertî zagonek e.

Nexwe, her kes ne tenê hindik, wê pir bibe leşker, bibe siyasî û bibe rêkxistinî. Jê pê ve têkiliya civakî jî bixwaze, wê demê ji têkiliya hezkirinê re dikare hindik cî bê dayîn. Têkiliyeke ku di bin xizmeta şer û rêkxistinê de ye. Tu nikarî bibêji, “dilê min dixwaze, lê nikarim bi ser xînim!” Na, ajo û dilê te çiqas dixwaze, wê mejiyê te jî têra şer û rêkxistinê bike. Tu nikarî bibêji, “ez ketim xafletê, li ser xwe serdest nebûm!” Ev tev axaftinên vala ne. Min di vê mijarê de jî teşe danîbû: Ger şer bikî wê tu xweşik bibî, ger xweşik bibî wê ji te bê hezkirin! Ev aliyekî xwe yê neyê fêmkirin nîn e. Ev formûlek e. Ji bo şerkirinê jî wê tu bibî fêrkar û rêkxistinkarekî baş, bibî milîtanekî baş, bibî kolektîf, bibî şopandinerekî baş û rêzdariya gel qezenc bikî. hingê wê tu mafê hezkirinê qezenc bikî. Hingê ji hezkirina te re dikare bê gotin erê. Ger ev nebe, jiyîna te ne gengaz e. Ger jin ango merê te hebe, wê ew jî, ji destê te bê derxistin. Binêrin, eşkere dibêjim, wê li stêrkan çavan neyê nihêrtin û ji destê wê wergirtin. Ev zagonek e, yê vê dahênan dîke ne ez im. Bi rastî jî min wisa kir. Tebî ger ku hun biramin, di bingehe

çalakiya me de, bi hezaran keçên ciwan ji destê qaşo nîşanî, mêr û bavên wan derxistin heye. Me bi hezaran xortan jî, ji destê jin ango keçan rizgar kir. Ez hizir dikim ku hun nû û nû vî aliyê çalakiya me dibînin. Em hewl didin da ku we bikişînin têtikiliyeke rast, têtikiliya civakî ya rast û milîtantiya rast. Hun zehmetiyê dikişînin, lê zehmetiya we li beranberî zehmetiya min di hezarî de yek e. Yanî ez tenê weke takekesekî nejiyam, min asta netew jî di vê bingehê de pêgirê çareseriyê kir. Zehmet kişandina we wisa zêde nîn e, heta hun di xeta hatî dahûrandin de rê werdigirin. Me, xwe çawa çareser kir? Hê hun ciwan in, ka hindekî fedakartî bikin.

Ez hizir dikim ku di berê de jî navdar e, zarok heya ku xwe selimînî nav li wan danaynin, wan nadin zewicandin. Di dîrokê de wisa gelek mînak hene, hemin divê bi çalakiyeke qehremanî xwe biselimîne. Kevneşopiyekî kevin e, divê mirov li hemberê rêzdar be. Niha di nava me de ev pirsgirêkeke jiyânî ye. Jixwe ku têtikilî hewqas niqokar bin, bela bi ser ve tînin bin, yê herî mezinê we jî, bêyî ku xisar bide şer û rêxistinê, dikare çiqas têtikiliya hest û evînê pêş bixe? Yê ku bi xwe bawer e, bila tilîka xwe rake, em biçepikînin. Eyb nîn e, yeka wisa hebe, bila derkeve pêş, em jê re bibêjin bravo! Zilam hewqas şervan û têtikoşevanê mezin e; jixwe jê re her kes rêzdarî nîşan dide, her kes qîmet didê. Jixwe di tevahî têtikiliyên xwe de mezin e. Na, di ciyê vê de wê bibe revandok, wê li hember her cure rêpîvana rêxistinê û her cure pîroziyê berevajî bikeve! Çi ye, wê xweperestiya xwe bije! Weke leşkerekî jiyîn nîn e. Xwe nexapînin.

## **Afirandina jin û zilamekî bi qezenckirina şer gengaz e**

---

Ez hizir dikim ku di derbarê têtikiliyên jin-zilam de nêzîkatiyên ku me di asta netew de aniye pir girîng in. Yenî ev demek e ez, têtikiliya Kurd vedibêjim. Di astake pir paşdemayî, nayê pejirandin û nayê jiyandin de bêrêxistin e, kirêt e, wenda ye û bi her cure tunebûnê re rûbirû ye. Em ji wirê derdixin. Dîqat bikin, wateyeke şer jî, we gihandina çemka têtikilî, xweşiktî û hezkirina rastî ye. Niha binêrin, weke xort û keçên ciwan hun dikarin eleqeyekî nîşan bidin. Belkî ji we re û ji van keçên ciwan re eleqeyek bê nîşan dan. Çima? Ji ber ku hindek pozisyonên ku dikare jê bê hezkirin werdigirin; tam na, hindek werdigirin. Kesayetiyên wan hê dûrê, ji tam gihîştina hindek pozîsyanan. Hindek ango bi hinek aliyan ve hun dikarin hez bikin. Vê gavê min bi xwe jî, xwe di asta tam dikare hez bike ango tam dikare bê hezkirin de negirtiye, mijuliyê didomînim. Belkî li we ecêb were, lê hê jî hewl didim ku xwe bidim ecibandin. Ger tu bi tevahî gel, di vê navberê de hemû jinan û ji taybetmendiya xweser a jinê re xwe nedî pejirandin, tu çawa

dikarî bibêji ku ez zilamekî saxlem im? Ger tu vê nekî, bi her cure taybetmendiyên xwe yê serdestiya zilam, bi wan pîsîtiyên ku di dirêjahiya dîroka civaka çînayetî hatî pêşxistin ve xwe bidî çespendin, wê gavê tu nikarî qala têkiliya azad bikî. Ji ber ku asta te ya têkiliya azad nîn e, wê tu asta serdest biçespînî. Asta serdest jî koletiyê, lihevhatinê û radestbûnê pêş dixê; ev jî jixwe artêşa me ber bi felîşandinê ve wê bibe û qehremaniya şervantiyê jî bikuje.

Ev dertê rastê: Afirandina jin ango zilamekî, dikare bê pejirandin, di bingeh de, ji bo qezenckirina şer şert e. Yanî pîvanên têkiliya her du zayendan di aliyê fîzîkî, giyanî, ramanî, dîsa rêkxistinî û çalakî de amadekirin, di bingeh de tê wateya vekirina jiyânê. Tebî bi awayekî din kes we napejirîne. Min ji bo vê yekê got, di nava me de têkilî avakirin pir zor e. Ne keçeke ciwan têgihîştina xwe bi zilam, ne jî zilam têgihîştina xwe bi keçekê gengaz e. Ev pir zor e, pir zor tê gihîştin. Ezmûneya min heye. Min jî nedixwest bigihîjim têkiliyên hêsanî, hem jî pir mebest qeşqê bûm, hê jî mebest qeşqê im, xwerû me û di bingeh de weke zarokekî me. Lê ez vî şerî mezin didim. Ji ber ku min pêwendiyên xwe bi rastînan ve qut nekiriye, çawa ku her dibêjim, tevî ku bêrî û hewesên min ên zarokî hene, ev di aliyekî de ji ber ku bi rastînan ve pêwendiyên xwe hene, bi xwe re mijul dibim. Hunê bibêjin, “ma çima wisa dibe, ma li me ne heyf e?” Ev şewazeke jiyana azad e, di jiyana azad de pîvana hezkirin, xweşiktî û dikare bê pejirandinê. Di halê din de, wê çi bibe? Di halê din de emê bihêlin ku di asta netew de meydan bê vekirin ji her cure kirêtî û koletiyê re. Wê di bingehê stû tewandin û lihevhatinê de nêzîkatiyên çewt pêş bikevin. Azadî pêş nakeve, weke encam artêş pêş nakeve û şer pêş nakeve. Ya ku pêş bikeve wê viyana dijmin û nayê jiyîn be.

Ma ez dîn im; ma mirovekî qasî min pêgirê jiyânê heye? Di temenê xwe yê piçûk de, ka çawa nêzîkê pirsgerêkê bûmê, min nîşan da. Hê jî li ser çareserîya jiyânê, çareserîya jinê û nêzîkatiya zilam hewqas tiştan dibêjim. Dêrde min ne îşkence bi we dana kişandin e. Ez hizir dikim ku hun dizanin, ger ku hin serserî fersend bibînin ka wê bixwazin çi pêş bixin. Erê, zagonên zewacê! Ma weke ku keç û xortên di mal de mane, temenê we nabore? Rast e, temenê we dibore. Ev jî zagonêk e. Ger tu naxwazî temenê te bibore, mirina netewa xwe asteng bike, bikeve pêşîya jiyana nayê tebatkîrin ango nayê jiyandina gelê xwe. Tu egîd î ne? Zilamê ku dibê, ez zilam im, xwe egîd dihesibîne. Min beriya niha got, di civatên seretayî de jî, ji bo zewicandinê lîxistina cinawirekî mezin pêwîst e. Ji bo ku navê xwe bigire jî, ev pêwîst e. Jixwe ev navên qehremaniyê, tev ji vê şewazê mane. Tu yekî tirsonek î, bi xwe ji jînikokekê xirabtir î; ma tu bizewicî çi dibe, nezewicî çi dibe! Jixwe bi gora min zilamtiya zilamên me gumanbar in, hema tev pîrejîn, di wateya siyasî û civakî de pir gumanbar in. Di aliyê zayendîtiyê de pir zilam in! Wey xwedê, di pîvaneke tirsna de zilamtiyeke bi eyb!

Min li ciyekî din vekiribû, li vir venekim; jinan tiştêkî ferq kirine, ketîbûna zayendîtî ya zilam. Hun dizanîn zayendîtî ango ajoya zayendiyê, hînbûyîna ku bi

hêsanî pêş lê nayê girtin e. Jixwe nav li ser e, ajoyek e; weke ajoya birçîtiyê, ew jî ajoyek e. Weke ajoya tirsê ajoyek e. Jin dinêre, zilamê serdest nikare bêyî vê bije. Bi gora vê helwest pêş dixê. Di pîvanên Kurdistanê de divê hindekî dî cewazî bê xistinê. Di wateya civakî, siyasî û yekser leşkerî de zilam ji zilamtiyê derketiye, ji ber ku dijmin tim di bingehê jinantîkirinê de nêzîk bûye, ketiye rewşeke ji jinê xirabtirîn. Di bingeh de jinantî ne têgineke zayendî ye. Ger di nava dîrokê de bê destgirtin wê bê dîtin ku, di warê civakî, siyasî û bi taybetî leşkerî de, di rêjeya tê qutkirin de jin dibe jinikok û rewşa ku tê gotin jinantiya bindest derdikeve rastê. Yanî di bingeh de jinantî, berhemekî pêşketina siyasî û civakî ye. Niha em li zilamê me binêrin; ji ber ku zilamê Kurd ji pêşketinên civakî, siyasî û leşkerî hatiye qutkirin, xulam û hevkarmandê yên din e. Di bingeh de jin jî, hevkarmandê zilam e. Lê zilam, hevkarmandê û ji jinê bêtîr girêdayî yê netewê serdest û çîna serdest e.

Niha em vê pênaseyê baş fêm bikin: Zilamê me çîma ne zilamekî saxlem e, tê fêmkirin. Erê, ku tu hewqas zilamekî rajêr bî, wê tu zilamiya xwe tenê bi çî bidî selimandin? Bi zayendîtiya bêteşe. Ez hizir dikim ku zayendîtî, di jinê de pir bi zû ji bûyîna hestekê derdikeve. Her wekî zayendîtiyê kuştine, divê ew jî hindek bê vegotin. Hizir dikim ku di vê teşeyê de xêvokî dibin û diçin. Di rêjeye mezin de zilam jî, weke zayendiyê ji bûyîna hêz dertê. Belkî jî hê nagihîje sî saliya xwe diqede. Piştî sî saliya xwe kal dibe. Binêrin, jixwe di nava me de jin, piştî sî saliya xwe ji jiyane qut dibe. Zilam jî wisa ye. Di destpêkê de bi taybetî weke ajoyekê, di xefika zayendîtiyê de xwe dane qedandin. Em bibêjin asta zayendîtiya nayê tebatkirin, wana bêyî ku nakokiyên rast bigirin dest, nixumandine. Ez ji ber vê yekê dibêjim, heya ku şewaza têkilîyên di nava me de neyê kuştin, yê pêşiyê mirin e. Ez pir ditirsiyam, mînak li hembêrê wê, ji ber ku min şerê xwe bi serkeftinî bi rê ve bir, niha ez hindek heme. Niha li rexmî vî jiyê xwe, hizir dikim ku weke zayendekî şûngeha min dikare bê pejirandin. Yanî weke zilamekî, ne di rewşeke ku ji kesî re bibim bar de me.

Lê gelek zilamên me yên herî dewlemend binêrin. Ez bawer im ku, jina wan hebe, bi misogerî eleqeyekê wan ê asayî jî tune, qet tune. Lê ji ber ku jin jî di wirê de hatiye qedandin, mitlaq hewce ye; ji ber diviyatiyên dargî û kevneşopiyên tiştên ku dizane didomîne. Bi misogerî tu pêwendîya xwe bi azadiyê tune. Îcar bi xweşikîtiyê, jiyaneke azad a ku dikare bê pejirandin û bi sînorên jiyane re tu eleqeya xwe tune. Dije û diçe. Va dema ku ev dijîn, miriyên li ser piya ne. Li hember jiyane bîrêzdariya mezin!

Esas ev çîrok pir dirêj e. Hun hê pêşxistina ramanan nizanin. Me hewl da ku em van babetan pir berfireh çaraser bikin. Vana li rewşa xwe anînê de hun xizan dimînin. Ev, bi gora we ramanên ku hema bî derbaskirin ango ramanên ku li ser rewşa we ya takekesî nayên lihevanînê ne. Hun nikarin vê xapandina mezin bijîn. Em zagonên jiyane eşkere dikin. Ev rast e: Şerê ku PKK bi rê ve dibe, di heman

demê de li hember kevneşopî û hewldanên dijmin ê ku bi van re pir ketiye nava hev, dixwaze îmha bike, biqedîne, ji bûyîna nijadekî derxîne, ji bûyîna civakekî xwedî nasnama azad derxîne, bîne rewşeke herî ketî û herî bêreh, belkî jî di sînorê ajalvaniyê de ber bi mêtîngeriye şerek e. Di vê wateyê de li hember zayendîtiyeke bêteşe û ew bi şêwaza malbata pir paşdemayî ku ber bi civakekî ve dibe ango civakbûyîn û têkiliya civakî ya nayê jiyandin, serhildanek e. Em li hember vê serî radikin. Her ku em vê red dikin, derbas dikin, hildiweşînin û her ku em ji rêxistinê re serkeftin didin qezenckirin, ji şer re serkeftin tê pêkanîn, hindek welat tê qezenckirin, hindek gel tê qezenckirin, hindek mirovatî tê qezenckirin û wê demê zayend jî tînan qezenckirin. Di vê bingehe de hev qezenckirina zayendan pir girîng e. Jixwe piştî van qezencana ku tu dikarî bibêjî têkilî, hest û zayendîtî divê hebin. Ji bona van şer tê dayîn.

## Keç û xortên me ji bo azadiya mezin in

---

Şoreşa me ya li Kurdistanê şoreşeke hezkirinê ye. Me vê vala negot. Şoreşa me ji bo azweriyên herî mezin e. Ev jixwe pir şênber e. Ma ku ev wisa neba, me hewqas mirovî û hewqas keçên ciwan dikaribû bikişanda? Ger azweriya mezin nebe, perosmendiyeye mezin û mezinahiya hestan nebe, ev ne gengaz e. Ji bo ku di PKKê de mirov vê mezinahiyê nebîne, divê mirov kor be. Şûna ku ev wisa bê dîtin, mirov nikare qala jiyandina xweperestiyê bike. Na, tu kes nikare vê mezinahiyê derveyî bike, yê ku ne layiqê vê mezinahiyê ye nikare nêzîkatî pêşan bike. Ev, berevajiyê xwezaya rasteqîna PKKê ye. Kes bila kesî nexapîne. Ji bo tu kesî têkiliyên erzan tune. Ji bo min jî wisa ye.

Ez vê bibêjim; ez ne miriyê jinê me. Berevajî jin pir hewcedarê me ye. Lê ji bo qezenckirina têkiliyekê, şer pêwîst dike, ked pêwîst dike. Ev keç beredayî eleqeyê nîşanê me nadin. Ew ji ber vê yekê eleqe nîşan didin: Em wana hindik zêde bi azadiyê re nasdar dikin, ji wan re azadiya axaftinê, azadiya rêxistinê ya ku di jiyana wan de nayê dîtin û jiyaneke ku eleqeyê dikişîne pêşkeş dikin; em vê jî destê yekem pêşkeş dikin. Pir şênber e, ev têkiliya xwe bi têkoşinekê ve heye. Nexwe ka em artêşeke şer û agir ê çawa ne, diyar e. Lê ew bi xwe jî baş dizanin ku, bixwazin hindek rûmet, şeref û kesayet bi dest bixin, pêwîst e ku li ba me rê wergirin. Vê yekê weke navê xwe dizanin, eleqeya wan jî, di vê bingehe de ye. Puxte ev e. Dibe ku hinekî din xafil bin, dibe ku hinekî din karên çewt kiribin, lê puxte ev e. Di bingehe tevlibûna jinê ya PKKê de ev heye. Ev zagon e, ev zagonê tevlibûna jinê ye.

Ev rêgez ango zagon pir girîng e. Ji ber ku vê şêwazê min bi xwe amade kiriye û hatiye asta zagonêkê. Jin, bi mirina xwe tevî vê tevgerê dibe û hewqas dayîna pakrewanan tê. Kes nikare bibêje, ji ber ku merê wê li wirê ye hat. Nikare bibêje, ji bo vê eşretê hat. Bi misogerî û bi teşeyekê perçiqîner sedemê tevîbûna jinê û xwe bi xwîne selimandinê, azweriya azadiyê ye. Dibe pêwîsteka wê ya jiyana bi rûmet û bi şeref. Ger tu bibî layiqê vê, hingê dikare wateya têkiliyên te hebe. Tu nikarî bêrêzdarî bikî. Tevîbûneke azad e. Tu nikarî bibêjî, “stû bidim tewandin, lewaz e, bi kar bînim!” ango “ji rê derxînim û bi kar bînim!” Wê gavê tu berevajiyê zagonê bikevî û ji ber ku tu berevajiyê zagonê ketî, wê tu bê cezakin. Di wirê de tevîbûneke azadiya mezin heye û divê tu bergîdanê bidî. Tu dizanî, tevîbûna azad di şer de ji mirov serkeftin dixwaze, wekhevî dixwaze, her cure asta rêxistinîyê dixwaze, jidiltiyê dixwaze; bi misogerî rizgarkirina welat û her cure şer bi serkeftin dayîn dixwaze. Ger tu bixwazî bikevî têkiliya azad, wê tu vana çêbikî. Ku tu vana çênêkî, nikarî nêzîk bibî. Ji têkiliyê re hêza te tune, tu dixînî, bi cureyek sîxur î, bêsinç î û bi dijmin re yî.

Ez xwe, weke yekî sermîyanê malbatê nabînim, lê ku em PKKê bişibînim malbatekê, em wê têxin şûna malbatekê, emê çima keçeka xwe bidin yekî bêsinç ango emê çima xortekî xwe yê baş bikin qurbanê keçeka serserî? Di her halî de emê jî, qasî malbatekî rûmeta me heye. Ma jixwe malbata me, bi rastî jî malbateke şerkar e. Rêgeza xwe heye, şerê xwe yê erjeng heye. Emê li hember pîvanên malbata xwe rêzdar bin. Tu kes nikare bibêje, “min xwepereştiya xwe wisa da axaftin”, “di hundirê min de azwerî, hest û ajoyên nayên zept û reptê, ger ku wisa fersend peyda bikin wê serî rakin, naverastê serûbin bikin!” Na, malbata me malbateke pir rişt e. Belkî weke yekî bêxêr, weke her malbatekê dikarî di çespanînan de peyda bibî, lê di nava me de qet! Tu karibî hez bikî, mezin hez bike. Xortên me yên herî egîd, keçên me jî, ji bona şerên mezin, jî bona azadiya mezin in; pêşengên wê yên zadegan û jiyana bi rûmet in. Ez jî tê de, mafê tu kesî tune ku vê berevajî bike. Ez, jixwe xizmeta vê ya mezin dikim. Pir baş dizanim, bi hezaran keçên ku ji hêla zilamekî me ve weke jinên pir erzan tê dîtîn, nêzîkbûna nayê bawerkin nîşan dame û bi xizmetê nêzîk bûme. Ma hun zilamên pir hişmend ango pir egîd û sergîran in, ez dîn im ango xizmetkarekî sihêl im? Ez di vê sehayê de şervantiya azadiyê diceribînim. Hun jî tiştên wisa pêşkeş bikin, xizmet bikin, bila têkiliya we pêş bikeve.

Ez, têkiliyên ku qezenc dikim bi hêsanî, bi nemerdî û ketîbûnî nadime bikaranîn. Ger tu zilam bî, zilamtiya xwe pêşî di warê siyasî, civakî û leşkerî de biselimîne! Dîsa tu keçeka ku hezkirinê û ji bandorên mezin re dixwaze rê bidî vekirin bî, pêşî di nava refên têkoşînê de ka tu çawa kasayetiyekekê bi rûmet, azad û xwedî nasnameya wekhev î, biselimîne! Çavkaniya hezkirinê ev e.

Niha nezanim, di asta têngîne de pirsgirêk pir balkêş in û pratîkê bibînin. Em çawa bijîn? Va, pratîk ev e; ev pratîka herî mezin e. Niha pevretiya we ya li virê

pratîka herî mezin e. Refbûniya di nava gerîla de pratîka herî mezin e. Hun hê çi dixwazin? Bi xistina hev, hev û dî girtin û revandin, hin têkiliyên hetikandinê nabin! Na, hezkirin wisa nabe, zayendîtî jî wisa nabe.

Em zayendîtîyê eyb nabînin, lê di bin teşeyên bêrûmet de wisa karanînê re tenê em dikarin bi tifikirinê bersîv bidin. Divê zayendîtî pîrozkar be, têkilî di radeya dawî de xwedî rêzdarî be. Tê gotin, “em van teşeyan peyda nakin!” Tu zilamekî herî ketî yê dijmin î, ne mirov î. Yên wisa, mafên xwe yên têkiliyê qet tune. Hun dizanin ku mafê zewicandina koleyan tune. Ji ber ku hun ji koleyan xirabtirîn di rewşekî de peyda dibin, ger hun rizgar nebin, mafê we yê zewacê nabe. Hun xwe azad dihesibînin. Ma KTê te azad kiriye? Tu ji vê bawer dikî? Ma ji koleyan xirabtir bi te nekiriye? Kole, mafên xwe yên avakirina têkiliya civakî nîn in. Kole, tenê ji hinekî din re xulamtiyê dikin. Jina kole jî, mêtê kole jî nabe. Jina kole tê kirîn, tê firotin, zilam jî di her karî de tê bikaranîn. Yanî ger ku em ji têoriya koletiyê re bersîveke rast bidin, a ku li mê tê çespendin, ji koletiyê wêdetir wateyek xwe hebe, wê demê ka têkiliya civakî çi ye, azadiya di têkiliya jin-zilam de çi ye, wê tu têbigihîjî. Di oxira azadiyê de şer bikî.

Ez nabêjim, ez her tiştî bi çare çar çêdikim. Lê ezmûneya min vê nîşan dide: Ji bo ji tiştêkî re maf bê qezenckirin, divê pêşî di oxira wê de têkoşîneke baş bê dayîn. Ez jî li pey têkiliya erzan geriyam û min peyda kir. Lê wê belayeke çawa bi serê min ve hatiba. Mînak artêş ji bo çi ye? Artêş ji bo lêxistina hezar cure dijminatîyê ye, ji bo gihîştina azadiyê ye; ji bo pevghîna we ya azad û wekhev e. Ger şewaza malbata we ya we xwedîkirinê bê dîqatkirin, çi tiştêkî ne ji bo tiştêkî din e. Her yek ji bo xiyaretê, ji bo rewşeke pir ketî ye. Ger hun bixwazin bibin yên hev, pêwendîya vê bi kedeke mezin û tevgera şer heye. Vê rêgezê hema di her carî de em xirab nekin, bi nemerdfî û durûtfî em peşk lê nexin. Rêgez rêgez e û divê pêwîstekên wê bi cî bîn. Ji bo ku hun hev û dî qezenc bikin, pêdivî bi şerekî mezin heye. Yanî ger em hezkirineke zadegan dixwazin, diviya ye ku ev wisa bê destgirtin.

Çawa ku min got, ne eyb e. Min ceriband, eleqeya min ji gelek keçan re hebû, pir hezkarên min hebûn. Tev jî hê di hişê min de ne û min tevan jî vekir. Hezkarên min, min kişandin ber bi ku derê ve? Ger ku gengaz be, ji bo me welatekî ku karibe jê bê hezkirin û civakeke karibe bi hev re bê jiyîn biafirîne. Wekî din encamekî ku tu ji hezkirinê derxîni tune. Tebî heke ku hezkarên we hebin û hun hezkirinê bizanibin... Ez, şiroveya hezkirinê wisa çêdikim. Ne tenê xweşiktiya jin ango zilam, dema li her xweşiktiyê dinêrim, encamê hema ji her yê xweşik derdixim, wê veguherandina welatekî, yanî welatekî qezenckirin bû. Piştê jî pîrsa emê çawa welat qezenc bikin kete rojevê. Ma mirov wisa bêrêxistinî dibe hêz? Bêyî artêş, bêhêz mirov dikare şer bide? Heke ku ev tev nebin, mirov dikare bigihîje xweşiktiyê? Ma tu mêtîngeran nabîni? Ew, te nagihînin tiştêkî herî piçûcîk. Ku bide, tenê ji bo xulamtiyê dide. Ê ev, xapandinek e.

Niha ez, van tevan çema dixwazim dubare bikim? Hun di têgihîştinê de pir rikoker in. Yanî kêmahiya têgihîştinê, li hember têgihîştinê rik heye. Bi taybetî jî, wê li ser jiyana xwe sepanînê de, hun pir zoriyê dikişînin. Hun, mezinahiya nav PKKê bi tu cureyan bi xwe nadin pejirandin. Hun, rasteqîna serokatîyê ka çi diderbirîne, di bingeh de li ser xwe nadine sepanîn. Şûna hêza sepanînê, hun xweperestîya xwe diçespînin. Di wirê de jî pevçûn dertê. Ji ber ku rêgez heye, di oxira wê de têkoşîneke mezin heye. Û tu jî milîtan î. Wê tu bi vê re nekevî nava pêvçûnê, wê tu nirx li ser zêde bikî. Ez vê jî bibêjim: Em naxwazin yek ji we jî destanan binivîse, lê tenê em dixwazin hun bibin şervanekî ku bi hêsanî nayê daqurtandin. Di hundirê sînorên dikare bê pejirandin de bibin şervanek. Ev jî ji bo me nirxekî mezin diderbirîne. Lê heke hun di vê xebatê de dixwazin bibin serok, zagon û rêpivanên wê hene. Ez asta netew didahûrînim, nikarim durûtîyê bikim. Hun belkî weke pêwîsteka ehab-çawîştî û herêmperestîyê ango di oxira xweperestîya xwe de, xwe têxin subjektîvîzmê, tengbûnê, seranseriyê û xapandinokiyê, lê ji bo min ev ne gengaz e. Emê dahûrînê di asta netew, heta gengaz be di asteke ku tevahî mirovatîyê eleqedar dike de bibin. Tebî hemû ol, felsefe û siyaseta ji bo mirovatîyê ne. Tenê ne ji bo welatekî, ji bo hemû zayendan in. Heke em sosyalîst bin, bi rastî jî ji bo wekhevî û azadiya herî pêşketî ne. Divê em, sepanîna vana bizanibin.

## **Ger azadî hêsan ba Ronahî û Bêrîvan xwe nedişewitandin**

---

Ecêb dimînim, çima hun me fêm nakin? Îca keçên ciwan ên wek we çima fêm nakin? Xwediyên wê berxwedana mezin rêhevalên Ronahî û Bêrîvan, bi taybetî jî rêhevala Ronahî, rêhevaleka ku bi me baş têgihîştîye. Jixwe me vê di rapora wê de jî dît. Di raporekî din de dibêje, “Ez, ji duyemîn civîna çapemeniyê ya di pêvajoya agirbesê de pir bandor bûm. Tevî ku hun hewqas derfet diafirînin, ji jinan û her cure pêşketinê re destek didin, di nava me de hê jî yeka di wê astê de tune. Halbûkî pir ked hatiye dayîn. Bi zanebûna xwe yên ku kesayetiyeke rast girtine zêde nîn in. Her ku ez partiyê nas dikim zêdetir pê ve tîm girêdan. Dema ku ez kesayet û bûyer, rasteqîna şer û qoxanê dinirxînim, yên tîm xwestin ku pêwîstekên girêdanê ne û carna jî hewl didim ku zêdetir bidim.” Çawa ku min got, şewaza wê vebir e, bi ya min pir girîng e. Divê hun jî hindek biramin. Riya jiyandina bîranîna wê, weke wê di gihîştina hêza têgihîştinê û xwedîbûna disîplîna jiyaneke saxlem de derbas dibe. Di nava we de hinek kes dibe ku bixwazin bibin layiqê wê. Bi taybetî pêvajoya jiyana xwe ya ku bi PKKê re bûye yek ka çawa girtiye dest û çawa xwe pêgirê veguherîne kiriye fêm bikin. Bi

taybetî ev di destnivîsên wê de hene. Li vana binêrin, fêr bibin û rêzdar bin. Ji ber ku ev nirxên mezin in. Ger azadî hêsanî ba, wana wê riyê nediceriband.

Rêhevala Ronahî di hevokeka xwe de dibêje, “*Serokatî giyan û can dide, a girîng vê derbaskirina jiyanê ye!*” vê yekê bi çalakiya xwe şewitandinê derbasî jiyanê dikin. Ev, bûyereke mezin e. Heke hun jî hindêk durust bin, wê wêrekî û fedakariya ku hun dibêjin ka çi ye, bibînin û fêm bikin. Her ku ev çalakî li ser navê me tê çêkirinê, em jî neçar in ku rêzdar bin. Ma gotina, “Em erzan jiyan” qet li we tê? Ez li wan kesên ku li hember nirxan dikevin berevajiyê şaş dimînim. Qet naxwazim dilê xwe bi wana bişewitînim. Her ku hun bi wan nirxan ve ne girêdayî bin, bi misogerî em nikarin we têxin şûna zilaman. Ev jî qewîtiya wan û girêdana bîranîna wan diderbirîne. Ezê, ka ew mirovên çawa bûn, keçên ciwan ên çawa bûn û di nava azweriya jiyaneka çawa de dixwestin bimînin, bizanibim û biriya xwe bidimê. Bi misogerî ezê wisa bikim. Ji min tiştekî din nepên. Hun çiqas hatibin xistin, hun çiqas xafil bin bibin, jiyan wan jî bo we fermana herî mezin e. Her ku hun endamekê artêşa egîdan e, hunê bi gora vê fermanê bijîn. Hun dibêjin ku, em dixwazin werin ARGKê û werin nav artêşa jinê. Wê demê serleşkerên vê wisan in û bi gora vê hunê tevbigerin.

Ez bi xwe jî di xizmeta wan de me. Ew mirovên di jiyanê de tiptijî bûn. Dahûrîneke jiyanê heye, lê binêrin, hunê di nava şaşwaziyê de bimînin. Pênaseyên zayendîtiyê hene, dibêjin; “Sehaya herî zêde ku jin û zilam hev û dî dixapînin!” Çi nirxandineke mezin e! Yanî dibêje, “di navê de lîstik heye!” sextetî û koledarî heye. Dibêje, “Azadiya wê pir zor e!” Dibêje, “çi mixabin em nebûn nasdarê wê azadiya çawa ku Serokatiya Partiyê dixwaze!” Lê weke hedefekî datînin pêşiya xwe. Tebî ev dibine nirxên ku pêwîst e hun pê ve girêdayî bimînin. Wisa bi hezaran hene. Hê jî ku bê gotin, “Me fêm nekir, me pêwîstekên wê neanî cî” qet ne tê pejirandin, ne jî bahane tê hesibandin. Hun ciwan in, egîd in, hunê bi can û dîl tevî van nirxan bibin.

## **Pakrewanî**

### **bergîdana jiyanê ku divê bê dayîn e**

---

Gelê me pir wenda kiriye. Tenê asîka jin û zilaman maye, bi xwe tun in. Ez ji bo xirabkirina arîşena we vana nabêjim, da ku azweriya qezenckirina we pêş bikeve dibêjim. Hun jin û zilamên ku tenê qerqotên wan mane, cendekên wan mane, xwiyangên wan mane; ne têkilî, ne rêzdarî û ne hezkin! Her tişt di nava eyb, qeyran û şermê de ne. Ez hizir nakim ku tu zilamek li keçekê bi saxlemî binêre, tu keç jî bi hêsanî zilamekî bipejirîne. Bi ya min li rastê sûcên pir mezin hene. Ji ber ku bi mirovatîyê hatiye leyistin. Ji ber ku her tiştê ku di mercên

civakên babistîn ên seretayî de nayê pejirandin, hatiye çespandin. Her wekî çiqas zagon û rêpîvan hene û demxeya xwe li pêşketina mirovatîyê xistine, em jê hatine derêxistin. Bi rastî jî qedan û tunebûna mezin hatiye afirandin. Şoreş, tam jî dermanê derbaskirina vê ye. Wateya uslûba şoreşger û şêwaza şoreşger yên van pakrewaniyên mezin ev e. Em jî bi xwe sipartina vê hewqas peywiran tînin cî. Wekî din bi tu awayî wateya pakrewaniyan nabe, tenê wateyeke wisa heye. Tebî ew jî ne bes e, ji bo pakrewaniyê mirov pakrewan nabe. Ji ber ku mitlaq bergîdaneke jiyânê yê pêwîst dike bê dayîn heye ku, mirin pêk tê. Ne ku bila xwîn hinekî din birije, xwîn tê rijandin. Heke ku pir ne pêwîst be, tenê dilopeke xwîn jî nayê rijandin. Bi rastî jî ez nikarim gelale bikim. Ez, ji bo çi xwe didime jiyandin? Dîqat bikin, di astên nayê bawerkirin de didim jiyandin. Bi ya min xwe bi hêsanî fedakirin, xwe bi hêsanî dana kuştin, bi misogerî nayê pejirandin ango nêzîkatiya mirîtiyê bi xwe bidim pejirandin, nayê hizirandin. Çima? Ji ber rêzdariya jiyânê. Îca bi taybetî ku em jiyana gelemperî hewqas eleqedar dikin, wê emê bi hêsanî nemirin. Bi rastî jî divê ez bibêjim ku, yên bi hêsanî dimirin li paş rastînen me yên rêkxistinî û armancên wê mane. Ji van ketinên erzan yên wisa re pir hêrs dibim.

Ez di virê de pakrewanan qesd nakim. Kê qesd dikim? Herî zêde xwe. Mînak da ku mirinê asteng bikim, di ciyekî de da ku xwe bidim bexşandin, hewqas nêzîk dibim. Lê tevî ku sedî sed berpirsiyar in û dikarin bi bergiriyekî gelek tiştan rêkûpêk bikin, lê vê nakin û xwe li pêşberî me didin jiyandin, gelo ez çiqas hêrs dibim, dizanin an na? Gelo ev dizanin ka çiqas nemerd û ketî ne? Hindek bila nebêjin, “rêkxistin me fêma nake” ango “zagonên jiyânê nabînin ka em li pey mirineke çawa ne!” Na, dibînin. Çawa ku min got, ez hewqas wateyeke mezin didim pakrewaniyan. Lê, di heman demê de eşkere dibêjim ku, tenê yek dilopa xwîna ne dem û ne di cî de bê rijandin, nayê pejirandin. Çawa ku ez dixwazin, xwe wisa nadim jiyandin, lê qasî azweriya jiyaneke mezin, dûrbûna mezin a jiyânê jî her qas li ba xwe didim girtin. Asta temsîla dozên ev cure wisa dibe. Em xwe nedin xapandin. Hewqas wendayî, ji ber vê kêmasiyê dev ji jiyânê berdan, naye pejirandin.

Ger ku we xwe anîbe halekî nayê nasîne, bi lezgînî xwe rast bikin. Jiyan, ne babetek wisa ye ku mirov bi hêsanî dest bigire. Têkiliyên beramber yên zayendan û jiyana hevpar ku nebe, jiyana nabe. Gava yekemîn jiyîn be, gava duyemîn weke rasteqîneke rêkxistinî û civakî jiyîn e. Ev jî di pevreyiya jin-zilam re derbas dibe. Heke ku her du jî di nava me de hewqas di xeteriyê de bin, her kes ka çalakiya wî tê çi wateyê, jiyana wî tê çi wateyê, divê fêma bike.

Bi ya min divê heya niha jiyandina we nebe. Hun çawa ketin, çima bi hêsanî dimirin û tîna kuştin? Divê ev nebe. Ger bibe jî, xwe nedîtî dihesibînim. Di felsefe û nêzîkatiya min de erêkirina vê nîn e. Ez ji roja yekem heya îro, ji roja ku xwe nas dikim vir ve, yeman didim jiyandin. Di wateyekê de qet najiyîm. Lê di wateyekê de jî yê herî bilind dije me. Otorîta herî mezin, ma ya dê û bav bû, weke

keyekî li hember wan sekinîm û hê jî wisa me. Li hember cîhanê disekinim. Rêgeza min heye, rêzdariya min li hember jiyana min heye. Ez wisa dizanim û wisa dibim. Temam, yê we jî dikişîne ev e. Belkî hun ji vê bi bandor bûn, lê ji bo me tenê bandorbûn ne bes e. Hun hevalên milîtan in, ne sempafîzanên jirêzê ne, yek jî we vê ji xwe re layiq dîtiye. Hun ji xwe re dibêjin hevalên şer; navdêrên artêş, serkan û serokî li xwe layiq dibînin. Wê demê hunê mafê vê bidinê. Bi min re bi hêsanî hevalbûn nabe. Ger hun bihizirin hevaltiya hêsanî dibe, hunê bixapin û bidine xapandin. Ev jî di rêhevaltiyê de ya herî xirab e. Dibe ku her tişt bê kirin, lê ji rêhevaltiyê re divê ev neyê kirin.

Ev tev, tenê ne ji bo şerekî hebûn û tunebûna netewekî, ji bo mirovatiyê jî pêwîst in. Ez, mirovekî ku xwe nede vê, gelale nakim. Hest û ajoyên xwe nexistina bin xizmeta vê, em nahizirin. Lê heke ku di cemsêrê dijber de hemin wê cî were girtin, li hember vê şerê me yê çetîn wê hebe. Bila kes ji me di nava refên me de, ji koletiyê re, ew palpiştîyên wê nezanînê re, girêdana sihêl û kirêtîyê re erê nexwaze. Em erê nadin, nadin û nadin. Li beramberî vê, ger ku yek ji şerê azadiyê re vekirî be, ez xizmetkarê wê/î ya/ê mezin û sereke me. Ez di bin fermana şerê vê/î kesê/î de me û jixwe dixebitim jî.

Hun dibînin ku, di partî û rasteqîna şerê wê de, di derbarê tevahîtiya jiyandê de bêtir darîçav û safîbûyîn gergaz e. Di vê bingehê de qasî xwe ji xapandin û nebesiyan paqijkirinê, gihandina xurtbûnê jî pir girîng e û heta jêveneger e. Ev, tenê ne peywirek e, ji bo we tevan mafek e: Mafê mirovbûnê. Û ev azweriyeke mezin diafirîne. Azweriya mezin rêkxistina mezin, ev jî şer diafirîne. Yên ku mezin şer dikin jî, her tim dibin xwediyê têkiliyên mezin; dibin mezin têkiliya netew, mezin têkiliya azadiyê, mezin têkiliya takekes, mezin têkiliya hezkirinê û mezin têkiliya huner. Pêdiviya me bi vê heye. Me, ji bo vê hindêk rê da vekirin. Hunê vê weke fersendekî bizanibin û bi wê vejena ku ciwanbûna we dide, pêwîst e zêdetir çêbikin. Nexwe bi vê astê ji tenegehîştin û li paş wê seyrkirin, ne dikare bê pejirandin, ne jî bi misogerî tiştêk bi we dide qezenckirin. Divê hun bibêjin, ev ji bo hilkeftinekê destekeke baş e. Qasî dewlemendiya têgihîştinê, bi hîskirina pêwîstiya hewldanê û bi pêşankirina hewldanê di cî de, divê hun tevî bibin. Ev, di şer de jî wê we bike xwediyê meşêke saxlem û mitlaqa bide qezenckirin.

**13 Pûşper 1994**